



# BÎNGÖL ÜNİVERSİTESİ

ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ

XUSREW Û ŞÊRÎNA ELMAS XANÊ KENDÛLEYÎ  
(METIN-LÊKOLÎN)

Amadekar

Semih GEZER

TEZA DOKTORAYÊ

ŞÊWIRMENDÊ TEZÊ

Prof. Dr. Abdullah KIRAN

Bîngol - 2023

**BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ**  
**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI**

**ELMAS HAN-İ KENDÜLEYİ’NİN HÜSREV VE ŞİRİNİ**  
**(METİN-İNCELEME)**

**Hazırlayan**  
**Semih GEZER**

**DOKTORA TEZİ**

**TEZ DANIŞMANI**  
**Prof. Dr. Abdullah KIRAN**

**Bingöl – 2023**

## NAVEROK

BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ.....	IX
TEZ ONAY SAYFASI.....	X
PÊŞGOTIN .....	X
KURTE .....	XIII
ÖZET .....	XIV
ABSTRACT.....	XV
KURTEBÊJE .....	XVI
LÎSTEYA PÊVEKAN .....	XVII
DESTPÊK.....	1
1. Mijar û Çarçoveya Tezê .....	1
2. Armanç û Girîngiya Tezê .....	1
3. Çavkaniyên Tezê .....	2
4. Hewramî û Edebiyata Hewramî ya Klasîk .....	4

## BEŞA YEKEM

### 1. JIYAN ÛBERHEMÊN ELMAS XANÊ KENDÛLEYÎ

1.1. Jiyana Elmas Xanê Kendûleyî.....	8
1.2. Berhemên Elmas Xanê Kendûleyî .....	9
1.2.1. Mûş û Gorbê (Mişk û Pisîng) .....	10
1.2.1.1. Nusxeya Berlînê .....	10
1.2.1.2. Nusxeya Îranê.....	11
1.2.1.3. Nusxeya Qeredaxî .....	11
1.2.2. Xawer Zemîn .....	11
1.2.2.1. Nusyexa Berlînê .....	11
1.2.3. Xurşîd û Xeraman.....	12
1.2.3.1. Nusxeya Pirtûkxaneya Millî ya Tehranê-I.....	13
1.2.3.2. Nusxeya Pirtûkxaneya Millî ya Tehranê-II.....	13
1.2.3.3. Nusxeya Pirtûkxaneya Meclîsa Şûreya Îslamê ya Tehranê .....	13

1.2.3.4. Nusxeya Koleksiyona Edmondsî .....	13
1.2.3.5. Nusxeya Sehnê .....	13
1.2.3.6. Nusxeya Elî Baranî Gûran .....	14
1.2.4. Ferhad û Şêrîn .....	14
1.2.4.1. Nusxeya Berlînê .....	14
1.2.4.2. Nusxeya Pirtûkxaneya Meclîsa Şûreya Îslamê ya Tehranê .....	14
1.2.4.3. Nusxeya Pirtûkxaneya Zanîngeha Tehranê .....	15
1.2.5. Xusrew û Şêrîn .....	15
1.2.5.1. Nusxeya Pirtûkxaneya Dewletê ya Berlînê .....	15
1.2.5.2. Nusxeya Pirtûkxaneya Dewletê ya Denmarkê .....	16
1.2.6. Nadirname .....	16
1.2.6.1. Nusxeya Berlînê-I .....	17
1.2.6.2. Nusxeya Berlînê-II .....	18
1.2.6.3. Nusxeya Pirtûkxaneya Meclîsa Şûreya Îslamê ya Tehranê I .....	18
1.2.6.4. Nusxeya Pirtûkxaneya Meclîsa Şûreya Îslamê ya Tehranê II .....	18
1.2.6.5. Nusxeya Pirtûkxaneya Millî ya Cumhûriyeta Îslamê .....	19
1.2.7. Siyaveşname .....	19
1.2.7.1. Nusxeya Elî Axa Weled Xeydan .....	19
1.2.7.2. Nusxeya Îskender Nûriyan .....	19
1.2.7.3. Nusxeya Xudadad Perware .....	20
1.2.8. Heft Leşker .....	20
1.2.8.1. Nusxeya Kitêbxaneya Meclîsa Şûraya Îslamê .....	20
1.2.9. Helbestên Kendûleyî .....	21
1.2.9.1. Helbestên Perekende .....	21
1.2.9.2. Munacat-I .....	21
1.2.9.3. Munacat-II .....	22
1.2.9.4. Pendname-I .....	22
1.2.9.5. Pendname-II .....	23
1.3. Ziman û Kesayetiya Edebî ya Elmas Xanê Kendûleyî .....	23
1.3.1. Zimanê Wî .....	23
1.3.1.1. Unsûrên Farisî .....	23

1.3.1.2. Unsûrên Tirkî .....	24
1.3.1.3. Unsûrên 'Erebî .....	24
1.3.1.1. Biwêj û Gotinên Pêşyan .....	24
1.3.2. Hunerên Edebî.....	25
1.3.2.1. Hunera Teşbîhê .....	26
1.3.2.2. Hunera Îstîareyê .....	26
1.3.2.3. Hunera Tenasubê.....	27
1.3.2.4. Hunera Telmihê.....	27
1.3.2.5. Hunera Tekrîrê .....	28
1.3.2.6. Hunera Leff û Neşrê.....	28
1.3.2.7. Hunera Tezadê .....	29
1.3.2.8. Hunera Teşxîsê.....	29
1.3.2.9. Hunera Mubalexayê .....	30
1.3.2.10. Hunera Îrsala Meselê.....	30
1.3.2.11. Hunera Nîdayê .....	31
1.3.2.12. Hunera Alîterasyonê.....	31
1.3.3. Kesayetiya Edebî ya Elmas Xanê Kendûleyî.....	31

## **BEŞA DUYEM**

### **2. 1. LÊKOLÎNA METNÊ JI HÊLA RUXSARÎ VE**

2.1.1. Wezna Metnê .....	34
2.1.2. Teşeya Nezmê ya Metnê.....	34
2.1.3. Qafiye (Serwa) û Cureyên Wê.....	36
2.1.3.1. Li Gorî Cihê Wê Yê Di Risteyê De .....	36
2.1.3.1.1. Serwaya Sereta .....	36
2.1.3.1.2. Serwaya Navekî.....	37
2.1.3.1.3. Serwaya Kutayî .....	37
2.1.3.2. Li Gorî Dengan .....	38
2.1.3.2.1. Serwaya Lawaz.....	38
2.1.3.2.2. Serwaya Asayî.....	39
2.1.3.2.3. Serwaya Zêdebar .....	40
2.1.3.2.4. Cînas (Serwaya Regezdozî).....	40

2.1.4. Redîf (Paşserwa) .....	41
2.2. LÊKOLÎNA METNÊ JI HÊLA MUHTEWAYÊ (NAVEROKÊ) VE .....	41
2.2.1. Lehengên Sereke Yên Çîrokê .....	41
2.2.1.1. Şêrîn .....	41
2.2.1.2. Xusrew .....	44
2.2.1.3. Ferhad .....	46
2.2.1.4. Hurmiz .....	47
2.2.1.5. Şapûr .....	48
2.2.1.5. Şîrûy .....	49
2.2.1.6. Keça Qeyserê Romê (Meryem) .....	50
2.2.1.7. Pîre Zal .....	51
2.2.1.8. Behramê Çûbîn .....	53
2.2.1.9. Qeyserê Romê .....	54
2.2.1.10. Fexfûrê Çînê .....	54
2.2.1.11. Gerra .....	55
2.2.1.12. Bi Kurtasî Danasandina Lehengan .....	56
2.2.1.13. Xulaseya Çîroka Xusrew û Şêrîna Elmas Xanê Kendûleyî .....	56
2.2.2. Şexsiyetên Dînî .....	58
2.2.2.1. Ye'qûb Pêxember .....	58
2.2.2.2. Yûsif Pêxember .....	58
2.2.2.3. Meryem .....	58
2.2.2.4. 'Îsa Pêxember (Mesîh) .....	59
2.2.2.5. Xizir .....	59
2.2.2.6. Belqîs .....	60
2.2.2.7. Şêxê Sen'anî .....	61
2.2.2.8. Acûc û Bacûc (Yecûc û Mecûc) .....	62
2.2.2.9. Meleku'l-Mewt (Ezrayîl) .....	62
2.2.2.10. Munker û Nekîr .....	62
2.2.2.11. Lat û Menat .....	63
2.2.3. Şexsiyetên Tarîxî (Dîrokî) û Efsanewî .....	63
2.2.3.1. Zal .....	63

2.2.3.2. Rustem .....	64
2.2.3.3. Siyamak.....	64
2.2.3.4. Nûşîrewan .....	65
2.2.3.5. Cemşîd .....	65
2.2.3.6. Dara.....	66
2.2.3.7. Îskender .....	66
2.2.3.8. Erjeng .....	67
2.2.3.9. Siyaveş .....	67
2.2.3.10. Ketayûn .....	67
2.2.3.11. Barbod û Nikîsa.....	68
2.2.4. Mesnewiyên Evîniyê.....	68
2.2.4.1. Bîjen û Menîjê.....	68
2.2.4.2. Behram û Gulendam .....	69
2.2.4.3. Humay û Humayûn .....	70
2.2.4.4. Seyfu'l-Milûk û Bedî' u'l-Cemal.....	72
2.2.4.5. Leyl û Mecnûn .....	74
2.2.4.6. Yûsif û Zuleyxa.....	75
2.2.5. Mekan (Cih) .....	76
2.2.5.1. Ermen .....	76
2.2.5.2. Medayin .....	76
2.2.5.3. Bêsitûn .....	76
2.2.5.4. Qesrê Şêrîn.....	77
2.2.5.5. Taqê Bostan.....	77
2.2.5.6. Stenbol, Mekke .....	77
2.2.5.7. Îran, Tûran, Hind, Sind, Belx û Buxara .....	78
2.2.6. Zeman (Dem).....	78

### **BEŞA SÊYEM**

3. Taybetmendiyên Zimên .....	79
3.1. Guhertina dengan .....	79
3.1.1. Guhertina Tîpên Dengdêr (Vowel).....	79
3.1.1.1. a/e .....	79

3.1.1.2. i/û .....	79
3.1.1.3. ê/i.....	80
3.1.1.4. e/i.....	80
3.1.1.5. ê/e .....	80
3.1.1.6. e/î.....	81
3.1.1.7. î/û .....	81
3.1.2. Guhertina Tîpên Dengdar (Consonant).....	82
3.1.2.1. w/b.....	82
3.1.2.2. h/k.....	83
3.1.2.3. l/r .....	83
3.1.1.4. t/d .....	84
3.1.2.5. w/xw.....	84
3.1.2.6. z/j.....	84
3.1.2.7. c/j.....	85
3.1.2.8. m/v .....	85
3.1.2.9. w /m.....	85
3.2.1.10. w/v.....	86
3.1.2.11.h/g.....	86
3.1.2.12. p/b.....	86
3.1.2.13. ç/j.....	87
3.1.3. Ketina Dengdaran .....	88
3.1.3.1. d.....	88
3.1.3.2. f .....	88
3.1.3.3. g.....	88
3.1.3.4. m.....	89
3.1.3.5. h.....	89
3.2. Dem .....	90
3.2.1. Dema Niha .....	90
3.2.2. Dema Bê .....	91
3.2.3. Dema Boriya Diyar.....	92
3.2.4. Dema Boriya Nediya .....	94



3.2.5. Çîroka Dema Borî.....	95
3.2.6. Çîroka Dema Niha .....	96
3.3. Cureyên Peyvan.....	97
3.3.1. Navdêr.....	97
3.3.1.1. Navdêrên Hevenav .....	97
3.3.1.2. Navdêrên Serenav .....	98
3.3.1.2. Navdêrên Şênber .....	98
3.3.1.2. Navdêrên Razber.....	99
3.3.2. Lêker .....	99
3.3.3. Cînavk.....	99
3.3.3.1. Cînavkên Kesane.....	99
3.3.3.2. Cînavkên Şanîdanê.....	101
3.3.3.3. Cînavka vegerok .....	101
3.3.3.4. Cînavkên kesandinê .....	102
3.3.3.5. Cînavkên Pirsiyarî.....	103
3.3.3.6. Cînavkên Jimarîn .....	103
3.3.3.7. Cînavkên Nebinavkirî .....	104
3.3.4. Rengdêr.....	104
3.3.4.1. Rengdêrên Çawaniyê .....	104
3.3.4.2. Rengdêrên Nişanî .....	105
3.3.4.3. Rengdêrên Hejmarî .....	105
3.3.4.4. Rengdêrên Nediya .....	105
3.3.4.5. Rengdêrên Wekhevî û Paye .....	106
3.3.4.6. Rengdêrên Pirsiyariyê .....	106
3.3.5. Daçek.....	106
3.3.6. Gihanek.....	107
3.3.7. Hoker.....	108
3.3.7.1. Hokerên Demê .....	108
3.3.7.2. Hokerên Cih û Berekê.....	109
3.3.7.3. Hokerên Çawaniyê .....	109
3.3.7.4. Hokerên mêjerî.....	109

3.3.7.5. Hokerên Pirsyariyê.....	110
3.3.8. Baneşan.....	110

### **BEŞA ÇAREM**

METNA MESNEWÎYA XUSREW Û ŞÊRÎN.....	112
ENCAM .....	585
ÇAVKANÎ .....	587
FERHENGOK .....	594
PÊVEK.....	618



# DANEZANA ETİK A ZANISTÎ

## BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ

Doktora tezi olarak hazırladığım *Elmas Han-i Kenduleyi'nin Hüsrev ve Şîrîni (Metin-İnceleme Edisyon Kritik-Sözlük )* adlı çalışmanın öneri aşamasından sonuçlanmasına kadar geçen süreçte bilimsel etiğe ve akademik kurallara özenle uyduğumu, tez içindeki tüm bilgileri bilimsel ahlak ve gelenek çerçevesinde elde ettiğimi, tez yazım kurallarına uygun olarak hazırladığım bu çalışmamda doğrudan veya dolaylı olarak yaptığım her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve yararlandığım eserlerin kaynakçada gösterilenlerden oluştuğunu beyan ederim.

19/01/2023

**Semih GZER**

**RÛPELA TESDÎQA TEZÊ**

**TEZ ONAY SAYFASI**

**BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ**

**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**

Semih GEZER tarafından hazırlanan *Elmas Han-i Kenduleyi'nin Hüsrev ve Şîrîni (Metin-İnceleme Edisyon Kritik-Sözlü )* başlıklı bu çalışma, 19.01.2023 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda oybirliği ile başarılı bulunarak jürimiz tarafından Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı'nda Doktora tezi olarak kabul edilmiştir.

**TEZ JÜRİSİ ÜYELERİ (Unvanı, Adı ve Soyadı)**

Başkan: Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ İmza: .....

Danışman: Prof. Dr. Abdullah KIRAN İmza: .....

Üye : Doç. Osman ASLANOĞLU İmza: .....

Üye : Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ İmza: .....

Üye : Dr. Öğr. Üyesi İhsanŞEHİTOĞLU İmza: .....

**ONAY**

*Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun ...../...../ 20..... tarih ve ..... sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.*

**Dr. Öğr. Üyesi Abdullah BEDEVA**  
**Enstitü Müdürü**

## PÊŞGOTIN

Edebiyat, li gor taybetiyên şiklî û ruxsarî ve wek du beş ji hev dabeş dibe. Ji van beşan yek edebiyata klasîk e, yek jî edebiyata nûjen e. Edebiyata klasîk zêdetir li dor qesra, di bin bandora desthilatdaran de derketiye holê. Ji bo ku muxetebên vê edebiyatê ji çîneke bijare bûne em dikarin ji bo vê edebiyatê têgeha ‘‘*edebiyata çîna bijare*’’ bi kar bînin. Berhemên di bin baniya ev cure edebiyatê de hatine nivîsîn xwe spartine xweşikî û estetîkiya gotinê. Gotinên qalibî, mezmûn, rêzikên tund yên şêweyî vê edebiyatê di qadeke teng de hepisandiye. Ji bo têgihîştina bi berhemên bin baniya vê edebiyatê de hatine nivîsîn, hewcehî bi perwerdehiyeke baş hebû. Herî zêde unsûrên edebiyata Farisî, unsûrên edebiyata Erebî di naverokên van berheman de cih girtine. Edebiyata Kurdî ya klasîk jî ji di çarçoveya vê sebkê de derketiye holê û belav bûye. Bi manendîbûna di hêla ruxsarî de, di hêla naverokê de jî manendîbûnek heye di nav berhemên di binê baniya vê edebiyatê de.

Dema em behsa edebiyata Kurdî ya klasîk dikin, di rastiye de armanca me jî vê gotinê edebiyateke wusan e ku di qadeke berfireh de belavbûyî ye. Ev belavbûn bibe nebe di nav berhemên vê edebiyatê de cudatiyek derxistiye meydanê. Ji ber hebûna van cudahiyan, edebiyata Kurdî ya klasîk li gor zaravayên zimanê Kurdî ji hev hatiye dabeş kirin. Wek edebiyata klasîk ya Kurdî ya Hewramî, edebiyata klasîk ya Kurdî ya Kurmancî, edebiyata klasîk ya Kurdi ya Soranî û edebiyata klasîk ya Kurdî ya Zazakî. Di vê xebatê de berê gotina me li ser edebiyata Hewramî û berhema helbestvanekî berhemdêrê vê edebiyatê ye. Ev helbestvan Elmas Xanê Kendûleyî ye. Elmas Xan, di serdema 18em de li Kendûle ya Kêrmanşanê hatiye dinê. Wî li dû xwe gelek berhem hiştine. Ji van berheman yek –ku mijara lêkolîna me ye- Husrew û Şêrîn e. Xusrew û Şêrîn bi terzê mesnewiyeke evîndariyê de hatiye nivîsîn.

Xebata me ji çar beşan pêk tê. Di beşa ewil de em li ser jiyana û berhemên Elmas Xan rawestiyane. Di beşa duyem de, ji hêla ruxsarî û naverokê de agahiyên derbarê metnê de cih digirin. Ji bo têgihîştina bi zimanê metnê hewcehî bi hinek agahiyan hebûn. Di beşa sêyem de di derbarê taybetiyên zimanê metnê de hinek agahî cih digirin. Di beşa çarema dawiya xebatê de jî metna Xusrew û Şêrînê cih

digire. Di xwendina metnê de kîjan rê hatin şopandin, di derbarê van xalan de agahî cih digirin di destpêka beşê de.

Her çiqas li ser berga xebatê tenê navê kesek derbas bibe jî di vê xebatê de keda gelek kesan heye. Ev xebat bi hewla me û bi alîkariya van kesan, di dawiya xebateke hevpar de bidawî bûye û gihîştîye ber destê we. Herî ewil malavayiya şêwirmendê xwe Prof. Dr. Abdullah Kıran dikim ku ji hêla menewî de alîkarî daye min û rêbertîyeke çê ji min re kiriye. Dr. İhsan Şehitoğlu ji hêla teknîkî û naveroka metnê de alîkariya min kiriye. Mala wî ava be. Dr. Ömer Delikaya û Dr. Zafer Açar pêşniyarên xwe bi min re parve kirine û di vê demê de gelek alîkarî dane min. Mala wan ava be. Ji bo alîkariyên wî yê di hêla teknîkî de malavayiya Dr. Cemal Tatlı dikim, dîsa ji bo alîkarî û teşwîqkirina ji vê xebatê re malavayiya Dr. İkrâm Filiz dikim. Ji bo rexne û pêşniyarên wan spasîyên xwe bi endamên lîjneya teza xwe, Prof. Dr. Hasan Çiftci, Doç. Dr. Osman Aslanoğlu û Doç. Dr. Nesim Sönmez re parve dikim. Ji bo xwendina wî ya metnê û tevahiya alîkariyên wî yê di hêla rêzimanî de spasîyên xwe bi birayê xwe yê Ayetullah Çelik re parve dikim. Dema ez li ser teza xwe di qadê de dixebitîm û min di derbarê teza xwe de agahîyan berhev dikir li rojhilat alîkariya gelek kesan gihîştîye min. Di hêla peydakirina çavkaniyan de û parvekirina agahîyan de, ji bo mêvanperweriya wan ya ji dil ez, spasîyên xwe bi Jîna Mîrteymûrî, Necm'ul Seba, Mubîn, Mîlad, Kak Rehmet, Kak Ferhad, Kak Sasan û Kak Esad, û gelek hevalên ku bi her hêlî de alîkariyên xwe bi min re parve kirine re dikim. Mala tevan ava be.

**BİNGÖL- 2023**

**Semîh GEZER**

## KURTE

Elmas Xanê Kendûleyî yek ji helbestvanê klasîk e di sed sala XVIII. de li devera Kendûleyê ya girêdayê parêzgeha Kêrmanşanê ji dayîk bûye. Kendûleyî bi diyalekta hewramî bi devoka Kenûlê gelek berhem nivîsîne. Mijara xebata vê têzê neşir û lêkolîna Xusrew û Şêrîna Elmas Xanê Kendûleyî ye. Ev xebat ji çar beşên eslî, ferhengok û pêvekê pêk tê. Em di beşa yekem de li ser jiyannameya Elmas Xanê Kendûleyî, berhemên wî û kesayetîya wî ya edebî sekinîn. Di vê beşê de berhemên Kendûleyî li gorî nusxeyên destxetên ku me bi dest xistin hatine nasandin. Beşa duyem mesnewiya Xusrew û Şêrînê ji hêla ruxsar û naverokê ve hatiye nirxandin. Di beşa sêyem de em li ser taybetmendiyên zimên sekinîn. Me di vê beşê de cih dane guhertina dangan, cureyên peyvvan û deman Mînakên ku di metna xebatê de hatine tespîtkirin bi zaraveya Kurmancî re hatine berawerdkirin di vê beşê de. Beşa çarem ji neşra metnê pêk tê. Di vê beşê de Mesnewiya Xusrew û Şêrîna Elmas Xanê Kendûleyî li gorî nusxeya Pirtûkxaneya Berlînê û Pirtûkxaneya Denmarkê ya Dewletê bi aweyeke edîsyon-krîtîkê bi tîpên latînî hatiye amadekirin.

**Peyvên Sereke:** Elmas Xanê Kendûleyî, Xusrew û Şêrîn, Edebiyata Kurdî/Hewramî, destxet.

## ÖZET

Elmas Han-i Kendûleyî, Klasik Kürt Edebiyatı şairlerinden olup XVIII. yüzyılda Kirmanşah şehrine bağlı Kendûle bölgesinde dünyaya gelmiştir. Kendûleyî, Havramî lehçesi ve Kendûle ağzıyla çok sayıda eser telif etmiştir. Bu tez çalışmasının konusu Elmas Han-i Kendüleyî'nin Hüsrev u Şîrîn adlı mesnevisinin metin neşri ve incelemesidir. Bu çalışma dört ana bölüm, lügat ve ekten oluşmaktadır. Çalışmanın birinci bölümünde Kendûleyî'nin hayatı, eserleri ve edebî kişiliği üzerinde durulmuştur. Bu bölümde Elmas Han-i Kendûleyî'nin eserlerinin elde edilen elyazma nüshaları esas alınarak tanıtılmıştır. İkinci bölümünde Hüsrev u Şîrîn mesnevisi şekil ve muhteva bakımından; üçüncü bölümde ise söz konusu mesnevinin dil özellikleri incelenmiştir. Bu bölümde ses değişimlerine, sözcük türlerine ve zamanlara yer verilmiştir. Metinde geçen örnekler Kürtçenin Kurmancî Lehçesiyle mukayese edilmiştir. Dördüncü bölüm transkripsiyonlu metin neşrinden oluşmaktadır. Elmas Han-i Kendûleyî'nin Hüsrev u Şîrîn adlı eseri; Berlin ve Danimarka Devlet Kütüphanesi elyazma nüshaları esas alınarak edisyon-kritiği yapılmıştır.

**Anahtar Sözcükler:** Elmas Han-i Kendûleyî, Hüsrev u Şîrîn, Kürt Edebiyatı/Havramî, elyazma.



## ABSTRACT

Almās Khān-i Kandulayi is one of the poets of Classical Kurdish Literature. He was born in the Kandula region of the city of Kermanshah in the 18th century. Kandulayi has written many works in Havrami and Kandula dialect. The subject of this thesis is the text publication and analysis of Almās Khān-i Kandulayi's masnavi named *Khusraw and Shirin*. This study consists of four main chapters, a glossary and an appendix. In the first part of the study, Almās Khān-i Kandulayi's life, works and literary personality are emphasized. In this section, the manuscript copies of the works of Almās Khān-i Kandulayi are introduced. In the second part, *Khusraw and Shirin* mathnawi in terms of form and content; In the third part, the language features of the mentioned mathnawi are examined. In this section, sound changes, word types and tenses are included. The examples in the text have been compared with the Kurmanji dialect of Kurdish. The fourth chapter consists of transcription of the text. The work named *Khusraw and Shirin* by Almās Khān-i Kandulayi; The edition-critique was made based on the manuscripts of the Berlin and Danish State Library.

**Keywords:** Almās Khān-i Kandulayi, *Khusraw and Shirin*, Kurdish Literature/ Havrami, manuscripts.

## KURTEBÊJE

amd.	: amedekar
b.z.	: berî zayînê
bnr.	: binêr
c.	: cild
çev.	: çeviren
h.q.	: hicrî qemerî
M.	: malik
m.	: mirin
MEB.	: Milli Eđitim Bakanlıđı
r.	: rûpel
TDK.	: Türk Dil Kurumu
wer.	: werger
hwd.	: her wekî din
NB	: Nusxeya Berlînê
ND	: Nusxeya Denmarkê

## LÎSTEYA PÊVEKAN

Pêvek 1: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1825). *Xusrew û Şêrîn*: **rûpela ewil**, Staatsbibliothek zu Berlin, Patermann II Nachtrag 13.

Pêvek 2: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1825). *Xusrew û Şêrîn*: **rûpela dawî**, Staatsbibliothek zu Berlin, Patermann II Nachtrag 13.

Pêvek 3: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (b.t.). *Xurşîd û Xawer*: **rûpela ewil**, Edmonds's Collection, IX. 2. Kurd.

Pêvek 4: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (b.t.). *Xurşîd û Xawer*: **rûpela dawî**, Edmonds's Collection, IX. 2. Kurd.

Pêvek 5: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1914). *Şêrîn û Ferhad*: **rûpela ewil**, Staatsbibliothek zu Berlin, Hs. or. 9777.

Pêvek 6: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1914). *Şêrîn û Ferhad*: **rûpela dawî**, Staatsbibliothek zu Berlin, Hs. or. 9777.

Pêvek 7: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1915). *Munacat*: **rûpela ewil**, Staatsbibliothek zu Berlin, Hs. or. 9778.

Pêvek 8: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1915). *Munacat*: **rûpela dawî**, Staatsbibliothek zu Berlin, Hs. or. 9778.

Pêvek 9: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1915). *Xawer Zemîn*: **rûpela ewil**, Staatsbibliothek zu Berlin, Hs. or. 9778.

Pêvek 10: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1915). *Xawer Zemîn*: **rûpela dawî**, Staatsbibliothek zu Berlin, Hs. or. 9778.

Pêvek 11: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1825). *Xusrew û Şêrîn*: **rûpela 150**, Denmark, cod. Pers. Add.54.

Pêvek 12: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1825). *Xusrew û Şêrîn*: **rûpela 52**, Denmark, cod. Pers. Add.54.

Pêvek 13: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1825). *Xusrew û Şêrîn*: **rûpela ewil**, Denmark, cod. Pers. Add.54.

Pêvek 14: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1825). *Xusrew û Şêrîn*: **rûpela dawî**, Denmark, cod. Pers. Add.54.

Pêvek 15: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (18XX). *Nadirname*: **rûpela ewil**, Staatsbibliothek zu Berlin, Hs. or. 9775

Pêvek 16: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (18XX). *Nadirname*: **rûpela dawî**, Staatsbibliothek zu Berlin, Hs. or. 9775.

Pêvek 17: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1825). *Pendname*: **rûpela ewel**, Denmark, cod.  
Pers. Add.54.

Pêvek 18: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1825). *Pendname*: **rûpela dawî**, Denmark, cod.  
Pers. Add.54.



## DESTPÊK

### 1. Mijar û Çarçoveya Tezê

Mijara teza me neşr û lêkolîna Xusrew û Şêrîna helbestvanê klasîk û Hewramî ziman Elmas Xanê Kendûleyî ye. Ev helbestvan di sedsala XVIII. de li bajarê Kêrmanşan û li devera Kendûlê jiyaye. Di navenda teza me de berhema Elmas Xanê Kendûleyî ya bi navê Xusrew û Şêrînê ku bi terzê mesnewiyê hatiye nivîsîn cih digire. Çarçova xebata me jiyar û berhemên Kendûleyî, ji hêla şiklê û naverokê ve nirxandina metnê, û ya din jî li gor du nusxeyên destxetên vê berhemê, avakirina metna transkripsiyonê pêk tê.

Li gor agahiyên me bi dest xistine di beşa yekem de em li ser jiyanname, mexlas, leqeb, berhem û nusxeyên destxetên berhem û kesayetiya edebî ya Elmas Xanê Kendûleyî sekinîn. Ji bo em kesayetiya wî ya edebî nîşan bidin, me hunerên edebî û unsûrên zimên, wek gotinên pêşiyar û biwêjan jî diyar kirine.

Di beşa duyem de em li ser unsûrên dîrokî, efsanewî, dînî, navên mesnewiyên evîniyê yên di metna xebatê de derbas dibin û lehengên sereke yên vê mesnewiyê sekinîn. Di vê beşê de bi hûrgilî di derbarê van xalan de agahî hatine dayîn. Dîsa di heman beşê de wezn û teşeya vê berhemê hatiye tespît kirin. Bi mînakên, cureyên serwayê û paşserwayê li vir hatine nîşandan. Kesên vê berhemê wê hildin destê xwe divê nasîniya wan bi zaravayê Hewramî re hebe. Di vir de ji bo piçek bê zanîn di asta bingehîn de, me di derheqa dengên zaravayê Hewramî de hinek agahî dane. Di beşa sêyem ya vê xebatê de em li ser valan xalan rawestiyar.

Di beşa çarem ya dawî ya vê xebatê de Xusrew û Şêrîna Elmas Xanê Kendûleyî cih digire. Ji bo xebata li ser vê mesnewiyê me nusxeya Berlînê ji xwe re esas girt û me vê nusxeyê bi ya Denmarkê re da ber hev. Her rûpelek bi herf û reqemek navekî li wan hatiye kirin. Me ji malika ewil heta ya dawî bi hejmaran diyar kirine.

### 2. Armanc û Girîngiya Tezê

Armanca me ji vê xebatê ew e ku em, Elmas Xanê Kendûleyî û berhemên wî bi lêkolîner û xwendekarên edebiyata Kurdî bidin nasîn. Xalek din jî ew e ku em cihê vî helbestvanî di Edebiyata Kurdî ya klasîk de tespît bikin. Heta niha li ser Xusrew û

Şêrîna Elmas Xanê Kendûleyî tezeke doktorayê nehatiye amade kirin. Dema em ji bo bijartina mijara tezê ketin gerê ev valahî bala me kişandin. Bi kifşkirina vê valahiyê re me ji bo xebatê ev mijar bijart. Armanca bijartina mijara vê tezê ji vir tê. Ev xebat armanca dike ku valahiya heyî bê dagirtin. Armanca bingehîn ya ku me behskirî be jî li ber vê, li pêş me ji bo xebata li ser berhemeke Hewramî ziman hinek sedemên dinê ku me motîve kiribûn jî hebûn. Di akademiya Kurdî de biyanîbûnek û dûrmayînek heye ji qada edebiyata Hewramî re. Berhemên di çarçova dîroka edebiyata Kurdî de hatine amadekirin de bi taybetî di berhemên Kurmancî de navê vî helbestvanî derbas nabe. Di berhemên weke Tarîxa Edebiyata Kurdî ya Qenatê Kurdo (1992, Ankara) de, *Dîroka Wêjeya Kurdî* ya Feqî Huseyîn Saxnîç (1992, Enstîtuya Kurdî, Stenbol) de, *Şairên Klasîk ên Kurd* ya Ebdurreqîb Yûsif (2012, Dîwan, Stenbol) de, *Kürt Şiir Antolojisi* ya Selîm Temo (2013, Agora Kitaplığı, İstanbul) de, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk* ya Abdurrahman Adak (2014, Nûbihar, İstanbul) de Elmas Xanê Kendûleyî tenê wek nav cih digire, weke din derbarê jiyana wî ya edebî de behsek tune ye (Adak, 2014: 151). Zanyarên weke Ela'eddîn Seccadî di berhema xwe ya bi navê *Mêjûy Edebî Kurdî: Mêjû, Edeb, Zanyarî, Kurdistan* (1389, Senendec) de û Şêx Ebdulmumîn Merdoxî di berhema xwe ya bi navê *Keşkuşê Şî'rêkî Kurdî Goranî* cih nedane Elmas Xanê Kendûleyî (1998, Lenden). Me xwest ku vê kêmasiyê ji holê rakin û ev helbestvanê xwediyê gelek berhem li bakur jî bidin nasîn. Abdurrahman Adak ku li ser edebiyata klasîk ya Kurdî gelek xebatên wî hene, bi serenavê *Mexlesê* (Nûbihar Akademî, 2017) gotarek nivîsiye. Di vê gotarê de nêzikî navên sêsed helbestvanên kurd derbas dibin lê nav û mexlasa Elmas Kendûleyî derbas nabe. Ev yek jî nîşan dide Elmas Xan bi awayekî baş nehatiye nasîn di nava kurdan de û herwiha di qada akademiya de. Ev xebat, herî zêde ji bo dagirtina vê valahiyê hatiye amade kirin.

### 3. Çavkaniyên Tezê

Di derbarê jiyana û berhemên Elmas Xanê Kendûleyî de heta van salên dawiyê gelek kêma çavkanî hebûn, yê heyî jî sînorkirî bûn. Di vê xebatê de me, ji berhemên bi navên Mêjûy Nawdaranî Kurd ya Baba Şeyx Merdûxê Rûhanî, *Hedîqeya Sultani* ya Muhemmed Elî Sultanî, *Mêjûy Edebî Kurdî* ya Me'rûf Xeznedar û *Mêjûy Wêjey Kurdî* ya Sedîq Sefîzade Borekey heta derekê sûd wergirtine.

Me di derbarê berhemên Elmas Xanê Kendûleyî de, ji berhema Muhemmed Reşîd Emînî ya bi navê *Keşkulî Şa'iranî Hewreman û Hikayetê Ferhad û Şêrîna* Elmas Xan Kendûleyî ku ji aliyê Emîn Gocerî (1373, Qom) ve hatiye amadekirin sûd vegirtiye. *Xusrew û Şêrîna* Nîzamiyê Gencewî (1390, Tehran ) û Xanay Qubadî (1367, Urmiye) ji bo berawerdkirina hin xalan weke çavkaniyên sereke di xebata me de cih digirin. Mînakên mesnewî û helbestên ku me di nav metna xebata xwe de bi kar anîne bi gelemperî ji destxetên berhemên Kendûleyî hatine girtin. Ev destxet weke dosyeyên dijîtal jî li ber destê me ne.

Ji bo beşa sêyem di warê zimanê Hewramî de me ji berhema Fatêh Rehmî ya bi navê *Destûrê Zebanê Kordî: Hewramî* (1386, Senendec) gelek sûd wergirtiye. Mînakên cureyên peyvan, deman ku li kêleka metna Xusrew û Şêrînê haine zêde kirin, bi gelemperî ji berhema Rehmî hatine girtin.

Me ji bo amadekirina ferhengokê ji ferheng û dîwanên Hewramî yê bi rêbaza tehlîlê hatine nivîsîn sûd wergirtine. Hinek ji van çavkaniyan li jêrê hatine nîşandan:

Nawxoş Begir, Selam, (2012), *Ferhengî Herze: Ferhengî Kurdî-Kurdî*, Hacî Haşim, Hewlêr.

Şerefkendî, 'Ebdurrehman, (1379). *Henbane Borîne: Ferhengê Kurdî-Farisî*, Siruş, Tehran.

Welî Dîwane, (1392). *Dîwanî Welî Dîwane: Soranî û Hewramî*, (amd. Razi), Kurdistan, Senendec.

Xanay Qubadî, (1985). *Xusrew û Şêrîn* (amd. Muhemmedê Mela Kerîm), Urmiye, weşanên Selaheddîn Eyyyûbî, Urmiye.

Xanay Qubadî, (2017). *Leyla û Mecnûn* (amd. Karwan 'Usman Xeyat), Şiwan, Senendec.

Xizrî, Seyyid Şehab, (1393). *Ferhengê Namha û Şexsiyetha: Kordî- Faresî*, Êntêşatarê Kalic, Senendec.

Ji bo em karibin analîza metnê ji hêla naverok û ruxsarê ve bikin, me ji berhemên li jêrê hatine nîşandan sûd wergirt û ew bi kar anîn.

Şemîsa, Sîrûs, (1383). *Ferhengê Telmîhat*, Çapxanê Mîtra, Têhran.

Yaheqî, Mohemmed Cefer, (1386). *Ferhengê Esatîr ve Dastamnvarêha Der Edebiyatê Farêsî*, Ferhengê Mo'asêr, Têhran.

Yıldırım, Nimet, (2006). *Fars Mitolojisi Sözlüğü*, Kabalcı Yayınları, İstanbul.

#### 4. Hewramî û Edebiyata Hewramî ya Klasîk

Zimanê Kurdî ji zaravayên cuda cuda pêk hatiye. Ji van zaravayan yek jî zaravayê Hewramî ye. Şerefxanê Bedlîsî di berhema xwe ya bi navê Şerefnameyê de kurdan weke Kurmanc, Kelhor, Lor û Goran tesnîf dike (Bedlîsî, 2007: 101). Hewramî, navê xwe ji herêma ku lê ev zarava hatiye axaftinê stendiye. Weke têgeh carnan Hewramî, carnan Goranî ji bo heman diyalektê tê bikaranîn. Mackienze, (2002: 401) Hewramî weke zaravayekî Goranî dihesibîne. Ev zarava li Başûr û Bakurê Kurdistanê tê axavtin. Ji Helebçeyê heta Kendûleyê bi gelemperî zaraveya Kurdî ya serdest Hewramî bûye. Di dîrokê de bajar û deverên ku ev zarava lê hakim bûye ev in: Helepçe, Tewîle, Dêzaver, Hecîc, Nojdê, Zerdê, Hewremana Text û Lion, Nisûd, Merîwan, Nekar, Pawê, Dînawer, Kulya, Kendûle.

Edebiyata Hewramî li gorî salnameya Hîcrî di sedsala duyemîn de bi kelimên ayîna Yaresaniyê dest pê kiriye. Di çarçoveya edebiyata vê zaravayê de Behlûlê Mahî weke nûner tê qebûl kirin. Behlûlê Mahî di dewra Şahxoşîn de jiyaye. Ev edebiyat bi awayeke şîfahî berdewam dike heta serdema Pîr Mûsî (Ölmez, Cumhûr û Valî, Shehab, 2022: 33). Pîr, bawe, daye û derwêşên Yaresan ji bo vê edebiyatê bi kelimên xwe xizmeteke zêde kirine. Destxetên kelimên Derwêş Xudawerdî Loristanî, Reyhan Xanima Loristanî, Lîza Xanima Caf, Fatime Lere, Xatûn Meyzerd, Derwêş Tehmas Gehware, Derwêş Zulfeqar Goran, Derwêş Reza Kirendî, Rustem Bawecanî, Pîr Rehmet, Pîr Fîrûz, Pîr Nasir Bextiyarî, Bawe Yûsif Kurmanc, Pîr Tahir Isfehânî, Derwêş Newroz û Pîr Mûsî heta roja me hatine parastin. Pênc riste ji kelama bi navê *Yar û Yadigar* ya Pîr Mûsî li jêr hatiye nîşandan.

Ûlaman dîşan we mu'cîzatiş

Bergê xudrengî bî we xelatiş

Temam Kurdistan da we beratiş

Yekser kerde we Kurd û Kurdistan

Hem we mu'cizat hem we sifrew xwan (Destxet ji Diwana Gewre, r. 239).



Xanay Qubadî di beşa Mihracnameya Xusrew û Şêrîna xwe de Kurdî bi Farisî re muqayese kiriye. Xanay dibêje ku herkes bi zimanê xwe û li her mekanî dikare binivîse. Wî, ev fikr û ramanên xwe bi malikên jêre aniye zimên:

Rasten miwaçan Farisî şekeran  
Kurdî ce Farisî bel şêrînteren  
Pey çêş ne dewran ey dinyay bedkêş  
Mehfûzen herkes be zubanê wêş  
Me' lûmen herkes be her zubanî  
Biwaço nezmê ce her mekanê (Xanay, 1368:14).

Edebiyata Hewramî di nava sedsala XVan de bi helbest û mesnewiyên Mela Perîşan, bi şêweyek klasîk dest pê dike (Adak, 2014:153). Ev şêwe heta sedsala XXan bênavber berdewam dike. Di vê serdemê de, ji hêla teşe û naverokê ve gelek helbest û mesnewiyên curbicûr hatine nivîsîn.

Helbestvanên weke Mela Perîşanê Dînawer bi dîwan, Saqîname û Perîşannameya xwe, Turkemîr (m. 1820) bi dîwana xwe, Mela Necef bi helbestên xwe, Mirza Şefî'ê Paweyî bi Ferhad û Şêrîna xwe, Mîrza Şefî'ê Dînawerî (Kulyayî) bi Newfel û Mecnûna xwe, Elmas Xanê Kendûleyî bi Xusrew û Şêrîn, Xurşîd û Xereman, Mûş û Gurbê, Nadirname, Siyaveşnameya xwe, 'Eynu'l Quzat Hemedanî (m.521/1131) bi helbestên xwe yê 'irfanî, Welî Diwane (m. 1881) bi helbestên xwe yê aşiqane, Bêseranî (m. 1701) bi dîwana xwe ya kamil, Mewlewiye Kurd (m. 1882) bi dîwan û eqîdenameyên xwe, Mewlana Xalid (m. 1827) bi helbestên xwe, Nûr Elî Kendûleyî bi Xurşîd û Xawera xwe, Xanay Qubadî bi Leyl û Mecnûn, Yûsif û Zuleyxa, Xusrew û Şêrîn, Sultan Îbrahîm û Noşafêrîn û dîwana xwe (Qubadî, 2017: 102), Cîhanara (m. 1911) bi dîwana xwe, Nefî bi helbestên xwe, Mahşeref Mestûre Erdelanî (m.1849) bi helbestên xwe, Tahir Begê Caf (m. 1918) bi dîwana xwe, Melayê Cebarî (m.1786) bi dîwana xwe, Ehmed Begê Komasi (m. 1876) bi dîwana xwe, Seydî (m. 1849) bi dîwana xwe, Seyîd Ye'qûbê Mahîdeştî (m.1871) bi dîwana xwe, Şake û Xan Mensûr bi helbestên xwe, Mîrza Şefî'ê Çamerêzî (m. 1836) bi helbestên xwe, Mela Mustefa bi Xurşîd û Xawera xwe di qada edebiyata Hewramî de xwediyê cihek taybet in. Bi van helbestvanan edebiyata Hewramî ya klasîk pêş ketiye.

Edebiyata Hewramî weke teşeya nezmê bi dehan berhem bi qaliba mesnewiyê hatine nivîsîn. Ji hêla cureyê ve, van berheman weke mesnewiyên qeremanî, mesnewiyên evînî û mesnewiyên dînî mirov dikare tesnîf bike.

**a. Mesnewiyên Evîniyê (Lîrik)**

*Leyl û Mecnûn*

*Xusrew û Şêrîn*

*Yûsif û Zuleyxa*

*Behram û Gulendam*

*Seyfû'l-Milûk*

*Bîjen û Menîjê*

*Mem û Zîn*

*Ferhad û Şêrîn*

*Xurşîd û Xereman*

*Humay û Humayûn*

*Xurşîd û Xawer*

*Newfel û Mecnûn*

**b. Mesnewiyên Lehengiyê (Epîk)**

*Nadirname*

*Rustem û Zunûn*

*Cengnameyê Şehzade Muhemmed*

*Heft Xwanê Rustem*

*Sohrab û Rustem*

*Xwawer Zemîn*

*Siyaveşname*

*Heft Leşker*

**c. Mesnewiyên Dînî**

*Perîşanname*

*Şêxê Sen'an*

*Mihrajnameyên Hewramî*

*Mewlûdnameyên Hewramî*

### *‘Eqîdenameyên Hewramî*

Mesnewiyên ku li jorê bi aweya tesnîfê hatine nîşandan di warê edebiyata Hewramî ya klasîk de dewlemendiyek derdixe holê.

### **Keşkula Merdoxî û ya Germiyan**

Di Keşkula Ebdulmumîn Merdoxî de navên bîst û heft helbestvanên klasîk ku di navbera salên 1739-1797an de jiyane derbas dibin. Nîvîskarê vê berhemê bi xwe jî helbestvan e û mexlasa wî *Raqim* e. Ji bilî Xanay Qubadî û Bêseranî navên gelek van helbestvanan gelek kêr hatine zikirkirin. Helbestvanên ku di vê berhemê de cih digirin ev in: Axakor, Ehmedê Textî, Îbrahîm (Mîrza), Elyas Beg, Mehzûnî, Peşêw, Cemaleddîn Merdoxî (Ebwîm), Hafîz Ferhad (Mela), Hesenî Dereherdî, Xanay Qubadî, Xusrew (Lalo), Derdîn, Reza Beg, Zeyne’l- ‘Abedîn (Mewlana), Şake, Şemseddîn Dereherdî, Tahir Hewramî, ‘Ebdî, ‘Umer Neccarî, Ebdulmumîn Merdoxî (Raqim), ‘Elî Kêwnanî (Sofî), ‘Elî Muhammed Begê Tileko, Ferrûx Palinganî, Şêx Fezlullah, Qasim Pagelanî, Şêx Lutfullah, Muhammed Emîn Begê Hewramî, Muhammed Qulî Suleymanî, Mustefa Textî, Ustad Mîkayîl, Nazir Bestî, Yaske, Yosif Royse, Ye‘qûbcan (Merdoxî, 1996: 74).

Di Keşkula Germiyan de jî helbestên Xelîl Munewwer, Şewqî, Giryanî, Mela Rehmetullahê Telmexar, Feqê Ferec, Emîn Mehak, Ehmed, Nezanrah, Feqê Ehmed Qisrit, Mela Resûl, Yûsif, ‘Elî Axayê Tercillî, Mela ‘Elî Kiwêr, Ehmed Kenoş, Fenaî, Mela Weledxan, Xemnaki, Mela Pîre, Sadiq, Rencûrî, Tali’, Salih, Mîrza Se‘îd cih digirin. Bi saya vê berhemê em jî van helbestvanên Hewramî ziman agahdar dibin (Xeyat, 2017: 11-314).

## BEŞA YEKEM

### 1. JIYAN ÛBERHEMÊN ELMAS XANÊ KENDÛLEYÎ

#### 1.1. Jiyana Elmas Xanê Kendûleyî

Elmas Xan di sala 1702an de li Kendûleyê ji dayîk bûye ku Kendûle girêdayê Kêrmanşanê ye. Ji malbateke navdar û serwetmend bûye. Çend kitêbên ku behsa jiyannameya Elmas Xan dikin derheqa wî de agahiyên gelek kurt didin. Muhemed Sultanî di kitêba xwe ya bi navê Hedîqa Sultanî de diyar dike ku helbestvanê bi navê Şefî'ê Dînewerî piştî mirina Elmas Xan, li ser wî mersiye gotiye (Sultanî, 1384: 205). Ew di heman serdemê de jiyane û ihtimal e ku Elmas Xan di sedsala dozdehan de yanî teqrîben di navbera salên h.q.1190-1200/m. 1776-1786 de wefat kiribe (Borekey, 2008: 198). Li gorî agahiyên ku Xeznedar dide, navê bavê wî Ehmed Xanê Kendûleyî ye (Xeznedar, 2002: 59). Li gorî nusxeya Rustem û Esfendiyar (1012 h.q.) ku li Kitabxaneya Zanîngeha Berlînê li berdest e, navê bavê wî Riza Xan e. Dîsa li gorî vê nusxeyê, bavê wî şa'ir bûye û ihtimal e ku beriya Elmas Xan, bavê wî Riza Xan bi diyalekta hewramî dest bi nivîsîna Şahnameya Kurdî kiribe û bi ihtimaleke mezin wî jî nivîsandina vê berheme domandibe. Şa'ir, bi navên wekî Elmas Xanê Kurdistanî, Serheng Elmas Xan, Mela Elmas Xanê Kendûleyî, Mîrza Elmas Xan û Elmas Xanê Kelhor tê naskirin (Sultanî, 1374: 100; Gocerî, 1374: 278; Yezdanpenah, 1384: 18). Hacî Şêx Hamid Hîsamî di berhema xwe ya bi navê Yadî Şa'êranî Kurd de derheqa leqeb û bajarê Elmas Xan de agahiyên wiha dane:

Şa'îrî Kurd e Serheng Elmas Xan

Le gund Kendûle nawçey Kêrmaşan (Hîsamî, 1372:114).

Elmas Xan di zaroktiya xwe de dest bi xwendina 'ilma medreseyê kiriye. Li medresên Kêrmanşanê û Sineyê xwendina xwe domandiye. Dû re wî, telîm û perwerdeya cengê jî wergirtiye. Di demeke kurt de Elmas Xan derbasî artêşa Nadîrşahê Efqar bûye û ji ber liyaqeta xwe wekî fermanzarekî wezîfe girtiye (Xeznedar, 2008: 59). Gelek çavkanî vê agahiyê piştrast dikin. Nadirnameya Elmas Xanê Kendûleyî jî yek ji wan çavkaniyan e. Li gorî çavkaniyên ku me bi dest xistine di sala 1732an de di şerê navbera Nadîr Şah û Topal Osman Paşa de, Kendûleyî jî cih girtiye. Di vî şerî de ji ber ku Kendûleyî leşkerê xwe daye dawîya cepheyê artêşa

Nadir Şah li hemberî artêşa Topal Paşa şikestê dixwe (Gencorî, 1373: 12). Piştî wî şerî ji ber têkçûna di şer de, Nadir Şah, Elmas Xan ‘ezl dike û wî sirgûn dike. Piştî vê bûyerê Elmas Xan heta dawiya ‘emrê xwe li gundê Kendûleyê bi mûsîqî û şî’irê re mijûl dibe (Rûhanî, 2011: 238).

## 1.2. Berhemên Elmas Xanê Kendûleyî

Elmas Xanê Kendûleyî yek ji wan helbestvanên herî berhemdarê edebiyata Kurdiya Hewramî ye. Kendûleyî, berhemên xwe bi tevahî bi terzê mesnewiyê nivîsiye û wezna kîteyê bi kar aniyê. Wî bi gelemperî mesnewiyên xwe bi deh kîteyî nivîsîne.

Di nav kurdên Îranê de berhema herî navdar û berbelav Şahnameya Kurdî ya Elmas Xanê Kendûleyî ye. Ev berhem bi terz û şeweya Şahnameya Firdewsîyê Tûsî hatiye nivîsîn. Gelek nusxeyên wê li herêma Hewremanê di nav kurdan de hatine peyda kirin û hin ji wan li muzeyên Rûsyayê, Elmanyayê, Înglistan û Denmarkê jî niha tên parastin. Li gor gotara Edway (1391: 84) yanzdeh nusxeyên vê berhemê hene û ji destanên cuda cuda pêk hatine. Kitêb an jî mesnewiyên di Şahnameya Kurdî de cih digrin ev in: Destana Rustem û Kivîguhza, Heft Xanê Rustem, Siyaveş, Berz û Fûlawend, Menîje û Bîjen, Cengê Heft Leşker, Rustem û Zerdheng, Rustem û Isfendiyar, Rustem û Şexad û Rustem û Behmen, Feramerz û Azerberzîn (Yezdenpenah, 1383: 20). Kendûleyî ji van destanan hinek ji Firdewsî wergerandine bo Kurdiya Goranî hin jî bi xwe nivîsine. Zanyarên wekî Ehmed Şerîfî, Îrec Behramî, Sidîq Sefîzadê Borekî, Muhemed Reşîd Emînî, Xelîl Begzade, Mecîd Yezdanpenah û Emîn Gocerî li ser Şahnameya Kurdî xebat kirine û di vê meseleyê de nêrînên wan wekî hev in.

Muhemmed Elî Sultanî di kitêba xwe ya bi navê Coxrafyayê Tarîxî û Tarîxê Mufessel de diyar kiriye ku Elmas Xan xemse nivîsiye û xemseya wî ji Yusif û Zuleyxa, Şêrîn û Ferhad, Leyl û Mecnûn, Zerd Aheng û Kenîz, Yanzdeh Pêser pêk tê (Sultanî, 1374: 176). Lê ji xemsa Kendûleyî bi tenê destxeta Ferhad û Şêrîn hatiye parastin an jî heta niha ev berhem gihiştiye ber destê me. Dibe ku siberoj berhemên wî yê din jî bînin peydakirin. Mirov nikare di vê mijarê de agahiyên teqez bide. Ji bilî van berhemên ku navên wan li jorê hatine zikirkirin Xusrew û Şêrîn, Xawer Zemîn, Xurşîd û Xereman, Nadirname, Mûş û Gorbê, Siyaveşname, Rustem û Zunûn hatine

tespîtkirin ku ev ji aliyê Elmas Xanê Kendûleyî ve hatine nivîsîn. Berhemên ku me destxetên wan bi dest xistine û ji wan sûd wergirtine li jêrê hatine nîşandan.

### **1.2.1. Mûş û Gorbê (Mişk û Pisîng)**

Di nav berhemên Kendûleyî de yek jî Mûş û Gorbê ye. Şa'ir ev mesnewî bi terzekî alegorîk kişandiye nezmê. Berhema bi navê Mûş û Gorbê ya Kendûleyî wekî Nadirnameya wî diyar e ku şer û cengên ku Nadirşahê Efqarî kirine û di encama wan de neyarên xwe çawa mexlûb kirine bi zimanekî temsîlî û teswirî nivîsiye. Bi navê Mûş û Gorbê bi heman rengî, yekem car mesnewiya Êbeydê Zakanî dertê pêşberê me di edebiyata Farisî de (Atabegî, 1384: 365). Berhema Elmas Xan ji gelek hêlan ve dişibe ya Zakanî bi taybetî ji hêla terz û alegoriyê ve. Ev yek jî nîşan dide ku Elmas Xanê Kendûleyî di bin bandora Zakanî de maye.

Mexlasa Elmas Xan di vê mesnewiyê de wekî Elmas derbas dibe. Jixwe ji hêla ziman û honandina metnê ve jî diyar e ku ev berhema Kendûleyî ye. Di vir de gorbê yanî pisîng an jî pişîle temsîla Nadir Şahê Efqarî dike û mûş jî Eşref Efxan temsîl dike. Ango Efxaniyan wekî mişkan welatê Îranê talan kirine û Nadir Şah jî wekî pisîngê ew tarûmar kirine (Edway, 1394: 41). Heta niha sê destxetên vê berhemê hatine bidestxistin. Nusxeyek di Pirtûkxaneyê Berlînê ya Dewletê de ye, yek li Îranê di Pirtûkxaneyê Meclîsa Şûraya Îslamê ya Tehranê de ye û ya din jî di Pirtûkxaneyê Muhemmed Elî Qeredaxî ya taybet de tene parastin (Qeredaxî, 2011: 214). Derbarê van nusxeyan de li jêrê me cih daye çend gotinan.

#### **1.2.1.1. Nusxeya Berlînê**

Nusxeya Berlînê, bi hejmara Ms. Or. Oct. 1178 li Pirtûkxaneyê Berlînê ya Dewletê, di beşa Rojhilatnasiyê de hatiye qeydkirin (Edway, 1394: 30). Ev nusxe bi xeta nestelîk hatiye nivîsîn. Ji 18 rûpelan û ji 175 malikan pêk tê. Ev nusxeya Mûş û Gorbe ya Kendûleyî bi tevî hin helbestên din di keşkuleke hewramî de cih digire. (Huseynî, 1397: 32).

Malika ewil:

Mîrzam guş bider

Haļa vey bendit satî guş

Malika dawî:

Ye elmas waten barê xem ne dûş

Talanzedeyê destê nêrê mûş (Elmas Xan, Ms. Or. Oct. 1178)

### **1.2.1.2. Nusxeya Îranê**

Ev nusxeya Mûş û Gorbê bi hejmara 9788an li Pirtûkxaneya Meclîsa Şûraya Îslamê ya Tehranê hatiya qeydkirin. Ev nusxe bi xeta nestelîkê hatiye nivîsîn, ji 10 rûpelan û 104 malikan pêk te. Di destpêka vê mesnewiyê de Gofte Elmas Xan Gorbê û Mûş hatiye nivîsîn. Derbarê mustensîx de agahiyek nehatiye dayîn.

### **1.2.1.3. Nusxeya Qeredaxî**

Nusxeya Qeredaxî, ev nusxe jî li Pirtûkxaneya Muhemed Elî Qeredaxî ya taybet de, di keşkûlekê de cih digire. Ji 10 rûpelan û 130 malikan pêk tê. Berevajiya herdu nusxeyên din ên navborî, di nusxeya Qeredaxî de hin malik kêr in. Ji ber ku rûpela ewil zêde deforme bûye çend malikên ewil nayên xwendin (Gocerî, 1397: 343). Derbarê nav û mexlasiya helbestvan de agahî tune ye di vê nusxeyê de.

Du malikên rûpela ewil wiha ne:

Ûra we heybet we awaz birez

Ne çîrke ew e'zam nîşt nelerzen

Lerzam sitîzam horêzam ne ca

Be şertê edeb min midram we pa (Edway, 1394: 42).

## **1.2.2. Xawer Zemîn**

### **1.2.2.1. Nusyexa Berlînê**

Ev nusxeya Xawer Zemînê li pirtûkxaneya Berlînê ya dewletê bi hejmara Hs.or. 9778 di sala 1915an de hatiye qeydkirin. Ev nusxe bi tevahî ji 493 rûpelan, her rûpel jî ji 10 malikan pêk tê. Ev berhema Elmas Xanê Kendûleyî bi munacatê dest pê dike, piştî wê jî bi mesnewiya Xawer Zemînê dewam dike. Ev munacat ji 120 malikan pêk tê. Di rûpela serî de Munacat Gofte Elmas Xan hatiye nivîsîn. Ev nusxe ji aliyê Muhemmed Rehîmî ve di sala 1333an de hatiye nivîsîn. Ev yek jî di xetma munacatê de hatiye diyarkirin (Kendûleyî, Hs.or. 9778).

Herdu malikên ewil:  
Êbtêda kerdîm we namê Xuda  
Hem cin we hem êns ewen rehnuma  
Her to yî sêtar bê 'eybê wahêd  
Qadir û qehar... ê ehed

Herdu malikên dawî:  
Ya reb we hürmetê enbiya teman  
Bibexşî gunay şeyîdan tamam  
Hezaran dorûd we hezaran selam  
Zi ma ber Muħemmed 'eleyu's-selam

### **1.2.3. Xurşîd û Xeraman**

Ev berhem bi teşeya mesnewiyê hatiye nivîsîn û teqrîben ji 2300 malikan pêk tê. Bi wezna deh kîteyî ye. Destan û menzûmên hewramî bi gelemperî bi wezna deh kîteyî ne. Ev mesnewiya aşiqane li ser evîna du şehzadeyan hatiye nivîsîn. Xurşîd kurê 'Adil Şahê padişahê Xaveran e û Xeraman jî keça padişahê Çînê ye. Xurşîd ji bo ku bigihîje dildara xwe bi salan li hemberî astengiyan tekoşîn dike û di dawî de jî aşiq û meşûq digihîjin hevdu.

Di têkiliyên navbermetnanî de ev mesnewî ji hêla mijar û honandinê ve dişibe mesnewiya 'Îsarê Tebrîzî (m.1390) ya bi navê Mêhr û Muşterî (Sebzewarî, 1375: 66) û dişibe mesnewîya Siyahpoş (m. 1831) ya bi navê Seyfu'l-Mulûk û Bedî'u'l-Cemal (Siyapoş, 2011: 13). Di van hersê mesnewiyan de padişahên wê demê Adil Şah, Îbnê Sefwan û Şapûr Şah ji ber ku ewladê wan ên kurîn tunene, ji Xwedê re dua dikin ku bibin xwediyê ewlad. Piştî ku ji wan re waris çêdibe bi heman şêweyê di van hersê mesnewiyan de çîrok berdewam dike. Siyapoş û Elmas Xanê Kendûleyî ihtimal e ku herdu jî di bin bandora berhema 'Îsarê Tebrîzî de mabin.

Heta niha şeş nusxeyên vê berhemê hatine peydakirin. Ji van nusxeyan pênc heb li pirtûkxaneyên Îranê hatine tespîtîkirin. Kunyeyên van nusxeyan bi awayekî zelal li jêrê hatine dayîn.



### **1.2.3.1. Nusxeya Pirtûkxaneya Mîllî ya Tehranê-I**

Ev nusxe bi hejmara 3/9251 li vê pirtûkxaneyê hatiye qeydkirin. Bi xeta nestelîkê hatiye nivîsîn lê mustensîxê wê diyar nîne. Ji 297 rûpelan pêk tê.

### **1.2.3.2. Nusxeya Pirtûkxaneya Mîllî ya Tehranê-II**

Ev nusxeya Xurşîd û Xeremanê jî bi hejmara 9487an di vê pirtûkxaneyê de hatiye qeydkirin. Mustensîxê wê Mîrza Muhemmed Emîn Mukrî ye û bi xeta nestelîkê hatiye nivîsîn. Ji 150 rûpelan pêk tê.

### **1.2.3.3. Nusxeya Pirtûkxaneya Meclîsa Şûreya Îslamê ya Tehranê**

Nusxeya Pirtûkxaneya Meclîsa Şûreya Îslamê ya Tehranê, bi hejmara 1/17299an li vê pirtûkxaneyê hatiye qeydkirin. Mustensîxê vê nusxeyê Mehmûd Muhemmedî ye û bi xeta nestelîk di sala 1359an de hatiye nivîsîn. Di nusxeyê de 133 rûpel hene û her rûpelek jî ji 12 malikan pêk tê.

### **1.2.3.4. Nusxeya Koleksiyona Edmondsî**

Nusxeya Koleksiyona Edmondsî, bi hejmara IX.2. Kurd.250068 hatiye qeydkirin. Ji 169 rûpelan pêk tê. Di her rûpelê de 11 malik cih digire.

Malika ewil:

‘Adil Şa rojî nigay camîş kerd

Dûdiş ne gerdûn heftemîn werd

Malika dawiyê:

Hezaran durûd hezaran selam

Zi ma ber Muḥemmed ‘eleyu’s-selam

### **1.2.3.5. Nusxeya Sehnê**

Nusxeya Sehnê, bi xeta nestelîk hatiye nivîsîn û mustensîxê wê Muhemmed Elîzade ye. Ji 133 rûpelan û ji 1840 malikan pêk tê. Ev nusxeya Xurşîd û Xereman a Elmas Xanê Kendûleyî di pirtûkxaneya Muhemmed Rehman Abadî ya taybet de cih digire (Îzzetîzadê û Qenberî, 2021: 35).

Malika ewil:

Je rûy şahname kerdim niha

Î dastane we zeynim ama

Malika dawî:

Ferdê je dastan wiyerdey werîn

Macray meynet şay Xawer zemîn

#### **1.2.3.6. Nuxeya Elî Baranî Gûran**

Nuxeya Elî Baranî Gûran, ev nusxe bi xeta nestelîk di sala 1352an de hatiye nivîsîn. Mustensîxê wê Esed Seferî ye ji gundê Elî Baranî Gûran e. Ev nusxe jî ji 133 rûpelan pêk tê û di her rûpelê de 16 malik cih digire.

#### **1.2.4. Ferhad û Şêrîn**

Heta niha sê nusxeyên vê berhemê hatine peyda kirin. Ji van nusxeyan du heb li pirtûkxaneyên Îranê yek jî li ya Berlînê cih digirin.

##### **1.2.4.1. Nuxeya Berlînê**

Nuxeya Berlînê, bi hejmara Hs. or.1977 û di sala 1990î de hatiye qeyd kirin. Bi xeta nestelîkê ji hêla Muhemmed Rehîmê Kêrmanşahî ve di sala 1332an de hatiye îstînsax kirinê. Ev nusxe ji 311 rûpelan pêk tê û di her rûpelê de jî 16 malik cih digirin.

Malika ewil:

Ewel we namê Xudayê bê niyaz

Padşahê bê ‘eyb kerîmê karsaz

Malika dawî:

Sitem kêşîdê rûzegarenan

Je kerdê xerab şerimsarenan

##### **1.2.4.2. Nuxeya Pirtûkxaneya Meclîsa Şûreya Îslamê ya Tehranê**

Nuxeya Pirtûkxaneya Meclîsa Şûreya Îslamê ya Tehranê, bi hejmara 576an di vê pirtûkxaneyê de hatiye qeyd kirin. Navê mustensîxê wê nusxeyê nehatiye diyarkirin û bi xeta nestelîkê hatiye nivîsîn. Ji 220 rûpel û her rûpelek jî ji 12 malikan pêk tê. Rûpela ewil û ya dawiyê deforme bûne.

Malika rûpela ewil:

Şewî horîza Xusrew be yeqîn  
Pênhan ce Hurmuz merkebiş kerd zîn

Malika rûpela dawî:  
Dişnê taz û saw xerqen ne cergiş  
Elwanen be xûn ser ta pa bergiş

#### **1.2.4.3. Nusxeya Pirtûkxaneya Zanîngeha Tehranê**

Nusxeya Pirtûkxaneya Zanîngeha Tehranê, bi hejmara 4772an hatiye qeydkirin. Mustensîxê vê nusxeyê Hadiyê Kêrmanşahî ye. Bi xeta nestelikê hatiye nivîsîn. Ji 220 rûpelan pêk tê û di her rûpele de 13 malik cih digirin. Ji ber ku nusxe hinek deforme bûye hinek ji malikên vê berhemê nayên xwendin (Huseynî, 1397: 30).

#### **1.2.5. Xusrew û Şêrîn**

Xusrew û Şêrîn wekî destaneke aşiqane di Şahnameya Firdewsî de derbas dibe. Nîzamiyê Gencewî yekem car ev destan bi teşeya mesnewiyê kişandiye nezmê. Ebdul Huseyn Zerînkûb dibêje ku li Ermenistan, Gurcistan û devera Qesrê Şêrîn û gelek cihan qewmê kurd dijiyan (Zerînkûb, 1382: 387). Di Leyl û Mecnûna Gencewî de derbas dibe ku dayîka Gencewî, kurd e (Hemîdiyan, 1387: 49). Ji ber vê yekê dibe ku Nîzamî ev çîrok ji herema ku dayîka xwe angû ji nav xelkê kurd wergirtibe. Piştî wî ev mesnewî bi rêya wergerê derbasî edebiyata Tirkî û Kurdî dibe. Di edebiyata Kurdî de bi diyalekta hewramî jî Xana Qubadî dinivîse.

#### **1.2.5.1. Nusxeya Pirtûkxaneya Dewletê ya Berlînê**

Nusxeya Pirtûkxaneya Dewletê ya Berlînê, bi hejmara Petermann II Nachtrag 13 hatiye qeydkirin. Bi xeta nestelikê hatiye nivîsîn. Ji 299 rûpelan pêk tê, ji bilî rûpela ewil û ya dawiyê di her rûpelê de 13 malik cih digirin. Navê mustensîxê vê nusxeyê di dawiya metnê de wek Ebdurrehman derbas dibe.

Malika ewil:  
Ewwel hem be ismê Ellahê ekber  
Rehmanê rehma Rehîm û rehber

Malika dawiyê:

Xîme xiyaman berdişan tarac

Wîney rahdaranmegirtişan bac

### **1.2.5.2. Nusxeya Pirtûkxaneya Dewletê ya Denmarkê**

Nusxeya Pirtûkxaneya Denmarkê, bi hejmara cod. Pers. Add.54 hatiye qeydkirin. Ev nusxe jî wekî nusxeya Berlînê bi xeta nestelîkê hatiye nivîsîn û ji 216 rûpelan pêk tê. Bûyêrên girîng bi 29 mînyaturan hatine teswîrkirin di vê nusxeyê de. Di rûpela ewil de wiha hatiye nivîsîn: Bismillahi'r-Rehmanu'r-Rehîm; Haza kitabu Şîrîn û Xusrew mîn kelamu'l-Elmas Xan. Di navbera vê nusxeyê û ya Berlînê de tiştêk kêma cudahî hene.

Malika ewil:

Ewwel hem be ismê Ellahê ekber

Rehmanê rehma Rehîm û rehber

Malika dawî:

Ewwel je teqsîrê Şî'îyan biguzer

Diwem ey 'aşî kemîneê kemter

### **1.2.6. Nadirname**

Elmas Xan di vê berhema xwe de teswîra êrişa ku Efxaniyan biribûn ser Îranê dike. Ji ber ku Kendûleyî beşdarî cengên Nadir Şah bûye, ew cengan bi tevahî dizane û bi awayeke berfireh serpêhatiyên xwe yê şer, di vê berhemê de anîne ziman. Nadir Şah bi Osmanî, Hindî û Efxaniyan re şer kiriye. Li gorî agahiyên ku Kelîmullah Tewahudî (1384: 974) dide ev berhema bi teşeya mesnewiyê teqrîben ji sê hezar malikan pêk tê û bi wezna deh kîteyî hatiye nivîsîn. Tewahudî dibêje ku dozdeh nusxeyê vê berhemê li ber destê wî ne. Di vê mesnewiyê de diyar dibe ku tayîfeyên ku bi Topal Osman Paşa re şer kirine kurd in û hinek ji wan kurdên Xoresanê ne, wekî Ewsanlû, Baçiwani, Palkanlû, Bîçiranlû, Miyanlû, Namanlû û Wiranlû; hin ji tayîfên Kurdên din Lûlû, Mukrî, Mamwî, Feylî, Wermziyarî, Bextiyarî, Erdelan, Ewramî, Înaxî, Biraxuy, Zîbarî, Pazukî, Şahyarî, Şîrwan, Goran,

Mîran, Zaza, Zerza û Zend. Mexlûbiyeteke mezin dan Topal Osman Paşa û welatê Iraqê kirin bin rêveberiya xwe.

Navên eşîrên Kurdan di malikên jêr de wiha derbas dibin:

Deste ke rid sipaş herkam we tîp tîp

Her tîpî wîney tîp ewreng zîp

Tîpî j'Kurdan awerdiş yekser

Girdiyan cengî şûr ser le ser

Tîpî usanlû tîpî baciwanlû

Tîpî balkanlû tîpî biçiranlû

Tîpî miyanlû tîpî namanlû

Tîpî ceîl berze wiranlû

Tîpî j'lûlû tîpî lalewî

Tîpî j'mukrî tîpî mamwî

Tîpî j'feylî je we rimziyarî

Tîpî j'merdan kûy bextiyarî

Tîpî qûçanî tîpî kelatî

Tîpî j'şîrwan gewre welatî

Tîpî erdelan tîpî ewremî

Tîpî îmaxî merdan namî

Tîpî biraxuy tîpî zîbarî (Tewahudî, 1384: 975).

Me heta niha pênc nusxeyên vê berhemê bi dest xistine. Danasîna van nusxeyan li jêrê hatine dayîn.

#### **1.2.6.1. Nusxeya Berlînê-I**

Ev nusxe bi navê Nadirname û bi hejmara Hs. or. 1975an li pirtûkxaneyê Berlînê ya Dewletê hatiye qeydkirin. Bi xeta nestelîkê hatiye nivîsîn. Ji 92 rûpelan pêk tê û di her rûpelî de 16 malik cih digre. Rûpela ewil û ya dawî deforme bûne û ji ber vê yekê xwendina wan gelek dijwar e. Di vê nusxeyê de hatiye diyarkirin ku mustensixê wê Muhemmed Huseynê Şûrbelaxî kurê Hadî Xanê Şawesî Abad e û di sala 1326an de ev nusxe îstînsax kiriye.

Malikek ji rûpela duyem:

Lerzan gurîzan seran sernigûn  
Beden xerqê xûn tuna bîn we tun

Malikek ji rûpela dawî:

El-qîşşe şîran şeyday şûrê ceng  
Rûmî rewalan ferseng û ferseng

#### **1.2.6.2. Nusxeya Berlînê-II**

Ev nusxe jî li pirtûkxaneyê Berlînê ya dewletê bi hejmara Ms. Or. Oct.1154 hatiye qeydkirin.

#### **1.2.6.3. Nusxeya Pirtûkxaneyê Meclîsa Şûreyê Îslamê ya Tehranê I**

Ev nusxe li Pirtûkxaneyê Meclîsa Şûreyê Îslamê ya Tehranê bi hejmara 13690î cih digire. Bi xeta nestelîkê hatiye nivîsîn. Ji 103 rûpelan pêk tê û di her rûpelî de 13-16 malik cih digirin.

Malika ewil:

Salî ce salan şah Huseyn ce text  
Ce Esfehan da te'yîn bî we cext

Malika dawiyê:

Muhammed Xanî bî zendê zeberdest  
Xurûş kerd xêza serdarê sermest

#### **1.2.6.4. Nusxeya Pirtûkxaneyê Meclîsa Şûreyê Îslamê ya Tehranê II**

Ev nusxe jî li Pirtûkxaneyê Meclîsa Şûreyê Îslamê ya Tehranê bi hejmara 136an cih digire. Ji 179 rûpelan pêk tê di her rûpelî de 14 malik cih digire. Bi xeta rîkayê di sala 1277an de ji aliyê Ferecullah ve hatiye îstînsaxkirin.

Malika ewil:

Sipah axêz kerd pûşa rûy sara  
Hadir bî we hukm serhengê dara

Maika dawî:

Sene hezar bî şed û çihl û heft

Mende mende mend refte refte refte

### **1.2.6.5. Nusxeya Pirtûkxaneya Millî ya Cumhûriyeta Îslamê**

Ev nusxe jî li Pirtûkxaneya Millî ya Cumhûriyeta Îslamê bi hejmara 8200-5an hatiye qeydkirin. Seyyid Sefer Elî Mûsevî ev nusxe di sala 1305an de bi xeta rîkayê îstînsax kiriye.

Malika ewil:

Qeyyûmê Qadir qeyyûmê qadir

Qadirê qudret qeyyûmê qadir

Malika dawî:

Her ke biwano yaran we dişad

We sureê fathe Elmas biken şad

### **1.2.7. Siyaveşname**

Ev berhema Elmas Xanê Kendûleyî wekî hemaseyên wî yên din bingeha xwe ji destanên lehengiyê yên Şahnameya Fîrdewsî digire. Elmas Xan ev berhem bi zimanê kurdî/hewramî kişandiye nezmê. Heta niha sê destnivîsên vê berhemê hatine peydakirin.

#### **1.2.7.1. Nusxeya Elî Axa Weled Xeydan**

Nusxeya Elî Axa Weled Xeydan di pirtûkxaneya Ellahmirad Nezerî ya taybet de cih digire. Ji aliyê Elî Weled Xeydan ve di sala 1305an de hatiye îstînsaxkirin. Ji 120 rûpel û her rûpel jî ji 19 malikan pêk tê.

#### **1.2.7.2. Nusxeya Îskender Nûriyan**

Nusxeya Îskender Nûriyan di pirtûkxaneya Xudadad Nabî ya taybet de cih digire. Di sala 1334an de ji hêla Îskender Nûriyan ve hatiye îstînsaxkirin. Ev nusxeya Siyaveşnameyê ji 60 rûpelan û her rûpel jî ji 15 malikan pêk tê. Bi hibra reş û bi xeta nestelîkê hatiye nivîsîn.

### 1.2.7.3. Nusxeya Xudadad Perware

Nusxeya Xudadad Perware, ev nusxe ji aliyê Xudadad Perware hatiye îstînsaxkirin. Li Îslam Abada bajarê Kêrmanşahê di pirtûkxaneyê Ezîz Begzade ya taybet de cih digire. Ji 300 rûpelî û her rûpel jî 4 malikan pêk tê (Begzade, 1394: 25).

Malika ewil û ya dawî ji Siyaveşnameya ku Xelîl Begzade edîsyon-krîtîka wê kiriye, bi vî rengî ye:

Malika ewil:

Be namê dana ferdê tenya tek

Cihan aferîn nar û bad û xak

Malika dawî:

Pîran bew efsûn hezar fen wêş

Ye gêşt wekû çên çêş ama we pêş

### 1.2.8. Heft Leşker

Ev berhema Elmas Xanê Kendûleyî jî wekî Siyaveşnameya wî bingeha xwe ji destanên lehengiyê yê Şahnameya Fîrdewsî digire. Elmas Xan ev berhem bi zimanê kurdî/hewramî kişandiye nezmê. Heta niha nusxeyek vê berhemê hatiye peydkirin.

#### 1.2.8.1. Nusxeya Kitêbxaneyê Meclîsa Şûraya Îslamê

Ev berhem di Kitêbxaneyê Meclîsa Şûraya Îslamê ya Îranê de bi hejmara 84972an hatiye qeydkirin. Ev nusxe ji 4859 malikan pêk tê. Seyid Bihaedînê kurê Seyid Qutbedîn di sala 1391ê wekî kitab çap kiriye (Yezdanpenah, 1384: 19).

Malika ewil:

Eger ne Behramê diî rîş pîtin

Mijde bidere ewilad wîtin

Malika dawî:

Nebîrey destan ewilad saman

Horêze nexwa dinyat we kamin



### 1.2.9. Helbestên Kendûleyî

Ji Kendûleyî 9 lib helbest, 2 lib name ji bo Mîrza Şefî'ê Kulyayî, 2 lib munacatname, 2 lib jî pendname heta niha mane. Ev helbestên wî di destxestên cuda de hatine parastin.

#### 1.2.9.1. Helbestên Perekende

Helbestên Elmas Xanê Kendûleyî bi awayeke perekende di keşkulên muxtelîf de cih digirin. Di pirtûkxaneyê Berlînê ya Dewletê de çend helbestên vî şa'irê di destxeta ku bi hejmara Ms.or.oct. 1178an hatiye qeydkirin de cih digirin. Risteyên ewil yên van helbestan û hejmara malikên wan li jêrê hatine nişandan.

Melam şarî dîm melay şarî dîm: ji 7 malikan pêk tê.

Bînay bê bedel bînay bê bedel: ji 45 malikan pêk tê.

Yaran yaweran yaran yaweran: ji 27 malikan pêk tê.

Yaran yaweran 'eceb rengî dîm: ji 50 malikan pêk tê.

Rawiyarî bî rawiyarî bîm: ji 32 malikan pêk tê.

Yaran ser kanî yaran ser kanî: ji 18 malikan pêk tê.

Xo be ceng nîyen xobe ceng nîyen: ji 15 malikan pêk tê.

Ruwî numay şam wextê êwar bî: ji 55 malikan pêk tê.

Zimistan berzen zimistan berzen: ji 87 malikan pêk tê.

#### 1.2.9.2. Munacat-I

Du lib munacat ji Kendûleyî gihîştine roja me. Yek ji wan bi hejmara Hs.or. 9778an hatiye qeydkirin di Pirtûkxaneyê Berlînê ya Dewletê de. Ev munacat ji 116 malikan pêk tê. Ev munacat di destpêka Mesnewiya Xawer Zemînê de cih digire.

Herdu malikên ewil:

Ibtêda kerdîm we namê Xuda

Hem cin we hem ins ewen rehnuma

Ewwel ibtêda we namê Dawer

Bê mişl û mişal Heyyê Tewanger

Herdu malikên dawî:

Muxteşerî bê gofneyê munacat

Penahem we luţfê Qazîyu'l-hacat  
Ya Reb we ĥurmetê enbiya tamam  
Bibexşe gunay Elmas Xan tamam

### 1.2.9.3. Munacat-II

Munacata Elmas Xan ya din jî bi hejmara Hs.or. 9777an hatiye qeydkirin di Pirtûkxaneyaya Berlînê ya Dewletê de. Ev munacat jî di dawiya mesnewiya Ferhad û Şêrîna Kendûleyî nusxeya Berlînê de cih digire. Ev ji 67 malikan pêk tê.

Herdu malikên ewil:

Ya nûrbexşê nûr cem'ê sitaran  
Ya gunahamerz giştê gunahkaran  
Ya zemîn ne piştê mahî muĥkem ker  
Ya Leylê Deycûr we rûy rûşen ker

Herdu malikên dawî:

Rû siyay rû zerd rûy ser besaţim  
Be elţafê wêt be der necatim  
Bê yar û rencûr bê hal û zebûn  
Hana her be ton ya zatê bê çûn

### 1.2.9.4. Pendname-I

Ev pendnameya Kendûleyî li Pirtûkxaneyaya Millî ya Denmarkê de bi hejmara cod.pers.add.54an hatiye qeydkirin. Ev di dawiya destxeta Xusrew Şîrîna Elmas Xan de cih digire. Ev pendname ji 11 malikan pêk tê.

Herdu malikên ewil:

Beleş hamseran we bextê wêtan  
Pendî pey perdax mewaçûnpêtan  
Pendim pey saşan bigêren ne gûş  
Ĥerf û goftarim meken feramûş

Herdu malikên dawî:  
Ye watey Elmas derdê di! ne bar  
Pey şadî şewan yaweranê yar  
Pendê pirr hurûf watey Elmas  
Eger meqdûr bûn her xaşî xaşen

### 1.2.9.5. Pendname-II

Ev pendnameya Kendûleyî bi hejmara 7200-5an li Pirtûkxaneya Millî ya Cumhûrê Îslamê hatiye qeydkirin. Ev pendname jî di serê destxeta Nadirnameya Elmas Xan de cih digire (Huseynî: 1396: 69). Me ev pendnameya Kendûleyî bi dest nexistiye.

## 1.3. Ziman û Kesayetiya Edebî ya Elmas Xanê Kendûleyî

### 1.3.1. Zimanê Wî

Elmas Xanê Kendûleyî berhemên xwe bi zaravayê Hemramî û bi devoka Kendûleyî nivîsîne. Devoka Kendûleyî ji ber ku ji hêla erdnîgariyê ve ji devera Hewreman zêdetir nezikê Kêrmanşanê ye bandora kelhorî û devoka Kermanşanê di vê devokê de bi awayeke zelal xuya dike. Kişana lêkeran, daçek, formên peyvên hinek ji Hewramiya Text û Leon cuda bûye.

Elmas Xan Kendûleyî di berhemên xwe de qalib, form û peyvên 'Erebî, Farisî û Tirkî bi kar anîne.

#### 1.3.1.1. Unsûrên Farisî

Elmas Xanê Kendûleyî berhemên xwe bi giştî bi Kurdî nivîsîne lê sernavên beşan bi Farisî ne. Ev yek weke kevneşopîya nivîsîna klasîk mirov dikare binirxîne. Elmas Xan di asteya riste û malikan de Farisî bi kar neanîye di Xusrew û Şêrîna xwe de. Lê her çiqas peyvên weke aw, wehar, waran, wîr, şew, des, mes, sahû, koh û hwd. bi forma Farisî nivîsîbe jî diyar e ku Elmas Xan ji hêla zimên ve di bin bandora Farisî de nemaye.

Bêberg poşak ker eħwalê nezan  
Muhtacê muflês dûr ce ab û nan (81a, m. 2206)

Ce'ce'ey çeqaş şeb û ro şanen

Waweylay ne dîn dînê toşanen (128a, M. 3507)

### 1.3.1.2. Unsûrên Tirkî

Elmas Xanê Kendûleyî di serdema Nadir Şahê Efşar de jiyaye. Wê serdemê bandora tirkîya azerî li herema Kermanshan û Hewreman hebû. Ji ber ku Elmas Xan di arteşa Nadir Şah de weke serleşker wezîfe dikir bandora tirkî bi awayeke xwezayî lê kiriye. Dîsa unsûrên Tirkî jî weke Farîsî di asteya peyvên de dertê pêşberê me. Peyvên weke taş, yurt, begler, bayeqoş, yatax, û hwd. Cih digirin di vê mesnewiyê de.

Mînak ji bo unsûrên Tirkî li jêrê hatine diyarkirin:

Te watiş Şîrin be xewf û endêş  
Ferhad ast be ca şî be yurtê wêş (28a, M. 744)

Bayeqoş berşî ce şîne zarîş  
Bułbuł bêzar bî ce bêqerarîş (96a, M. 2608)

### 1.3.1.3. Unsûrên 'Erebî

Elmas Xanê Kendûleyî jî weke helbestvanên klasîk yê din bi awayeke xwezayî ji peyvên 'erebî sûd vegirtiye û di berhemên xwe de bi kar anîne. Lê ev peyv di forma Hewramî de hatine bikaranîn. Ev yek jî nîşan dide hêza zimanê 'erebî serdestiyê ji Elmas Xanê Kendûleyî nestendiye. Peyvên weke cewab, edeb, yehcûc û mehcûc, qebûl ku 'erebî ne di forma Hewramî de nivîsîne. Weke mînak cewaw, qewûl, acûc û bacûc, edew. Terkîbên 'erebî jî gelek kêr in di mesnewiyê de.

Sogend bew şenem be daru'l-mecûs  
Be lat û menat be naz û naqûs (44b, M. 1203)

Qewûl kerd Şîrîn goftariş ne di  
Şikufa be şad çûn şikufey gul (26a, M. 689)

### 1.3.1.1. Biwêj û Gotinên Pêşyan

Elmas Xanê Kendûleyî ji çanda gel ji hêla gotinên pêşyan û biwêjan ve gelek sûd vegirtiye û di berhema xwe de jî bi awayekî serkeftî bi ev hêman kare anîne. Ji bo ku vegotina xwe bi hêz bike û çîrokê bi awayeke zelal bîne zimên di cih de mîsal

anîye ji van unsûrên zimên. Ji van gotinên pêşiyên û biwêjan hinek ji wan li jêrê hatine diyarkirin.

Min rû sefid bîm: ez rû sipî bim (25b, M. 677)

Nemek heram: bêwefa, bê esil (32b, M. 868)

Giyanim payendaz serim mizaganî: Rihê min di binê piyên te de serê min jî ji bo te mizgînî be (33b, M. 894)

Mergîş awerd be xiyal: birina xwe anî ber çavên xwe (42b, M. 115)

Taşan ce taşan çûn paçê penîr: keviran weke penîr dibirî (54b, M. 1463)

Lal bîm ce ziwani: ji zimên lal bim (57b, M. 1557)

Yek gorg we şed mêş mekerûn fenaş: gurekî sed mêşinan tune dike (63b, M. 1719)

Nermî mar ce lan mawerû we ber: bi nermî mar ji kunê derdixe (67b, M. 1828)

Pola ce tondî mawerû zerer: pola ji tondiyê zirar dibîne (67b, M. 1828)

Şeytan wêş mebo we pabosê pam: şeytan bi xwe dibe maçkiriye lingê min (74b, M. 2019)

Şeytan ce mekrîm ferar bî ferar: şeytan ji fen û fûtên min direve (74b, M. 2025)

Lazim heq be destê heq misparo: heq lazime bi destê heq bispêre

Kes ce derdê kes xeber nedaro: kes ji derdê kesî xebardar nîne (99b, M. 2708)

Kafir mekerû be halê Şîrîn: kafir di halê Şêrînê de nebin (116a, M. 3152)

Naniş binûşîm sifreş pare keym: nanê wî bixwim sifra wî bidirînim (99a, M. 1692)

Mader wefat kert Şîro seriş werd: Şîro serê dayîka xwe xwar û ew mir (19b, M. 505)

### 1.3.2. Hunerên Edebî

Hatiye tesbîtkirin ku Elmas Xanê Kendûleyî hunerên edebî yê mina teşbîh, îstîare, tenasub, telmîh, tekrîr, tezat, teşxîs, mubalexe, îrsalê mesel û hunara nîdayê di Xusrew û Şêrîna xwe de bi kar anîne. Ev hunerên edebî bi awayeke serkeftî di metnê de cih digirin ev yek jî asta edebî ya Kendûleyî nîşan dide. Ji van huneran, yek bi yek mînak, ji metna berhemê hatine dayin.

### 1.3.2.1. Hunera Teşbihê

Peyva teşbihê tê wateya şibandinê. Weke têgeheke edebî ger du tiştên di navbera wan de têkilî hebe û ji van herdu tiştan bi ya xurttir re ji hêla şibandinê ve bê muqayesekirin jê re hunera teşbihê tê gotin. Van unsûrên ku bi hev re tîn şibandin di navbera wan de peywendiyê rastî an jî mecazî divê hebe. Weke hunera edebî teşbihê kamil bi gelemperî ji çar hêmanan pêk tîn (Aktaş, 2005: 25). Ev unsûr weke muşebbeh (yê/ya dişibihe), muşebbehun bîh (ya bi wî/wê tê şibandin), wecha şebêhê (hêla şibandinê), edata teşbihê (daçeka şibandinê) tîn zanîn.

Mînaka hunera teşbihê:

Ûiwała be nerm Şapûr wîney bad

Şîrîn wat perêş ehwâlê Ferhad (86a, M: 2335)

Muşebbeh: Şapûr

Muşebbehun bîh: bad

Edata teşbihê: wîne

Wecha şebêhê: be nerm

Be dîş bî destûr Şêruy zinakar

Megêla be tond wîneyê jarmar (95a, M. 2581)

Muşebbeh: Şêruy

Muşebbehun bîh: jarmar

Edata teşbihê: wîne

Wecha şebêhê : be tondî

### 1.3.2.2. Hunera Îstîareyê

Peyva îstîareyê tê wateya deynkirin. Weke têgeheke edebî tişteki bi rêya mecazê ji hin hêlan ve bi tişteki din re bê şibandin ji vê re îstîare tê gotin. Ev hunera edebî di eslê xwe de teşbih e. Lê ji ber ku çar unsûrên şibandinê li vir cih nagire jê re teşbih nayê gotin. Ev huner weke îstîareya girtî û îstîareya vekirî ji duh cureyan pêk tî. Eger bi tenê muşebbeh hebe îstîareya vekirî tê gotin. Wexta bi tenê muşebbehun bîh hebe îstîareya girtî jê re tê gotin (Özsoy, 2011: 818).

Di malika jêrîn de hunera îstîareyê hatiye bikaranîn. Zulfên Şêrînê bi kemendê hatiye jibandin lê li vir zulf derbas nabe. Muşebbeh zulf e, muşebbehun bîh kemend e.

Kerdiş şost û şoy kemendê kelaf

Be çeng û çil çeng nuqrey sîmê şaf (122a, M. 3327)

Di malika jêrê de Pîrezal ji hêla fitne û xirabiyê ve bi şeytan hatiye şibandin.

Şeytanê êblis şeyatîne şer

Dêwê deyrî reng pîregurgê der (74a, M. 2003)

### 1.3.2.3. Hunera Tenasubê

Du peyv an jî ji du peyvên zêdetir di hêla wateyê de di navbera wan de peywendî hebe û bilî ku tezaad bê holê bi hev re eger bîh bikaranîn jê re hunera tenasubê tê gotin (Özsoy, 2011: 808). Peyvên weke Misr, Ye'qûb, Yusif, Zuleyxa, çal, pîrehan, gur dema bi hev re bîh bikaranîn hunera tenasubê pêk tê.

Çûn Yûsifê Mêsr Zilêxay Ken'an

Beter ce tersa be rozê Se'nan (31a, M. 830)

Di malika jêrê de şa'ir, bi peyvên behar, bilbil, xunçe, şikûf û gulê hunera tenasubê çêkiriye.

Beharet ama wîney buľbuľan

Şikufa şikuf xunçet be guľan (33a, M. 885)

### 1.3.2.4. Hunera Telmihê

Buyereke ji aliyê hemû kesan de bê zanîn, şexsekî dîrokî an jî efsanewî yê navdar, çîrokek berbelavbûyî di nava gotinê de bi awayekî kurt dema bê îşaretkirin hunera telmihê pêk te (Dilçîn, 2013: 461). Di malika jêrîn de ji bo balê dikişîne ser bûyera derketina Hezretî Mûsa bo Çiyayê Tûrê û bi Xwedê re tekelluma wî, bi

mînakek hatiye nîşandan. Bi vî awayî di helbestê de hunera telmîhê yanê hunera bibîrxistinê bi kar aniyê.

Çêş bedem cuwab xaqanê fexfûr  
Bisûzûn be nar beter ce Koy Tûr (47a, M. 1271)

Di malika jêrîn de hunera telmîhê bi çîroka Bîjen û Menîjê ku Bîjen dîl dikeve û bi emrê Efrasiyabî ve tê zindankirin, Qeys jî wexta dîwane dibe û bi çolan dikeve hatiye çêkirin.

Çûn Qeysê Mecnûn deyrî derbeder  
Bîjen biren çak be yedî girt ne wer (3b, M. 76)

Malika jêrê bi gencê badawer çîroka şerê Qeyser û Xusrew Perwêz îşaret dike. Dema şer dest pê dike Qeyser xezîneyên xwe li keştiyan bar dike bi hêla giravan ve dibe. Tofanek di behrê de radibe, keştiyan ber bi peravên Îranê ve dibe. Bi vî awayê xezînen Qeyser dikevin destê Îranê. Dema tiştêk bê ked û zehmet bê bi destxistin gencê badawer tê gotin. Bi rêya telmîhê ev çîrok hatiya diyarkirin,

Ce şewqê Şîrîn dîlim şad kerûn  
Gencê badawer min we bad derûn (113b, 3096)

### 1.3.2.5. Hunera Tekrîrê

Tekrîr weke peyvê tê wateya dubarekirinê. Weke têgeheke edebî jî ji bo hêza vegotinê bê kirpandin hin peyv an jî komên peyvên tînan dubarekirin. Bi vî awayê hunera tekrîrê pêk tê. Şa'îr ji bo balê bîkşîne ser vegotina an jî hest û kelecaniya xwe diyar bike serî li vê hunera edebî dixê (Özsoy, 2011: 806).

Elmas Xanê Kendûleyî ji vê hunera edebî di gelek cihan de îstîfade kiriye.

Perî peykeran perîzadey Çîn  
Qed qed qed kerdên zulfanê çîn çîn (93b, M. 2543)

Ga meşî ne keş ga meşî ne kû[h]  
Ga şêtê şeyda be zarî û endûh (39b, M. 1046)

### 1.3.2.6. Hunera Leff û Neşrê

Leff û neşr bi gelemperî di malikek de peyvên ku di risteya ewil de derbas dibin ji hêla wate û şibandîna ve bi peyvên risteya duyem re têkildar in. Di helbesta



klasîk de gelek caran şa'ir serî li vê hunera edebî dide ji bo vegotina xwe bi hêz bike. Di bingeha vê hunerê de hunerên teşbîh û îstîareyê cih digirin (Dilçin, 2013: 437).

Kendûleyî di malika jêrê de bi peyvên 'etrê 'ebîran û zulf û gîsuyan hunera leff û neşrê bi kar anîye.

'Etrê 'ebîran meşend pêş da

Be zulf û gîsuy xatîrê rêş da

(122a, M. 3330)

### 1.3.2.7. Hunera Tezadê

Ji hêla wateyê ve du fikr, hest û xiyalên dijber dema ku bi hev re tîn bikaranîn jê re hunera tezatê tê gotin. Ji bo vê hunera edebî navên weke tîbaq, tetbîq, muqabele û mustezad jî tê gotin. Ji bo ku şa'ir hêza vegotinê zêde bike û tesîra wê nîşan bide serî li vê hunerê dide.

Rojan be refîq şew be hamraziş

Her çend naz kerû bikêşe naziş

(37a, M. 995)

Di malika jêrîn de bi peyvên padişahî û gedayî hunera tezatê hatiye kirin.

Ga ne zîb û zewq ne padişahî

Ga ne derwêşî kesbê gedayî

(23a, M. 604)

### 1.3.2.8. Hunera Teşxîsê

Ew hunera edebî ya peyvê/gotînê ye ku şa'ir, taybetiyên mirovan li tiştan, bar dike, wan dixê şûna mirovan û xîtabî wan dike. Ev caran dibe ku tişteke bêruh be an jî dibe ku ajalek be. Elmas Xanê Kendûleyî di mesnewiya xwe de şexsiyeta mirovan daye Şewdêz û kulingê Ferhadî.

Dema kulingê Ferhadî ji Ferhadî mirina Şêrînê bihîst rengî wî guherî weke qîtranê reş û tarî bû.

Quleng çûn şineft ce Ferhad xeber

Gêliya ce reng siya çûn zixer

(47b, M.1278)

Şewdêz şineftîş be Şîrîn ce goş

Kêşa şe'ney şîn be ne'rey xuroş

(51b, M.1390)

### 1.3.2.9. Hunera Mubalexayê

Şa'ir ji bo vegotina xwe bi hêz bike tişteki biçûk pir mezin an jî tişteki mezin pir biçûk nîşan dide. Her çiqas di vegotinê de ev yek ji mentiqê dûr nebe jî. Divê vegotinê de zerafet û nuktedanî cih bigire. Di helbesta klasîk de bi gelemperî ev hunera edebî di methiye û hîcviyan de cih digire (Dilçin, 2013:447).

Dema ku xwedê Şîro dide ji ber ku weke ejderha ye dayîka wî dimire. Li vir hunera mubalexayê hatiye bikaranîn.

Peyda bî weled ejdêhay neberd

Êbtiday ejder weşî weled derd (19a, M.503)

Di malika jêrîn de jî hunera muxalexayê heye. Lingê Şewdêz ji ber ku şikiyaye Ferhad Şewdêz û Şêrînê dide koklîka xwe.

Şîrîn Şewdêz herdû şend be şan

Goş da be razan rengîn mehbûnan (59a, M. 1595)

Di malika jêrîn de dîsa hunera mubalexayê heye. Ferhad bi kulingê xwe çil rêbirin ku destdirêjiyê dîkin li hemberê Şêrînê dîkuje.

Coşiya be coş zerbey zengê zîşt

Her çil be qebzey mewday quleng kuşt (71a, M. 1925)

### 1.3.2.10. Hunera ÎrsalaMeselê

Ev hunera edebî jî yek ji wan hunerên edebî yên ku ji peyvan pêk tê ye. Şa'ir ji bo vegotina xwe bi hêz bike ji gotinên pêşiyên sîd digire û mîsal tîne (Özsoy, 2011: 818).

Elmas Xanê Kendûleyî ji vê hunera edebî gelek sîd vegirtiye, ji van mînakên du lib di malêkên jêrîn de hatine diyarkirin.

Nermî mar ce lan mawerû we ber

Poşa ce tondî mawerû zerer (67b, M. 1828)

Wicûdiş niyen ce lamê sengtiraş

Yek gorg we şed mêş mekerûn fenaş (63b, M. 1719)

### 1.3.2.11. Hunera Nîdayê

Şa'ir ji bo hestên xwe bihêz îfade bike, serî li vê hunera edebî dide. Bi gelemperî ev hunera edebî di serê risteyan de wekî denglêkirin xuya dike. Zêdetir ji peyvên ku di forma baneşanê de ne ji bo vê hunera edebî tîna îstîfadekirin (Dilçîn, 2013: 453). Peyvên weke wey, derîx, aman, dexîl, ax, oxey, be daxewa, nexêr, belê qorban, na, ne, hergêz, ser û çema, qorban, şelley, aferîn, elbet, belê, eceb, naka, ha ku baneşan in Elmas Xan hinek ji van peyvên weke hunera nîdayê bi kar anîne.

Aman rêmmaşan nocûmê nerdbaz

Saħiranê sext rêmilê nerdbaz (19b, M. 511)

Kenîzanê zar be şurşitê şîn

Waweyla wey ro ne dewrê dêrîn (117b, M. 3189)

### 1.3.2.12. Hunera Alîterasyonê

Ew hunera edebî ya tîpan e ku edîb, bi dubarekirina herfên dengdar, aheng û rîtmê di nav peyvên de pêk tîne. Ev jî di berhemê de heye.

Di malika jêrê de bi dengdara “q”yê hunera alîterasyonê hatiye kirin.

Ama yek pîrê ce Pîrezâşan

Qarî qerînê qern qeltaxê şaşan (73b, M. 1989)

Di malika jêrê de bi dengdara “r û z”yê hunera alîterasyonê hatiye kirin.

Şîrîn be rêzan razê şekerrêz

Be razan raz ‘etrê ‘enberbêz (68a, M. 1845)

### 1.3.3. Kesayetiya Edebî ya Elmas Xanê Kendûleyî

Elmas Xanê Kendûleyî li gorî tespîtên me di dîroka edebiyata Kurdî ya sedsala XVIIIan de wekî helbestvanekî ku xwediyê gelek berhemên be dertê pêşberî me. Kendûleyî hevçerxê Xanay Qubadî, Mîrza Şefî‘ê Kulyayî (m. 1204) ye. Kendûleyî di vê sedsalê de yek ji helbestvanê herî berhemdêr tîna qebûl kirin. Li gel Mîrza Şefî‘ê Kulyayî an jî bi leqebekî din Dînawerî re peywendiyek xurt hebûye. Ev yek ji nameyên ku ji hevdu re şandine diyar dibe ku tîkiliya wan hertim hebûye. Di Hedîqeya Sultanî de hatiye nivîsîn ku li ser belaya bi serê Mîrza Şefî‘î de hatiye ji bo tesliyetê Elmas Xan bi terzê helbestê jê re name nivîsiye.

Herdu malikên ewil û dawî yên vê helbestê li jêrê hatine diyarkirin.

Malikên ewil:

Mîrzam şadenî Mîrzam şadenî

Mîrzam şad be to xaîr şadenî

Seyidsara we koser azadenî

Xaîr bêazar xem we badenî

Malikên dawî:

Simkoy siyaset samanim sa kerd

Geļayê xezanim badê seba berd

Mîrzam şad be to şadî ne bexten

Eļmas alûdey ‘ezabê sexten (Merdûxî,2011: 238)

Mîrza Şefî‘ê Kulyayî jî bi terzê helbestê bersiva Elmas Xanê Kendûleyî dide.

Bi kêfxweşiya nameya Elmas Xanê Kendûleyî, Mîrza Şefî‘ wiha bersiv dide:

Malikên ewil:

Er şadim namit er şadim namit

Diļ şadî bî be şewqê nizûlê namit

Nameyê ‘etîramîz şekerîn xamet

Perî sucûdiş xem kerdem qamet

Malikên dawî:

Ta bedye neçrad neçdê cehanbaz

Ragey şeşderit key mekerû waz

Mîrzam xaşen nam şadî menzûren

Şefî‘ ce şadî şed ferseh dûren (Huseynî, 1397: 108)

Elmas Xanê Kêndûleyî weke Xanayê Qubadî ji kîjan helbestvanê beriya xwe û yên serdema xwe sûd wergirtiye bi aweyeke eşkere diyar nekiriye. Lê tesîra Kendûleyî bi aweyeke zelal li ser Mîrza Şefî‘î xuya dike. Şêrîna û Ferhad Mîza Şefî‘î ev yek nîşan dide (Kulyayî, 1382: 30- 35).

Xusrew û Şêrîna Kendûleyî:

Şeytanê êblîs şeyatîne şer

Dêwê deyrî reng pîregurgê der (74a, M. 2003)

Elxennas ce taw tariya be tar

Şeytan ce mekrîm ferar bî ferar (74b, M. 2025)

Şêrîn û Ferhada MîrzaŞefî'î:

Dersê şer ce lay 'Ezazîl wende

Şeytan ce mekrîş mebî şermende

Za! ama wiyerd wîney gurgger

Dîş Xusrew nîştên nerwî textê zer (Kulyayî, 1382: 32).

## BEŞA DUYEM

### 2. 1. LÊKOLÎNA METNÊ JI HÊLA RUXSARÎ VE

#### 2.1.1. Wezna Metnê

Elmas Xanê Kenûleyî weke berhemên xwe yê din Xusrew û Şêrîna xwe jî bi wezna (pîvana) kiteyî (heceyî) nivîsiye. Her risteyên vê berhemê ji deh kiteyan û ji du qîsman pêk tên. Ew jî pênc pênc in. Ji mesnewiya wî jî diyar e ku Kenûleyî, wezna kiteyî bi awayekî serkeftî bi kar aniye.

$$5+5= 10$$

Çûn mahê mehtab + şuley cehangîr  
Poşa ser besat + boy 'etr û 'ebîr (36a, M. 965)

Ce şewqê şuley+Ferhadê fexfûr  
Beyaz nûriş bî+ weku kayê Tûr (36a, M. 966)

Diya tecellay + cemînê dîlxoş  
Satê sernigûn + ne xakê xamoş (36a, M. 967)

Şîrîn dîş Ferhad + bêhoş û medhoş  
Rîwala seriş + niya ne bawoş (36a, M. 968)

Girtiş ne axûş + seriş ne rûy xak  
Be destê desma! +cemîniş kerd pak (36a, M. 969)

#### 2.1.2. Teşeya Nezmê ya Metnê

Xusrew û Şêrîna Elmas Xanê Kenûleyî bi teşeya nezmê ya mesnewiyê hatiye nivîsîn. Wî mesnewiya xwe di çarçoveya rêbaza mesnewiyên klasîk de nenivîsiye. Weke mesnewiyên din bi wezna 'erûzê nehatiye nivîsîn. Cudatiya wê ya din ji mesnewiyên dinê ev e ku ev mesnewî ji du beşan pêk tê. Beşa ewil bi "bismîla" dest pê dike û bîst û şeş malikên ewil yê mesnewiyê beşa tewhîdê ye.

Bismîlahê Reḥmanê Reḥîm

Ewweļ hem be ismê Ellah ekber  
Rehmanê Rehmet Rehîmê rehber (1a, M. 1)

Kerîm karsaz kar be dest asan  
Şehzadeê şerîf rehber şinasan (1a, M. 2)

Sermeşqê neqqaş ‘aşiqanê pêş  
Diļdarê dîrîn derwêşê diļrêş (1a, M. 3)

Beşa duyem jî bi çîroka Xusrew û Şêrînê didome. Em dibînin ku beşa ne’etê, beşa mihracnameyê, beşa sebebê telifê û methiyeya ji bo padişahê wê serdemê di mesnewiyê de cih nagirin. Ev yek jî nîşan dide ku Elmas Xanê Kenûleyî Xusrew û Şêrîna xwe li gorî tertîba klasîk nenivîsiye. Ji bo ku vegotinê biguherîne ji xezel û qesîdeyan jî sûd wernegirtiye. Ev yek jî taybetmendiya edebî ya Elmas Xanê Kenûleyî ye. Hemdemê wî Xanayê Qubadî di Xusrew û Şêrîna xwe de tertîba klasîk bi kar aniyê (Xeyat, 2017:103). Nîşan dide ku Elmas Xanê Kenûleyî di bin bandora Nîzamiyê Gencewîde nemaye weke Xanayê Qubadî.

Çîrok wiha dest pê dike di vê metnê de:

Yaran goş biden be derdê dîrîn  
Destanê Xusrew Ferhad Şîrîn (2a, M. 27)

Şitorê Şîrû Şapûr û Perwêz  
Te‘ziyey Xusrew xoruşê xûnrêz (2a, M. 28)

Ce hâlâtîşan eger bidey goş  
Be ehwâlîşan diļ meşo ce hoş (2a, M. 29)

Perî kiyanan pey şehriyaran  
Birêzûn esrîn çûn seylê waran (2a, M. 30)

Pey şêr û Şîrîn pey kemer laļan  
Pey Ferhad mebûn be sengê saļan (2a, M. 31)

Di malika dawiyê de silav bi tenê ji bo Hezretî Muhemed heye. Ew jî wiha ye:

Hezaran dirûd hezaran selam  
Zi ma ber Muḥemmed ‘eleyu’s-selam (139b, M. 3089)

### 2.1.3. Qafiye (Serwa) û Cureyên Wê

#### 2.1.3.1. Li Gorî Cihê Wê Yê Di Risteyê De

Li gorî cihê paydabûna di risteyê de sê cure serwa hene. Ew jî serwaya sereta, serwaya navekî û serwaya kutayî ye (Serdar, 2015: 83). Di helbestê de bi gelemperî serwaya kutayî tê bikaranîn lê ji bo ku hêza vegotinê nîşan bide helbestvan serwaya navekî û ya sereta jî bi kar tînin. Elmas Xanê Kenûleyî di mesnewiya Xusrew û Şêrînê de li gelek deran jî cih daye serwaya sereta û ya navakî.

##### 2.1.3.1.1. Serwaya Sereta

Ev cure serwa weke ku ji navê wê jî diyar e, di serê risteyan de cih digire. Beravêjiyê paşserwayê carnan weke pêşserwa tê bikaranîn (Serdar, 2015: 83). Elmas Xanê Kenûleyî li gorî gelek helbestvanên klasîk yê Hewramî ji ev cure serwayê zêde sûd vegirtiye. Ji bo bi awayek zelal bê famkirinê çend mînak ji metna transkîrîbe li jêrê hatiye dayîn:

Ga dest ne lîmû ga ne zolîf û xal  
Ga dem ne deman sîmay sipî lal (59a, M. 1587)

Çend be qurbanî dadê do‘ago  
Çend benir besit awerdiş we ko (4a, M. 82)

Çend nazenînan mehbûbê dîlkêş  
Çend nazik neha! awerdiş perêş (4a, M. 83)

Çi neqşê awerd be bextê Perwêz  
Çi nerd şana ce rozê Perwêz (3b, M. 68)



Ûerlan ÷ewaran tûranê diÛber  
Ûeref ÷erayif ne Şîrîn beter (6b, M. 150)

Min berdim cefa ne pey karê to  
Min bîm be xilel rozigarê to (32b, M. 866)

#### 2.1.3.1.2. Serwaya Navekî

Ev cure serwa di nava risteyan de cih digire. Zêdetir di helbestên klasîk ên ku bi wezina ‘erûzê tên nivîsîn de dertênê pêşberê me (Serdar, 2015: 83). Lê di helbestên ku bi pîvana kîteyî hatine nivîsîn de ev cureya serwayê her çiqas kêr be jî dîsa hatiye bikaranîn. Weke ku li jorê hatibû diyarkirin metna xebata bi pîvana deh kîteyî hayîye nivîsîn. Ev serwa di navbera pênc kîteyên risteya ewil û risteya duyem de cih digire. Ji metna xebatê hinek mînak li jêrê hatine diyarkirin.

Xusrew şineftîş serefkende bî  
Ce watey herfiş eramende bî (20b, M. 540)

Mîraş û maÛit kesê newero  
Tacê tûfanit kesê nebero (20b, M. 537)

Çend îlçî xaqan be sanê leşker  
Çendî serweran salarê leşker (37b, M. 1013)

Agah ce eÛwaÛ nîst û hestîm bî  
Xeber darê haÛ ne cay kesim bî (43a, M. 1163)

#### 2.1.3.1.3. Serwaya Kutayî

Ji serwaya di dawîya risteyan de cih digre re serwaya kutayî tê gotin (Serdar, 2015: 83). Helbesta klasîk, bi taybetî jî cureya mesnewiyê li ser bîngeha ev cure serwayê hatiye honandin. Dema li gorî dîngan serwa tê nîrxandin jî, serwaya kutayî weke kriterî sereke derdikeve pêşberî me. Elmas Xanê Kenûleyî ev cureya serwayê di mesnewiyên xwe de bi awayeke serkeftî bi kar anîye. Ji Xusrew û Şîrînê çend mînak li jêrê hatine dayîn:

Ferhad be ʔazan ŧehdê ŧekerrêz  
ŧêrîn peya kerd ce gulê ŧewdêz (58b, M. 1581)

Boy ‘etrê ‘ebîr dînê dilpesend  
Pêçan ‘ebîriŧ ne tengê derbend (60b, M. 1632)

Gerʔay bademest bêdar bî ce xaw  
Tawiyân cergim yanet bo xiraw (61a, M. 1651)

Çûn Rexŧê Rustem me ‘rekey Fereng  
Qînê qehreman ekwanê Erjeng (61b, M. 1658)

Hey kerd we yaran zengî Hebeŧ da  
Zîley zeberhat be kawê keŧ da (61b, M. 1659)

### 2.1.3.2. Li Gorî Degan

Li gorî degan serwa, vediqete çar cureyan: Serwaya lawaz, serwaya asayî, serwaya zêdebar û serwaya regezdozî(cînas). Li jêre ev serwa bi tavahî hatine ravekirin û ji bo her cureyê mînak hatina dayîn.

#### 2.1.3.2.1. Serwaya Lawaz

Serwaya lawaz ji wekheviya dengekî bi tenê re tê gotin (Serdar, 2015: 84). Ev cureya serwayê di helbesta klasîk de zêde nehatiye bikaranîn. Ji ber ku çêkirina serwaya bi dengekî hinek dijwar e û li gorî serwayê din hinek huner dixwaze ev cure serwa zêde dernakeve pêŧ me. Helbestvanên ŧareza dema xwestine asta hêza vegotina xwe nîŧan bidin ev cureya serwayê bi kar anîne. Elmas Xanê Kenûleyî ji van helbestvanên ŧareza yek e û wî vê cureya serwayê di gelek cihan de bi kar anîye. Di qada edebiyata klasîk ya Hewramî de ne Xanay Qubadî ne jî Mîrza ŧeffî’ê Paweyî di vê mijarê de nagihîjin asta Kenûleyî. Kenûleyî carna deh malikan tenê bi serwaya lawaz nivîsiye. Ev yek jî nîŧan dide ku Elmas Xanê Kenûleyî xwedî vegotineke bi hêz e û di peydakirina serwaya lawaz de kêŧeyek zêde nekiŧandiye. Me çend malikên ku bi vê serwayê hatine nivîsîn li jêrê daye nîŧandan:

Toxraş ce tela terriş ce dorî bo  
Cedwel zerefşan neqşê mermer bo (42a, M. 1134)

Be karê eşqen dûdî derd ne di!  
Şeyday şikûfim bedter ce bulbul (45b, M. 1125)

Wer ne min ce ko kawê to ce ko  
Sewday min çêşen çenî kawê to (45b, M. 1126)

Er nemo Ferhad şeyday eşed bo  
Kawê to ce ko şarê Çîn ce ko (45b, M. 1127)

Bişno ce Şêrîn ne mewcê aw bî  
Sumatê serwer tacê Xusrew dî (11a, M. 281)

Sewday Şîrînim awerden be di!  
Sewday şikûfim bedter ce bulbul (45b, M. 1230)

#### 2.1.3.2.2. Serwaya Asayî

Serwaya asayî ji wekheviya du dangan re tê gotin (Serdar, 2015: 84). Bikaranîna vê serwayê li gor serwaya zêdebar hinek diwartir e. Ji vê serwayê mînak, li jêrê hatine nîşandan.

Şêrîn û Şewdêz niya we zemîn  
Coşa we xiroşa şî ne kifr û kîn (62a, M. 1677)

Coşaw coşiya kemanê koken  
Rû niya be semt Şêrînê Ermen (66a, M. 1780)

Sipay siya reng da ne teblî kûs  
Zulmat da zuhûr ne zengê naqûs (76b, M. 2079)

Xakê ademxar çûn ejder ne xem  
Xiroşa Xusrew bikêşu be dem (102a, M. 1773)

Doğabê dewran dîne bada bad  
Ferîştay ferîb fermanê Ferhad (154a, M. 1457)

### 2.1.3.2.3. Serwaya Zêdebar

Di helbestê de wekhevî heke ji du dangan zêdetir be, ji ev cure serwayê re serwaya zêdebar tê gotin(Serdar, 2015: 84). Ji ber ku bikaranîna wê hêsan e di nav cureyên serwayê de ya herî berbelav serwaya zêdebar e. Elmas Xanê Kenûleyî jî weke gelek helbestvanên klasîk yê Hewramî, cih daye vê cureya serwayê. Çend mînak ji xebata tezê li jêrê hatine dayin:

Bey tewr mewyerî ce derbendê teng  
Bêperwa ce sehmê Gerray siya reng (62a, M. 1681)

Maçûn be yaran neberdê zengî  
Dîwanê dawxaz şîranê cengî (62b, M. 1689)

Darayê dest bord ce kamit kerden  
Şikaran be şew ce kot awerden (62b, M. 1694)

Birbir kerd be hem sanê siya reng  
Kerdiş tar û mar pereng û pereng (66a, M. 1783)

### 2.1.3.2.4. Cînas (Serwaya Regezdozî)

Deng an peyvên ku bilêvkirina wan wekî hev in an bi gotineke din ji hêla şiklî ve yek in, lê ji hêla wateyê ve ji hevdu cuda ne dema di helbestê de bi hev re tên bikaranîn serwaya regezdozî tînin holê (Serdar, 2015: 84). Ev di mijara hunerên edebî de weke hunera cînasê jî tê binavkirin. Ev cure serwa ji ber ku bikaranîna wê dijwar e li gorî cureyên serwayê yê din gelek kêrhatîye bikaranîn di helbesta klasîk de. Elmas Xanê Kendûleyî jî ev cure pir kêrhatî bi kar aniye.

Di risteya ewil de ji Çînê qesd welatê Çînê ye, di risteya duyem de jî ji çînê qesd zulfên ku serê wan badandî ne. Di vê malikê de cînas heye.

Perî peykeran perîzadey Çîn  
Qed qed qed kerden zulfanê çîn çîn (93b, M. 2543)

#### 2.1.4. Redîf (Paşserwa)

Deng û peyvên di dawiyên risteyan de hem ji hêla wateyê ve hem jî ji hêla şiklî ve wekî hev in wek paşserwa tên binavkirin (Dilçîn, 2013: 61). Ji navê wê jî diyar e ku piştî serwayê tê û carnan weke qertaf, carnan jî weke peyv û cotepeyvên tê bikaranîn. Paşserwa ewqas formeke girîng e ku hinek helbestên klasîk hene ku bi paşserwayên xwe navdar in an jî bi paşserwayên xwe tên bilêvkirin. Ji bo ku di mesnewiyên de vegotin herîkbar be bi taybetî ji paşserwayê sûd tê wergirtin. Elmas Xanê Kenûleyî di mînakên li jêrê hatine dayîn de jî nîşan dide ku vê formê bi awayeke servkeftî bi kar aniye.

Xîza perîwar xeşit kend ce wer	
Tacê silsiley serwîn kend ce wer	(10a, M. 256)
Keylê bey destûr fikr û xiyal kerd	
‘Elacê ferman mewtê Ferhad kerd	(41a, M. 1102)
Min wêlê xerîb ser diyarê tom	
Bêneway û bêkes ne mekanê tom	(43a, M. 1161)
Henasey serdiş ne cerg mexêzo	
Dûdiş ne derûn be genç mexêzo	(44b, M. 1194)
Neqşîş çûn neqqaş nuqtay nigîn bo	
Balater ce qeşr xaqañê Çîn bo	(42a, M. 1135)

## 2.2. LÊKOLÎNA METNÊ JI HÊLA MUHTEWAYÊ (NAVEROKÊ) VE

### 2.2.1. Lehengên Sereke Yên Çîrokê

#### 2.2.1.1. Şêrîn

Şêrîn biraziya melîkeya Ermenistanê Mehîn Banûyê ye. Dema ku Xusrew direve diçe Azerbaycanê bi Şêrînê re aşina dibe û ji hev re dibin evîndar. Agahiyên bi vî rengî cara ewil di Şahnameya Fîrdewsî de derdikevin pêşberî me (Firdewsî, 1389: 778). Nîzamiyê Gencewîdi Xusrew û Şêrîna xwe de diyar dike ku beriya wî ev çîrok hatiye gotin. Nusxeyek vê çîrokê li bajarê Burdaxa Ermenistanê hatiye parastin. Nîzamî dibêje ku ji pîrên vî bajarî, vê çîrokê bihîstiye (Gencewî, 1390: 32).

Ev yek jî nîşan dide ku Şêrîn dive Ermen be bi eslê xwe. Piştî Nîzamî bi terzê mesnewiyê Emîr Xusrewê Dehlewî nivîsiye. Emîr Xusrewê Dehlewî (m. 725 h.q.) Şêrînê weke keça melîka Ermenistanê daye nîşandan (Dehlewî, 1961: 60).

Elmas Xanê Kenûleyî di Xusrew û Şêrîna xwe de Şêrînê weke melîka Ermenistanê nîşan daye. Cudatiyeke din jî ya Xusrew û Şêrîna Nîzamî ev e. Ya din navê Melîke Behîn Banû di berhema Kenûleyî de derbas nabe.

Şîrîn padişay Ermen diyar bî  
Ne cagey ba boş wêş şehriyar bî (6b, M. 160)

Evîna Xusrew û Şêrînê bi wesîleya wêneyên ku Şapûr neqş kiriye û li baxê qesra Şêrînê bi cih kiriye dest pê kiriye. Piştî ku Şêrîn, wêneyên Xusrewî dibine, Şapûr xwe aşkere dike û xwe wek qasidê Xusrewî dide nasîn. Şapûr behsa xewa Xusrewî ji Şêrînê re kir û diyar kir Xusrew bi vê xewê evîndarê Şêrînê bûye.

Ama xiyal kerd be te'cîlê dew  
Şûretî kêşa be şiklê Xusrew (7a, M. 165)

Êware Şîrîn ama ce şîkar  
Yawa be yatax yagey çeşmsar (7a, M. 165)

Şapûr wat Şîrîn wêlê haşenan  
Min peykê Xusrew kemer laşenan (8a, M. 199)

Xusrew zerîfî to diyen ne xaw  
Be şêtê şeyda mesuzo be taw (8a, M. 200)

Piştî bûyera serî rakirina Behramê Çûbîn, Xusrew ji Ermenistanê diçe Medayinê û demek dirêj peywendiya wî bi Şêrînê re çênabe. Rojek Ferhad tê Taqê Bostan û Şapûr peyda dike.

Ferhad Şapûr dî kêşa bangê şîn  
Şapûr dî Ferhad xeftan da be çîn (22a, m. 527)

Şapûr behsa Şêrînê ji Ferhadî re dike. Bi vê xeberê Ferhad gelek kêfxweş dibe. Şêrîn rojek behsa zehmetiya anîna şîrî ji çiyê ji bo Qesrê Şêrîn ji Şapûr re dike. Li ser vê mesele Şapûr jî behsa hostatî û hunera Ferhadî dike. Bi vî rengî evîniya Ferhad û Şêrînê dest pê dike.

Şîrîn be Şapûr watiş çûn kerîm  
Çarî be çarey ey kare berîm (24b, M. 643)

Er kesê biya karê bikerda  
‘Elac be çarey karim bikerda (24b, M. 644)

Şapûr şeneftîş awerdiş be yad  
Sewday serencam sengtaşî Ferhad (24b, M. 646)

Watiş be Şîrîn be êqbalê wêt  
Ustadî qabil mawerûn perêt (24b, M. 647)

Piştî mirina Xusrewî, Şîro evîniya xwe li hember Şêrînê eşkere dike. Şêrîn jî bo teklîfa Şîro qebûl bike jê sê tişt dixwaze. Ewil divê mal û milkên Xusrew li feqîran belav bike, dû re di nav çil rojan de qatîlên wî peyda bike û sêyem jî li hemberî xelkê tohmetên ku li Şêrînê kiribû bibêje. Şîro xwestekên Şêrînê aniye cih. Şîro wê demê li xwe daniye ku kuştina Xusrew bi destê wî bûye. Şêrîn jehrê dixwe û xwe dikuje û Şîro jî dîn dibe û bi çol û çiyayan dikeve.

Watiş cew dîn nemanî dirêx  
Ba dimay Xusrew wê m bedewn we têx (120a, M. 3267)

Mekêşe minnet mîraşê Xusrew  
Mer to ce şahî kemterî ce ew (120b, M. 3283)

Badawer bişken Şewdêz biker pey  
Destefşar wize ne behrê bêpey (120b, M. 3284)

Cew dima Şîrîn xêza bêendêş  
Kerdiş benay qeşd perî qetlê wêş (131b, M. 3589)

Şêt û şeyda bî derdînê dara  
Riwala be nerm rûş kerd nesara (37a, M. 3755)

### 2.2.1.2. Xusrew

Xurewê Duyem bi leqeba Xusrew Perwêz tê nasîn. Ji silsila padîşahên Sasaniya kurê Hurmizî û neviyê Nûşîrewan e (Yaheqî, 1386: 330). Piştî mirina bavê xwe, di sala 589an de tê ser textê padîşahiyê. Serleşkerê Hurmizî Behramê Çûbîn serî li ber desthelatdariya Xusrew radike di dawiya şerî de Xusrew Perwêz mecbûr dimîne seltenetiya xwe terk bike û xwe bispêre împeratoriya Romê. Bi alîkariya Împeratorê Romê Morîs, piştî du salan, Xusrew bi artêşeke giran ve êrîş dibe ser Behramê Çûbîn. Artêşa Behramê Çûbîn têk diçe û Behram jî tê kuştin. Xusrew dîsa dizivire ser textê xwe.

Dema Hurmiz dimire, Xusrew li Ermenê li cem Şêrînê ye. Behramê Çûbîn mirina Hurmizî û amade nebûna Xusrewî li Medayinê weke xenîmet dibîne û serî radike. Li gor mesnewiya Xusrew û Şêrîna Elmas Xanê Kenûleyî:

Nagah wey hewaļ mematê Hurmiz  
Ehwaļê mergiş yawa be perwêz (16a, M. 419)

Watin be Xusrew Hurmiz wefat kerd  
Text û tacê ew yekî henî berd (16a, M. 420)

Şaranê şêwna şûrê şînişen  
Behramê Çûbîn canişînişen (16a, M. 421)

Xusrew, Şêrînê di xewa xwe de dibîne û dibe wê. Ji ber evîna Şêrînê, Xusrew gelek xemgîn dibe. Tu kes jê re çareseriyek nabîne. Xusrew tevî çend xulamên bi tevdir ji bo peydakirina Şêrînê dikeve ser rê.

Şebî kemer laļ ne coş tawiş  
Şukûfê Şîrîn ama ne xawiş (3b, M. 69)



Çendî ce xulam moresse' kemer  
Hor daşt çenî wêş çend gencê gewher (4a, M. 86)

Ferar bî ne dûn dewranê dêrîn  
Şête şîwinak ne şûnê Şîrîn (4a, M. 87)

Şapûr ji bo Ferhadî peyda bike gelek welatan geriya û rastî Xusrewî hat. Xusrew wî kir wezîrê xwe û çîroka xwe jê re bi tevahî got. Şapûr ji wê diçe welatê Ermenê û Şêrînê peyda dike. Wêneyê Xusrew li ser dîwarên qesrê neqîş dike. Şêrîn dema ji nêçîrê dizivire û wêneyê Husrew dibîne dibe evîndarê wî. Şapûr ji Şêrînê re çîroka Xusrewî dibêje û bi daxwaza Şapûrî bi hev re diçin Taqê Bostan cem Xusrewî. Herdu evîndar wiha digihîjin hevdu.

WeLAT kerdiş tey dinya her çî hen  
Şîrîn eyda kerd ce mulkê Ermen (6a, M. 133)

Ama xiyal kerd be te' cilê dew  
Şûretî kêşa be şiklê Xusrew (7a, M. 165)

Şapûr wat Şîrîn wêlê haşenan  
Min peykê Xusrew kemer laşenan (8a, M. 199)

Beled wist we pêş rahan be westan  
Wadî be wadî ta Taqê Westan (8b, M. 210)

Piştê mirina Hurmizî, Xusrew dizivire Medayinê û bi keça Qeyserê Romê re dizewice. Ji vê zewacê kurekî wî çêdibe û navê wî datînin Şîru. Şîru mezin dibe û Xusrew qetil dike.

Kinaçey Qeyser pey ciftê Şîrîn  
'Eqdiş best be şad mehbûbê dîrîn (18a, M. 464)

Ewweļ ce şûmîş daye aliş berd  
Mader wefat kerd Şîro seriş werd (19b, M. 505)

Şî be şitaban Şêruy şermesar  
Yawa ne pay qeşr dîwarê țelar (103b, M. 2812)

### 2.2.1.3. Ferhad

Ferhad yek ji lehengê sereke yê çîroka Xusrew û Şêrînê ye. Di metnên dîrokî de zêde behsa wî nehatiye kirin. Di hin metnan de ev leheng weke Ferhadê Hekîm û muhendis hatiye zikirkirin. Weke Nîzamiyê Gencewî ji hêla nejada xwe ve weke Kurdê Kelhor hatiye nasîn di nava qewmên Îranî de. Beriya Mesnewiya Nîzamî, navê vî lehengê di çîroka Xusrew û Şêrînê de derbas nabe. Cara yekem Nîzamî navê vî kesî di vê çîrokê de zikir dike (Yaheqî, 1386: 639).

Şapûr derbarê Ferhadî de agahî dide Şêrînê ku wî û Ferhad li Çînê bi hev re ji ustadekî ders girtine. Ferhad wisa bi huner û mahir e, dikare di binê avê de ji masiyê re çûkê resm bike. Di Xusrew û Şêrîna Gencewî, beşa destpêka evîniya Ferhadî de behsa vê meselê hatiye kirin (Gencewî, 1390: 216). Di Xusrew û Şêrîna Elmas Xanê Kenûleyî de Ferhad weke şehzadê Fexfûrê Çînê û Şapûr jî wezîrê bavê wî hatiye nîşandan. Dema Şapûr, Ferhadî bi Şêrînê dide nasîn, Şêrîn eslê wî dipirse. Ferhad wiha bersiv dide:

Eşlim mepirsî neşlim ce xaşen  
Danem ce şedef xaşey xewaşen (27a, M. 721)

Rast maço Ferhad herfiş yeqînen  
Ferzendê fexfûr xaqañê Çînen (35b, M. 952)

Min wezîrê bab Ferhadê wêlim  
Ne şunê Ferhad min eragêlim ((35b, M. 953)

Li gorî mesnewiya Kenûleyî destpêka evîniya Xusrew û Ferhadî ya li hemberî Şêrînê di heman demê de dest pê dike. Ferhad jî Şêrînê di xewê de dibîne. Ji bo peydakirina wê Çînê terk dike. Fexfûrê Çînê li ser vê bûyerê pir xemgîn dibe û wezîrê xwe Şapûr wezîfedar dike li pey Ferhadî dişîne:

Bişno ce Ferhad şehzadey Maçîn  
Şewê dî ne xaw şikufê Şîrîn (4b, M. 102)

Şapûr hem wezîr babuy Ferhad bî  
Fexfûr haşt be ca çenî Ferhad şî (4b, M. 103)

Ferhad li çiyayê Bîsitûnê mijûlê çêkirina cuhikê ye. Jê re xebera birina Şêrînê tê ji aliyê Pîrezalê ve. Dema Ferhad vê xebera xirab dibihîze feryad û fixan dike li wir dikeve û dimire. Xebera mirina wî ji Şêrînê re diçe. Şêrîn diçe çiyayê Bîsitûnê ser cenazê Ferhadî. Pişt re wî dişon, kefen dikin, û cenazeyê wî li wir binax dikin.

Mezarê maway xarê xatîrrêş

Qebriş kend Şapûr be qulengê wêş (90b, M. 2454)

Ûesîl xuslîş dan be sedrê kafûr

Defn û kefen kerdenFerhadê fexfûr (90b, M. 2455)

Yage lehd gêrit seray qeşrê no

Kêşa be serda lehafê gilko (90b, M. 2457)

#### 2.2.1.4. Hurmiz

Ji silsila padişahên Sasaniyan kurê Behram û neviyê Nûşîrewanê ‘adil ê. Piştî mirina bavê xwe di sala 579an de tê ser textê padişahiyê û nêzîkê deh salan padişahiyê kiriye. Li gorî hinek rîwayetan, ji ber ku Hurmiz zilmê kiriye, serleşkerê wî Behramê Çûbîn wî ji ser text aniye xwarê û mîl kişandiye çavên wî (Onay, 1996:). Di edebiyata rojhilat de Hurmiz weke Hurmizê tacdar jî derbas dibe ji bo ku cara ewil taca ji zêr wî daye serê xwe.

Hurmiz ce newey nesîl newşîrwan

Ne fermanîş bê Mekke ta Merwan (2a, M. 33)

Ne mulkê meskûn mehalê memlûk

Padişahîş bê ne çuwar bilûk (2a, M. 34)

Dema xebera mirina Hurmiz ghişte Xusrew Perwîz, wê demê ew li cem Şêrînê bû. Elmas Xanê Kenûleyî ev yek jî di çîrokê de wiha aniye ziman:

Be ‘îş û nuş bî Xusrew be Şîrîn

Bêxeber ce dam dewranê dirîn (16a, M. 418)

Nagah wey hewaļ mematê Hurmêz

Ehwaļê mergîş yawa be perwêz (16a, M. 419)

Watin be Xusrew Hurmiz wefat kerd

Text û tacê ew yekî henî berd (16a, M. 420)

### 2.2.1.5. Şapûr

Şapûr, di Xusrew û Şêrîna Nîzamiyê Gencewî de weke nedîmê Xusrew Perwîzî yê sadiq derbas dibe (Gencewî, 1390: 55). Di dewra xwe de bi neqaşiyê navdar bûye, heta bi neqaşê navdar Manî re hatiye muqayesekirin. Ev lehengê sereke di Xusrew û Şêrîna Elmas Xanê Kenûleyî de weke wezîrê Fexfûrê Çînê hatiye diyarkirin.

Şapûr hem wezîr babuy Ferhad bî

Fexfûr haşt be ca çenî Ferhad şî (4b, M. 104)

Şapûr her çend kerd men‘iş be goftar

Nekerdîş qebûl Ferhadê dîldar (5a, M. 105)

Horgêla be taw şîşdangê Şapûr

Hewalê Ferhad watiş be fexfûr (5a, M. 106)

Dema Ferhad û Şêrîn rastî hev tèn Ferhad dixwaze rûyê Şêrînê bibîne. Lê Şêrîn di serî de pûşiya xwe hilnayne ji serçavê xwe. Berê ji Şapûrî dipirse agahiyên ku Ferhad dide rast in ya na. Şapûr wexta bersiva wê dide dîsa diyar dike ku wezîrê bavê Ferhadî ye.

Şapûr bersiva wê wiha dide:

Be lefzê Şîrîn rûş kerd ne Şapûr

Persa lêş ehwâl ferzendê fexfûr (35b, M. 947)

Watiş be Şapûr mepersûn ce to

Ye Ferhad watiş rasten ya diro (35b, M. 948)

Min wezîrê bab Ferhadê wêlim

Ne şunê Ferhad min eragêlim (35b, M. 953)

### 2.2.1.5. Şîrûy

Şîrûy kurê Xusrew û keça Qeyserê Romê Meryemê ye. Bavê xwe dîkuje û di cihê wî de diçe ser textê padişahiyê. Li gorî tarîxa Teberî navê wî Şîreveyh e. Bi neyarên Xusrew re dibe yek û wî bi darve dîkin. Dema tê ser textê padişahiyê panzdeh birayên xwe tevî zarûkên wan dide kuştinê. Piştî mirina bavê xwe poşman dibe. Ji bo Xusrew bi destê Hurmizê kurê Merdanşah hatibû kuştinê Şîrûy jî ew dîkuje. Hatiye riwayetkirin Xusrew ji memûrê ku ji bo darvekirina wî wezîfedar bûye re wiha gotiye: ‘‘Te ji min re gelek xizmet kiriye, tu vê sindoqê bigre bila ew nekeve destê kurê min ê xayîn.’’ Piştî Xusrew tê darvekirin ew memûr jî wê sindoqê hiltîne dibe teslîmê Şîrûyî dike û meselê jê re dibêje. Wê sindoqê vedîkin ku di hundirê wê de derman heye û li ser rûpelekî hatiye nivîsîn ku yê vî dermanê bixwe ew ê hêza wî ya cinsî deh qatan zêde bibe. Şîrûy jî ew şev hinek ji wî dermanê dixwe û di cih de dimre. Ji ber ku jehr bû û Xusrewî bi zanebûn ew kire dafikê (Nîzamî, 1988: 505).

Di Xusrew û Şêrîna Elmas Xanê Kenûleyî de Şîrûy zînekar, bêexlaq, qatîl, wehşî hatiye bilêvkirin. Dema ku Şîrûy tê dine weke ejderha hatiye teswîrkirin. Ji ber vê yekê dayîka wî dema ew tîne dinê dimire. Xusrew ev yek weke bêyomtiyek şîrove dike û gazî remalan dike û rewşa Şîrûyî ji wan dipirse.

Mader çûn meral bariş bî reha Awerdiş weled aşuy ejdêha	(19a, M. 502)
Peyda bî weled ejdêhay neberd Êbtiday ejder wehşî weled derd	(19a, M. 503)
Ce nehsî nisa’ notfey napesend Be şûmî çarey çeftê napesend	(19b, M. 504)
Ewwe! ce şûmîş daye aliş berd Mader wefat kerd Şîro seriş werd	(19b, M. 505)
Mend webê mader narast û naxas Be şitur û şîn seday bê qiyas	(19b, M. 506)

Ji bo ku dilê wî dikeve Şêrînê bavê xwe dikuje û dixwaze bi Şêrînê re bizewice. Ev bûyer bi awayeke berfireh hatiye vegotin di çîrokê de. Çend malikên derbarê vê meselê de li jêrê hatiye nîşandan.

Xezêney Xusrew lêtan beş kerû  
Hemîn diî ce şewq Şîrîn weş kereû (98b, M. 2677)

Dînê diîberim be min kafiyen  
Zuxa û zaman diî pey şafiyen (98b, M. 2678)

Razîm min be kesb geda we derwêşî  
Be şert ce Şîrîn bibum diîxuşî (98b, M. 2679)

#### 2.2.1.6. Keça Qeyserê Romê (Meryem)

Meryem keça Qeyserê Romê Morîs e. Hevjîna Xusrew Perwîz e. Dema Behramê Çûbîn dibe desthilatdarê Welêt, Xusrew penah dibe ber Romê û li wir bi keça Qeyser re dizewice, ji wê jî Şîrûy tê dinê. Ev zewac li ser têkiliyên siyasî pêk tê. Navê keça Qeyserê Romê di Xusrew û Şêrîna Nîzamî (Gencewî, 1390: 266), Tarîxa Teberî û Xusrew û Şêrîna Xanay Qubadî de weke Meryem derbas dibe (Qubadî, 1368: 308). Lê Elmas Xanê Kenûleyî bi tenê di serenava beşa ku behsa Meryem û ji dayîkbûna Şîrûyî dike de wê weke keça Qeyserê Romê nîşan daye.

Kinaçey Qeyser pey ciftê Şîrîn  
‘Eqdiş best be şad mehbûbê dîrîn (18a, M. 464)

Be ‘eqd û nikaş teşşerofîş kerd  
Be ham ciftê şux Şîrîniş Awerd (18a, M. 465)

Yekser kerd welat pulê sermestan  
Horgêla ne semt seraw û westan (18a, M. 466)

Be keyfê Şêrîn şelapeniş berd  
Seraw û wadî westan pesend kerd (18a, M. 467)

Meryemê dema ku Şîrûy tîne dinê dimre li gorî Xusrew û Şêrîna Kenûleyî mirina wê ji bêyomiya Şîrûyî ye.

Ce behrê deryay meralê bedreng  
Xewas hordaştiş sengê siyareng (19a, M. 501)

Peyda bî weled ejdêhay neberd  
Êbtiday ejder wehşî weled derd (19a, M. 503)

Ce nehsî nisa' notfey napesend  
Be şûmî çarey çeftê napesend (19b, M. 504)

### 2.2.1.7. Pîre Zal

Pîrezal yek ji lehengên girîng yê çîrokê ye. Ji ber ku bi dek û dolabên xwe dibe sedemê mirina Ferhadî, di çîrokê de derdikeve pêşberî me. Piştî evîndariya Ferhad û Şêrînê eşkere dibe, Pîrezal ji jî nişkeve derdikeve holê. Pîrezal bi awayeke xirab, weke jûjî elawat, siyasetmedar, dilê wê weke teniyê, fitneger, dolabgerîn, şikil weke meymûn, devê weke devê dêwan, porê wê weke yên pîrelkan, lingên wê çewt, tevgerên wê weke roviyan bi hîle û bi fen, zimaçepel, di xiybetê de xwediye hunerê, pêsîrên wê li ser zikê wê, çena wê weke kasê, zik weke meşk, diran weke diranên çêlekên pîr, axaftin weke ya beqê, şeytansifet hatiye teswîrkirin.

Nagah peyda bî yek pîrezalê  
Siftey siyaset derûnê zoxalê (73b, M. 1988)

Ama yek pîrê ce pîrezalan  
Qarî qerînê qern qeltaxê sajan (73b, M. 1989)

Daday dêwê deyr dolabê sajan  
Felek ferîwker ce kohne maJan (73b, M. 1990)

Fitney faîlê fil qernî qel be qel  
Cametey cadû mekr û fêl ne mel (73b, M. 1991)

Ferhad ferîwin aşuy şerengîz  
Coşê cengê coş xênîmê xûnrîz (73b, M. 1992)

Pîrezal tê huzûra Xusrew Perwîzî, jê re fen û fûtên xwe pêşkêş dike. Ew dizane ku Xusrew ji bo evîndariya Ferhad û Şêrînê xemgîn e. Ji ber ku bavê Ferhadî,

fexfûrê Çînê kurê xwe emanetê wî kiriye, nikare xirabiyê jî lê bike. Tîrsa Xusrew ew e ku zîrê bide Ferhadî û navê wî li vê dinê bi xirabî bimîne. Pîrezal behsa dek û dolabên xwe ji Xusrew re dike ku ew ê çawan Ferhadî ji holê rake. Pîrezal ji bo ku hunerê xwe derxê pêş ji Xusrewî re dibêje şeytan ji wê ders û te'lîm stendiye.

Waçe perî min derdê halê wêt  
Karit bisazun ser bidem nerêt (74b, M. 2018)

Her çend karê sext asanen ce lam  
Şeytan wêş mebo we pabosê pam (74b, M. 2019)

Elxennas be fend fitney min benden  
Şeytan dersê `êlm we lay min wenden (74b, M. 2020)

Ye çenden wey tewr wiyerde salîm  
Sê şed salîm bo hêman mindalîm (74b, M. 2021)

Ce tîflê min toxm şeytanîm şenden  
Êlmê `edawet wey şerîm wenden (74b, M. 2022)

Tîflî ta îse min ye karîmen  
Çend fendê fitne gîrdarîmen (74b, M. 2023)

Çerxê çep kerdiş keften ne bendîm  
Gerdûn gorêzan ce fitney fendîm (74b, M. 2024)

Pîrezal diçe Çiyayê Bisitûnê. Fîxan û feryad dike, bi dengê bilind digrî û dibêje Şêrîn miriye lê agahiya Ferhadî ji vê yekê tune ye. Bi vî awayî xebera mirîna Şêrînê dide Ferhadî. Dema ku Ferhad ew dibîhize li wir jiyana xwe ji dest dide. Pîrezal û Xusrew jî digîhijin armanca xwe.

Xêza resta xêz mûr û melamet

Zarî û zawma bî we zelalet (78b, M. 2128)

Weled pey walêd walêd pey weled  
Bî we zilzeley bêdad û bêhed (78b, M. 2129)



Bî we qiyamet nadirey nedîm  
Xêza zayiley zelalet 'ezîm (78b, M. 2130)

### 2.2.1.8. Behramê Çûbîn

Behramê Çûbîn, serleşkerê padişahê Sasaniyan Hurmizê çaremîn e. Behram dikeve pey kêf û hewesa desthilatdariyê ji ber vê yekê leşkeran li der û dora xwe dide hev û padişah ji ser text tîne xwarê. Her çiqas di serî de bixwaze Xusrew Perwîz were ser text jî ji bo ku bi Xusrewî ewle nîne ew bi xwe tê ser textê padişahiya Sasaniyan di tarixa pênsed û heft û nehan de. Piştî Xusrew penah dibe ber împeratoriya Romê û bi alîkariya xezûrê xwe Qeyser Morîsî bi artêşek giran û bi leşkerên zêde diçe bi ser Behramê Çûbîn de. Behramê Çûbîn li ser vê bûyerê firar dike diçe hêla Turkmenistanê. Xusrew weke padişahê Sasaniyan tê ser textê padişahiye û seldeneta xwe bi dest dixê. Ev buyer di berhema Nizamiyê Gencewî de berfiretir hatiye vegotin(Gencewî, 1390: 130). Di Xusrew û Şêrîna Kenûleyî de piştî padişah Hurmiz dimire Behramê Çûbîn weke canişînê wî hatiye diyarkirin û li ser mirina wî, Behram diçe ser textê padişahiye.

Be 'îş û nuş bî xusrew be Şîrîn  
Bêxeber ce dam dewranê dîrîn (16a, M. 418)

Nagah wey hewaļ mematê Hurmêz  
Ehwaļê mergiş yawa be perwêz (16a, M. 419)

Watin be Xusrew Hurmiz wefat kerd  
Text û tacê ew yekî henî berd (16a, M. 420)

Şaranê şêwna şûrê şînişen  
Behramê Çûbîn canişînişen (16a, M. 421)

Dîsa cudatiyek din jî Xusrew bi alîkariya leşkerên Ermen hêrîşê dibe ser Behramê Çûbîn, wî digre dikuje û artêşa wî jî tar û mar dike. Elmas Xan bi van malikên xwe cudatiya xwe û Nîzamî û Xanay Qubadî nîşan daye.

Çapê çepaw da pey mekanê wêş  
Şîrîn keft ne pes Xusrew keft ne pêş (17b, M. 460)

Yawa be welat mułkê wêş beqar  
Daş be Behrem da kerdiş tar û mar (17b, M. 461)

Behram gêrt we koşt sipaş da şikest  
Ne serhedan da yek şed sinûr best (17b, M. 462)

#### 2.2.1.9. Qeyserê Romê

Weke me berê jî got Qeyser, leqeba padişahên Romê ye. Di çîroka Xusrew û Şêrînê de meqsed ji qeyser, Morîsê bavê Meryemê ye. Gelek caran bi artêşên giran hêriş biriye ser Sasaniyan (Pala, 2004: 263). Di berhema Elmas Xanê Kenûleyî de dema behsa zewaca Xusrew û Meryemê û ji dayikbûna Şîrûy dike navê qeyser derbas dibe.

Şebî bî we cift mehbûbê Qeyser  
Notfeş bend awerd ne betnê mader (19a, M. 496)

Peywend bî be taqet notfey naxelef  
Hemliş zohûr kerd ce kasey şedef (19a, M. 497)

Çûn seng ne şedef kerdiş perwerişt  
Yawa be encam zobrey zaxê zişt (19a, M. 498)

#### 2.2.1.10. Fexfûrê Çînê

Fexfûr leqeba padişahên Çînê ye. Di mesnewiya Xusrew û Şêrînê de fexfûr bavê Ferhadî ye. Nevê wî nehatiye diyarkirin bi tenê weke fexfûr derbas dibe.

To nazdarê nûr fexfûrê Çîn bît  
Ber guzîdey mułk Maçîn zemîn bît (22b, M. 494)

Min wêm longê pust bejnê bergê to  
Şapûr mewtiş bo wer ce mergê to (22b, M. 495)

Ewse dimay to ce daxê bêşot (22b, M. 495)

Çêş biru cuwab baboy řencerot

Fexfûr bizano bey tewern halît

Budîno rihban reşte 'edalet (22b, M. 496)

### 2.2.1.11. Gerra

Gerra serê çil keleşê rêbir e. Di navbera Bîsitûn û qesra Şêrîn de li ser rê kon vedane ji yên ku tèn û diçin bacê digrin. Dema Şêrîn ji bo Ferhad bibîne tê Bîsitûnê lingê Şewdêz dikeve ber kevir û dişikê. Ferhad jî dixwaze Şêrîn û Şewdêz bibe Qesrê Şêrîn li serê rê rastî Gerra û çil bacgîr tê. Tev di xew de ne. Yek ji wan radibe dibine ku Ferhad derbas dibe xeber dide Gerra. Gerra şiyar dibe tê pêşiya Ferhadî bacê jê dixwaze û destdirêjiya Şêrînê dikan. Ferhad serê her çilên wan jî ji gewdê wan diqetîne.

Ferhadê fexfûr bêxeber ce kar  
Ce sewday Gerça ragîrê radar (59b, M. 1608)

Neşis mostehfez ragey şeb û ro  
Gerçay siya reng bacgîrê Xusro (59b, M. 1609)

Timez Gerçay şûm bacgîrê bengî  
Radarin çenî çil kes ce zengî (59b, M. 1610)

Rahdarin ce rah her çil herimend  
Gêrten ragey rast ce tengê derbend (59b, M. 1611)

Herkes bêferman mewîru be rah  
Çeneş mestano çen bacê mitah (59b, M. 1612)

Her çilê sermest xoşê badenûş  
Huş biyen ne hoş ne xawê xamûş (59b, M. 1613)

### 2.2.1.12. Bi Kurtasî Danasandina Lehengan

Bi kurtasî lehengên Xusrew û Şêrîna Elmas Xanê Kendûleyî di tabloya jêrê de hatine danasandin:

Navê Lehengan	Pênasa Wan
Hurmiz	Padişahê Medayînê û bavê Xusrew Perwêz e.
Xusrew	Kurê Hurmizî û evîndarê Şêrînê ye.
Şêrîn	Melkîka Ermenê û meşûqeya Xusrew e.
Ferhad	Kurê padişahê Çînê û aşîqê Şêrînê ye.
Şapûr	Wezîrê Fexfûrê Çînê, nedîmê Xusrew û Ferhadî ye.
Fexfûr	Bavê Ferhadî û padişahê Çînê ye.
Behramê Çûbîn	Serleşkerê arteşa Hurmizî ye
Qeyser	Qiralê Roma û bavê Meryemyê e.
Meryem	Keça Qeyserê Romê û jina Xusrewî û dayika Şîrûy e.
Şîrûy	Kurê Meryem û Xusrewî ye. Qatilê bavê xwe ye.
Daye	Murebiya Xuwser e. x
Pîrezal	Pîrejina ku xebera mirina Şêrînê dide Ferhadî ye.
Nekîsa û Barbud	Du mûsîqîşînasên qesra Xusrew Perwêzî ne.
Gerra	Serokê çil keleş an jî rêbiran e.

### 2.2.1.13. Xulaseya Çîroka Xusrew û Şêrîna Elmas Xanê Kendûleyî

Padişahêkî bi navê Hurmiz ku ji nesla Nûşîrewanî hebû. Ev padişah xwediyê mal, mulk, xezîneyên mezin bû. Ji bilî ewlad Xwedê her tişt ji wî re lutf kiribû. Ew ji ber bêewladiyê xemgîn û dilşikabdî bû. Jê re kurekî çêbû navê Xusrew Perwêz danîn. Xusrew ji bo bê perwerdekirin dan berdesê Dayeyê. Deme bû Xusrew heft salî ji zanyarê û alimên mezin perwerda ilmê dît, fêrê hesp siwarî, tîr û kevan bikaranîne dibe. Xusrew rojek di xewna xwe de Şêrînê dibîne. Ew li ser vê xewê ji deredê Şêrînê dîn û şeyda dibe. Hurmiz reşwa Xusrewî dema dibîne pir xemgîn dibe. Xurew bi gelek xulam û xizmerkaran ve bi tedvîr ji bo Şêrînê peyda bikin ji Medayînê dertênê. Kurê Fexfûrê Çînê jî weke Xusrew di xewa xwe de Şêrînê dibîne ji bo wê

bibîne ew jî firar dike ji welatê Çînê derdikeve. Wezîrê bavê Ferhadî Şapûr ji bo Ferhadî peyda bike li pey wî diçe. Şapûr rojek li Qesrê Şêrînê rastê Xusrew tê û ji rewşa wî û Şêrînê agahdar dibe. Bi xwesteka Xusrewî Şapûr diçe welatê Ermenê û Şêrînê dibîne. Wêneyê Xusrewî neqş dike dema Şêrînê vî wêneyî dibîne evîndarê Xusrew dibe. Şapûr wisa wesf û methê Şehzayê Medayînê dike ji bo dîtina wî Şêrîn li gel Şapûr diçin Qesrê Şêrînê. Aşiq û meşûq digihîjin ev û din. Piştê vê dîtîna Xusrew diçe Ermenê. Di demeke kurt de xebera mirina Hurmizî didin Xusrewî. Behramê Çûbîn jî mirina Hurmizî weke xenîmet dibîne û cihê wî digire.

Xusrew 1 iser mirina bavê xwe û serhildana Behramê Çûbîn xemgîn dibe. Xusrew ji bo hêzeke siyasî bi dest bixe diçe xwe davêje Qeyserê Romê, piştê wextek bi keça Qeyser re dizewice. Xusrew bi artêşeke giran ve diçe ser Behramê Çûbîn. Behram û artêşa xwe têk diçin. Behram ji aliyê Xusrewî ve tê kuştin. Xusrew tac û textê bavê xwe dîsa bi dest dixwe. Xweda kurekî dide Xusrewî navê wî datînin Şîrûy. Keça Qeyser piştê ku Şîrûy tîne dinê dimire. Ferhad piştê demeke dirêj Şapûr li Taqê Bostan peyda dike. Şêrîn ji Şapûr dixwaze ji bo ji Çiyayê Bêsîtûne şîr bi awayeke hêsan bînin Qesra wê. Li ser vê xwesteka Şêrîne, Şapûr wê û Ferhadî dide nasîn li gel hev û din. Şapûr methê ostatiya Ferhadî dike. Ferhad li Taqê Bostanê ji bo Şêrînê qesreke pir xweşik, û bexçeyên delal ava dike. Xusrew û Şêrîn pir kêfxweş bûn û ji ber hunermendiya Ferhadî, wî teqdîr kirin. Xusrew ji evîndariya Ferhadî agahdar dibe. Emir dide Ferhadî li Çiyayê Bêsîtûnê ji bo cuhikê. Ferhad diçe çiyê dest bi kolanê dike. Xusrew fam dike ku Ferhad ji evîna xwe paşve nakişe bi hîle û desîsên Pîrezalê xebera mirina Şêrînê digihîjîne Ferhadî. Ferhad li çiyayê Bêsîtûnê din ava kevir û zinaran de dikeve dimire.

Şêrîn li ser mirina Ferhadî gelek xemgîn dibe. Xusrew bi mirina evîndarê Şêrînê kêfxweş dibe. Lê ew jî nagihije armanca xwe. Ji berk u Şîrûy dil ber dide Şêrînê û dixwaze textê bavê xwe bi dest bixe Xusrew dikuje. Şîrûy teklîfa zewacê li Şêrînê dike lê Şêrîn ji wî dixwaze mal û milkê Xusrewî li hejar û feqîran belav bike. Bi vê awayê Şîrûy ji mal û mîrasê Xusrewî merûm dimîne. Şêrîn diçe ser qebra Xusrewî li wir dimire. Şîrûy dema xebera mirina Şêrînê dibîze dîn dibe bi çiyayan dikeve. Di dawiya çîrokê de Şîrûy ji xem û kedere dimire.

## 2.2.2. Şexsiyetên Dînî

### 2.2.2.1. Ye'qûb Pêxember

Ye'qûb Pêxember kurê Îshaq Pêxember û di heman demê de bavê Yûsif Pêxember e. Leqeba wî Îsrayîl e. Di helbestê klasîk de bi gelemperî weke telmîh tê bikaranîn. Navê wî nîşana xem û hesretê ye. Yar hertim bi Yûsif Pêxember tê şibandin aşiq jî weke Ye'qûb ji ber ku ji yarê dûr e hertim xemgîn û dilbirîn e. Ye'qûb bi têgehên weke kulbeya ehzenê, Yûsif, pîrehen, Misir, Ken'an, xem, keder, bêhna Yûsif, korbûn, başbûna çav, dûrîtî û hesretê tê zikirkirin. Elmas Xanê Kenûleyî jî ev mezmûn di çarçova wêjeya klasîk de bi kar aniyê. Ev yek di malikên jêrê de hatiye diyarkirin:

Rûşen bî dîdeş Şêxasay Sen'an  
Çûn badê Yûsif Ye'qûb ne Ken'an (53b, M. 1441)

Çûn Ye'qûb ce boy Yûsif ce memat  
Rûşen kerd zemîr 'eyniş ce zołmat (55b, M. 1503)

### 2.2.2.2. Yûsif Pêxember

Kurê Ye'qûb Pêxember e. sembola xweşî û muhebetê ye. Di Qurana Pîroz de qîseyay Yûsif bi aweyeke hûrgilî hatiye vegotin. Di helbesta klasîk de yar bi Yûsif tê şibandin bi xweşî û rindiya xwe (Pala, 204: 484). Bi gelemperî ev mezmûn bi têgehên weke Ken'an, Misir, Zuleyxa, Ye'qûb, çah, pîrehen re derbas dibe (Onay, 1996: 504). Ji bo mînak du malik li jêrê hatine nîşandan:

Husnê cemîniş xûbter Şe'nan  
Bêznaş beyzay Yûsif ce Ken'an (3b, M. 65)

Çûn Yûsifê Mêşr Zilêxay Ken'an  
Beter ce tersa be rozê Sen'an (31a, M. 830)

### 2.2.2.3. Meryem

Meryem dayika 'Îsa Pêxember û keça Îmranî ye. Beriya Xwedê Meryem bide bavê wê nezir kir ku eger zarokê wî kur be ew ê wê weqfî Beytu'l- Muqedesê bike. Lê zarok keç bû ji ber vê di dudiliyê de ma. Ji xeybê dengê hat ku keça xwe weke muawira mizgeftê bexş bike. Piştê ku Îmran wefat kir, kurê meta wî Zekeriya

Pêxember li Meryemê xwedî derket. Meryem heta hijdeh saliya xwe li mizgeftê ma. Rojek Cebrail xwe di şiklê Yûsif Nekarî de nîşanê Meryemê da û mizgîniya Îsa da wê. Cebrail puf kir Meryemê û Îsa di wê demê de kete hemla wê. Ji ber bêtêkiliya cinsî Meryem bardar bû jê re di wateya bakîreyê de leqeba ‘uzra hat dayîn (Şemîsa, 1383: 609). Ji Îsa Pêxember re jî Rûhillah hat gotin ew jî ku tê wateya rihê Xwedê.

Di Qurana mubîn de jî di derbarê Meryemê de wiha agahî derbas dibe: ‘‘Dema Zekeriya Pêxember diçe hucra ku Meryem tê de îbadet dike, dibîne fêkiyên cur bi cur li ber wê ne û ew wan dixwe. Zekeriya jê dipirse, ev ji kuderê ji te re tîn? Ew wiha bersiv dide: ‘‘Ew ji bihiştê ji min re tîn.’’ (Qurana Pîroz, 3/37)

Meryem di Ehdê Etîq û Ehdê Cedîd de jî bi wesfê jineke pîroz derbas dibe. Ji bilî misilmanan, cihû û xaçperest jî wê muqedes dizanin.

Mesîhay Meryem Şîrînê Ermen

Bî be qûtê roj Ferhadê koken (53b, M. 1440)

#### 2.2.2.4. ‘Îsa Pêxember (Mesîh)

Di edebiyata Îslamê de ‘Îsa Pêxember bi rêya telmîhê bi mucîzeyaya xwe ya ku miriya zindî kiriyê hatiye zikirkirin. Di helbestan de bi navên weke Rûhillah, Mesîh, Îbnî Meryem, ‘Îsa Mesîh, ‘Îsî dem, derbas dibe (Onay, 1996: 283). Bi gelemperî nav û leqebên ‘Îsa pêxember bi peyva dem û nefesê re derbas dibe. Di mesnewî û helbestên aşiqane de nefesa meşûqê weke nefesa ‘Îsa pêxember e, çawa ew miriya zindî dike yar jî aşiq wisa zindî dike.

Elmas Xanê Kenûleyî di du cihan de navê ‘Îsa Pêxember weke Mesîha bi kar aniyê. Ji ber ku destê xwe di laşê miriyan daye û ew zindî kirine jê re Mesîh hatiye gotin (Pala, 2004: 309). Şa‘ir lêva yarê şibandîye nefesa Mesîhî di malika jêrîn de:

Ce nesîmê naz Mesîhay nefes

Demya ce demax morxiş ce qefes (53b, M. 1438)

#### 2.2.2.5. Xizir

Xizir di hinek çavkaniyan de weke pêxemberê cihûyan, di hinekan de jî weke weliyê Xwedê derbas dibe. Bi ilm û merîfata xwe navdar e. Li gorî tarixa Bel‘emî Xizir li ser kevirek rûdinê dema ku radibe ji binê wî kevirê giya hêşîn dibe. Li ser vê buyerê leqeba wî Xizir tê danîn (Bin Bel‘emî, 1353: 464). Navê Xizir di Quranê de derbas

nabe, lê di sûreya Kehfê di ayeta şest û pancan de li gorî hinek mufesîran îşaretê Xizir dike (Qurana Pîroz, 15/65).

Qiseya Mûsa û Xizir di edebiyata Rojhilatê de weke motîfek ji bo ilmê ledûn û jiyana cavidan hatiye nivîsîn. Xizir xwediyê zanist û ferasetê ye ji vê hêlê Mûsa Pêxember dixwaze jê ilm û merîfetê fêr bibe. Mûsa sembola ‘eql, Xizir jî ya ‘işqê ye. Disa Xizir weke pîrê terîqetê rê nîşan dide ji bo ku salik yanî murîd bigihîje armanca xwe (Yaheqî, 1386: 332).

Li gorî efseneyek Xizir û Elyas heval in û di serdema Îskenderê Zulqerneyn de jiyane. Bi emrê Îskenderî di welatê zulûmatê de li ava heyatê geriyane. Piştî demek dirêj Xizir û Elyas ku li ava heyatê digerin li teniştê golekê rûdin. Li cem wan masiyên pijandî hene, dema ew masiyan dixwin dilopek av ji golê li masiyek dikeve û masî zindî dibe û xwe davê golê. Herdu heval fam dikin ku ew av, ava heyatê ye. Herdu ji wê avê têr vedixwin. Dizivirin xebera dîtina ava heyatê didin Îskender, lê careke din cihê wê avê nabînin. Îskender ji ava heyatê mehrûm maye. Li gor baweriyê berbelav yê ku li vê dinê rojên xirab li wan diqewime Elyas û Xizir bi hewara wan ve diçin (Pala, 2002: 204).

Di edebiyata Kurdî ya klasîk de mezmûna Xizir bi peyvên weke kewser, ava heyatê, Iskender, Elyas, zulûmat, Musa, çeşma heyatê, zezemê re derbas dibe. Bi gelemperî lêvên yarê weke Xizir tene teswîrkirin ji ber ku ava heyatê dide aşîqî. Di edebiyata Kurdî de ev mezmûn ji aliyê gelek helbestvanên klasîk ve hatiye bikaranîn. Weke mînak Melayê Cizîrî, Pertew Beg Şêxê Meczûb, Weda’î, Şêx Nûredînê Birifkanî, Ehmedê Xanî û hwd.

Elmas Xanê Kenûleyî vê mezmûna Xizir di du cihan de bi kar aniye.

Kokenê şeyday şêr yawa be dişber

Çûn çeşmey heyat Xizir Eskender (57b, M. 1549)

Çûn awê zezem heyatê kewşer

Xizrasay qedîm sabîq Sikender (57b, M. 1551)

#### 2.2.2.6. Belqîs

Belqîs di dewra Suleyman Pêxember de melîka welatê Sebayê bûye. Her çiqas navê Belqîs di Quranê de derbas nebe jî di sûreya Nemlê de behsa wê hatiye kirin. Li gorî



Quranê tê zanîn ku artêşa Hezretê Suleyman ji cin, însan û ajalan pêk hatiye. Çûka bi navê Hudhud rojek derbarê Belqîs û welatê wê Sebayê de agahî dide Suleyman Pêxember ku melîka vî welatî jin e û ji hêla baweriyê ve jî ew rojperest in. Bi emrê Suleyman Pêxember, Hudhud ji bo îrşada xelqê Sebayê name ji Belqîsê re bir(Qurana Pîroz, 27/20-30). Piştî ku nameya Suleyman Pêxember gihişt ber destê Belqîsê, wê bi qasidek re nameyek tevî xelatên giranbiha ji Suleyman Pêxember re şand. Lê Suleyman pêxember vê yekê qebûl nekir, xwast ku Belqîs biçe huzûra wî. Wezîrê Hezretî Suleyman, Belqîs tevî textê wê yê mezin anî huzûra Suleyman Pêxember. Belqîs bi xelqê xelkê xwe re baweriya dîne yek xwedayî qebûl kir(Şemîsa, 1383: 178).

Belqîs di edebiyata klasîk de weke mezmûneke evîniyê derbas dibe (Onay, 1996: 138). Ev mezmûn bi peyvên weke mulkê Seba, Textê Seba, Suleyman, Asaf, Hudhud, wadiya nemlê di helbesta klasîk de cih girtiye.

Weke mezmûn navê Belqîs di malika jêrîn de bi evîndarên navdar re derbas dibe:

Homîlay çilgîs se' dê Homayûn

Ya canî Belqîs karê Ketayûn (23a, M.607)

#### 2.2.2.7. Şêxê Sen'anî

Şêxê Sen'an navê wî yê rastî Ebdulrezaq bin Human e. Şêx û arifekî mezin e di serdema xwe de. Li gorî salnameya koçî di sala 126an de ji dayîk bûye û di sala 211an de jî wefat kiriye. Di mesnewiya Mentiqu't- Teyra Hekîm Ferîduddîn 'Etar de hatiye nivîsîn ku Şêxê Sen'an hezaran murîdê wî hebûn û pêncî car hecê tewaf kiribû ('Etar, 1388: 181-189). Rojek Şêx aşîqê keçek tersa dibe dev ji her tiştî berdide. Ji bo keça tersa wî qebûl bike diçe ser dîne wê û tamamî daxwaziyên wê pêk tîne ji ber vê yekê murîdên Şêx terka wî dikin û jê diqetin. Di dawiya çîrokê de heqîqet aşîkar dibe dîsa wekî berê yên ku li pey şêx bûn dizivirin û rastiye dibîbin (Onay, 1996: 395).

Şa'îrên weke Feqiyê Teyran û Mûradxanê Bazîdî ev çîrok bi teşeya mesnewiyê di edebiyata Kurdî de derbasî nezmê kirine.

Di malikên jêrîn de bi rêya telmîhê çîroka Şêxê Sen'anî hatiye diyarkirin.

Ketûn kelexan muşkê bo 'enber

Dîde xezalan Şen'an ce rê ber (6b, M.149)

Reştey ‘ebdañan riway rehbanî  
Pey to şîm ne ray Şêxê Şen‘anî (35a, M. 935)

#### 2.2.2.8. Acûc û Bacûc (Yecûc û Mecûc)

Yehcûc û Mehcûc weke qewmên talanker û fitneger tên teswîrkrin di Sureya Kehfê de. Ji bo ku ev herdu qewm di riyê erdê de fitnê derdixin û hêrîş dibin ser qewmên din ji Îskenderê Zulqerneyn dixwazin di navbera wan û van herdu qewmên talankar de setek çêke ku ji şerên wan xelas bibin (Qur‘ana Pîroz, 18/94). Hinek riwatek jî dibên Yehcûc û Mehcûc di rastiye de Hûnî ne. Ji ber ku hertim hêrîş birine ser Çînê, çîniyan jî rabûne seta Çînê ava kirine (Onay, 1996: 449). Li gorî rîwayeteke din jî ev navê du qebîlê tirk in ku ji nesla Yafes bîn Nûh in. Guh û dûvên wan dirêj, rûyên wan pehn, neynokên wan weke das in û hejmara wan bêhed û bêhîsab e. Ev qewm biçin kuderê li wê derê talanê dikan (Yaheqî, 1386: 902).

Pîrezal bi fitnegerî û bi hîleyên xwe di malika jêrîn de bi Yehcûc û Mehcûc hatiye şibandin:

Çilêsê çir çul dêwê bêdendan  
Acûc û bacûc daday ecandan (74a, M. 2007)

#### 2.2.2.9. Meleku‘l-Mewt (Ezrayîl)

Ezrayîl yek ji çar melêkên mezin e. Wezîfa wî stendina ruhên mirovan e. Ji bo Ezrayîl navên weke rihistîn, meleku‘l-mewt, melkemot tên bikaranîn di Kurdî de. Di edebiyatê de xedariya yarê dişibînin rihstendina Ezrayîl.

Di malika jêrîn de nîşan dide ku tu kes ji ber destê Ezrayîl nafilite. Eylo çawa li benda nêçîra xwe disekine Ezrayîl jî li hêviya wê demê ye ku ruhê mirovan bistîne.

Meleku‘l-mewt merg qebzîş sitana  
Qellabey çengîş peniş nemana (77b, M. 2099)

Melekê mewt merg be qebzey qullab  
Midra muntezêr şeydiş çûn ‘uqab (78a, M. 2119)

#### 2.2.2.10. Munker û Nekîr

Munker û Nekîr navê du melean in. Ev herdu melek dema ku mirov dimirin û daxilê qebrê dibin, miriyan dikşînin hesabê. Ev herdu melek ji miriyan pirsên weke

“Rebbe we kî ye? Kitêba we çîye? Pêxemberê we kî ye? Qîbla we çî ye û ji kengî ve misilman in?” dipirsin. Yê ku xwediyê îmanê bin bi hêsanî bersiva van pirsan didin, yen bêdîn û gunehkar jî zimanê wan tê girtin nikarin bersiva xwe bidin. Meqsed ji van herdu melekên kirinên mirovan yê baş û xirab in di tesewifê de (Pala, 2004: 340).

Dema Ferhad diçe Çiyayê Bêsitûnê çil keleşên ku rêya wî dibirin û pirsan jê dipirsin di malika jêrê de bi munker û nekîr hatine şibandin.

Ûerîwê xewxay sextê siyayîm

Mewcê Ferhad dan çûn Munkir Nekîm (64b, M. 1747)

### 2.2.2.11. Lat û Menat

Lat û Menat di Serdema cahîliyê de pûtên herî mezin û biqîmet bûn di nav ereban de û ev pût di hundirê qebeyê de cig digirtin. Ev herdu pût aîdê qebîleyên Huzeyl Huzameyê bûn. Li gorî hinek rîwayetan ev pûtê Lat ku niha li mabeda Sûmnata Hindistanê ye ji Mekkeyê neqlî vê mabedê bûye (Onay, 1996: 338).

Dema ku Ferhadî, Şêrîn ji Çiyayê Bêsitûnê dibe Qesrê Şêrîn çil rêbir dertên pêşiya wan û bac ji Ferhadî dixwazin. Ferhadî sond dixwe eger ji ser rêya wan xwe nedin alî ew ê her çil keleşan jî bikuje.

Werne sewgendim be daru'l-mecûs

Be lat û menat be narê naqûs (67a, M. 1812)

Xusrew bi Lat û Menat qesem dixwe ku eger Ferhad dev ji Şêrînê bernede ew ê xirabiyê bîne serê wî.

Sogend bew şenem be daru'l-mecûs

Be lat û menat be naz û naqûs (44b, M. 1223)

### 2.2.3. Şexsiyetên Tarîxî (Dîrokî) û Efsanewî

#### 2.2.3.1. Zal

Zal kurê Sam e û yek ji qehremanên Îranî ye. Dema ku Xwedê wî daye porê wî sipî bûye ji ber vê yekê ev nav lê hatiye kirin. Leqeba wî di Şehnameya Firdewî de Zalê Zer e. Sam, ji ber sipîbûna porê wî, ev yek weke bûyereke bêyomiyê qebûl kiriye. Li gorî efsaneyan Sam, emir da ku Zal li çiyayê Elburzê berdîn. Sîmurxî jî ew girt û bir di hêlîna xwe de bi têtjikên xwe re xwedî kir. Sam piştî çend salan xewn

dibîne û li ser vê xewa xwe diçe çiyayê Elburzê û kurê xwe ji Sîmurxê disitîne. Dema ku Zal bi bavê xwe re dizivire, Sîmurx ji baskên xwe du lib perik didê û jê re dibêje eger tu rastî muşkilekî hatî van herdu perikên min di hev bide ez ê bêm hewara te. Zal bi keça padîşahê Qabulê ya bi navê Rudabê re dizewice û ji vê zewacê Rustem tê dinyayê (Yaheqî, 1386: 411).

Ce sehmê sengin dawiyânê daw

Zaley zaledar mekerdin be aw (60a, M.1620)

### 2.2.3.2. Rustem

Rustem yek ji qehremanên Îranî yê navder e. Di edebiyata Fars û Kurdan de lehengekî mîtolojîk yê hevpar e. Kurê Zalê Zer û Rudabê ye. Li gorî efsaneyan di serdema Medan de jiyaye (Çeper, 2020: 515). Di edebiyata Pehlewî de navî wî weke Rostem derbas dibe û ev jî tê wateya dîlawer, cengawer û wêrek. Wexta ji dayîk dibe di bejn û bala zarokekî yek salî de ye. Di zaroktiya xwe de xwediye heybetê bûye. Dîsa di heyama zaroktiya xwe de dêwê sipî dîkuje û keleha çiyayê Sehendê distîne. Padîşah û şehzadeyên îranî çî wext ketibin tengasiyê Rustem bi hewara wan de çûye û wan xelas kiriye. Bîjen ji çala Efrasyab rizgar dîke û du car Kavûs ji xeretê derdixe. Gurz û temenê wî weke mezmûn di edebiyatê de cih digire (Yaheqî, 1986: 393).

Di edebiyata Klasîk de Rustem nîşenaya hêz û qudretê ye. Meşûq ji gelek hêlan ve bi Rustemî tê şibandin. Rustem bi mezmûnên weke Bîjen û Menîjê, Dêwê Sipî, Rexş, Zalê Zer, Suhrab, Efrasiyab re derbas dibe di edebiyata Rojhelatê de.

Du malikên ku Rustem tê de derbas dibin li jêrê hatine dayîn:

Çûn Rexşê Rustem midra ne cay wêş

Gerra bezmê ceng pa niya we pêş (62a, M. 1679)

Şîfet sipî bûm qehremanê qîn

Û Rimûz û Rustem Nerîmanê kîn (21b, M. 563)

### 2.2.3.3. Siyamak

Siyamek kurê Giyamers e û xelkên îranî ji nesla vî lehengên efsanewî ne li gorî Şahnameya Firdewsî (Yaheqî, 1386: 495). Ehrîmen ji qehremanî û wêrekiya Giyamers hesûdiyê dîke û dêwekî xwe bi ser Siyamek û bavê wî de dişîne ku wan

bikuje. Siyamek bi vî dêwî re şer dike û ji aliyê dêw ve tê kuştin. Li ser mirina Siyamek leşkerên artêşa wî şîn digirin û xemgîniya xwe bi stranên şînê tînin zimên. Kurê Siyamek tola bavê xwe ji dêwan distîne û piştî mirina Giyamers dibe padişah(Çeper, 2020: 536).

Herwiha ku di malikên jêrîn de jî diyar e navê vî lehengê bi peyva dêw re derbas dibe:

Dîwanê dawî yek we banê yek  
Ekwanê erjeng sanê Siyamek (60a, 1618)

Xiroşa be xeşm watiş ey xerîw  
Samê Siyamek wîney neşre dîw (61b, M. 1657)

#### **2.2.3.4. Nûşîrewan**

Yek ji padişahê silsila Sasaniyan e. Ereban, leqeba kîsra lê kirine. Piştî Nûşîrewan, leqeba padişahan weke kîsra dewam guheriye. Ji ber edaletperwerî û camêriya wî jê re Nûşîrewanê Adil jî hatiye gotin. Ev padişah gelek qedir daye alim û hunermendan. Li gorî hin rîwateyan Nûşîrewan welatê xwe bi edalet îdare kiriye. Weke mezmûn Nûşîrewan di edebiyata klasîk de bi edalet û camêriyê tê nasîn. Meşûq bi edaleta xwe dişibe vî padişahî (Onay, 1996: 74).

Di malika jêrîn de nîşan dide ku Hurmiz ji nesla Nûşîrewan e:

Hurmiz ce newey nesîl Newşîrwan  
Ne fermaniş bî Mekke ta Merwan (2a, M.33)

#### **2.2.3.5. Cemşîd**

Cemşîd an jî Cem yek ji padişahên efsanewî yê îranê ye. Di zimanê Sanskrît de weke yem û di Gatayên Avestayê de jî weke yîm derbas dibe. Ev peyv tê wateya xweşik û birqandinê (Yaheqî, 1386: 291). Cemşîd weke mûcîdê şerabê tê zanîn û qedeheke wî ya ji camê hebûye dema ku li vê qedehê nihêrtiye tamamî cîhanê tê de dîtiye li gorî efsaneyên Îranê. Ev qedeh bi navên weke camê cîhanara, camê cîhanbîn, camê cîhannuma jî derbas dibe.

Di edebiyata klasîk de ji unsûrên xweşikiya yarê rû û enî bi paqîjî û sipîbûna xwe bi camê Cem tê şibandin.

Cemînê cemaray camê Cem awer  
Çûn mahê mehtab xurşîdê xawer (104a, M. 1838)

Temam kerd teyar be diñewazî  
Çûn camê Cemşîd şîşey Şîrazî (69b, M. 1888)

#### 2.2.3.6. Dara

Dara ji silsila Kiyaniyan padîşahê nehemîn e. Ev silsile piştî mirina wî bidawî dibe. Weke Darayê Kebîr jî tê zanîn. Di şêrê li hemberî Îskender de tê kuştin. Ev padîşah sembola hêz û îhtîşamê ye di edebiyata klasîk de (Pala, 2004: 106).

Çûn cemcemey Cem Cemşîdê Dara  
Saniş ne Hûşeng bişeng winara (2b, M. 36)

Xezîney Xusrew rêza be sara  
Dînar û direm nemend ce Dara (121a, M. 1303)

#### 2.2.3.7. Îskender

Îskender yek ji cîhangîrê herî mezin û navdar e. Li gorî hinek rîwayetan beriya mîlada Îsa Mesîh, di navbera salên 356-323an de jiyaye. Bi leqebên weke Îskenderê Mezin û Îskenderê Meqedonî meşhûr e. Ji Yewnan hata Hindistanê gelek welatan fetih kiriye. Li devera Hewlêrê artêşa wî, ya Dara mexlûb dike. Ji bo ku qewmê Yehcûc û Mehcûc li dinyayê belav nebin Seta Îskender daye çêkirin (Pala, 2004: 236-237).

Helbestvanên klasîk di helbestên xwe de dema ku kesî ji hêla hêz û qudretê ve bipesinînin wan dişîbînin Îskender. Weke mezmûn Îskender bi gelemperî bi Cemşîd û Xizir re di edebiyata klasîk de derbas dibe.

Artêş, leşker, xezîneyên Hurmiz ji hêla hêz û pîrbûnê ve bi rêya telmîh û teşbîhê ve bi yê Îskender ve hatine şîbandin di malikên jerê de:

Sipaş çûn sipay sanê Sikender  
Xezaneş xênî ce genc û gewher (2b, M.35)

Hewa best ne taş tûşê serender  
Muleq da ne mewc şedrê Sikender (138a, M. 1361)

### 2.2.3.8. Erjeng

Navê yek ji wan dêwan e ku li çiyayê Espirozê ji aliyê Rustem ve tê kuştin. Ji aliyê Dêwê Sipî ve ji bo gencîneya Kawûs bibe teslîmê şahê Mazenderanê bike hatibû wezîfedarkirin (Yaheqî, 1386: 95).

Çûn Rexşê Rustem me' rekey Fereng

Qînê qehreman ekwanê Erjeng (61b, M. 1658)

Balê bahû berz sehî siyareng

Be ya! û kupa! ekwanê Erjeng (21b, M. 562)

### 2.2.3.9. Siyaveş

Siyaveş yek ji silsila padîşahên Kiyaniyan e. Kurê Keykavûs e. Wî ji aliyê Rustemê Zal ve telîm û terbiya rezmê (cengê) girtiye. Ev lehengê efsanewî di suwarî û bikaranîna amûrê şerî de gelek şareza bûye. Damariya Siyaveşî ku navê wê Sûdabê ye, evîndarê xortê xwe dibe û ji wî dixwaze xwe bi destê wê re berde. Siyaveş vê yekê qebûl nake Sûdabê jî li ser vê meselê tohmetan li wî dike. Ji bo ku ji binê van tohmetan bikaribe derkeve, dibê hespê xwe di nava agirekî mezin de diajo (Yaheqî, 1386: 496). Ji hêla têkiliyên navmetnanî de ev çîrok dişibe çîroka Yûsif û Zuleyxayê.

Xûnê xênîman awerdiş xireş

Coşa xiroşa xûnê Siyaveş (94b, M. 2573)

### 2.2.3.10. Ketayûn

Keça qeysê Romê, hevsera Goştasip û dayîka Isfendiyar e. Di çîroka Rustem û Isfendiyar de hatiye vegotin ku dema Ketayûn agahdar dibe kurê wê ji bo sefera Sistanê hatiye wezîfedarkirin gelek xemgîn dibe. Ketayûn dixwaze Isfendiyarî razî bike ku ev sefer bê betalkirin. Lê Isfendiyar bi teklîfa dayika xwe razî nabe. Şerek di nava wî û bavê wî de diqewime û Isfendiyar tê kuştin. Li ser vê bûyerê Ketayûn heta dawiya temenê xwe bi xem û keder dijî (Yaheqî, 1386: 664).

Serencamê se'd sewday Homayûn

Gerdabê Gerşasib karê Ketayûn (1b, M. 7)

### 2.2.3.11. Barbod û Nikîsa

Barbod li gorî hinek rîwayetan li Cehrûna Şîrazê hatiye dinyayê. Di qesra Xusrew Perwîzî de mûsîqîşînasekî mezin bûye. Wî sih meqam îcad kirine, yek ji wan meqaman jî Xusrewanî bûye. Ustadê mûsîqiyê yê din jî Nikîsa bûye. Ev herdu hunermend di warê mûsîqiyê de gelek şareza bûne (Pala, 2004: 55; Sevsevil, 1988: 470).

Barbod û Nikîsa weke di malikên jêrîn de jî hatiye diyarikirin navên van herdu ustadên mûsîqiyê bi gelemperî bi hev re derbas dibin di helbestên klasîk de:

Nikîsaw Barbod şefayê suzsaz

Sade saqîyan nemano bînaz (110a, M. 2993)

Niksîya be têx ciger pare ker

Barbodê destbîr ew aware ker (120b, M. 3286)

### 2.2.4. Mesnewiyên Evîniyê

Helbestvanên Klasîk hertim di metnên xwe de berhemên di çarçova kanonê de cih digrin weke referê bi kar tînin. Ev kevneşopî di edebiyata Rojhilat de gelek berbelav e. Referê ji bo mesnewiyên evîniyê bêtir tînin kirin. Helbestvanek wexta bixwaze ji hêla unsûrên evîniyê ve şibandinek bike bi gelemperî ya navên aşîq û me'şûk ku weke lenhengên sereke di van metnên kanonîk de derbas dibin zikir dike an jî buyereke van metnan weke telmîh nîşan dide. Di edebiyata Rojhilat de metnên weke Yûsif û Zuleyxa, Xusrew û Şêrîn, Leyla û Mecnûn, Behram û Gulendam, Humay û Humayûn, Xurşîd û Xereman, Weys û Ramîn, Bîjen û Menîjê, Ferhad û Şêrîn, Seyfu'l-Milûk û Bedî'u'l-Cemal, Méhr û Muşterî, Şem û Perwane ji aliyê helbestvanên klasîk ve hatine referêkirin. Di Edebiyata Kurdî de jî heman metn ji bo hêza mefhûma metnê bê nîşandan weke metnên referê dertên pêşberî me. Di metna xebatê de hin ji van mesnewiyên evîniyê bi rêya telmîh û teşbîhê ve hatine referêkirin.

#### 2.2.4.1. Bîjen û Menîjê

Bîjen kurê Gîv, neviyê Guderz û xwarziyê Rustem e. Menîjê keça Efrasiyabê padişahê Turanî ye. Ev çîrok di serdema Keyxusrewî de derbas dibe (Çeper, 2020: 124). Rojek Keyxusrew di dîwana xwe de rûniştîbû dibihîze ku hinek mirov li pêşiya



qesra wî fixan û feryad dikin. Keyxusrew rewşa halên van mirovan dipirse. Jê re tê gotin ku ew ji welatê Ermanê hatine û ji ber ku beraz û ajalên dirinde zirarê didin mal û heywanên wan, ji wan alîkariyê dixwazin. Ji bo alîkariyê Bîjen û Gurgîn xwe amade dikin bi hêla tixûbê Tûraniyan ve dikevin rê. Piştî Bîjen alîkariyekî mezin dide xelqê Ermanê, Gurgîn ji ber qehremanî û jêhatîbûna wî hesûdiyê dike. Li ser xwesteka Gurgîn derbasî sînorê Tûraniyan dibin, dibînin ku keça Efrasiyabî, Menîjê bi komek mirovan re bilîyê kêf û şayiyê bûne. Dema Bîjen, Menîjê dibîne evîndarê wê dibe. Efrasiyab bi vê meselê agahdar dibe û emir dide ku Bîjenî biavêjin hundirê çalê. Gurgîn piştê vê bûyerê dizivire Îranê. Giv û Keyxusrew dema dibihîzin çî qewimîye bi serê Bîjenî de gelek aciz dibin û Keyxusrew emir dike ku Gurgîn zindanî bikin. Keyxusrew li cama gîtînuma dinihêre ku Bîjen di çalê de ye. Rustem tevî gelek şervanên îranî ji bo rizgarkirina Bîjenî di şiklê taciran de diçin Tûranê. Bi alîkarî û rêbertiya Menîjê Bîjen tê xelaskirin. Menîjê bi wan re diçe Îranê û bi Bîjen re dizewice (Yaheqî, 1386: 239).

Çîroka van herdu aşiqan cara ewil di Şahnameya Ebu'l- Qasim Firdew Tûsî de derbas dibe. Pişt re Tûsî Eta bîn Ye'qûb vê çîrokê bi navê Bijennamê ji nû ve dinivîse. Berhema Eta bîn Ye'qûb hin beşên wê ji Şahnameya Firdewsî girtiye hin beşên din jî cudatiyeke zêde di navbera wan de xuya dike (Yıldırım, 2912: 408).

Di edebiyata Kurdî/Hewramî de ev çîrok bi teşeya mesnewiyê bi wezna kîteyî ji aliyê Elmas Xanê Kenûleyî ve di nava Şahnameya Kurdî de hatiye nivîsîn. Ev çîrok teqrîben ji heşt sed malikan pêk tê.

Di malika jêrîn de telmîh ji bo wundabûna Bîjenî û Keyxusrew li cama gîtînuma dinêre heye:

Behramê kêşwer Gulendamê Çîn  
Menîjey Bîjen camê cehanbîn (23a, M. 608)

Çûn Qeysê Mecnûn deyrî derbeder  
Bîjen biren çak be yedî girt ne wer (3b, M. 76)

#### 2.2.4.2. Behram û Gulendam

Padişahê welatê Romê piştî temenê wî digihîje çil salî dibe xwediyê zarokek kûrîn. Navê Behram li vî zarokî dike. Dema ku Şehzade Behram balix dibe, bavê wî

heft şîretên padîşahîtiyê lê dike ku çawa hukumdariya xwe bi rê ve bibe. Padîşah terka kar û barê dinyayê dike text û tacê xwe teslîmê Behram dike. Rojek Behram Şah li nêçîrê şerekî mezin nêçîr dike. Dû re xezalek dibîne û ji bo wê nêçîr bike dide pey wê. Xezal diçe dikeve hundirê odeyek. Dema Behram Şah li du xezalê dikeve hundir dibîne pîrek li ser text rûniştiye û bi dîwar ve wêneyek weke pût û senem xweşik daliqandiye. Pîr dibêje ku ev resmê keça fexfûrê Çînê ye û bi tenê salê carek ji qesra xwe dertê derva.

Pişti Behram derbarê Gulendamê de van tiştan ji pîr dibihîze rêya welatê Çînê digre. Behram di rê de rastî birayên çînî Seyfûr, Şumayen, Qumtar û Qeytûl tê û wan têk dibe. Dêwê bi navê Efre' dikuje û keça perîyan Rûhefzayê rizgar dike. Behram Şah, li nêzî welatê Çînê rastî şehzadeyê Bulxarî Behzad tê. Dema ku Behram agahdar dibe Behzad ji bo xwestina Gulendamê hatiye li hemberî şehzadeyê Bulxarî şerekî giran dike.

Behram rojek di şiklê derwêşê qelenderî de li hemberî qesra fexfûrê Çînê rûdinê û li qesrê temaşe dike. Gulendam fam dike ku ev şehzade ye. Gulendam ji evîndarê Behramî dibe. Ev herdu evîndar ji hev re name dişînin. Padîşahê Romê cengawerekî bi navê Şebreng dişîne cem fexfûrê Çînê bo ku Behram bizivire welatê xwe. Di wê demê de padîşahê Bulxarî ji bo tola kurê Behzad bistîne artêşekî giran dişîne bi ser Çîne de. Bi alîkariya Behram artêşa padîşahê Bulxarî tar û mar dibe. Behram, Gulendamê ji Fexfûrî dixwaze û bi kêf û şahî dizivirin Romê (Şêkergozar, 1394: 21-29).

Elmas Xanê Kenûleyî di malika jêrîn de ji bo Behram û Gulendam van herdu evîndarên navdar refere kiriye:

Bêhrûzê Behram Gulendamê Çîn

Perwazê Perwêz şefafê Şîrîn (1a, M. 6)

#### 2.2.4.3. Humay û Humayûn

Humay kurê padîşahê Şamê Menuşeng Qertasî ye, Humayûn jî keça Fexfûrê Çînê ye. Qertas bi salan dua û temena kiriye bo ku bibe xwediyê zarokê kurîn. Xwedê lê rehmê kir û ji Qertasî re kurekî çebû. Navê wî Humay danîn û teslîmê daye hatiye kirin. Humay jî weke her şehzadeyî ji bo huner rezmê perwerde dît. Wî ji gelek arif û aliman ilm tehsîl kirin. Rojek li nêçîrê kerekî kûvî derket pêşberî wî.

Humay da pey kera kûvî heta şev bi ser de hat. Humay serê sibê di nava mêrg û kulîlkan de qesreka sipî dît. Ji vê qesrê keçeka perî derket û ew dewetê hundir kir. Humay li hundirê ve qesrê wêneyê keçek dît û evîndarê wê bû. Keça perîyan ji Humayî re gote ku ev wêneyê keça Fexfûrê Çînê ye.

Dema Humay çavê xwe vekir ku li dora wî çend leşkerên bavê xwe dîtin. Ev leşker ji bo ku Humay peyda bikin hatibûn çolê li şehzadeyî digeriyan. Wan dît ku rewşa Humay gelek xirab e û ew di halekî pir perîşan de ye. Humay tiştên ku di serê wî de qewimîbûn bi tevahî ji wan re gotin.

Humay ji bo ku keça Fexfûrî peyda bike bi Behzadê kurê wezîrê Qertasî re dikeve ser rêya welatê Çînê. Behzad û Humay piştî ku gelek rê diçin rastî deryayek tîn û li wir ji aliyê çil mirovên Zengî ve dîl tîn girtin. Zengiya ew davêjin nava keştiyê. Ji nişke ve di deryayê de tufanek çêdibe û ba keştiya wan bi xwe re dibe. Dema van herdu ciwanan çavên xwe vedikin li qeraxê deryayê li ser mêrg û çîmenê ne. Hinek mirov tîn cem wan û dibêjin padîşahê me miriye li gorî kevneşopiya bajarê me yê ku ji derveyê welêt cara ewil rêya wî bi vir bikeve em wî dikin padîşah Xawer. Humay rêvebertiya vî bajarê li hêviya Behzad dihêle û bi hêla Çînê ve hespê xwe dajo. Di rê de rastê tacire Humayûn pîrê bi navê Se'dan tê. Se'dan ji Humayî re dibêje li ser rêya wan keleyek heye di wir de keça perîyan ji aliyê dêw ve dîl ketiye. Humay derbasê hundirê kelê dibe, dêw dikuje û keça perîyan ji dêwê xebîs xilas dike. Dema Humay ji keçan perîyan re evîniya xwe ya li hemberê Fexfûrê terîf dike, keça perîyan soz dide ku wan bigihîjîne hevdu.

Perîzad behsa dîlketina xwe û kuştina dêw kir ji Humayûn re û gelek pesnê Humay da. Humayun li ser van gotinên Perîzadê evîndarê Humay bû. Se'dan jî heman tişt ji Fexfûrî re gotin. Fexfûrî xwest Humay biçe huzûra wî. Dema ku Humay bi Se'dan re çû hizûra Fexfûrî, Perîzad Humay re nîşanê Humayûn da. Rojek Fexfûr diçe nêçîrê Perîzad Humay dibe cem Humayûn. Fexfûr ji vê bûyerê agahdar dibe û emir dike ku Humay zindanî bikin. Humay li ser emrê Fexfûrî diavêjin zindanê.

Qertasî jî artêşeke giran dişîne Çînê. Behzad bi artêşa Çînê re şer dike û Fexfûr tê kuştin. Humay ji zindanê derdixin. Humay bi Humayûn re dizewice û dibe padîşahê Çînê. Humay piştî demekê Perîzad li kurê wezîrê Çînê Ferînuş mehr dike. Ferînuş dibe padîşahê Çînê, Humay û Humayûn jî dizivirin welatê Şamê. Ji bo vê çîrokê li mesnewiya Humay û Humayûna Xaceyê Kêrmanî binihêrin (m. 753).

Malikên ji bo çîroka Humay û Humayûn hatine referekirin li jêr hatine nîşandan:

Serencamê se'd sewday Homayûn  
Gerdabê Gerşasib karê Ketayûn (1b, M. 7)

Homîlay çîlgîs se'dê Homayûn  
Ya canî Belqîs karê Ketayûn (23a, M. 607)

#### 2.2.4.4. Seyfu'l-Milûk û Bedî'u'l-Cemal

Di serdema Silêman Pêxember de li Misrê padişahêkî bi navê Asim Ibnê Sefwan hebû. Xwediyê edalet û merhemetê bûye. Temenê wî gihiştîye sed û heştê salî warisekî ku jê re mal û milkê xwe bihêle tune bûye. Ibnê Sefwan jî ji ber vê rewşê gelek xemgîn bûye. Tac û textê xwe terk dike dikeve xelwetê, zîkr û îbadet dike çil rojê wî tamam dibe ji xeybê dengê dibihîse ku ew ê bibe xwediyê ewladê kûrîn. Ibnê Sefwan gelek şa dibe, emir dike ku li feqîran xwarin belav bikin, tesedîq bidin bêkesan. Munecim û arif dicivin li remlê dinêrin ji bo bextê wî, qerar didin ku ew ê bi keça Qehtan şahê Yemenê re bizewice û bibe xwediyê warisek. Wezîrê wî Salih tedarek dikin, bi zêr û perûyên giranbiha diçin Yemenê û keça Qehtan dixwazin û ew ji bo Ibnê Sefwan tînin. Wezîr Salih jî zarokek wî tunebûye. Ew jî ew şev dizewice. Ibnê Sefwan û Salih herdu bi hev re dibin xwediyê ewlad bi merasîm li kurê padişahî Seyfu'l-Milûk yê wezîrî Se 'du'l-Milûk nav datînin. Dibin heft salî herdu bi hev re diçin mektebê û ji seydayê xwe serf û nehv, satranc, tewra, zebûr û gelek îlman hîn dibin. Dema ku dibin çardeh salî bi merasîmek mezin cil û berg li wan dikin. Piştî kêf û şahiyê Ibnê Sefwan perûyên ku qasidên silêman Pêxember jê re anîbûn dan Seyfî. Hemû kes ji bo îstirhetê derbasê aliyê xwe bûn. Seyf ew sindoq vekir li perûyan nihêrt û di nav wan perûyan de, li ser qumaşekî neqîşkirî sûretek dibîne û aşîqê wê dibe. Se'd dema ku şiyar dibe halê Seyf xirab e. Xeber nade û bi tenê digirî. Wexta Ibnê Sefwanî ev xeber distîne gelek xemgîn dibe. Xeber didin tamamî hekîm û arifan ji bo çare ji Seyfî re peyda bikin.

Di dawî de têdigihîjin ku Seyf evîndarê keça periya bûye. Ibnê Sefwan bêçare dimîne di dawî de destûr dide ku Seyf li vê keça periyan bigere. Seyf li gel Se'd û tevî gelek xulam û xizmetkaran bi aliyê Çînê ve diçin. Bi keştîyê diçin Çînê Fexfûrê Çînê gelek ezet û îkram dike ji wan re. Ji bo Seyf bigihîje mirazê xwe emir dike ku

remalê navdar Dehqan li remlê binêre. Wî li remlê nihêrî lê xeberek neda derbarê Baxê Iremê de. Ji Çînê derketin çil roj û çil şev di deryayê de çûn ji nişkeve de bayek rabû keştî xerq bû û kesên tê de mirin. Seyfî, Se'd winda kir. Seyf li giravek rastî Zengiya tê û dîl dikeve. Ew dibin ba şahê Zengiyan. Keça şahê Zengî dil dikeve Seyfî. Keça şah gelek elewat û nexweşik bû. Ji bo ku Seyfî ew naxwaze, bi şehzade karên giran didin kirin. Rojek sebr û tehemula şehzade namîne û bi aliyê deryayê ve diçe, dibîne keştiyek ji giravê radibe, ba dide, dikeve keştiyê û ji Zengiyan xilas dibe. Demek çûn rastê giraveke din hatin li wir gelek fêkî û mêmên xweş dibînin. Ev girav jî girava ku Sekseran lê dijiyan bû. Ew birin huzûra şahê wan, demek li wir man lê ji wir jî ew herdu heval reviyar dîsa rêwîtiya behrê dest pê kir. Gihiştin giraveke ku xaka wê zû gewher dibû. Ji nişkeva teyrekî wekî şêr hat van hevalan hilanî û ew perçe kirin û dan têtjikên xwe. Şehzade ev tişt dît. Ew şev li ser darê raza. Dema şiyar bû ji dûr ve qesrek dît û bi aliyê qesrê ve çû. Qesreke mezin ya çil derî û çil pencereyî bû. Li nava qesrê keçek dibîne û çîrokên xwe ji serî heta dawiyê ji hev re dibêjin. Ev keça şahê Serendîbê Melke Xatûn bû ku kurê şahê Qulzemê ew dîl girtibû li qesra xwe. Melke Xatûn ji bo şehzadeyê Baxê Iremê terîf kir. Got ku ew Bedî'a ba-Cemal keça Şahbal şahê periyar dinase. Şahzade Melke Xatûn xilas dike û ew dibe cem apê wê Tacu'l-Milûk. Di dawiyê de wî û keça Şahbal digihijine hev. Şahê Qulzemê ji bo ku şehzade kurê wî dikuje şehzade direvîne davêje zindanê. Şahbal bi vê yekê dihese û li gel şahê qulzemê şer dikin û şehzade xilas dikin. Şehzade û Bedî'a ba-Cemal dizewicin. Seyf li Serendîbê Se'd peyda dike ew jî bi Melke Xatûn re dizewice û tedarekên xwe dikin dizivirin Misrê. Ji bo vê çîrokê binêrin li mesnewiya Seyfu'l-Milûk û Bedî'u'l-Cemala Siyahpoş (Siyahpoş, 2011: 9-266).

Ya Seyfu'l-Milûk Bedî'u'l-Cemal

Ferqey Fereydûn şikufê şehbal (23a, M. 606)

Şeyfu'l-Milûk Bedî'u'l-Cemal

Heway Homîla şikufê Şehbal (1, M. 5)

#### 2.2.4.5. Leyl û Mecnûn

Mecnûn, şa'irê navdar yê ereban Qeysê Amirî ye û Leyl jî keça Se'd bîn Amir e ku weke keça apê Qeysî derbas dibe di hinek rîwayetan de (Şemîsa, 1385: 573). Zarokên qebîla benî Amir Qeys û Leyl dema zarok in bi hev re diçin medreseyê. Di temenekî biçûk de ev herdu ciwan evîndarê hev dibin. Dema evîniya wan di nava qebîlê de belav dibe dayîka Leyl ji bo Leyl û Qeys hev nebînîn wê ji malê dernaxe. Qeys ji ber ku Leylî nabîne gelek xemgîn dibe û eqlê xwe wunda dike. Bavê Qeysî her çiqas Leylî ji bavê wê bixwaze jî bavê wê muxalifê zewaca wan e û Leylî nade Qeysî. Li ser vê bûyerê Qeys bi çol û pesaran dikeve û jê re mecnûn yanî dîn tê gotin. Piştî wextekî dînîtiya Qeysî belav dibe. Ji bo Qeys şîfayê bibîne bavê wî dibe ziyareta Ke'beyê lê kurê wî baş nabe.

Newfel ku yek ji mezinên ereban e di wê serdemê de dema rewşa Qeysî dibîze ji bo Qeysî, Leylî ji bavê wê dixwaze. Bavê Leylî dîsa vê zewacê qebûl nake. Li ser muxalifbûna bavê Leylî, Newfel bi leşkerên xwe re li dijî qebîla Leylî şer dike. Dema Mecnûn vî şerî dibihîze ji bo malbata Leylî zirar nebîne dua dike. Artêşa Newfel cara ewil têk diçe. Newfel dîsa şer dike li hemberê wan û qebîla Leylî têk diçe. Ji ber ku Newfel agahdar dibe ku Mecnûn dua kiriye artêşa wî têk here Leylî ji bo Mecnûn nabe. Malbata Leylî wê didin ibnê Selamî. Ev herdu evîndar di dawî de nagihîjin mirazê xwe û dimirin (Pala, 2004: 288).

Leyl û Mecnûn beriya ku bi teşeya mesnewiyê bê nivîsîn di nava ereban de weke çîrokek evîniyê ya gelêrî dihate zanîn. Cara yekemîn di edebiyata faris de Nîzamiyê Gencewî ev çîrok di forma mesnewiyê de derbasê nezmê kiriye. Xanay Qubadî bi navê Leyl û Mecnûn, Mîrza Şefîê Kulyayî bi navê Newfel û Mecnûn nivîsîne di zaravayê Kurdî/ Hewramî de (Gocerî, 1380: 5). Harisê Bedlîsî jî cara yekemîn di sedsala XVIII. de ev çîrok bi terzê mesnewiyê nivîsiye di edebiyata Kurdî /Kurmancî de (Adak, 2014: 289).

Di malikên jêrîn de ji bo mesnewiya Leyl û Mecnûnê refere hatine kirin:

Fire kes çûn to xem derûn xeylê

Nedarî xeber Mecnûn û Leylê (23a, m. 605)

Çûn Qeysê Mecnûn wêlî bî ne wadî

Be şîn û şîwen zilmê ziyadî (28a, M. 748)

#### 2.2.4.6. Yûsif û Zuleyxa

Ev çîrok bingeha xwe ji Qur'anê digire. Di sûreya Yûsif de bi sed û yanzdeh ayetan behsa vê çîrokê dike. Navê Zuleyxayê her çiqas rasterast di Qur'anê de derbas nebe jî ji tarix û metnên dînî yên din îşaret ji bo navê wê tene kirin. Ev çîrok di Qur'ana pîroz de weke Qissasû'l- Ehsen derbas dibe yanê çîroka herî xweş.

Yûsif di zaroktiya xwe de dibine ku yanzdeh sitêrk, hîv û roj jê re secde dikin. Dema Yûsif ji xew şiyar dibe xewa xwe ji bavê xwe Ye'qûb Pêxember re dibêje. Bavê wî jê re tenbîh dike ku xewa xwe ji birayên xwe re nebêje.

Ji ber ku Ye'qûb Pêxember ji Yûsif zêde hez dikir birayên wî hesûdiyê jê dikirin. Rojek birayên wî xwestin Yûsif bi xwe re bibin nêçîrê. Li nêçîrê biryar dan û Yûsif avêtin binê bîrê. Birayên Yûsif dema dizivirin malê kirasê wî yê bixwîn nîşanê bavê xwe didin û dibêjin gurekî Yusif xwariye. Ye'qûb Pêxember ji ber girînê çavên wî kor dibin.

Pişt re karwanek tê û Yûsif ji bîrê derdixin bi xwe re dibin Misrê. Li sûka bendeyan Yûsif ji aliyê ezîzê Misrê ve weke bende tê stendin. Yûsif sedema bedewiya xwe bala Zuleyxayê dikişîne. Zuleyxa evîndarê Yusifi dibe. Yûsif vê evîna Zuleyxayê qebûl nake û li gorî daxwazên wê tevnagere Zuleyxa tomet diavêje ser wî. Ezîz jî ji vê bûyerê agahdar dibe û Yûsif diavêje zindanê.

Yûsif heft sal di zindanê de dimîne. Xwedê, ilma şîroveya xewnan beşî Yûsifi dike. Hukumdarê Misrê xew dibine ku heft çêlekên qels, heft çêlekên xurt diqurtînin. Dema Yusif vê xewê bi awayekî rast şîrove dike bi emre hukumdêr Yûsif ji zindanê derdixin. Xela çêdibe û birayên Yûsifi ji bo genim tên Misrê. Yûsif birayên xwe nas dike. Xebera Yûsifi ji Ye'qûb Pêxember re diçe. Çavê wî baş dibin bi kirasê Yûsifi. Di dawiya çîrokê de Yûsif û Zulayxa dizewicin (Pala, 2004: 484).

Di edebiyata Kurdî/ Kurmancî de ev çîrok ji aliyê Selîmî ve di sala 1754an de bi terzê mesnewiyê hatiye nivîsîn (Adak, 2014: 284). Dîsa ev çîrok di sedsala XVIII. De ji aliyê Xanay Qubadî ve bi zaravayê Hewramî hatiye nivîsîn (Xeyat, 2017: 104). Di helbesta klasîk de bi gelemperî weke mezmûn Ye'qûb Pêxember, Ken'an, çal, gur, Zuleyxa, Misir, pîrehan, kulbeya ehzanê bi hev re derbas dibin. Ev yek jî bi rêya telmihê îşaretê vê mesnewiyê tê kirin.

Malikên ji bo refereya mesnewiya Yûsif û Zuleyxayê li jêrê hatine diyarkirin:

Çûn Yûsifê Mêsr Zilêxay Ken'an  
Beter ce tersa be rozê Şe'nan (31a, M. 830)

Çûn Ye'qûb ce boy Yûsif ce memat  
Rûşen kerd zemîr 'eyniş ce zûlmat (55b, 1503)

Şîrîn niga kerd be şewqê Ferhad  
Sewday Zilêxa awerdiş be yad (26b, M. 706)

### 2.2.5. Mekan (Cih)

#### 2.2.5.1. Ermen

Di çîrokê de mekanê herî zêde çîrok lê derbas dibe ev der e. Û di heman demê de welatê Şêrînê ye Ermen. Dema ku navbera Hurmîz û kurê wî Xusrew xirab dibe, Xusrew li vî bajarî ji aliyê Mehîm Banûyê ve weke mêvan tê qebûl kirin. Xusrew û Şêrîn, wexta xwe bi piranî li bajarê Ermenê bi hev re derbas dikin.

Ew cefa ke min ne ray ew berdim  
Ce muşkê Ermen to peyda kerdim (35b, M. 957)

Şîrîn pey westan hey kerd we Şewdêz  
Xusrew pey Ermen merkeb da mehmêz (11b, M. 299)

#### 2.2.5.2. Medayin

Medayin bajarekî kevn û dîrokî ye. Ev mekanê dîrokî 26 kîlometre dûrî bajarê Bexda yê û li herdu qeraxên çemê Dîcleyê hatiye avakirin. Di serdema Eşkanîyan û Samanîyan de ev cih weke payîtextê sermiyanî derbas dibe. Ji ber ku her padîşahêkî Îranî taxek li vî bajarî zêde kirine Ereban jê re Madayin gotiye. Ev peyv di erebî de pîrjimara peyva medînê ye. Taqê Kîsra û xerabeyên Nûşîrewan li vî bajarî ne.

Ame ne mehaļ muşkê Medayin  
Pesend kerd feras be şewqê ayin (4b, M. 91)

#### 2.2.5.3. Bêsîtûn

Ev çiya teqrîben sih kîlometre li rojhelatê de vera Kêrmanşanê cih digire. Ferhad bi emrê Xusrew Perwîz, li vî mekanî ji bo şîr bîne qesra Şêrînê cuhek



dikole(Pala, 2004: 73). Ferhad, dema xwe bi kolana cuhê re li vir derbas dike. Pîrezal xebera mirina Şêrînê li vir dide Ferhadî.

Aro ne say seng pay Bîsitûn ko  
Ne min mamanûn ne aşarê to (81b, M. 2217)

Bew zurê bazûy bewrê bêderîx  
Berdê Bîsitûn awerdiş ce bêx (49b, M. 1328)

#### 2.2.5.4. Qesrê Şêrîn

Yek ji mekanê tarîxî yê Îranê ye. Mekanên tarîxî yên vî bajarî nisbetî serdema Xusrew Perwêzî tên kirin. Xusrew Perwêz ji bo evîndara xwe Şêrînê li vî bajarî qesrek ava dike piştî avakirina vê qesrê jê re Qesra Şêrînê tê gotin (Sultanî, 1370: 43). Ev bajar li başûrê Kermansahê û nêzîkê Besrayê ye. Hewaya wê gelek germ e. Ji ber vê yekê zivistanan Şêrîn dema xwe li vir derbas kiriye. Ev yek di malika jêrîn de wuha derbas dibe.

Megêla dayim ne dewrê dîrîn  
Zimistan mekan ne Qesrê Şîrîn (24a, M. 638)

#### 2.2.5.5. Taqê Bostan

Ji serdema Sasaniyan, heta niha cihê kêf û seyranê ye. Ev mekan li bakurê rojhelatê Kermansahê ye û li rojavayê Îranê cih digire. Xusrew û Şêrîn li vê derê di halê kêf û seyranê de bûn. Di kurdî de weke Taqê Westan derbas dibe. Di vê metna xebatê de weke taqê westan û di piraniya cihan de wekwestan derbas dibe.

Xusrew çenî xar nîşê sermestan  
Mend be sergerdan ne Taqê Westan (4b, M. 99)

Xêza ce Westan şeydayê şînşen  
Suwar bî we zîn her girînişen (10b, M. 67)

#### 2.2.5.6. Stenbol, Mekke

Navê van herdu bajaran weke mekanên eslî derbas nabin di metnê de. Dema Xusrew, Behram digire û dukuje di malikên jêrê de tixûbê hukumraniya Xusrewî nîşan dide. Ev tixûb ji Stenbolê, Mekke, Şam û heta Misrê fireh dibe.

Behram gêrt we kuşt sipaş da şikest

Ne serhedan da yek şed sinûr best (17b, M. 462)

Ta be Îstenbul Mekke Misr û Şam

Awerdiş be zebt dinya hen tamam (17b, M. 463)

Di malika jêrê de jî nîşan dide ku gelek welat di bin desthelatdariya Hurmizî de bûne. Ji Mekkê heta Merwanê hukmê wî derbas dibû.

Hurmiz ce newey nesîl Newşîrwan

Ne fermaniş bî Mekke ta Merwan (2a, M. 33)

### **2.2.5.7. Îran, Tûran, Hind, Sind, Belx û Buxara**

Ev bajar jî weke mekanên eslî û cihên bûyeran nînin. Piştî Xusrew bi keça Qeyserê Romê Meryemê re dizewice qada desthelatdariya wî gelek fireh dibe. Ji bo ku hêza padîşahtiya Xusrewî bê diyarkirin ji welatê Çînê heta Ewrûpa gelek dever di bin hukumraniya wî de hatiye nîşandayîn. Di malikên jêrê de navê van bajaran hatine zikirkirin:

Rûmatê Fereng Xeça û Xoçen

Îran û Tûran Erman û Ermen (18a, M. 475)

Hind û Send tamam ta Çîn û Maçîn

Belx û Boxara saraw serzemîn (18a, M. 476)

Amaş be ferman şahan gişt tamam

Heleb ta Hebeş Zengiwar û Şam (18b, M. 477)

### **2.2.6. Zeman (Dem)**

Di mesnewiya Xusrew û Şerînê de demeka diyar cih nagire. Dem weke sibe, roj, êvar, zivistan, havîn, şeveqa sibê derbas dibin. Li gorî lehengên tarîxî weke Xusrew Perwîz mirov dikare bibêje ev bûyer di sedsala VII. de derbas bûye.

Rojan geşt û gêl çenî weşşiyar

Teŷirasa xerîb şew bê aşiyar (37b, M. 1008)

Megêla dayim ne dewrê dîrîn

Zimistan mekane Qeşrê Şîrîn (24a, M. 638)

# BEŞA SÊYEM

## 3. Taybetmendiye Zimên

### 3.1. Guhertina dengan

Guhertina dengan buyereke xwezayî ye. Ev guhertin bi piranî di navbera zimanên ku ji malbatekî, zaravayên zimanekî û devokên zaravayeke de ne pêk tên. Di vê beşê de li gorî metna berdestê me van guhertinan wê bên nirxandin. Zaravayê Hewramî wê bi Kurmancî re bê berawirdkirin ji hêla guhertina dengan ve.

#### 3.1.1. Guhertina Tîpên Dengdêr (Vowel)

##### 3.1.1.1. a/e

Dengên “a” û “e” di Kurmancî û Hewramî de bi hevdu tên guhertin. Carna di Hewramî de weke “a” û di Kurmancî de jî “e” hatiye tercîh kirin carna jî beravêjîyê vê yekê guhertin çêbûye. Di Hewramî de peyva çav weke çem derbas dibe an jî xew û sipartin weke xaw û siperden tên bikaranîn.

Çem/çav, xaw/xew, siperden/sipartin, çenî/çawa, wastey/ xwestin

Ji bo guhertina van herdu dengan ji metna xebatê li jêrê mînak hatiye nîşandan:

Min to dîm be çem zêndey zîbê zîc

Henî mewtê merg merdê min be hîç (88b, M. 1399)

Bêdar ber ce xaw fiday xawit bam

Fiday kokenî kuhê kawit bam (90a, M. 2243)

Rengîn kerûn şaf cerengê biro

Nîga bidarûn xastey ce Xusro (114a, M. 3100)

##### 3.1.1.2. i/û

Guhertina van herdu dengan di kişana lêkerê de li gorî şexsê duyem û pirjimar di Hewramî de weke “-ûn” derbas dibe lê ev yek di Kurmancî de “-in” e. Bizanûn/ bizanin, biwînûn/bibînin, mewaçûn/dibêjin.

Di malikên jêrê de ji bo vê guhertinê mînak hatine diyarkirin.

Belkêm bizanûn halê hewalî  
Yam ce rawiyan yam ce delalî (6b, M. 155)

Belê yeh herfê mewaçûn penet  
Bêca newaçûn goş der we benet (44a, M. 1284)

### 3.1.1.3. ê/i

Ev guhertin di hinek lêkeran de hatiye tespîtîkirin. Dengê “ê”yê di Kurmancî de bi taybetî di lêkeran de weke “î”yê derbas dibe. Lêkerên weke gêrtey/girtin û kêşay/kişandin di metna xebatê de ji bo vê guhertinê mînak in.

Gêrtenim ne doş diîdarê dêrîn  
Ta biyawinûş be Qeşrê Şîrîn (63a, M. 1709)

Ye watiş Ferhad kêşa ahe serd  
Bey qebzey qoleng kelleş bibî gerd (83a, M. 2266)

### 3.1.1.4. e/i

Van herdu dangan di peyvên weke jin/jen, kinaçe, keçji/ce, bi/be, kird/kerd, birin/berden, merd/ mir, ters/tirs, pers/pirs qoleng, kuling, şekest/şikest bi aweyeke zelal xuya dike. Dengê “î”yê di Hewramî de weke “e” derbas dibe. Di qertafa cînavkên kesane ya şexsê sêyem ya pirjimar de jî ev guhertin hatiye tespîtîkirin. Qertafa “-in” di Hewramî de di forma “-en”ê de ye. Koren/ kor in

Di mînakên jêr de ev yek hatiye diyarkirin.  
Berdên mercê min tamam kerden kar  
Şîrîn mebero be şert û êqrar (75b, M.2041)

Bednamî mebo pey min pişt be pişt  
Xusrew pey jenê Ferhadê Çîn koşt (75b, M. 2050)

### 3.1.1.5. ê/e

Dengê “ê” û “e” di zaravayê Hewramî û Kurmancî de guhertina wan hatiye tespîtîkirin. Di hinek peyv û cînavka vegerokê de dengê “e”yê di Hewramî de weke dengê “ê”yê hatiye pejirandin weke gêliya/geriya, geşt û gêliya/ geş û geriya.

Cînavka vegerok xwe/wê di hewramî de li gorî tamamî cînavkên kesane bi vî şeklî tê kişandin: wêm, wêt, wêş, wêman, wêtan, wêşan.

Ji bo vê guhertina van herdu dengên mînak li jêrê hatine dayîn:

Qoleng çûn şineft ce Ferhad xeber

Gêliya ce reng siya çûn zixer (47b, M. 1278)

Waçan bednamîm her yek be faşê

Banû wêş baxtî be sengtiraşê (32a, M. 858)

### 3.1.1.6. e/î

Di peyvên weke Emşew/işev, emcar de ev guhertinê tê dîtîn. Di Kurmancî de dengê “m”yê ketiye û dengê “e”yê yê kurt guheriyê bûye “î”. Tîpên bêdeng weke “ş” û “j”yê li biriya wan bi dengên weke “e” û “i” re bilêvkirina wan dijwar e. Ev jî bûye sedem ku dengê dirêj “î” were tercîh kirin.

Ji bo vê guhertinê di herdu malikên jêrîn de mînak hatine dayîn:

Emcar bo be seyr Şîrînê Ermen

Diya be cesyey Ferhadê koken (65a, M. 1761)

Żewqê zînetî xuş xiyalîmen

Emşew be mêhman kemerlaşîmen (124a, M. 3384)

### 3.1.1.7. î/û

Ev herdu deng guhertina wan bi taybetî di lêkera bûyînê de dertê pêşberî me. Di Hewramî de ev deng di heman peyvan de weke dengê “û”yê derbas dibe. Mînakên weke şî/çû, bî/bû vê mijarê di warê guhertinê de zelal dike.

Ferhad ce zarî diş şî ce hoşîş

Reng dadayê pîr yawa be goşîş (79a, M. 2142)

Şehîd bî şekest ce şîne şeyda

Bejn û beden çak cemîn elweda (81a, M. 2194)

Di tabloya jêrîn de guhertina dengdêran hatiye diyarkirin:

Guhertina Dengdêran	Hewramî	Kurmancî
a/e	Çem, xaw, siperden, çenî, wastey	Çav, xew, sipartin, çawa, xwestin
ê/i	Gêrtey, kêşay	Girtin, kişandin
i/û	Bizanûn, mewaçûn	Bizandin, dibêjin
e/i	jen, be, kerd, berden, merd, ters, pers, qoleng, şekest	Jin, bi, kir, birin, mir, tirs, quling, şikest
ê/e	gêliya, wê	geriya, xwe
e/î	Emşew, emcar	Îşev, îjar
î/û	şî, bî	çû, bû

### 3.1.2. Guhertina Tîpên Dengdar (Consonant)

Bi gelemperî di hinek peyvên de dengên ku cihê derketina wan û bilêvkirina wan nêzî hev in bi hevdu diguherin. Ev cure guherîn di gelek zimanên de pêk tê (Malmîsanîj, 2013: 19). Dengên lêvî weke p, b, m, v, w û yê diranî weke ç, d, j, t, n, s, ş, z bi hêsaniyê di navbera wan de guhertin çêdibe (Senendecî, 1394: 11).

#### 3.1.2.1. w/b

Ev herdu deng li gor cihê derketina wan di nava dengên dulêvî de ne. (Senendecî, 1394: 17). Di zarava û devokên Kurdî de guhertina van herdu dengên gelek zêde ye (Aslanoğlu, 2019: 17). Di zaravayê Kurmancî de peyvên ku bi ‘b’ yê dest pê dikin û bidawî dibin di Hewramî de bi gelemperî weke ‘w’ derbas dibin. Di metna Xusrew û Şêrînê de gelek mînak hene ji bo ev cure guhertinê. Waran/baran, wehar/bihar, xiraw/xirab, cewaw/cewab, biwînûn/bibînin, edew/edeb, kebab/kewaw, wîney bulbul, bîna bilbil, taqê westan, waç/bêj. Ji bo guhertina van herdu dengên, mînakên ku ji metna xebatê hatine girtin li jêrê hatine dayîn:

Watin be Xosrew çêş waçim be to

Mayey fesaden maceray bêşo

(19b, M. 518)

Zerrey ce rêzey pir şengê xaran  
Çûn feşlê go! geşt wadey weharan (54a, M. 1551)

Perî kiyanan pey şehriaran  
Birêzûn esrîn çûn seylê waran (28b, M. 752)

Niyen lazimim zerî û genc û ma!  
Menzûrim êden biwînûn cema! (35a, M. 944)

### 3.1.2.2. h/k

Guhertina van herdu dangan di xebata metnê de li cihê hatiye tespît kirin. Wek mînak peyva hane/kanî ji bo guhertina van dangan di malika jêrîn de hatine diyarkirin.

Hane westan ra çûn şew çiray şew  
Be herem seray kiyanê Xusrew (23b, M. 615)

### 3.1.2.3. l/r

Dengê “l”yê dengê awazdar e û bi alîkariya pêşiya zimên tê derbirin, dengê “r”yê jî dengê lerokî nîne tenê di naverast û dawîya peyvan de tê bikaranîn (Kurdo, 2013: 50). Dengê “l û r” yê ku qelew in di zaravayê Kurmancî de gelek caran cih diguherînin her wekî di bêjeyên girovir/gilovar, bilûlvan/bilûrvan, şalûl/şalûrê de hatiye diyarkirin (Amêdî, 2012: 72). Ev herdu deng di zarava û devokên Kurdî de, di dawî û nava peyvan de bi hev tînguhertin. Peyvên weke gêliya/geriya, geşt û gêl/geşt û ger, sewl/serw, kejbela/kerbela di metnê de derbas dibin. Di Hewramî de bi piranî dengê “l”yê di Kurmancî de di forma “r”yê de ne.

Ji bo guhertina van dangan di malikên jêrîn de mînak hatine dayîn:

Be nîşê naxûn xalan ciya kerd  
Be şîn û şîwen wêş kejbela kerd (65a, M. 1762)

Rojan geşt û gêl çenî weşşiyar  
Teyirasa xerîb şew bê aşiyar (37b, M. 1008)

Be bejn û balay kiyanî kemer  
Çûn sewlê sayey nûcemey ney şeker (33b, M. 905)

#### 3.1.1.4. t/d

Ev herdu deng li gorî derketina cihê xwe dikevin nava koma tîpên lêvî û diranî û ji ber vê yekê bi hev guhertina wan bi hêsanî çêdibe (Senendeci, 1394: 15). Di Hewramî de peyvên ku bi tîpa “d” bidawî dibin di Kurmancî de ev tîp an ketiyê an jî guheriyê bûye “t”. Ji bo guhertina van dengan siperdîn/sipartin, qedkirin/qetkiran. Weke mînak ji metna xebatê, me li jêrê ev diyar kirine.

Xaqan ferzendiş be min siperden

Min be cay umîd ê ‘tîbar kerdên (40b, M. 1093)

Perî peykeran perîzadey Çîn

Qed qed qed kerdên zolfanê çînçîn (93b, M. 2543)

#### 3.1.2.5. w/xw

Peyvên ku di Kurmancî de bi dengê diftongê “xw” destpê dikin bi gelemperî di Hewramî de bi dengê “w”yê tîp bilêvkirin. Di Kurmancî de diftong dengêkî wisa bi hêz e ku carnan li ser peyvên biyanî yê bi tîpa “x”yê destpê dikin jî bandorê dihêle (Bedîrxan û Lescot, 2009: 20). Peyvên weş/xweş, wast/xwest, wend/xwend, xorak/xwarin. Ji bo guhertina van herdu dengan bibe mînak, ji metna xebatê li jêrê ev hersê malik hatine dayîn:

Xezêney Xosrew lêtan beş kerû

Hemîn diî ce şewq Şîrîn weş kerû (98b, M. 2667)

Rojan bê xorak şewan we bê xaw

Guşiş da be deng naşey tafê aw (4b, M. 100)

Elxennas be fend fitney min benden

Şeytan dersê ‘êlm we lay min wenden (74b, M. 2020)

#### 3.1.2.6. z/j

Di metna ber destê me de guhertina van herdu dengan di peyva merêzu de hatiye tesbîtkirin. Lêkera rêtinê koka wê ya dema niha di Hewramî de “rêz” e, di Kurmancî de jî “rêj”.



Merêzu dîdeş xûnabê esrîn

Kafir mekerû be haîlê Şîrîn

(116a, M. 3152)

### 3.1.2.7. c/j

Guhertina dengê “c” û “j”yê di daçeka Kurmancî ya “ji”yê de em tê derdixin ku ev deng di zaravaya Hewramî de “c” ye. Ji bo ev cure guhertinê jî ji metnê di malika jêrîn de mînakek hatiye nîşandan.

Watiş be Şîrîn nenîşî be şad

Xeber nedarî ce haîlê Ferhad

(85b, M. 2328)

### 3.1.2.8. m/v

Dengê “m” lêvî û ezmandevî ye, dengê “v” jî li gorî cihê derketinê lêvî ye. Ev herdu deng jî bilêvkirina wan nêzikê hev in. Ev yek jî ji bo guhertina wan hêsaniyê çêdike (Amêdî, 2012: 64). Bi piranî “m” ya Hewramî di Kurmancî de wek “v” derbas dibe. Peyvên weke zimistan/zivistan, dem/dev, gam/gav, zama/zava, nam/nav, çem/çav, nîm/nîw ji bo guhertina van herdu dengdaran mînak in.

Kes nebê kero dermaniş ce derd

Birêzuş ne dem qetrey awê serd

(85a, M. 2317)

Çem ra be hem da be dîdey nemnak

Giyaniş teslîm kerd be Yezdanê pak

(89a, M. 2483)

Zehr awerd be nîş çûn marê kejdor

Qewsê zimistan be wêney zoqim

(99b, M. 2704)

### 3.1.2.9. w /m

Dengê “w” û “m”yê li gorî bilêvkîrîna xwe di nav dengdarên dulêvî de cih digirin (Senendecî, 1394: 15). Peyva ziwan/ziman ji bo guhertina van herdu dengdaran weke mînak hatiye diyarkirin.

Medhoşen ce hoş nedaro ziwan

Ne mergê mewten bêdengê diwan

(107b, M.2935)

### 3.2.1.10. w/v

Ev herdu deng ji aliyê bilêvkirinê ve nêzikê hev in. Di zarava û devokên Kurdî de di gelek peyvan de ev herdu deng bi hevdu diguherin (Senendecî, 1394: 19). Bi piranî di dawiyê de û di nava peyvan de cih digirin. Ev deng di zaravayê Hewramî de wek “w”, di Kurmancî de jî di forma “v”yê de derbas dibe. Peyvên weke aw/av, niwîs/ nivîs, emşew/işev, baw/bav, şew/şev, xaw/xew ji bo vê guhertinê mînak in.

Hinek malikên ku ev cure guhertinê di xwe de dihewînin li jêrê hatine nîşandayîn.

Êware Şêrîn ama ce şîkar

Yawa be yatax yagey çeşmsar (7a, M. 165)

Ferhad şineftîş ce watey Şêrîn

Dîdeş dêwiya ce awê esrîn (27a, M. 713)

Be hîç reng nebî ragey ruşin roş

Ûeyr ce qeşr qetî qeşaşê bawoş (96b, M. 2652)

Şêrîn cew beter be weswasê rew

Sifteyê suznak be roz û be şew (27b, M. 750)

### 3.1.2.11.h/g

Di peyva “ahir”ê de ev guhertin hatiye tespîtîkirin. Peyva agir di Kurmancî de bi dengê “g”yê, heman peyv di Hewramî de bi denge “h”yê tê bilêvkirin. Mînaka guhertina “h” û “g”yê bi mînakek di malika jêrîn de hatiye diyarkirin.

Ahir ce kûrey cergiş mexêzo

Qeqnes ce qirçey cergiş megrêzo (21b, M. 585)

### 3.1.2.12. p/b

Ev herdu deng di koma dengdarên lêvî de cih digirin. Ji bo ku cihê derketin û bilêvkirina wan nêzikê hevdu ye, di nav wan de guhertin çêdibe. Di metna ber destê me de ev cure guhertin bi tenê di cihekî de derbas dibe. Me ev guherîn di peyva belg/pelê de tespît kiriye. Mînak di malika jêrîn de hatiye dayîn:

Qeṭrey qeṭranî abê eceḷnoş

Ne rûy belgê diḷ xosrew meda coş (101b, M. 2763)

### 3.1.2.13. ç/j

Ev herdu deng li gorî cihê derketina xwe di heman komê de cih digirin. Di hinek peyvên mînak de peyva “ç”yê di heman wateya xwe ya Hewramî de wek “j” di zaravayê Kurmancî de cih digire. Ev cure guherîn hem di nava peyvan de hem jî di dawiya wan de pêk tê. Peyvên weke ewîç/ew jî, mewaçûn/dibêjin, menîç/min jî mînakên ber dest in ji bo guhertina dengên “ç” û “j”yê.

Di malikên jêr de ev guhertin hatiye diyarkirin:

Herfê mewaçûn mekere sitêz

Bena be xatîr mezarê Perwêz (119a, M. 3239)

Ew berdî Ferhad ce mînet haştî

Ewîç ce bextim rewa nedaştî (80b, M. 2189)

Ce qetlê Xosrew minîç xuşhalîm

Xaş karî kerdî qezat we maḷîm (120b, M. 3277)

Bi tabloyek guhertina dengdaran li jêrê hatiye diyarkirin:

	Hewramî	Kurmancî
w/b	Waran, wihar, xiraw, cewaw, biwînûn, kewaw, wîne, westan, waç	Baran, bihar, xirab, cewab, bibînin, kebab, bibînin, bîna, bostan, bêj
h/k	hane	kanî
l/r	sewl, Kelbela, gêliya	serw, Kerbela, geriya
t/d	qed qed, siperden	qet qet, sipartin
w/xw	weş, wast, wend, xorak	Xweş, xwest, xwend, xwarin
z/j	merêzu	dirêjim
c/j	ce	ji
m/v	Zimistan, dem, gam, zama,	Zivistan, dev, gav, zava, nav,

	nam, çem, nîm	çav, nîv
w/m	ziwan	ziman
w/v	Aw, niwîs, emşew, baw, şew,xaw,	Av, nivîs, îşev, bav, şev, xew
h/g	ahir	agir
b/p	belg	pel
ç/j	mewaçûn, ewîç, minîç	dibêjin, ew jî, ez jî

### 3.1.3. Ketina Dengdaran

#### 3.1.3.1. d

Tîpa “d”yê ya ku di dawiya hinek peyvên zaravayê Hewramî de hebûna xwe parastiye, di zaravayê Kurmancî de bi gelemperî ketiye. Di mînakên jêrê de ji ev cure ketinê re mînak hatine dayîn:

Kard/kêr, dûd/dû, menden/man, berd/bir, serd/sar, zerd/zer

Ferhad çûn şineft ce dada xeber

Dêwiya dûdiş ce kapolê ser (80b, M. 2180)

Şadê şikuf bî ce dînê Ferhad

Xiyaîê Xosrew Şewdêz berd we yad (58b, M. 1580)

#### 3.1.3.2. f

Ketineke heman weke dengê “d”yê di dengê “f”yê de jî qewimiye. Di hinek peyvên Hewramî de ev deng hebûna xwe parastiye lê di Kurmancî de ev deng ketiye. Ji bo vê guhertinê di metna xebatê de bi tenê me peyva keftin/ketin tespît kir. Ev jî li jêrê hatiye nîşandan.

Yaran şineften watey xezebnak

Yeksan be yekbar keften ne ruy xak (98b, M. 2281)

#### 3.1.3.3. g

Tîpa “g”yê ya ku di dawiya hinek peyvên zaravayê Hewramî de cih digire, di dawiya peyvên zaravayê Kurmancî de hebûna xwe neparastiye û ketiye. Ev yek di mînakên jêrê de wuha hatiye diyarkirin:

Merg/mirin, sewgend/sond, belg/pel, gurg/gur,

Medhoşen ce hoş nedaro ziwan

Ne mergê mewten bêdengê diwan (107b, M. 2935)

Belgiş ne direct zatifê zerden

Rohiş alûdey adabê derden (101b, M. 2762)

Şeytanê êblîs şeyatînê şer

Dêwê deyrî reng pîregurgê der (74a, M. 2003)

Eger dem dereng mawerdêş perêm

Wer ne sewgendim be ayînê wêm (115b, M. 3142)

#### **3.1.3.4. m**

Dengê “m”yê di zaravaya Hewramî de di peyvên weke emşew/işev, emcar/îcarê de hebûna xwe parastiye lê di Kurmancî de ev deng ketiye. Mînak di malikên jêrê de hatine nîşandan:

Min dimay Şîrîn emşew şînimen

Henî zêdegî perî çêşimen (79b, M. 2221)

Wat emcar be sozê zarîm zerûren

Derde derûnim perê Şapûren (91a, M. 2480)

#### **3.1.3.5. h**

Ev deng di zarava û devokên Kurdî de carnan dikeve. Di mînaka jêrê de peyva “jar” wek “jehr” derbas dibe di zaravayê Kurmancî de. Lê di Hewramî de ev deng ketiye. Peyv wek “jar” derbas dibe.

Midra muntezêr mewday kînedar

Ûenîmê xûnrêz jar alûdey jar (102b, M. 2776)

Bi tabloyek, ketina dengdaran li jêrê wuha hatiye diyarkirin:

Dengdarên ku ketine	Hewramî	Kurmancî
d	zerd, kard, dûd, sard,	zer, kêr, sar, dû, sar
g	merg, sewgend, belg, gurg,	mirin, sond, pel, gur
f	keftin	ketin
m	emşew, emcar, emsal	îşev, îjar, îsal
h	jar	jehr

### 3.2. Dem

#### 3.2.1. Dema Niha

Di vê demê de bûyer, kar, û tevger bi vegotinê re di heman demê de pêk tên. Qertafa dema niha tê pêşiya koka dema niha û li koka dema niha qertafên cînavkên kesîn lê tê zêdikirin (Baran, 2012: 144).

Qertafa dema niha di Hewramî de “mi/me” ye. ev qertaf tê pêşiya koka dema niha bi vî şeklî dema niha tê sazkin. Carnan jî lêker bi tenê bi rayeka dema niha tê kişandin di Hewramî de.

Weke mînak:

Warday/Xwarin rayeka dema niha “wer” e.

Werû werî, wero, wermê, werdê, wera

An jî miwerû, miwerî, miwero, miwermê, miwerdê, miwera

Qertafa neyîniyê “ni” an jî “ne” ye. Nimwerû, nimwerî, nimwero, nimwermê, nimwerdê, nimwera (Rehîmî, 1385: 84)

Mi + rayeka lêkerê ya dema niha + Qertafên cînavkên kesane

Forma neyînî bi qertafa “me/mi, ne/ni”yê çêdibe. Ev herdu qertafên neyînî tîn pêşiya lêkaran û wate neyînî dibe.

C. Kesane	Watay/ maç Hewramî	Qertafên Kesane	Kurmancî
Min	maçû	-û	dibêjim
To	maçî	-î	dibêjî
Ad/Ade	maço	-o	dibêje
Ême	maçmê	-mê	dibêjin
Şime	maçdê	-dê	dibêjin
Adê	maçma	-a	dibêjin

Minakên ku di metna xebatê de derbas dibin li gorî kesê yekem, duyem, seyem û kesê yekjimar hatine kişandin:

Rast maço Ferhad herfiş yeqînen  
 Ferzendê fexfûr xaqañê Çînen (35b, M. 952)

Her çi min maçûn bigîre ne goş  
 Pendê watey min meker feramoş (67b, M. 1830)

Er maçî diron Şapûr şehadet  
 Eger xelafen Ferhad xecalet (35a, M. 943)

### 3.2.2. Dema Bê

Di vê demê de kar di dema dahatû de pêk tê. Ji dema niha cudatir bi tenê di piştî qertafên kesane de weke qertafa dema bê “ne” tê.

Rayeka lêkerê ya dema niha + qertafên cînavkên kesane + ne

Forma neyînî bi qertafa “me/ne”yê çêdibe. Ev herdu qertafên neyînî tên pêşiya lêkaran û wate neyînî dibe (Rehîmî, 1385: 94).

Weke mînak: ez dixwim/werû; ez ê bixwim/werûne.

C. Kesane	Watay/ maç Hewramî	Qertafên Kesane	Kurmancî
Mîn	werûne	-û	Ez ê bixwim
To	werîne	-î	Tu yê bixwî
Ad/Ade	werone	-o	Ew ê bixwe
Ême	werme	-mê	Em ê bixwin
Şime	Werdêne	-dê	Hûnê bixwin
Adê	werdane	-a	Ew ê bixwin

Nîşe: Ji bo dema bê di metna xebatê de mînak nehatiye peyda kirin.

### 3.2.3. Dema Boriya Diyar

Dema boriya diyar, wexta ku bûyerek di demeke diyar de pêk hatibe tê bikaranîn. Li gorî lêkerên gergûhêz û negergûhêz bi awayeke cuda tê kişandin. Ev dem bi alîkariya rayeka dema borî çêdibe (Taş, 2013: 191).

Di dema borî de qertafa raderê dikeve û lêker li gorî rayeka dema borî tê kişandin. Di Hewramî de jî ev yek wiha ye. Lêkera çûyînê li jêrê hatiye kişandin li gorî dema boriya diyar.

Forma neyînî bi qertafa ‘‘me/ne’’yê çêdibe. Ev herdu qertafên neyînî tên pêşiya lêkeran û wate neyînî dibe.

Rayeka lêkerê ya dema borî + Qertafên cînavkên kesane

Leway/Çûyîn (Negerguhêz)



C. Kesane	Leway/ lewa Hewramî	Qertafên Kesane	Kurmancî
Min	liwanê	nê	çûm
To	liway	-î-/y	çûyî
Ad/Ade	liwa	-	çû
Ême	liwaymê	-mê	çûn
Şime	liwaydê	-dê	çûn
Adê	liwê	-ê	çûn

Berden pey Ferhad be çend ‘ezz û naz

Ferman we şahan liwan we pêşwaz (38b, M. 1030)

Merdum ce dîniş ber liwan ce dîn

Şêt û şeyda bîn ce şewqê Şîrîn (125b, M. 3429)

Di dema borî de lêker ger gerguhêz be kişandina wê jî li gorî wê diguhere.

Dema ku lêker gerguhêz be qertafên kesane -m, -t, -ş, -man, -tan, -şan tên dawiya lêkerê. Lêkera “gotinê” li gorî dema boriya diyar hatiye kişandin (Rehîmî, 1384: 65).

Forma neyînî bi qertafa “me/ne”yê çêdibe. Ev herdu qertafên neyînî tên pêşiya lêkaran û wate neyînî dibe.

C. Kesane	Watay/wat Hewramî	Qertafên Kesane	Kurmancî
Min	watim	-m	got
To	watit	-t	got
Ad/Ade	watiş	-ş	got
Ême	watiman	-man	got
Şime	watitan	-tan	got
Adê	watişan	-şan	got

Mînak ji metna xebatê:

Ha watim perêt derdê wê m tamam  
 Êltêcam êden baqî wes- selam (27b, M. 734)

Herçê to watit mawerdim be ko  
 Ane şertê min îne şertê to (136a, M. 3714)

Watiş be Şapûr bişo ne şûniş  
 Bizane eħwaļ ħalê mezmûniş (5a, M. 114)

Eħwaļê Xosrew persa her çê hen  
 Watişan Perwêz liwa be Ermen (12b, M. 324)

### 3.2.4. Dema Boriya Nediya

Dema boriya nediya, kar di dema borî de dest pê kiriye û dive ku bandora wê heta dema niha jî hebe. Ev dem jî weke dema boriya diya bi rayeka dema borî tê çêkirin (Yıldırım, 2012:123).

Rayeka lêkerê ya dema borî +-in +Qertafên cînavkên kesane

Forma neyînî bi qertafa “me/ne”yê çêdibe. Ev herdu qertafên neyînî tên pêşiya lêkeran û wate neyînî dibe.

Tersay/ ters (Lêkera negerguhêz)

C. Kesane	Tersay/ters Hewramî	Qertafên Kesane	Kurmancî
Min	tersana (n.) tersêna (m.)	-n +-a - n+-a	tirsiyame
To	tersanî (n.) tersînî (m.)	-n +-î -n+-î	tirsiyayî
Ad/Ade	tersan (n.) tersêne (m.)	- e	tirsiyaye
Ême	tersênmê	-mê	tirsiyane
Şime	tersêndê	-dê	tirsiyane
Adê	tersênê	-ê	tirsiyane

Ji metna xebatê mînak:

Tersan ce Şêru ten be qeza dan

Be qet! Xosrew hoşnê reza dan (100a, M. 2726)

Dema ku lêker gerguhêz be qertafên kesane diguherin. Kîşandina lêkera kuştinê li jêrê di tabloyê de hatiye diyarkirin:

Koştay/koşt

C. Kesane	Koştay/koşt Hewramî	Qertafên Kesane	Kurmancî
Min	koştanim	-n +-m	kuştîye
To	koştanit	-n +-t	kuştîye
Ad/Ade	koştaniş	-n +-ş	kuştîye
Ême	koştanman	-n +-man	kuştîye
Şime	koştentan	-n +-tan	kuştîye
Adê	koştênşan	-n -şan	kuştîye

Mînak ji metna xebatê:

Reza da be merg nigûn bo ne xak

Wiyerd ne koştên ferzendê napak (20b, M. 543)

### 3.2.5. Çîroka Dema Borî

Di vê raweyê de bûyer, kar, tevger di demeke dûr de diqewime (Ocak, 2014: 229). Lêkera ‘bên/ bûn’ê tê ber dema boriya nediyar û bi vî awayî çîroka dema borî çêdibe di Hewramî de (Rehîmî, 1384: 76).

Kerday/kerdê

C. Kesane	Kerday/kerdê Hewramî	Qertafên Kesane	Kurmancî
Min	kerdê bê m	-m	kiribû
To	kerdê bê t	-t	kiribû
Ad/Ade	kerdê bê ş	-ş	kiribû
Ême	kerdê bê man	-man	kiribû
Şime	kerdê bê tan	-tan	kiribû
Adê	kerdê bê şan	-şan	kiribû

Kerdê bêş betal dîwanê şahî

Xarê Xosrew bî be xatîr xahî (7a, M. 161)

### 3.2.6. Çîroka Dema Niha

Di dema borî de kar hatiye domandin. Bi qertafa dema niha “-mi”yê û bi teşeya dema borî çêdibe. Di dawiya lêkerê de jî qertafên cînavkên kesane tên (Senendecî, 1394: 76).

Mi + -ên + rayeka dema borî + qertafên cînavkên kesane

C. Kesane	Koştey/koşt Hewramî	Qertafên Kesane	Kurmancî
Min	miwerênê	-ên +-ê	dixwar
To	miwerênî	-ên +-ê	dixwar
Ad/Ade	miwerê	-ên +-	dixwar
Ême	miwerênmê	-ên +-mê	dixwar
Şime	miwerêndê	-ên +-dê	dixwar
Adê	miwerênê	-ên -ê	dixwar

Mînak ji metna xebatê:

Ne di l mewatiş sitarem çeften

Tasê taşey şûm ne tarî keften (62a, M. 1673)

### 3.3. Cureyên Peyvan

Peyv, hêmanên herî biçûk ên watedar in an jî bi serê xwe ger xwedî wateyek nebin jî di nava hevokê de li gorî erka xwe wateyek digrin. Di ziman de ji van tiştên herî biçûk ên watedar re peyv tê gotin. Ev peyv li gorî wate û erkên xwe tîndabeşkirin. Peyv weke navdêr, lêker, cînavk, hoker, rengdêr, gihanek, daçek û baneşan tîndabeşkirin.

#### 3.3.1. Navdêr

Ji ew cure peyvên ku heyber û tîgehê dinimînin û didin nasîn re nav tê gotin. Di rêziman de nav, xwediyê wateyê berfireh e; ji ber vê yekê di rêzimanê de wek navdêr tê binavkirin. Rengdêr, cînavk, hoker, daçek, gihanek û baneşan di eslê xwe de navdêr in. Navdêr di naveroka xwe de liv û tevgerê nahewînin ji vê hêlê ve ji lêkeran tîne qetandin (Baran, 2012: 55).

Navdêr li gorî cureyên xwe weke navdêrên serenav (navdêrên xas), hevenav (navdêrên 'am), navdêrên şênber (navdêrên zat), navdêrên razber (navdêrên me'na) tîne dabeşkirin.

##### 3.3.1.1. Navdêrên Hevenav

Navdêrên hevenav ji bo tevahiya peyvên ku hevcure tiştan îşaret dikin re tê gotin. Ji bo ev cure navdêrê em dikarin wek dar, çiya, çem, çûk û palende, kulîlk, hesp, xanî û hwd. mînakên nîşanê bidin.

Ji metna xebatê jî mînakên wek gur, mêşin, gul, binefş, bilbil, bax ji bo cureya vê navdarê li jêrê hatine nîşandan.

Be tîşey sengtaş kûhê gerankeş  
Yekê nimazûn be zengîw herbeş (63b, M. 1715)

Wicûdiş niyen ce lamê sengtiraş  
Yek gorg we şed mêş mekerûn fenaş (63b, M. 1719)

Benefşe ser weş bendê êlaxan  
Gul gulab be feş bulbul ne baxan (128a, M. 3495)

### 3.3.1.2. Navdêrên Serenav

Navdêrên serenav, navên ku taybetiyên kesek an jî tiştêkî nîşan didin re tê gotin. Navên kesan, welatan, nîjad, ol, ziman, eşîr, komele, sazî, rojname, derya, çem, dîn û terîqetan dikevin nava koma navdêrên serenavan.

Bîsitûn, Şewdêz, Ferhad, Ermen, Hurmiz, Şapûr, Taqê Bostan, Qesrê Şêrîn, Çîn, Rustem, Nerîman, Dara, Behram û Gulendam, Bîjen û Menîjê, Yûsif, Meryem û hwd. Di vê metnê de weke navdêrên serenav derbas dibin. Çend mînak jî van navdêran li jêrê hatine diyarkirin.

Watiş be Ferhad mizanî çûnen	
Xiyaşim çenî Koy Bîsitûnen	(41b, M. 1115)
Rewan bî rahî dişdarê Perwêz	
Rûş kerd ne kemend şew bend Şewdêz	(50b, M.1365)
Gêrtenim ne doş dişdarê dêrîn	
Ta biyawinûş be Qesrê Şêrîn	( 63a, M.1709)

### 3.3.1.2. Navdêrên Şênber

Navdêrên ku bi aweyekî bûjenî cihekî dadigirin û bi lebatê sehekiyê tîn ferqîrin ji wan re navdêrên şênber tê gotin. Mîrov, ajal, ewr, baran, berf, ax, dar, pisîng û hwd. mînak in ji ev cureya navdêran re (Ocak, 2014: 89).

Bergê sewadî siyaş kend ce ber	
Silsiley serwîn hewa daş ce ser	(122a, M. 3320)
Nergisê nûknîş xonçay şikawan	
Şeqey şaqayiq herdan ce kawan	(128a, M. 3488)
Çetrê çinûran laley heşalan	
Zîbê kelaşan da ne guşalan	(128a, M. 3489)

### 3.3.1.2. Navdêrên Razber

Navdêrên razber, navdêrên hestî û ramanî ne. Ne têne dîtîn ne jî têne pelandin, tenê bi hestan tên nasîn û hîskirin (Kerîmpûr, 1390: 45). Wesl, feraq, dad, ‘eşq, taqet, xeşm ji bo navdêrên razber mînak in.

Xusrew xiruşan xeşmê xanit bam

Serdarê serkeş serkeşanî bam (130b, M. 3569)

Şîn û zarîşen be dadê bêdad

Be şewqê şadî yawa be Ferhad (33a, M. 887)

### 3.3.2. Lêker

Lêker, kar, tevger, rewş û bûyînê diyar dîkin. Di warê hêmanên hevokê de lêker hêmana bîngêhî ye. ev cureya pêyvê bi piranî peywira pêveberê digirin ser xwe. Navdêr jî bi alîkariya lêkeran dikarin bibin pêveber. Lêker qertafê deman û kesan disitînin li gorî wwan jî tên kişandin (Baran, 2012: 135). Di Hewramî de jî her lêker li gorî dema niha û dema borî du rayên wan hene (Rehîmî, 1386: 46). Radera lêkeran ji raya dema borî û ji qertafên “-en û an”ê pêk tînin. Mînak: Wardey, watey, kerdey, faray, wanay, waray. Ji bo vê mijarê li serenava deman binêrin.

### 3.3.3. Cînavk

Peyvên ku di hevokê de cihên navdêran digrin re cînavk têne gotin. Ji bo di hevokê de herîkbaryek çêbibe û navdêr neyên dubarekirin cînavk tên bikaranîn. Di Hewramî de cînavk ji van cureyan pêk tînin: Cînavkên kesane, cînavkên şanîdanê, cînavkên vegerok, cînavkên kesandinê, cînavkên pirsîyarî û cînavkên nebinavkirî.

#### 3.3.3.1. Cînavkên Kesane

Cînavkên ku cihê kesê yekem, duyem û sêyem yên yekjimar û pirjimar digrin re tînin gotin (Tan, 2011: 124). Di Kurdiya Hewramî de cînavkên kesane li jêrê hatine diyarkirin:

Hewramî	Q.C. Kesane	Kurmanî	Q.C. Kesane
Min	-m	Ez	-im.-m
To	-d	Tu	-yî/-î
Ad/ade	-ş	Ew	-ye/-e
Ême	-man	Em	-in/-n
Şime	-tan	Hûn	-in/-n
Adê	-şan	Ew	-in/-n

Xosrew êtîbar be ême kerdên

Ser û sîretîş pêman siperden (99a, M. 2686)

Min derdey esîr ser bê serencam

Serdar sernigûn zedey zux û zam (117b, M. 3196)

Min ce to beter meylê to pêmen

Îse 'eybê to hem 'eybê wêmen (120a, M. 3276)

Di metna ber destê me de kişandina lêkera gotinê/watey li gorî temamî kesan wiha hatiye kişandin:

Cînavkên kesane yên yekjimar: Min watim, to watit, ad watiş.

Cînavkên kesane yên pirjimar: Ême watiman, şime watitan, adê watişan.

Mînak ji meta xebatê:

Watiş hey bêdad şûmî şikestim

Ane Xosrew bî berşî ce destim (12b, M. 315)

Ehwaîê Xosrew persa her çê hen

Watişan Perwêz liwa be Ermen (12b, M. 324)



### 3.3.3.2. Cînavkên Şanîdanê

Ev cure cînavk bi rêya nîşankirinê cihê navdêran digirin. Ji bo tiştên nêz êd, îna , êda, îne, êde, îne; ji bo tiştên dûr jî ew, ûne, ewe, ûne, ewê, ûnî tên bikaranîn (Rehîmî, 1384: 164).

Ji bo vê cureya cînavkê mînakên me ev in:

Bibexşiş be min be êqbalê wêm  
Ba ce bedî ew her çi meyo pêm (20b, M. 438)

Anê mohebet îne neqşê tîr  
Her çêt xo mebo mekere teqşîr (63a, M. 1704)

Cînavkên Şanîdanê	Zayenda nêr	Zayenda mê	pirjimar
Nîşandina nêz	Êd, îne	Îne, êda	Îne, êde
Nîşandina mutevesit Ne nêz ne dûr	Ad, ane	Ade, anê	Adê, anê
Nîşandina dûr	Ew, ûne	Ewe, ûne	Ewê, ûnî

### 3.3.3.3. Cînavka vegerok

Ev cînavk di Kurmancî de bi tenê bi peyva xwe tê diyarkirin. Di Hewramî de ev cînav wê ye û bi qertafên kesandinê li gorî temamî kesan tê kişandin (Mackenzie, 2011:67). Xwe/wê

Wê+m, wê+t, wê+ş, wê+man, wê+tan, wê+şan

Wêm Ez bi xwe

Wêt Tu bi xwe

Wêş Ew bi xwe

Wêman Em bi xwe

Wêtan Hûn bi xwe

Wêşan Ew bi xwe

Ev cureya cînavkê di malikên jêrîn de wiha derbas dibe:

Karê wê m ce to çêş niyam kerûn

‘Eşqê Ferhaden keften ne derûn (31b, M. 846)

Mebo ce ezel fikrê wêt kerdî

Serit be saman dîn û wêt berî (32a, M. 859)

Diya be rengîş qetranî ce derd

Fetway qetlê wêş ne di l eşer kerd (41a, M. 1109)

Kerîn meşlehet ne karê wêman

Belê ber neşo ba ne di lêmân (97b, M. 2647)

Şerhê halê wê mawaçûb peytan

Sewgendim êden we bextê wêtan (97b, M. 2646)

Sewday siyaset keft ne di lêtân

Kerden meşweret be rotbey wêşan (100a, M. 2725)

### 3.3.3.4. Cînavkên kesandinê

Cînavkên kesandinê weke paşgiran tên dawiya lêker, navdêr û cînavkan. Di Hewramî de ev cure cînavk ji sê beşan pêk tînin (Rehîmî, 1384: 166)

I	II	III
D. B. û L.G	D.B. û L. NG.	D. N. û D. Bê
-im	-a/nê	-û
-it	-î/y	-î
-iş	-ê/-	-o
-man	-mê	-mê
-tan	-dê	-dê
-şan	-ê	-a

Mebo her fikrê kerî be hâlim  
Wer ne şemaļ şend siftey zuxaļim (32b, M.824)

Rast maço Ferhad herfiş yeqînen  
Ferzendê fexfûr xaqañê Çînen (35b, M. 952)

Xosrew şineftiş siya bî ce derd  
Zu xa û zamet ne cergiş ca kerd (40b, M. 1084)

### 3.3.3.5. Cînavkên Pirsiyarî

Ev cure cînavk jî ji bo ku tişteki, kesekî an karekî bi rêya pirsiyariyê bipirse tê bikaranîn. Di Hewramî de cînavkên pirsiyarî bi gelemperî ji van peyvên pêk tên: Kam, çêş, çî, key, çenî, ko, çin.

Çend mînakên di mesnewiyê de derbas dibin li jêrê hatine diyarkirin:

Me'lûm kerden lêş ne kam Şîrînen  
Eşliş çenî min be ham qerînen (32a, M. 851)

Ko şamalê pêş baboy babê to  
Ceddê wêt koşî bes babê min ko (16b, M. 435)

Watiş fedatim hûrê rizwanî  
Henî çêş kerûn ce to pinhanî (35b, M. 951)

Key bo karê min beyo be encam  
Ce dîne dilber biyawun be kam (53a, M. 1428)

Take to çenî Şîrîne bednam  
Kerûn be risway çend watyê 'am (64a, M. 1736)

### 3.3.3.6. Cînavkên Jimarîn

Jimarnavên ku cihên navdêran girtine re cînavkên jimarî tene gotin (Taş, 2013: 125). Di Hewramî de çîwar çîwar, de de, yo be yo, ewelîn, heştêmîn...

Min şert ce Şîrîn to ce giyan wêt  
Be êqrarê wêt her çî be yo pê (41b, M. 1124)

Çend kerdiş bêdar feñan û feryad  
Ewel pey Xosrew axer pey Ferhad (111a, M. 3020)

### 3.3.3.7. Cînavkên Nebinavkirî

Cînavkên nebinavkirî cihên navdêrên nebinavkirî digirin. Cînavkên nebinavkirî yên sereke di Hewramî de ev in: Hîç, hîç kam, kesê, hîç kes, her kes, koçê, her çî, yaro, hîn, nextê.

Xêlê cor'eten kesê be wêş da  
Biden cergê wêş be nûkê nêş da (131b, M. 1396)

Her kes be şelay herfê jenan bo  
Lazim ce kariş mebo rencero (22a, M. 573)

Hîç kam be şadî nenîşan be şad  
Neyawan be kam ce dimay Ferhad (94b, M. 2564)

Herçend kerden şebr be şîn û şeyda  
Dîn şewqê Şîrîn hîç niyen peyda (134a, M. 3659)

### 3.3.4. Rengdêr

Peyvên ku çendîni û çawaniya navdêran diyar dikin re rengdêr tene gotin. Rengdêr, navdêran ji hêla rewş, teşe, hejmar, reng û nîşanê ve diyar dikin. Rengdêr ji hêla wate, erk û taybetmendiyên xwe ve dabeş dibin (Baran, 2012: 77).

#### 3.3.4.1. Rengdêrên Çawaniyê

Ev rengdêr çawaniya navdêran, ji hêla reng, teşe û rewşê ve diyar dikin. Mînak di malikên jêr de hatine nîşandan. Berz, şêrîn, sûr, gewre, weş, zer di Hewramî de rengdêrên çawaniyê ne.

Kêşa bangê berz fiñanê feryad  
Wêş niya ne gil be dadê bêdad (9b, M. 134)

Puşa be endam reng reng 'ecawî  
Dîmay zer û sûr awî ce awî (122b, M. 3340)

### 3.3.4.2. Rengdêrên Nîşanî

Ev rengdêr navdêran bi rêya nîşanê diyar dikin. Di Hewramî de rengdêrên nîşanî ev in: î, û, ew, a. Di herdu malikên jêrê de minak hatine nîşandan:

Be qînê qatîl şanaş ew qoleng  
Fişar da destîş be çengalê çeng (83a, M. 2267)

Beîê î bende kemter ce bendet  
‘Asî ‘usyan barê şûm şermendet (1b, M. 12)

### 3.3.4.3. Rengdêrên Hejmarî

Ev rengdêr, navdêran li gorî hejmarê diyar dikin. Ji bo ev cure rengdêran li jêrê di nava malikan de mînak hatine nîşandan.

Ser ta pa ne gil esrînê xare  
Şehîdê şîwen yexey şed pare (109a, M. 2967)

Çenî çil kenîz şeyday şûxê şeng  
Be sozê sazan nexmeyê aheng (6a, M. 141)

Yek yek hamseran be zarî tamam  
Dem niyan ne dem gonay cemîn cam (123b, M. 3363)

Meşrib ta meşriq çiwar êqlîm tamam  
Sekkey selţenet waniyaş tamam (18a, M. 473)

### 3.3.4.4. Rengdêrên Nediya

Ev rengdêr wateyeke nediyar didin navdêran. Hin, hinek, her, çend, hemû, hîç, yek ji bo rengdêrên nediyar mînak in. Hinek mînakên rengdêrên nediyar yê ku di metnê de derbas dibin di malikên jêrê de hatine nîşandan:

Herçê ferman bo lazim bibo pêt  
Mawerûn be ca be êqbalê wêt  
Çend nazenînan mehbûbê dîlkêş  
Çend nazik neha! awerdiş perêş  
Watiş ey Ferhad dinyat xirawen

Serit hur dare çi weqt xawen  
Her pelê pustiş keften ne cayê  
Her zerrey guştiş keften ne layê

#### 3.3.4.5. Rengdêrên Wekhevî û Paye

Ev cure rengdêr di Hewramî de bi qertafên “-ter û -terîn” ê tên çêkirin. Mînak ji metna xebatê di malikên jêrîn de hatine diyarkirin:

Naziş da nîzam bêhter ce daye  
Siperdiş be dest dayanê daye  
Per kerd ce cergiş bedter ce saşan  
Ce kîne kînet xarê xiyalan  
Watiş fedatim kemter kemînim  
Xolamê êxlaş şahê şîrînim  
Neqşiş çûn neqqaş nuqtay nigîn bo  
Balater ce qeşr xaqañ Çîn bo

#### 3.3.4.6. Rengdêrên Pirsiyariyê

Ev rengdêr bi rêya pirsê, navdêran destnîşan dikin. Dema pirs ji navdêrê tê kirin bersiv dîsa rengdêr e (Baran, 2012: 81). Di Hewramî de “kam, çenî, çêş” rengdêrên pirsiyariyê ne. Kam mar, kam canewar, çêş xeber ji bo cureya vê rengdêrê di malikên jêrîn de weke mînak hatine diyarkirin.

Xalîit be xorak kam marê mûr bî  
Cemînit ne dem kam canewer bî (9b, M. 142)

Kerdiş tewazo´ be şedrê saşan  
Persa çêş xeber haşê hewaşan (8a, M. 196)

Ferhad mend be ca çenî derdê wêş  
Be suz û zarî êş û nûşê wêş (28a, M. 745)

#### 3.3.5. Daçek

Daçek di nava hevokê de, bi peyvên din re tên bikaranîn. Bi tena serê xwe xwediyê wateyek nînin. Di hevokê de wateya derketin, mayîn, pêrebûn, berpêbûnê

çêdikin. Daçek bi piranî ji qertafan pêk tên, hinek ji wan jî peyv in. Hertim ji peyvên din cuda tên nivîsîn (Tan, 2011: 187). Di Hewramî de daçekên sereke ce, je, be, ne, bê, we, pey, siwa, bêcge, perê, çon weke mînak mirov dikare nîşan bide (Rehîmî, 1384: 222).

Ce şînê Şîrîn şerêxey Şewdêz  
Şe'ney şîn be hem bî be restaxêz (54b, M. 1474)

Şîrîn pey Şewdêz be dad û feryad  
Be zar û endûh çîrêş be Ferhad (54b, M. 1475)

Tebeq best be taw çûn xarê xedeng  
Wiyerd ce raniş seng minişt we seng (54b, M. 1467)

Şoleş da ne bend berzê bayiran  
Şefafen ce şewq bendê tawîran (56a, M. 1517)

Biber xecalet xîrey bê xêred  
Cengê çêşiten be Ferhadê ferd (68b, M. 1860)

Yadigarî bo pey rozigarî  
Ne ragey rewend zerbey zewaran (69b, M. 1887)

Mizanûn taqî serit nebaren  
Şîn ûm şîwenim perê Ferhaden (47a, M. 1267)

### 3.3.6. Gihanek

Gihanek di navbera peyv û hevokan de têne bikaranîn û hêmanên wan bi hevdu ve girê didin. Ev cure peyv bi tena serê xwe nayên bikaranîn. Weke daçekan hinek ji wan qertaf, hinek jî ji wan peyv in. Dema ku gihanek ji hevokê bê derxistin wateya hevokê xira nabe (Taş, 2013: 166).

Di Hewramî de gihanekên sereke ev in: Ta, û, eger, er, ya, herçen, sakê, beşam, mer (Senendecî, 1394: 103).

Mebo ce daxit ta roy qiyamet  
Şîn û şîwen kem zarî û zelalet (47a, M. 1268)

Ya heq to kesî we bêkes neker  
Eger toy delîl be nakes menger (65a, M. 1755)

Belê er mebot payet bo new ca  
Herçê min maçûn bawere be ca (120b, M. 3279)

Şapûr her çend kerd men'îş be goftar  
Nekerdiş qebûl Ferhadê diîdar (5a, M. 105)

### 3.3.7. Hoker

Ji peyvên ku wateya rengdêr û hokerên weke xwe û lêkeran ji hêla cih, dem, rewş, sedem, hejmar û rêjeyê ve tamam dikin re hoker tê gotin. Bi gelemperî hoker di bingeha xwe de ji rengdêr û navderan pêk tên. Ev cureya peyvê bi alîkariya qertafên pêşgir û paşgir jî têne sazîkirin (Tan, 2011: 181). Hoker bi awayeke sereke ji van pênc beşan pêk tên: Hokerên çawaniyê, hokerên şanîdanê, hokerên demê, hokerên cih û berekê û hokerên pirsyariyê (Baran, 2012: 101).

#### 3.3.7.1. Hokerên Demê

Ev hoker wateya lêkerê ji hêla demê ve diyar dikin. Ji bo dîtina van hokeran divê pirsên wek kengî, heta kengî, ji kengî ve ji pêveberê bêne kirin. Her wekî ku ji navê wê jî diyar e, ev cure hoker di hevokê de dema qewimîna kar nîşan dide.

Hinek peyvên ku ji hêla cureyê ve di Hewramî de weke hokera demê tên bikaranîn ev in: Aro, ewsa, hîzî, îse, ta îse, car car, hêmay, heşay, şew ta be ʀo, şob ta be şew, êsal, vêreganay (Rehîmî, 1384, 195).

Çend mînak ji cureya hokera demê ji metna xebatê li jêrê hatine diyarkirin:

Ta îse be kes nekerdim êzhar  
Megêlam be soz ne hobot û cuwyar (7b, M. 183.)

Bişno ce Şîrîn ew şew tabe ʀo  
Hey kerd be Şewdêz be yad awerd ho (10b, M. 140)

Namirdit keran taqî ker xeber  
Ewsa wêt beray be xaray xeşer (87b, M. 2384)



### 3.3.7.2. Hokerên Cih û Berekê

Ev cure hoker, lêkerê ji hêla cih û aliyan ve tamam dikin. Hokerên cih û aliyan zêdetir bi daçekên qertafi re tèn bikaranîn. Di Hewramî de hinek hokerên cih û aliyan nîşan didin ev in: Çêgeh, cage, dima, weleş, dilê, ber, ser, war (Senendecî, 1394: 98).

Çend malik ji bo ev cure hokerê li jêrê, ji metna xebatê hatine nîşandan:

Poşanim reday reştey rehbanî

Liwam ne cagey Şêxê Şe'nanî (27b, M. 725)

Cew dima be seng qeşrê bisazî

Ce zîb û zînet pey dilnewazî (42, M. 1131)

### 3.3.7.3. Hokerên Çawaniyê

Ev hoker, wateya lêker, lêkernav, rengdêr û hokerê ji hêla çawanî û rewşê ve dinimîne. Ji bo dîtina vê hokerê divê pirsên wek çawa, çimayê ji pêveberê bêne kirin. Hokerên çawaniyê bi pîranî rengdêr in lê çawaniya lêkerê nîşan didin (Yıldırım, 2012: 180).

Di Hewramî de peyvên weke serweş, piyanane, nerm, yewaş, weş, jîrane, koşane mînak in ji bo ev hokerên çawaniyê.

Xezêney Xusrew lêtan beş kerû

Hemîn dil ce şewq Şîrîn weş kerû (98b, M. 2677)

Cuşiya be xeşm siya sitare

Qeşran bî ce qîn çîn da be çare (106a, M. 2884)

### 3.3.7.4. Hokerên mêjerî

Ev cure hoker, lêker, lêkernav, rengdêr û hokerên weke xwe ji hêla mêjer û radeya karê ku tê kirin nîşan didin. Ev hoker, pîrsa çiqas dibersivîne (Baran, 2012: 104).

Di Hewramî de peyvên fire, nextê, dennê, kem, koçê, nextalê ji bo vê cureya hokerê mirov dikare weke mînak nîşan bide.

Fire metersûn ce çînê çareş  
Ce sîmay sengîn siya sitareş (19b, M. 513)

Min ce to beter meylê to pêmen  
Îse ‘eybê to hem ‘eybê wêmen (120a, M. 3276)

### 3.3.7.5. Hokerên Pirsyariyê

Peyvên ku mêjer, sedem, dem û çawaniya lêkerê bi rêya pirsê diyar dikin re hokerên pirsyariyê tê gotin. Ev hoker jî pirsê hokerên din didin. Peyvên weke çenî, pey çî, pey çêş, ko ge, key, çî û hwd. di Hewramî de mînak in ji bo hokerên pirsyariyê (Rehîmî, 1384: 198).

Watiş ey ferzend çêş amat we ser  
Keffî ne tîlsêm dîwanê ejder (9b, M. 139)

Daxê derdê tom key mişo we yad  
Pey Ferhadim ro pey Xusrewim dad (110b, M. 3008)

Henî to pey çêş amay ne cay wêt  
Xaş karî kerdey xeyr beyu we rêt (12a, M. 309)

### 3.3.8. Baneşan

Ji peyvên ku kelecana, tirs, heyirîn, bangkirin, ecibandin, kêfxweşî, qehrê diyar dikin re baneşan tê gotin (Yıldırım, 2012: 267). Bi tena serê xwe xwediyê wateyek in. Di Hewramî de baneşanên sereke ev in: “wey, derîx, aman, dexîl, ax, oxey, be daxewa, nexêr, belê qorban, na, ne, hergêz, ser û çema, qorban, ya xewa, dek, şelley, aferîn, elbet, belê, eceb, naka, ha...” (Rehîmî, 1385: 211)

Ji metna xebatê hinek mînakên baneşanê di malêkên jêrîn de hatine diyarkirin:

Be şeh d û şeker be lefzê Şîrîn  
Watiş be Ferhad hezar aferîn (25b, M. 679)

Daxil bîn be aq taay ‘eceb reng Seyrangey efay tekyey di ce seng	(70a, M. 1892)
Ya xurid xawer ya mahe taban Elbet sitaren aman be daman	(11a, M. 276)
Aman b aman cuyare diber Dde derni cuwiyane ser	(7a, M. 173)
Kenzane zar be urite in Waweyla wey ro ne dewre drn	(117a, M. 1389)
Bew zure bazy bewre bderx Berde Bsitn awerdi ce bx	(49b, M. 1328)
Leb da be hem da fan b Ferhad Mewat hergz ce mader nezaad	(89a, M. 2424)
Hey dad hey bdad siyay bexte men Bergetey sefil roe sexte men	(102b, M. 2793)
Be zar zigar watin n kerm Dimay to dexl be lay k berm	(124b, M. 3394)

## BEŞA ÇAREM

### METNA MESNEWÎYA XUSREW Û ŞÊRÎN

Rêbaz û xusûsiyetên di neşra metnê de hatine şopandin li jêrê xal bi xal hatine rêzkirin:

- a. Ji bo neşra metnê bê avakirin nusxeya Berlînê ya Xusrew û Şêrîna Kendûleyî hatiye tercîhkirin. Ji ber ku nusxeya Berlînê li gorî salnameya hîcrî qemerî beriya ya Denmarkê hatiye înstînsaxkirin û ji hêla îmleyê tekûztir bû me jî ji bo însa metnê weke metna bingeh cih daye nusxeya Berlînê. Nusxeya Berlînê di sala 1241 ya Denmarkê jî di sala 1306an de hatine nivîsîn. Ewil nusxeya Berlînê hate latînzekirin di pişt re bi ya Denmarkê re hate berawerdkirin.
- b. Nusxeya Berlînê bi kurtasî *NB* ya Denmarkê jî *ND* hatine nîşandayîn.
- c. Rûpela ewil 1a ya li pey 1b, 2a, 2b, 3a, 3b...139a,139b li her rûpelî nav lê hatiye dayîn.
- d. Ji destpêka malika ewil heta ya dawî ji her pênc malikan carek me bi hejmarê wan diyar kirine. Weke mînak malkia ewil 1, palika pêncemîn 5, malika dehemîn 10 û wiha heta malika dawiya metnê sê hezar û heşt sed û pênc 3805 jî hejmar li pêşiya malikê hatiye danîn. Çar malik li piştê malika bi hejmar heye lê me hewcedariyê nedît ku em hejmar deynin. Ev yek jî hejmardayîn li gorî pênc û qatên wê hatiye kirin.
- e. Temîr û cihên me ji bo tekûzbûna kîte û serwayê sererast kiriye me di kevana çargoşe [] de nîşan dane. Weke mînak: di risteya duyem de tîpa deyê tuneye lê hem wate rast dibe hem jî serwa tekûz dibe.

Çoqîya be cim çenî daxê dûd

Çûn koterey nar siftey awesû[d]

- f. Ravekên Kurdî û Farisî weke hev hatine nivîsîn. Zayend tuneye di vaan metên klasîk de. Mînak: xûnawê dil, Qeysê Mecnûn, bextê Perwêz. Ravekên bi degdarên **a û e'**yê xilas dibin piştê wê **y** hatiye. Mînak: daney şedef, dimay Xusrew, piya<sup>ley</sup> bi<sup>lûr</sup>.
- g. Ravekên Erebi li gorî herfên Şemsî û qemerî hatine nivîsîn. Mînak: Seyfu'l-Milûk, Meleku'l-mewt.

- h. Di nava metnê de navên taybet yên ku derbas dibin di serê peyvan de bi tîpa girde hatinie nivîsîn. Mînak: Hurmuz, Şîrîn, Şen'an, Ermen, Koy Tûr, Nekîsa, Barbud.
- i. Cudatiya peyvan li gorî nusxeyan li jêra metnê me diyar kirine. Mînak: ce: NB; je: ND, bişo: NB; biço: ND, mezmûn: ND; mezmûniş: NB, eħwaļ: ND; hewaļ: NB.
- j. Nivîsa peyvan li gorî bilêvkirina zaravaya Hewramî hatine nivîsîn. Mînak: kerden, berd, merd, buļbuļ, guļ, maļ, Şîrîn, muļk, şemşal,
- k. Daçek û giħanek cuda hatine nivîsîn. Mînak: **ce, be, we, ne, û.**
- l. Peyvên hevedûdanî bi hevre hatine nivîsîn. Di navbera van herdû peyvan de sembola tireyê (-) nehatiye danîn. Mînak: newnehaļ, diļber, pîregurg, horgêla, diļgiranî, kemerlaļ.
- m. Deçek **ce**'ye di ND de weke **je** derbas dibe ev yek careke di serî weke cudatiya nusxeyê hatiye diyarkirin.
- n. Tîpên ku di elîfbaya erebî de xelet hatibin nivîsîn her çiqas weke cudatiya nusxeyê hatibe diyarkirin jî forma wê ya rast hatiye nivîsîn. Weke mînak: سيف **û رهبر** di ND de weke رحبر **û صيف** hatine nivîsîn weke şeyf **û رهبر** di jêrenivîsê de hatiye diyarkirin.
- o. Serenavên her beşî di metna Xusrew **û Şêrînê** de bi farisî hatiye nivîsîn. Di avakirina metnê de jî forma resen hatiye nivîsînê li gorî transkribsiyona Kurdî **û** bi reş **û** îtalîk hatiye nîşandayîn. Mînak: ***Reftenê Xosrew Ez Eqebê Şapûr.***
- p. Mexlasa helbestvên hatite reşkirin **û** bi îtalîk hatiye nivîsîn.
- q. Ji bo her tîpên elîfbaya Erebi me îşaretên transkribsiyonê bi kar aniyê. Weke tabloyê li jêr hatiye nîşandan.

**Tabloya transkrîpsiyona ku ji bo xebata tezê hatiye bikaranîn**

Elifbaya Erebi	Elifbaya Kurdî	Xwendina van dengan li gorî Kurdî	Traskrîpsiyon
ا	ا	elif	e, a
ب	ب	bê	b
-	پ	<i>pê</i>	<i>p</i>
ت	ت	tê	t
ث	ث	sê	ś
ج	ج	cîm	c
	چ	<i>çê</i>	<i>ç</i>
ح	ح	hê	h
خ	خ	xê	x
د	د	dal	d
ذ	ذ	zal	z
ر	ر	rê	r
-	ړ	<i>rê qelew</i>	<i>r</i>
ز	ز	zê	z
-	ژ	<i>jê</i>	<i>j</i>
س	س	sîn	s
ش	ش	şîn	ş
ص	ص	şad	ş
ض	ض	žad/đat	z, (đ)
ط	ط	ţê	ţ
ظ	ظ	zê	z
ع	ع	‘eyn	‘
غ	غ	xeyn	x
ف	ف	fê	f
-	ڤ	vê	v
ق	ق	qaf	q
ک	ک	kef	k
-	گ	<i>gê</i>	<i>g</i>
ل	ل	lam	l
-	ل	<i>lam qelew</i>	<i>l</i>
م	م	mîm	m
ن	ن	nûn	n
ه	ه	hê	h
و	و	waw	w, û
ی	ی	yê	y, î
ء	ء	hemze	’

**1a Bismillahi'r- Reḥmani'r-Reḥîm**

1 Ewweļ hem be ismê Ellah ekber  
Reḥmanê Reḥmet Reḥîmê rehber<sup>1</sup>

Kerîm karsaz kar be dest asan

Şehzadeê şerîf rehber<sup>2</sup> şinasan

Sermeşqê<sup>3</sup> neqqaş 'aşıqanê pêş

Diļdarê dîrîn derwêşê diļrêş

Be sozê sîney ko Se'ûdê 'ad

Şûrê şîrûyê Şîrînê Ferhad

5 Şeyfu'l-Milûk Bedî'u'l-Cemaļ

Heway Homîla şikufê Şehbaļ

Bêhrûzê Behram Guļendamê Çîn

Perwazê Perwêz şefafê Şîrîn

**1b**

Serencamê Se'd sewday Homayûn

Gerdabê Gerşasb karê Ketayûn

Ya heq to zîbay zewqê giştenî

Waqif sıř dadey zîb [û] ziştenî

<sup>1</sup> Rehber: rehber ND

<sup>2</sup> Rehber: rehber ND

<sup>3</sup> Sermeşq: sermeşq ND

Ewweļ to miḏey serencamişan

Axer to bînî we nakamişan<sup>4</sup>

10 Êxtiyar we ton sahib serbisat

Ce ferman to niyên deselât

To perwerdigar perwa ce kêten

Her çî to kerdî qabilê wêten<sup>5</sup>

Beļê î bende kemter ce bendet

‘Aşî ‘uşyan barê şûm şermendet

Ne dergay kerem niyazim êyden<sup>6</sup>

Umîdwarim be tom umîden<sup>7</sup>

Qedrî ce qodret ce kanê kerem

Gencê xezaney danayê bê dirim

15 Zeynim ce qodret xiştê xiyaļ bo

Zemîrî zumrey zeynim zuļal bo

Serasîmewar soxen we safî

Nawerûn xilîlet xiştê xelafî<sup>8</sup>

---

<sup>4</sup> Mebîy be nakamêşan: ND

<sup>5</sup> Her çê to kerdî qabil be wêtin: ND

<sup>6</sup> We dergay: ND

<sup>7</sup> We tom: ND



Têxî ziwanim peṛ ce cewher bo<sup>9</sup>  
Deryay derûnim peṛ ce gewher bo

Dehanim ce neqşê mirwarî peṛ bo  
Rêzanê razim be daney duṛ bo

Birêzûn rêzey le'le cewahêr  
Ziberced kerûn be sengê bahêr

20 Mînayê xewas bikêşûn neser  
Xûtey xiyal wê m ne behrê bê der

2a

Bişkafûn sendûq mohrey mirwarî<sup>10</sup>  
Erzan kerû durdaney diyarî

Bifrûşûn be seng hekakanê Çîn  
Serafan sift kenendeyê nigîn

Dinya demî bo ce watey **Ejmas**<sup>11</sup>  
Xerîd bo ce lay xewasanê xas

Bimano xiştim ce xamey xiyal<sup>12</sup>  
Yadiyarî bo ta be qerîn sal

---

<sup>8</sup> We berxişt: ND

<sup>9</sup> Tîxê zibanîm je gewher piṛ bûn: ND

<sup>10</sup> Bişkafûn şîdqê mohrê mirwarî: ND

<sup>11</sup> Demî bûn çenî: ND

<sup>12</sup> Xaneyê xiyal: ND

25 Yadigarî bo perê yaweran  
Şadî şewan bo perê hamseran  
  
Herkes be şadî biwanoş be şad<sup>13</sup>  
Dayim be do‘a bawerom be yad

Yaran goş biden be derdê dîrîn

Destanê Xusrew Ferhad Şîrîn

Şitorê Şîru Şapûr û Perwêz

Te‘ziyey Xusrew xiroşê xûnrêz

Ce halatişan eger bidey goş

Be ehwalişan diî meşo ce hoş<sup>14</sup>

30 Perî kiyanan pey şehriyaran  
Birêzûn esrîn çûn seylê waran  
  
Pey şêr û Şîrîn pey kemer laşan<sup>15</sup>  
Pey Ferhad mebûn be sengê saşan  
  
Be halê Şapûr Xusrew xiyalaşan<sup>16</sup>  
Pey Ferhad mebûn be sengê saşan

---

<sup>13</sup> Biwano: ND

<sup>14</sup> Je: ND

<sup>15</sup> Pey şoxê Şîrîn: ND

<sup>16</sup> Be halê Şapûr pey xiyalaşan: ND

Hurmiz ce newey nesi! Newşîrwan

Ne fermaniş bî Mekke ta Merwan

Ne mu!kê meskûn meha!ê memlûk

Padişahiş bê ne çuwar bilûk<sup>17</sup>

**2b**

35 Sipaş çûn sipay sanê Sikender

Xezaneş xenî ce genc û gewher

Çûn cemcemey Cem Cemşîdê Dara

Saniş ne Hûşeng bişeng winara

Saniş Siyamek Keyûmers key

Keykawusê key Keyqubadê key

Be hîç reng nebî melûlê muhtac

Silsiley sengîn be sencûdê tac

Be nocûm necim be ‘êlmê e‘dad

Be xeyrê êhsan bendê ce bêdad

40 Be bergê miskîn dirim be derwêş<sup>18</sup>

Te‘am bo geda nê‘met be di!rêş

---

<sup>17</sup> Ew padişa bî: ND

<sup>18</sup> We derwêş: ND

Belê we yek bab derdîn bî ce derd

Mudam mekêşaş henasanê serd

Ne daşt ce herem diîdarê diîbend

Mewatiş hesret bê ferzî ferzend

Axer sencid reng be sûzê adab

Neqşê moneqqeş se'î ustorlab

Libas bo yetîm bergê bê newa

Be hellê hacat be zarî do'a

45 Qebûl bî hacat hellê muşkiş

Buîbuî nîşt ne şax gulxunçey gulîş<sup>19</sup>

Şebî şehwetêş ne daney şedef<sup>20</sup>

Nuţfeş bend awerd ne kasey şedef

Çûn daney şedef ne deryay derûn

Diyar da nedîm perdey enderûn

Be xûnawê dil kerdiş perwerişt

Nigah dariş bo ce zîb û ce zişt<sup>21</sup>

### 3a

<sup>19</sup> Ne bax: ND

<sup>20</sup> Çûn: ND

<sup>21</sup> Nigahdar naz je zîb û zişt: ND

No mah û no roj wiyerd ce miyan  
Barê hemliş da nuţfeş bî 'eyan  
50 Şukûfê şedef mirwarî medar  
Xewaşê noşret daneyê şahwar

Qewsê qemer rû beyzay beyzawer  
Çûn mahê mehtab Xurşîdê Xawer

Berden mizganî pey Hurmiz mezac  
Daş be mizganî zeřî û text û tac

Daney şadî lex berze demaxan  
Teblê kûs terzê nexme ferawan

Şîlan şadî çend şebane û roş<sup>22</sup>  
Jenden gebrekan be şadî xiroş<sup>23</sup>

55 Be şewqê şadî heftiş wiyara  
Niyaşê benay bezm û meclisara  
Teleb kerd 'aqil 'alîmanê çend  
Sahîb tedbîran danayê hûşmend

---

<sup>22</sup> Roz: ND

<sup>23</sup> Zenden gebrekan be şadî we boz: ND

Niya namê naz ferzendiş Hurmêz  
Namiş be Xusrew leqeb we Perwêz

Mewelûd mewcûd be kamê waye  
Siperdiş be dest dawanê daye

*Sipordenê Xusrew be Dest Daye*<sup>24</sup>

Pêçaşan be berg waļay bo ‘enber  
Perweririş dan be şehdê şeker  
60 Şikufa çûn gul lalay helale  
Yawa be bilûx be çarde saļe

Daş be leley naz beroş be mekteb  
Wano ders ‘elim be ‘eqlê edeb

Pîr amûjziş dan be ser siwarî  
Meşafê meydan herbe guzarî

**3b**

Yawa be bilûx kemaļ merdî  
Bî we başqey merd neberdî<sup>25</sup>

<sup>24</sup> Ev serenav di NB de tuneye

<sup>25</sup> Başûxe: ND

Be qed çûn şimşad serw sinober  
Beta! kerd bunyad Behram kêşwer

65 Hûsnê cemîniş xûbter Şen'an  
Bêznaş beyzay Yûsif ce Ken'an

Ce şadî ferzend laley lalegûn<sup>26</sup>  
Demax berd ne uc pay çerxê gerdûn

Bişno ce gerdiş çerxê çepîwaz  
Neçradê nerd baz remilê bed endaz

Çi neqşê awerd be bextê Perwêz  
Çi nerd şana ce rozê Perwêz<sup>27</sup>

*Xab Dîdenê Xusrew Şêrîn Ra*<sup>28</sup>

Şebî kemer la! ne coş tawiş  
Şukûfê Şêrîn ama ne xawiş

70 Peştan bîn be hem çûn lûlê lewlaw  
Çûn bulbul ne şax xunçey gul gulaw

---

<sup>26</sup> Jê: ND

<sup>27</sup> Çi nerd şana nerd je Perwêz

Çi neqşî awerd ne bextê Hurmêz : ND

<sup>28</sup> Di NB de ev serenav tuneye.

Be qîqey demax xendey gulşikaw<sup>29</sup>

Ce xiroşê wêş herasan ce xaw

Dîş ne şîrînen ne şuxê dilkêş

Bêhoşê şeyda zîrê xatîr rêş

Pêkiya be tîr dilber ce dilda

Ta şob 'eyşê nûş deruniş cîlda

Seher hor rîza xarê xeternak

Şêtê şeyda bî yeqêş kerd çaq

75 Be şîn û zarî be dad ro ro

Dêwaney deyrî rû niya be ko

Çûn Qeysê Mecnûn deyrî derbeder

Bîjen biren çak be yedî girt ne wer

**4a**

Ce tawê xaran sernîşê xara

Rîwalane koh rûş kerd ne sara

Hurmiz dîş ferzend be zîrrê wanan

Ce textê zerkar wêş dest we daman

---

<sup>29</sup> Be qîqeyê dax xendey fekşikaf



Xelqan bî nexak feẖanê feryad  
Çeng da rîşê wêş kendiş daş we bad

80 Gina ne dimay Xusrew be zarî  
Be ser payê ‘uryan ce bê qerarî

Çend do‘ayê derwêş ‘alimanekan  
Nezir niyyet da be xeyrê êhsan

Çend be qurbanî dadê do‘ago  
Çend benir besit awerdiş we ko<sup>30</sup>

Çend nazenînan mehbûbê dilkêş  
Çend nazik neha! awerdiş perêş

Fayideş nekerd be ha!ê Xusrew  
Feramoş nebî be roz be şew<sup>31</sup>

85 Şewê hor rêza di!azar wîn<sup>32</sup>  
Be dizdî Hurmiz merkebiş kerd zîn

---

<sup>30</sup> Nego: ND

<sup>31</sup> Roj: ND

<sup>32</sup> Şî: ND

*Avordenê Xosrew be Telebê Şîrîn Der Vesten*<sup>33</sup>

Çendî ce xulam moresse' kemer<sup>34</sup>

Hor daşt çenî wêş çend gencê gewher

Ferar bî ne dûn dewranê dêrîn<sup>35</sup>

Şêtê şîwinak ne şûnê Şîrîn

Gêla ne dinya ne muşk ne milûk

Nañiyey şaran mehalê bilûk

Çar rokin meskûn gêla be şeyda

Asarê Şîrîn nekerdiş peyda

90 Minzil girt nesan serawê westan

Guzergay rohil pûlê sermestan

**4b**

Ame ne mehal muşkê Medayin

Pesend kerd ferâş be şewqê ayin

Mend be xatir xar be dîwey nemin

Ziwîrê zayif zîrê dil xemîn

Bişno ce Hurmiz aga bî ce hal

Qirça çûn qeqnes bî be koy zoxal

<sup>33</sup> Di NB de ev serenav tuneye.

<sup>34</sup> Çenî çend: ND

<sup>35</sup> Bî ferarî: ND

Sipa tayin kerd be her terefda<sup>36</sup>

Soraxê Xusrew nekerden peyda

95 Hurmiz çoqış da be dîlgiranî

Pencir da ne diî deste ziranî

Çem da çûn çewgan çemya çûn keman

Bîrmaş haz hêz gorbî ce çeman

Mend be peşîman ce dûrî ferzend

Umîdiş birya ce dînê dîlbend

Çoqiya be cim çenî daxê dûd

Çûn koterey nar siftey awesû[d]<sup>37</sup>

Xusrew çenî xar nîşê sermestan

Mend be sergerdan be Taqê Westan<sup>38</sup>

100 Rojan bê xorak şewan we bê xaw

Guşîş da<sup>39</sup> be deng naley tafê aw

Perwanan destûr sifteyê xar xem

Sifteyê sûznak bî şefafê şem

---

<sup>36</sup> Lapişda: ND

<sup>37</sup> Awesû: NB; abesûd: ND

<sup>38</sup> We: ND

<sup>39</sup> Guş meda: ND

*Der Xab Dîdenê Ferhad Şîrîn Ra*<sup>40</sup>

Bîşno ce Ferhad şehzadey Maçîn  
Şewê dî ne xaw şikufê Şîrîn

Xêza poşa berg keļbosê derwêş  
Şapûriş hordaşt awerd çenî wêş

Şapûr hem wezîr babuy Ferhad bî  
Feẋfûr haşt be ca çenî Ferhad şî<sup>41</sup>

5a

105 Şapûr her çend kerd men'îş be goftar  
Nekerdîş qebûl<sup>42</sup> Ferhadê diļdar

Horgêla be taw şîşdangê Şapûr  
Hewalê Ferhad watiş be feẋfûr

Feẋfûr dêwiya xarê xeṭernak  
Ser ta pa yeqey beden kerdîş çak

Beden kerdîş çak be nişê naxûn  
Ce textê ṭawûs<sup>43</sup> wêş kerd ser nigûn

<sup>40</sup> Di NB de ev serenav tuneye.

<sup>41</sup> Feẋfûr hêşt we ca çenî Ferhad çî: ND

<sup>42</sup> We gûş: ND

<sup>43</sup> Zerkar: ND

Taciş hewa da wêş niyane gi!

Kêşa henasan<sup>44</sup> ce derûnê di!

- 110 Fermaş bo sipah xiroşa<sup>45</sup> be taw  
Ne<sup>46</sup> şûnê Ferhad be qetrew<sup>47</sup> çepaw

Her çend kerdişan yelxar ne herla

Asarê Ferhad nekerden peyda<sup>48</sup>

Horgêla newe sipa eramend

Fexfûr umîdiş birya ce ferzend

Be xarê xemnak be di! giranî

Nîtiş be zar û mûr destê zeranî

Watiş be Şapûr bişo<sup>49</sup> ne şûniş

Bizane eħwa! halê mezmûniş<sup>50</sup>

- 115 Peydaş ker her ca çeniş bo yawer  
Ne weqtê<sup>51</sup> bê weqt ser hesawiş ber

---

<sup>44</sup> Henasan: ND

<sup>45</sup> Xiroşan: ND

<sup>46</sup> Be: ND

<sup>47</sup> Qetre dan: ND

<sup>48</sup> Nedîn ne hiç ca: ND

<sup>49</sup> Biço: ND

<sup>50</sup> Mezmûn: ND

<sup>51</sup> Wext: ND

Ce tengê terşî sezay telxê al

alatiş perîm bikyane hewa!<sup>52</sup>

apûr horrêza be dadê bêdad

Weatiş<sup>53</sup> ey kerd ne şûnê Ferhad<sup>54</sup>

Gêla weatan dinya be çû yar

Peyda nekerd al şûniş be aşar

5b

ey kerdiş dinya pey pûrê destan

Tayawa be muk serawê westan

120 Şî be lay Xusrew sucdey zemîn berd

Xusrew tewazo' bêhed çeniş kerd

Xil'etê sengin der dem bexşar pêş<sup>55</sup>

Kerdiş be wezîr hest nîstê wêş

Kerdiş be enîn kariş be ahir<sup>56</sup>

Ne fermaniş da kes nebo qadir

apûr dîş Xusrew xarê xemînen

Zanaş pîkiyay<sup>57</sup> şewqê Şîrînen

<sup>52</sup> Ewal: ND

<sup>53</sup> Weat: ND

<sup>54</sup> Weat kerdiş ey: ND

<sup>55</sup> Qedrê menzêlit la necoşar pêş: ND

<sup>56</sup> Kerdiş biwanîn gişt karê ahir: ND

Watiş be Xusrew xaîr meker xar

Pey dînê dilber meber dilazar

- 125 Henî cey fêşter şêt meber şeyda  
Şerî bo min Şîrîn bikerûn peyda<sup>58</sup>

Çûn bulbul be gul perwanan be şem

Şerî bo dilberit biyawnûn be hem

Xusrew ce Şapûr şineftîş hewal

Ce şadî şikuf şana peş û bal

Watiş be Şapûr eger ye kerdî

Ehwaî<sup>59</sup> Şîrîn perêm awerdî

Şertê şer'î bo te'eb ne wêlim

Bibexşû penet text û tacê wêm

- 130 Kerût be ser kar sere keşan gişt

Bisparûn be dest yeksan zîbê zişt

***Reftenê Şapêur Ez Pay Şîrîn***<sup>60</sup>

Şapûr şineftîş ce Xusrew xeber

Xêza sucde berd be textê exzer

---

<sup>57</sup> Bêkay: ND

<sup>58</sup> Şerten min Şîrîn perêt kem peyda: ND

<sup>59</sup> Ehwaî: ND

<sup>60</sup> Di NB de ev serenav tune.

Bosa destî şah ʔewan bî rahî

Peʔtaqê bada xatîrê xahî

6a

Weʔat kerdiş tey dinya her çî hen

Şîrîn eyda kerd ce muʔkê Ermen

Halatê Şîrîn zanaş be hewa!

Zanaş peyXusrew xaren be xiyal

135 Ewîç<sup>61</sup> çey beter giranen be taw

Şîrîn hem şew deyin be xaw

Cuyaren be soz xarê xem xiyal

Ṭaqî bizanûn ce Xusrew hewa!

Bê xord bê xaw dîde giryanen

Derûniş be coş cergiş biryanen

Şewan ta be ʔo<sup>62</sup> be şînê zarî

ʔojan mesozû ce bêqerarî

Kariş her êden ce 'eşqê diʔber

Her ʔo mexêzoş heway diʔneser

---

<sup>61</sup> Ewîş: ND

<sup>62</sup> Roj: ND



140 Kerden be 'adet xidê rozigar

Meşo be sehra behaney şikar

Çenî çil kenîz şeyday şûxê şeng

Be sozê sazan nexmeyê aheng<sup>63</sup>

Be şîşey şerab badey bo gulab

Saqî şoraşî be mezey kebab

Piyaşey bilûr mînay Şîrazî

Mezey şehdê sûr<sup>64</sup> be balê bazî

Muxennî mûkeş çil tarê semtûr

Çar tarzê temûm kizey pa be mûr

145 Çenî çil kenîz kemend we pîlan

Nazik newnehaş rendê rewîlan

Mulîkê mehbûban new tûlê şemşal

Hûrî tel'etan saşib xet û xal

**6b**

Tûle kenaçan newber newaya<sup>65</sup>

Ûnçey new şikuf sewlanê sawa

---

<sup>63</sup> Def û çeng: ND

<sup>64</sup> Şûr: ND

<sup>65</sup> Newber neya da: ND

Kiław zerrînan muřisseh kemer

Ťaqî telaar tewq tacê telaar we ser

Ketûn kelexan muřkê bo 'enber

Dîde xezalan Ťen'an ce rê ber

150 Ťerlan tewartan tûranê diľber

Ťeref teryif ne Ťîrîn beter

Temay xeyatan koy ketûn keľaf

Ťahîn Ťehbazan ahûyê muřknaf<sup>66</sup>

Megêľan be řad ne murxê zaran

Be řadî řikar ahû tewartan

Çetir çemenan sefay serewan

Seyrê ser diyar neser gıľawan

Çetir çinûran řaxey řitawan

Serewzê bûrçîn sûney serawan

155 Belkem bizanûn halê hewalî

Yam<sup>67</sup> ce rawiyan yam ce deľalî

---

<sup>66</sup> Ťewartan: ND

<sup>67</sup> Yam: ND

Rojan mekerdiş şewqê şikarî  
Şew menzil megêrt ne çeşme sarî

Mekerûn neşat be şadî şerab  
Badey bo gulab be mezey kebab

Naley def û çeng şiday sûs û saz  
Nexmey xoş aheng balê bazî baz

Be şem'ê fanûs meş'el çiraxan  
Qûley qewaqûy qîqe demaxan

160 Şîrîn padişay Ermen diyar bî<sup>68</sup>  
Ne cagey ba boş wêş şehriyar bî<sup>69</sup>

7a

Kerde bêş<sup>70</sup> betal dîwanê şahî  
Xarê Xusrew bî be xatîr xahî

*Kêşîdenê Şapûr şûretÊ Xusrew Ra<sup>71</sup>*

Bişno ce Şapûr agah bî ce hal<sup>72</sup>  
Zanaş ke Şîrîn xaren bî hewa!

---

<sup>68</sup> Diyan: ND

<sup>69</sup> Şehriyan: ND

<sup>70</sup> Pey: ND

<sup>71</sup> Dî NB de en serenav tune:ye:

<sup>72</sup> Kar: NB

Ciwiyar ھاڤen bizano xeber  
Xaren pey Xusrew zedey zam xetêr

Dayim hewalîş mepirsa pîniş  
Be hîç reng nebî 'elacê dîniş

165 Ama xiyal kerd be te'cîlê dew  
Şûretî kêşa be şiklê Xusrew  
Êware Şîrîn ama ce şîkar  
Yawa be yatax yagey çeşmsar  
Be qedd û qamet şîweş boqerar  
Seher berd niyaş ne ray çeşmesar

Guzarê yaran yataxê Şîrîn  
Bendiş kerd ne bend şerrafê dîrîn

170 Niyaş ne yatax Şîrîn û yaran  
Rewan bî ne rah çûn yawiyaran  
Diya şûretî benden ne rawiş  
Her ew şûreten aman ne xawiş

Şîrîn wêş<sup>73</sup> şûret bo şiklê şêwen

Ew şehriyaren ew perêş lêwen

Aman bî aman cuyarê dişber

Dûdê derûniş cuwişyane ser

Keft ne şûret da kerdiş be yariş

Bêxord bê ce şewq feñan û zariş

175 Dem dem hengeran be laş poşewe

Peya pey minyaş bo be poşewe

7b

Rû kerd ne şûret megêrtiş axoş

Bê xord bî ce şewq şî ce 'eql û hoş

Wat be<sup>74</sup> kenîzan îne kê kerden

Ye kê bey mekan menziş awerden

Kenîzan tamam pa niyan ne wer

Werdişan sewgend ne dayim xeber

Şîrîn wat yaran mizandê çêşen

Pey şahib şûret xatirim rêşen

---

<sup>73</sup> Dî: ND

<sup>74</sup> We: ND

180 Newa biwaçan min be her zekar  
Emin pey şikar megêlûn bezar

Min bî ey şûret weşê û lîfan  
Ser şet û şeyday era gêliman

Bewbone cemîn zayif zerdenan  
Wêl barê be lêw deyrî derdenan

Ta îse be kes nekerdim êzhar  
Megêlam be soz ne hobot û cuwyar

Her ê şûreten aman ne xawim  
Cew bone be rizen biêsey nawim

185 Ha watim pêtan derdim î derden  
Ne perdey derûn êzharim<sup>75</sup> kerdên

Îse dîm be çem dîdarê diwar<sup>76</sup>  
Çew<sup>77</sup> bone kerdim razim aşikar

Watiş yaweran yagey<sup>78</sup> nazimen  
Esrarê meħrem ragey nazimen

---

<sup>75</sup> Pênhan: ND

<sup>76</sup> Diłdar: ND

<sup>77</sup> Jew: ND

<sup>78</sup> Cagey: ND

Geştîn be yek car bêş be lamê

Baweran perêm xeber ce camê

Baweran perêm neqşê şûret bend

Werne giştîntan mekerû we pend

**8a**

190 Kenîzan be şef senciq wenaran

Ne dewir an mah wîney sitaran

Pereng pereng bîn her yek be layê

Her yek be şitab rû kerd we cayê

Yaran we yek car hucûm berdişan

Şapûr şişdanig peyda kerdişan

Şapûr şeyida sergeştey xeber

Awerden we lay Şîrînê dilber

*Avordenê Kenîzan Şapûr Ra Be Nezdê Şêrîn<sup>79</sup>*

Edeb be edeb Şapûrê dîrîn

Sucdey sucûd berd be şewqê Şîrîn

195 Medira be edeb peykê kemer la!

Şîrîn be miħbet çêş persa hewa!

<sup>79</sup> Di NB de ev serenav tune ye

Kerdiş tewazo´ be şedrê sajan

Persa çêş xeber halê hewaJan

Watiş rawiyar rake rehguzer

Ce halê şûret çêşenî xeber

Penem der eħwaJ derûnim taren

Rast waçe perêM xaşirim xaren

Şapûr wat Şîrîn wêlê haJanan

Min peykê Xusrew kemer laJanan

200 Xusrew zerîfi to diyen ne xaw

Be şêtê şeyda mesuzo be taw

Ferar kerd ce lay Hurmiz baboş

Teş kerdiş weLat peş zîbê lapoş

Nekerdiş peyda şûxê sermestan

Nîştên diLazar ce<sup>80</sup> muLkê westan

Bê xord û bê xaw xirêş giryanan

Sifteş suz ton cergiş biryanan

---

<sup>80</sup> Ne: ND



8b

Miniş kiyasten be coyarê to  
Ha yawam be to ey nemamê no

205 Eger neyaway be dadê haliş  
Şemal meşano<sup>81</sup> gerdê zoxaliş

Cuwabim îden ha watim be to  
Êxtiyar be ton ey nemamê no

Şîrîn şineften ce Xusrew eħwa!<sup>82</sup>  
Ce şewqê şadiş xêza nişt ne bal

Xêzabû şadî dilber huzûr  
Şed nobet gîla ne dewrê Şapûr

Şikufa şikuf çûn xunçey guşan  
Persa çêş eħwa! ragey menzişan

210 Waçe<sup>83</sup> biyawan be dînê dilber  
Newa ce dûrîm biwîno zerer

Şapûr şikufa çûn şikufê gul  
Watiş rast<sup>84</sup> waçe menzil be menzil

---

<sup>81</sup> Şemaliş berden: ND

<sup>82</sup> Je Şapûr heval: ND

<sup>83</sup> Watiş: ND

Beled wist<sup>85</sup> we pêş rahan be westan

Wadî be wadî ta Taqê Westan

*Reftenê Şîrîn Be taqê Vestan<sup>86</sup>*

Şapûr Şîrîniş beled kerd ne rah

Çenî kenîzan rûy kerd ew dimah<sup>87</sup>

Megîla perey firset bo şîkar

Ce lay kenîzan berşo bêqerar

215 Nagah ce teqdîr ahû Teţarî

Dîniş diyar da ne ser diyarî

Şîrîn teţar dî bo nehanewe

Cerğîş da be nîş tîrê ţanewe

Behaney şîkar hey kerd be Şewdêz

Yadê yahuş kerd yaran we şeb bêz

**9a**

Hey kerd we bałdar şoxê sermestan

Lada cew<sup>88</sup> şîkar rû kerd be westan

---

<sup>84</sup> Halîraş: ND

<sup>85</sup> Kerd: ND

<sup>86</sup> Di NB de ev serenav tune.

<sup>87</sup> Şîrîn Şapûr rewan kerd ne ra

Çen kenîzan rû ker ew ma: ND

<sup>88</sup> Ne: ND

Ran da be rikab behrî nîşt ne baļ

Awîn bî pey dîn polê new nehaļ

220 Yaran cew<sup>89</sup> dimaş hey kerden yelxar

Nedîn şunê şox eşliş be aşar

Gêlanê şaban şoxanê şeyda

Aşarê Şîrîn nekerden peyda

Kerden cost û cu ta dadê êwar

Xurşîdê xawer awîn bî ne kar

Badibanê zer keştîş bî nigûn

Tûfan bî ne gişt gerwabê gerdûn

Murxê zerîrîn baļ rêza perç û baļ<sup>90</sup>

Hûr pêça perdey badbanê zerç baļ<sup>91</sup>

225 Şiyona şifay şewqê diyarî

Keft ne mewcê behr tayînê tarî

Sipay siya reng birî şewqê nûr

Da ne debdebey diholê deycûr

---

<sup>89</sup> Je: ND

<sup>90</sup> Baļ û perç: ND

<sup>91</sup> Zer: ND

Şef da şef aray sanê sitaran  
Sipay şewqê roj maļa be taļan

Seher hor rêza be şuriş û şîn  
Qaw kewt naw welat pey şunê Şîrîn

Coşya we coşa sipay bêşomar  
Kîşya we kêşa bêdaxan hezar

230 Çapê çepaw dan yaran be yelxar  
Çend şebane ruz qetre dan be xar

Gêlan be wadî şitabê şeyda  
Suraxê Şîrîn nekerden peyda

9b

Horgêla newe sipa be carî  
Be dadê feryad be şînê zarî

Daye dî sipay xalî perîşan  
Şikufê Şîrîn niyen çenîşan

Kêşa bangê berz fixanê feryad  
Wêş niya ne gil be dadê bêdad

135 Cemîn kend be nîş<sup>92</sup> ser nûkê naxûn

Wêş kelbela kerd xelţan bî nexûn

Be şûrê şêwen Şîrînê lawnaş

Şûriş sengê sext siyayê tawnaş

Dûdê derûn rêş siftey sernigûn

Ŧufê henaseş yawa be gerdûn

Be eşkê esrîn dîdeganê şûr

Şewqê Şîrîniş melawna be mûr

Watiş ey ferzend çêş amat we ser

Keftî ne Ŧilsêm dîwanê ejder

140 Gîr werdî we çeng kamînê dîwdam

Parey beden çak zarî zuxê zam

Bendî bit be dest kam cin û perî

Ne mewcê gerdab rencê bêberî

Xalîit be xorak kam marê mûr bî

Cemînit ne dem kam canewer bî

---

<sup>92</sup> Kerd ne çak: ND

Dayet nemanô îse çûn kerûn  
Dadê derdê to we lay kê berûn

Daye çend be soz Şîrîn lawina  
Dinya be zarî zîwer tawina

245 Çend ce kenîzan saway newnemam

Be mehzim nesteq kerû pendê ‘am<sup>93</sup>

10a

Mend be diłazar zarî şînê mûr<sup>94</sup>

Çemya çuqya nûr dîdeyê kûr

Çemra çûn kemen sifteyê suz zar

Be be kuterey awesû ce nar

Nîts be peşyo haļ be diłgiranî

Pençe da ne diļ deste ziranî

Bişno ce Şîrîn ew şew tabe ır

Hey kerd be Şewdêz be yad awerd ho

250 Ce şob ta be şam ırana minadî<sup>95</sup>

Teş kerd menziłan wadî be wadî

<sup>93</sup> Be nezmê nesq pendî kerd nedam: ND

<sup>94</sup> Şûr: ND

<sup>95</sup> Peyapey: NB

Yawa be çemend<sup>96</sup> yek murxizarê

Çemen lalezar yek çeşme sarê

Xoş ama ne di! newnemamê no

Perî nasayiş satê raşet bo

Peya bî Şewdêz wer dabe çira

Xeraman be saz seyranê sara

Riya<sup>97</sup> be çeşmey zela!ê kewşer

Rîgiş mirwarî çûn durrê gewher

255 Xahiş kerd ne di!<sup>98</sup> new çeşme seraw

Perî asayiş be xusi! û şinaw

Xîza perîwar xeşit kend ce wer<sup>99</sup>

Tacê silsiley serwîn kend ce wer<sup>100</sup>

Lonik foçe besit rû ne şetaw

Xu!ey çeşmiş kerd çûn suney seraw

Destey ki!anan nazdarê çîn çîn

Tebeq da ne aw çûn balê bûrçîn

---

<sup>96</sup> Newçemen: ND

<sup>97</sup> Diya: ND

<sup>98</sup> Şîrîn: ND

<sup>99</sup> Kend ne wer:ND

<sup>100</sup> Je ser: ND

Çûn beţê bûrçîn suney serawî

Sersezwê bûrçîn laçînê awî

10b

260 Ce sumay beden bejnê newnehal

Bew xetate xet textê mawî xal

Şuley şefa bexş xurşîdê bêzna

Per û balê nûr xawerê rêzna

Hûr û melayik menden be heyran

Perî cinn û mel amaş we seyran

Hûranê cennet aman be dîniş

Şewat dan b'şewq camê cemîniş

Şîrîn be şadî meşxûl be şinaw

Neşust û şû bî çûn suney seraw

*Reftenê Xusrew Ez 'Eqebê Şapûr*

265 Bişno ce Xusrew diğdarê dîrîn

Birya qerariş pey dînê Şîrîn

Ce namanê hal Şîrîn û Şapûr

Nemend tewaney şebriş ce<sup>101</sup> şebûr

---

<sup>101</sup> Bew: ND



Qeṭre dû kerdiş qeṭ‘ê munadî  
Ṭey kerd menziḷan wadî be wadî

Banû new çemend ne xawiş diyen  
Ew şikl û şîwe peyş deyrî biyen

270 Dubare we tîr we nîşê xeṭer

Pêkiya ne diḷ be tîrê xencer

Ama be medhoş ce espê bongûn

Kînit dabe wêş midra çûn sitûn

Tiwasa Xusrew herasan be qar

Ce şermê Şîrîn wêş da ne pêwar

**11a**

Bişno ne wendiş xecalet mebo<sup>102</sup>

Perî min bîcay ‘edalet mebo<sup>103</sup>

Newa ew nebo puḷê perî bo<sup>104</sup>

Ya telêsim dîw cadûgerî bo<sup>105</sup>

275 Ya firêştay ferş seqfê serîn bo

Ya hûrê rêzwan xeldê berîn bo

---

<sup>102</sup> Meyon: ND

<sup>103</sup> Mebon: ND

<sup>104</sup> Bon: ND

<sup>105</sup> Bon: ND

Ya xurşîd xawer ya mahê taban

Elbet sitaren aman be daman

Wer ne mehaşen ta dinya biyen

Ênsan bey destûr hergêz kê diyen

Ya berşo ne<sup>106</sup> aw bipoşu bergiş

Be xatîr azar negnu ne cergiş

Ewsa min meşûr bizanû çêşen

Zumrey periyen ya Şîrîn wêşen

280 Xusrew bey destûr wêş dane wêwar

Midra muntezêr<sup>107</sup> ne guşey kenar

Bişno ce Şîrîn ne mewcê aw bî

Sumatê serwer<sup>108</sup> tacê Xusrew dî

Dubare Şîrîn şeyday diyariş

Pêkya be tîr xedengê xariş

Ce ‘eşqê dilber tawiya be taw<sup>109</sup>

Ama medhoş bo sernigûn ce aw

---

<sup>106</sup> Je: ND

<sup>107</sup> Întîzar: ND

<sup>108</sup> Sîmat û şûret: ND

<sup>109</sup> Coşiya te baw:ND

Kînit da ne di! midra bo qerar

Tersiya ce tîr taneş rozigar

285 Watiş er îse bişû ne wenriş

Newa ew nebo bignû ne bendiş

Ye Xusrew nebo naşeneftê bo

Pey min bednamî nengê sextê bo

**11b**

Herze karî bo ce bê kema!an

Bedem be law da namus sa!an

Namûs dem we bad be xanî xiyal

Çêş bideş cuwaw ce lay kemer la!<sup>110</sup>

Cey xasterînen ne şû ne wendiş

Nepîçim we dam he!qey kemendiş

290 Ber ama ne ew bergiş kerd ne wer

Silsiley serwîn taciş da ne ser

Xêza be te'cîl ce xewfê Perwêz

Suwar bî ne gu! şebazê Şewdêz

---

<sup>110</sup> Cêş ciwab je lay kemerla!an: ND

*Reftenê Şîrîn Ez Destê Xusrew û Neyaftenê Û*

Rikab da be rexş rewandey rahwar

Xêza be axêz çûn badê diîdar

Çûn murxê perwaz perwa be hem da

Awîn bî dîdar dîniş be çem da

Bîrya ce mesken<sup>111</sup> dînê dîdariş

Hîç kes nezana eşl û aşariş

295 Xusrew diya diş diîber nemenden

Ne şûlê<sup>112</sup> Şîrîn ne espê benden

Çend da be ser da şûrê şebanan

Gîliya be deşt kuh û beyaban

Her çend kerd nebî aşariş be çem

Hor gêla peşêw xestey xarê xem

Be seftey suzan eşkê esrînbar

Rûş niya neşa be zarî zigar

Şîrîn pey westan hey kerd we Şewdêz

Xusrew pey Ermen merkeb da mehmêz<sup>113</sup>

---

<sup>111</sup> Bîr ama je aw : ND

<sup>112</sup> Şûn: ND

12a

300 Ew rûş be ewla êd rûş be îla  
Ciya bîn her yek her yek ne yek ca

Perwêz be mehmêz zarî û şîneş  
Be xarê xemnak yawa be Ermen

Daxîl bî ne şar şah bî esas  
Xerîb û xemgîn wêl û kes nenas

Gêla be<sup>114</sup> her la be şêt û şeyda  
Be te'cîl şinuy Şapûr kerd peyda

Şapûr dîş Xusrew ama ce der da  
Yeşey wêş dirî xak kerd we ser da

305 Watiş mey Xusrew xarê xaşîr rêş  
Rencim day we bad ye çêş kerdî çêş

Şehzadey şişdang şehriyarenî  
Belê heyf bêsebr bê qerarenî

Axer to minet kiyast pey halî  
Bada peyda bo ce min hewalî

---

<sup>113</sup> sitêz: ND

<sup>114</sup> Ne: ND

Min Şîrînê şox şeyday eşed bo  
Kiyastim be bo welay<sup>115</sup> textê to

Henî to pey çêş amay ne cay wêt  
Xaş karî kerdey xeyr beyu we rêt

310 Be takê tenya kerdem der be der

Xuda mizano çêş amaş we ser

Min xo piyade be axêz û axêz

Nemamam çenî şitabê şûrêz

Watim ew mişo rehwaren ne raş

Min piyade ro mamam we dimaş

To rencê Şîrîn Şapûrê naşad

Ha cefay herdû bêsûd day we bad

**12b**

Xusrew şineftiş ce Şapûr ce xeber

Nigûn bî ne xak xakiş kerd we ser

315 Watiş hey bêdad diğdarê wêm dî<sup>116</sup>

Ane Şîrîn bî ce destim berşî<sup>117</sup>

---

<sup>115</sup> Be poy: ND

<sup>116</sup> Bî: ND

<sup>117</sup> Berçî: ND

Ama ne turrim şahîne şehbaz

Tevarê terlan laçîn bêperwaz

Berşî<sup>118</sup> ne destim ew ber guzîdem

Laî bam ce zîwan lêlaw bo dîdem

Daxo<sup>119</sup> be tenya ne wendê kê bo

Bendî dam bend kemendê kê bo

Bignu ce gerdab çî naşinextê

Ne damê dolab çî siya bextê

320 Şeîla<sup>120</sup> min be şad amam ce westan

Dam be la weda şewlê sermestan

Xusrew çendî [xiya]an] awerd ce diî da

Wêş ser nigûn kerd be xak û giî da

Bişno ce Şîrîn şikufê gulân

Wadî be wadî tey kerd menzi]an

Xarê xestênak serwê ser destan

Yawa be seraw pay Taqê Westan

---

<sup>118</sup> Berçî: ND

<sup>119</sup> Ta xo: ND

<sup>120</sup> Şay min: ND

Ehwaîê Xusrew persa her çê hen

Watişan Perwêz liwa be Ermen

325 Şiniftîş Şîrîn siya bî ce derd

Peyapey kêşa henasanê serd

Watiş hey bêdad şûmî şikestim

Ane Xusrew bî berşî ce destim

Berşî ce destim şehbazê şahin

Perwazê tewar<sup>121</sup> ne xakê xayin

13a

Ce muîkê Ermen kê gêro qedriş

Kê zano qêmet salarê şedriş

Ew ro min çî nîş namam be dewan

Lêlaw bam ce çem laî bam ce ziwan

330 Şîrîn bey destûr çend kerdiş bêdad

Zarî û şûrşîn feñan û feryad

Yaranê Xusrew aman we<sup>122</sup> pêşwaz

Kerden teklîfiş be şed 'izz û naz

---

<sup>121</sup> Pey ne xak: ND

<sup>122</sup> Wêş: ND



Peya bî Şîrîn ne koîê Şewdêz

Be suzê enduh eşkê esrînrêz

Tekda be meşned piştî tukê qaz

Yaran be xidmet kerden be dilwaz

Şîrîn mend be dad xiwar êwar ʔo

Xurşîdê Xawer bêzar bî ne ko

335 Murxê zerîrîn baî rêza baî û peṙṙ

Mehzûn bî ce şewq zîbay sêr<sup>123</sup> û zerṙ

Bî nûr bî ce nûr tîre bî ce tar

Penhan bî şo‘aş ne perdey peywar

Nigûn bî ne gonc tarê tûfanî

Gina ne girdab zolmanî fanî

Ṭîpê tîre tar peṙṙ bî şewq û nûr

Da ne debdebey diholê deycûr

Kûbakûbê teblî zîb rengê coşa

Sipay sitaran sema xiroşa

---

<sup>123</sup> Reng: ND

340 Şef dan şef aray qobey zîb û zer  
Ne dehrê deycûr şana bal û per

Şikest da sipay şewq û zîb û zîr  
Derya qe‘rê qehr bî be cehangîr

**13b**

Şîrîn mend ew şew<sup>124</sup> be daxanê dil  
Ta şub êşê nîş derûniş da çil

Seher şo‘ay şewq şefeq bî beyan  
Suwarî siphêr zerdî kerd ‘eyan

Şefeq kûbakûs zerîrîn ce bała  
Sipay sitaran siyahî mała

Dane kebirkey sencê sazê zerd  
Xiroşa xiroş biyaban bî kerd

345 Tewqê tenteney tarî bî beçal  
Sipay sitaran mała mała ma!

Zuhûr kerd şefeq da ce kosaran  
Hor da xîmey zerd ce ser diyaran

Xiroşa xurşîd ce xawer zemîn

---

<sup>124</sup> Ew şew mend: ND

Be kuhê kewhan<sup>125</sup> nemana cemîn<sup>126</sup>

Murxê zerîrîn baļ beyzay beyze zerîr

Ce ser diyaran şana baļ û peŕŕ

Hor da badeban zerîrînê zeŕ pak

Kiştîş keft ne gêc gerdûnê eflak

350 Seherê hor rêza Şîrîn bê qerar

Be ta û te'cîl xêza bî suwar

Suwar bî be ta û ne koļ Şewdêz

Rûş kerd ne Ermen ne şûnê Perwêz

Hey kerd we baļdar Şîrîn be şitab

Mehmêz da merkeb rexşîş da rikab

Şîrînê şeyda xestey xarê ten

Be yadê yawer yawa be Ermen

Çûn şewqê xurşîd ne burcê tarî

Naga diyar da ce ser diyarî

---

<sup>125</sup> Mahûn: ND

<sup>126</sup> Çîn: ND

14a

355 Zananê Şîrîn aman ce wadî  
Xêza zemzemey şe 'şe 'ey şadî

Kêşan ce bazar bangê hewîra  
Carîrê mizganî Şîrîn bî şeyda

Agah bîn Xusrew Şapûr ce ehwaj  
Ce şewqê şadî şana perî û bal

Enaşê zikûr Ermen be dişwaz  
Liwan we pêşwaz kerden payendaz

Keft ne pes û pêş Şîrînê dîldar  
Daneşa yelxan daxil bî ne şar

360 La negirt ne qeşr nedînê dayeş  
Nişist ne eywan seywanê sayeş

Watiş biyaran çenî menîşûn  
Mizanûn mêmman 'ezîzî darûn

Ta nişûn Xusrew newînûn we çem  
Meħalen xiyal xatîr kerû cem

Zana eḫwaliş yataxiş ce kon

Rû niya neṛa mikaniş bişon

Bew xelqê kişret bê şimarewe

Bû silsiley san şed hezarewe

365 Yawa be Xusrew diya be rengiş

Pîkiya be tîr xarê xedengiş

Şêtê şeyda bî şehbalê Şîrîn

Bêhoşû bêxod peya bî ce zîn

Keft ne xakê pay ew ber guzîdeş

Xakê ferşê raş malaş we dîdeş

Gêla ne dewrêş Şîrîn dema dem

Ce terzê Perwêz perwananê şem

**14b**

Watiş weş amay giyanim nazit bo

Şîrînê Ermen payendazit bo

370 Ser û maļ û muļk meḫaļ û weļat

Şaranê Ermen gişt bo be fidat

Şed giyan Şîrîn fiday lencet bo

Nîsarê ragey qedim rencet bo

Dîdem weş amay dîdey giyanim

Dînit bî be zewq qûtê jiyanim

Žerûr bîm ce terz perwananê şem

Sekenderasa be awê zemzem

Şad bîm ce weşlit<sup>127</sup> çûn bułbułê gul

Yawam be murad wêm be kamê di!

375 Çend reng tewazo ‘kerdiş we Perwêz

Teklîf kerd Xusrew ne qeşrê cam rêz

Çend lûley qomaş zerbaftê zerkeş<sup>128</sup>

Kerdiş pay endaz Perwêz pêşkeş

Daxil bî ne qeşr camê rêz eywan

Tek da ne mesned piştî ne eywan

‘Erûsê mincir camê rêz bêgerd

Ayiney ce duwel şîşey lacewerd

---

<sup>127</sup> Je dînir: ND

<sup>128</sup> Baftê zerkeş: ND

Xusrew nîştebê be xatîr<sup>129</sup> goşad

Rencê ramaniş ber liwa ce bad

380 Çendîn<sup>130</sup> xulaman muresşe‘ kemer

Dest bestey xidmet midran beraber

Diya ne şîwey Şîrînî Şîrîn

Şed bala beter ber liwa ce dîn

Şad bî ce şikuf cilî xetê xal

Şikufa çûn gul şanaş perç û bal

15a

Watiş heqqa şux torkê dîrînen

Heqqa Şîrînî Şîrîn Şîrînen

*‘Eqd Nomûdenê Şêrîn<sup>131</sup>*

Şiker şadiyen ha yawam be kam

Şewqê Şîrîn dîm megêlo ce lam

385 Şîrîn ce şadî dîdarê dara

Bena kerd we bezm be meclêsara

---

<sup>129</sup> Şad: ND

<sup>130</sup> Çenî: ND

<sup>131</sup> Di NB de ev serenav tune.

Sulţan sulţanen<sup>132</sup> xanê begleran

Samî suwaran namî serdaran

Teleb kerd mîran serdarê serkeş<sup>133</sup>

Meclês nişînan mîrasê mehweş<sup>134</sup>

Çenî çiyinan şîşe peyaşe

Mînay şerahî bilûrê laşe

Besaşe badey fexfûrî bilûr

Kebab û biryan mezey şehd û şûr

390 Sade saqîyan xoşxanê aheng

Xaşe kenîzan şeyday şox û şeng

Muqelled bazî nexmeyê xoşawaz

Mebazan<sup>135</sup> dihsuz başe bazî baz

Dan ne saz û tar def û ney û çeng

Muxennî mûkiş nexmey xoşaheng

Quley quwaqûy nexmey şed destan

Îca îcê cam badey sermestan

---

<sup>132</sup> Selafîn: ND

<sup>133</sup> Leşkere: ND

<sup>134</sup> Serwere: ND

<sup>135</sup> Sazan: ND



New cilûsê coş kiyananê key

Bazî badenoş qeyqey heyahey

395 Têleb kerd Şîrîn qazîyan be dew

Perî 'eqdê wêş pey xanê Xusrew

Çend şebane roz be meclêsara

Şîlanê şadî ne sûrê dara

15b

Kerden resta xêz be suzê sazan

Be şûrê şadî kemer dirazan

Dimay sûzê saz şîlanê şadî

Zemzemey zînet zewqê ziyadî

Şîrîn be<sup>136</sup> şadî xêza be xeram

Çenî kenîzan rûş kerd ne hemam

400 Daxîl bî ne hewz xezîneş zişal

Kêşa kisey bejn başay sipey laş

Celî da cemin cela da camiş

Şist û şûy kelaf xeyatey xamiş

---

<sup>136</sup> Bew: ND

Be sengê tûfi<sup>137</sup> be endaze kerd  
Fîrûzey xalan yek yek taze kerd

Poşa be endam darayê waşa  
Zîbê zerwerek zerî bafê ała

Zîbayê zerendûz ba diley zerkeş<sup>138</sup>

Kêşê kesarî mu we muneqqeş

405 Termey telarîz qetnî gul mekar

Şûfê sîmê şaf taftey bitedar

Xetayê Xuşen mewê muşebiq

Kabilê ketan<sup>139</sup> nexşê muneqqeş

Silsiley serwîn tacê gewherrêz

Lagîrê lerzan tewqê serawêz

Şîrînî Şîrîn mehbûbê daver

Bêzina beyzay xurşîdê xawer

Hûrê melayik menden be heyran

Perî perîwar amaş be seyran

---

<sup>137</sup> Tûba: ND

<sup>138</sup> Zerêş: ND

<sup>139</sup> Ketanê kabil: ND

16a

410 Xêza xeraman cîranê cerde

Pey xanê Xusrew ama we perde<sup>140</sup>

Tek da be mesned piştî be edew

Muntezêr be dîn aman Xusrew

Mîran hor daştin Xusrew be Qeyser<sup>141</sup>

Berden ne perde Şîrînê diłber

*Der Perdê Reftê Xosrev Ba Şêrîn*

Dan be deste hem herdû destişan

Yawan be murad awert westişan

Bo niyan we boy lalay le'lê hem

Ce tarzê te'zîm perwananê şem

415 Çûn bułbuł<sup>142</sup> ne şewq xunçey guł guław

Peştan bîn be hem çûn lûlê lewlaw

Dem dem meniyan dû dest ne gerden

Kerden barê leb bînay nûş<sup>143</sup> werden

---

<sup>140</sup> Rû kerd ne perde: ND

<sup>141</sup> Be xidmet: ND

<sup>142</sup> Ne şewq: ND

<sup>143</sup> Leb: ND

Ta çend çûn Şîrîn hem çenî Xusrew

Kerûn şadiman be roz û be şew

*Rêsîdenê Xeberê Mordenê Hormoz Be Xosrow<sup>144</sup>*

Be 'îş û nuş bî Xusrew be Şîrîn

Bêxeber ce dam dewranê dîrîn

Nagah wey hewa! mematê Hurmiz

Ehwa!ê mergiş yawa be perwêz

420 Watin<sup>145</sup> be Xusrew Hurmiz wefat kerd

Text û tacê ew yekî henî berd

Şaranê şêwna şûrê şînişen

Behramê Çûbîn canîşînişen

**16b**

Xusrew şineftîş ce mergê baboş

Ce daxê heşret şî ce hal û hoş

Yeşey wêş dirrî bergê beden çak

Wêş niya ne gi! siya bî xoş xak

Tacê efserîş hewa da ce ser

Bêzar bî ce dîn Şîrînê di!ber

<sup>144</sup> Xeberê Wefatê Hormoz Be Xosrew û Şîrîn: ND

<sup>145</sup> Watiş: ND

425 Fexan<sup>146</sup> û feryad be şîn û zarî  
Kerdiş resta xêz be yadigarî

Watiş rû siya bî dewranê babom  
Bêberî ce dîn baboy ɣencerom

Be daxê feraq<sup>147</sup> be cergê şed çak  
Hesretanê min siperdiş be xak

Be şîn û şîwen baboş lawina  
Cergê sengê sext siya tawina

Şîrîn be diğdar kerdiş delalet  
Fariş bî ce şîn zarî zelalet

430 Watiş be Xusrew Şîrînê diğber  
Çî haşîl ce şîn zarî derbeder

Kes niyen ce dîn dewranê fanî  
Ta sermende bo be kamiranî

Kê dinyaş be kam ta be ser berden  
‘Ezîziş ce dest merden nemerden

---

<sup>146</sup> Fêqan: ND

<sup>147</sup> Ax û feraq

Ṭewqê teneney şîn zarî û mûr  
Ne<sup>148</sup> qapî kêda dûriş<sup>149</sup> mida dûr

Niyen cey dinya be diğiranî  
Ne nîş û diğîr deste ziranî

*Dildarî Dadenê Şîrîn Be Xosrew<sup>150</sup>*

435 Ko şamalê<sup>151</sup> pêş baboy babê to  
Ceddê wêt koşî bes babê min ko

17a

Ce karê gerdûn diğ mawer we teng  
Bazarê dûnen satê be şed reng

Gêcê<sup>152</sup> gerdûnen satê be şed reng  
Demê şadiman gahî be diğ teng

Poseş nevaxten gerdanê gerdûn  
Gehê serefraz gahê sernigûn

Ga şadî dewran be şadimanî  
Ga xelğanê xûn ne xakê fanî

---

<sup>148</sup> Be: ND

<sup>149</sup> Ṭewqîş: ND

<sup>150</sup> Di NB ev serenav tune. ye.

<sup>151</sup> Ko şahan: ND

<sup>152</sup> Gêjê: ND

440 Fayideş niyen be şîn û şîwen  
Mewyero dewran dinya demêwen

Er to merdenî karê meylêt  
Bigêre yagey textê baboy wêt

Ba neşo ce bad xercê xeraciş  
Merdîm şad nebo be text û taciş

Şermendegî dewr dinya neyo pêt  
Dişmenan be şîr tane bidan lêt

Wer ne çi haşîl be zarî kerden  
‘Aqîbet Mergen her mebo merden

445 To şadî dewran her be kamten  
Sikkey selţenet nezimê namten

‘Aqîbet ne dam dewranê bê bo  
Ne min memanû<sup>153</sup> ne bazarê to

Tayin ber ne text cagey şehriyar  
Bitersî ce tîr taney rozigar

---

<sup>153</sup> Bimanom: ND

Werne ce ھاşıl be şîn û zarî

Sewdat bêşûden ce bêqerarî

Xusrew şineftîş ce Şîrîn xeber

Ťaniş ne cergiş kirya karger

**17b**

450 Diyoya ce derd şîrê laļ kemer

Dûdiş xêziya ce kapolê ser

Xiroş û be<sup>154</sup> coş be leşkerara

Xîme û xiyaban kêşa wesara

Carr da be sipay Ermen diyar da

Be sanê serdar be şehriyar da

Xêza xiroşa be serhed serdar

Coşa be axêz sipay bêşimar

Şefa şef sipa coşiya be coş

Yasaļ da saman ne dewr laļepoş

455 Xêza be axêz sipas coşiya

Ceman<sup>155</sup> be tîrey tarik poşiya

---

<sup>154</sup> We: ND

<sup>155</sup> Cehan: ND



Toz û temengîz yawa be gerdûn

Sengê serzemîn bî be toz û tûn

Lalay lalegûn sebzî sone terz

Girdiş nîşt ne seqf simawu'l-erz<sup>156</sup>

Ṭuf<sup>157</sup> û temengîz tîreyê tuz tûn

Girdiş kê ciya ne gence gerdûn

Yelxar da be dû qetre da be taw

Şebxûn da be şew çeper be çepaw

460 Çapê çepaw da pey mekanê wêş

Şîrîn keft ne pes Xusrew keft ne pêş

Yawa be weļat muļkê wêş beqar

Daş be Behrem da kerdiş tar û mar

Behram gêrt we kuşt sipaş da şikest

Ne serhedan da yek şed sinûr best

Ta be Îstambul Mekke Misr û Şam

Awerdiş be zebt dinya hen tamam

---

<sup>156</sup> Semewatê berz: ND

<sup>157</sup> Ṭewq: ND

18a

Kinaçey Qeyser pey ciftê Şîrîn  
‘Eqdiş best be şad mehbûbê dîrîn

*Awordenê Doxterê QeyserXusrew Ra*

465 Be ‘eqd û nikaş teşşerofiş kerd  
Be ham ciftê şux Şîrîniş Awerd

Yekser kerd wejat pulê<sup>158</sup> sermestan  
Horgêla ne semt seraw û westan

Be keyfê Şîrîn şelapeniş berd  
Seraw û wadî westan pesend kerd

Gêla ne her ca pey cagey şefa  
Nişîngay dewran maway bêcefa

Nişten ne westan Şîrîn ûXusrew  
Be şewq û şadî be roz û be şew

470 Xusrew be şadî pêka ceqe tac  
Dinya kerd ne zebt be xercê xerac

Sekkeş da ne sîm zerbiş da ne zer  
Fermaniş ferma ne behr û ne beş

---

<sup>158</sup> Biber: ND

Horiş bî mezbût sekkeş bê rewac  
Çiwar rob‘ meskûn awerd ne xerac

Meşrib ta meşriq çîwar êqlîm tamam  
Sekkey seltenet waniyaş tamam<sup>159</sup>

Dinya seraser awerd ne şîtab  
Şahê heft êqlîm amaneş<sup>160</sup> rikab

475 Rûmatê Fereng Xeşa û Xoşen  
Îran û Tûran Erman û Ermen

Hind û Send tamam ta Çîn û Maçîn  
Belx û Boxara saraw serzemîn

**18b**

Amaş be ferman şahan gişt<sup>161</sup> tamam  
Heleb ta Hebeş Zengiwar û Şam

Çend tuhfey teyay gerdûn bexşa pêş  
Hiç padişahê nedaşt yekê lêş

Şîrîn be şadî Şewdêz bî suwar  
Bad awer pey genc telay dest Efşar

---

<sup>159</sup> Rewac bî we nam: ND

<sup>160</sup> Ama we: ND

<sup>161</sup> Bil tamam: ND

480 Kesra pey yatax berbet perîsaz  
Nekîsa pey deng nexmey xoşawaz

B'her reng merkeb ta diwazde hezar  
Bestiş ne kemend wêş be karizar

Çend Qeşrê Şîrîn telar tamam kerd  
Be gecê<sup>162</sup> kafûr şimşey lacewerd

Be sîmê cedûl sûret be zerkeş  
Be sengê mermer neqşê muneqqeş

Şewan be şadî baîê bazî baz  
Badey bo guław nexmey suzsaz

485 Rोजan be şikar ahû Tetaran  
Qiwaquy<sup>163</sup> qişçî neser diyaran

Xusrew be hîç reng nebî dilazar  
Nedaşta dilrenc ne roy rozigar

Perey ferzendî deyrî bî ce derd  
Mekîşaş ce dil henasanê serd

---

<sup>162</sup> Çend şem'ê: ND

<sup>163</sup> Qûyaquû: ND

Dayim melûl bê daxîn derd û mend

Mesuzâ ce dax perey yek ferzend

‘Alem ‘aşî bî ce dûdê daxiş

Ferzendî nebî ce rûy ocaxiş

490 Axir be çî reng be dam û doĻab

Be necmê nocûm se‘yê ustorlab

**19a**

Neqşê muneqqeş<sup>164</sup> be remĻê remaĻ

Modi‘ay<sup>165</sup> derwêş ‘alimanê faĻ<sup>166</sup>

Bergê yetîman be xeyr û êĻsanar

Ne‘met be geda xidmet be xasan

Be çend reng kerdiş ĥacatê efzûn

Qebûl bî ĥacat ĥelliş be gerdûn

Binger ta nerraw nerdê bedamêz

Ce nexşê awerd be bextê Perwêz

495 Metin muradiş kerd be kamê diĻ

Qeza ce qodret weniş bî nazil

---

<sup>164</sup> Munecim:ND

<sup>165</sup> Be do‘ay:ND

<sup>166</sup> ĤaĻ:ND

*Peyda Şodenê Şîro Ez Betnê Maderêş*

Şebî bî we cift mehbûbê Qeyser

Nuţfeş bend awerd ne beţnê mader

Peywend bî be taqet nuţfey naxelef

Ĥemliş zohûr kerd ce kasey şedef

Çûn seng ne şedef kerdiş perwerişt

Yawa be encam zobrey zaĤê<sup>167</sup> zişt

No mah û no roj wiyerd ce miyan

Niya barê Ĥemil be diş bî beyan

500 Şikawa perdey şedef ce penhan

Peyda bî xiroş xeţay xanedan

Ce beĤrê deryay meralê bedreng

Xewas hordaştiş sengê siyareng

Mader çûn meralî bariş bî reha

Awerdiş weled aşuy ejdêha

Peyda bî weled ejdêhay neberd

Êbtiday ejder weĤî weled derd<sup>168</sup>

---

<sup>167</sup> Zîb û:ND

<sup>168</sup> Ser walid werd: ND

19b

Ce nehsî nisa' nuţfey napesend

Be şûmî çarey çeftê napesend

505 Ewwe! ce şûmiş daye aliş berd

Mader wefat kerd Şîro seriş werd

Mend we bêmader narast û naxas

Be şitur û şîn seday bêqiyas

Şedayê sehmgîn bedreng û bedreng

Dinya be feryad awerdiş be teng

Perwêz niga kerd we çîn û çariş

Be sîmay sengîn siyah sitariş

Zanaş ne qeştiş ye qatîl mebo

Xetay xanedan lêş haşil mebo

510 Tersa ce bîmiş serhengê salan

Derdem teşeb kerd remlê remmaşan

Aman remmaşan nocûmê nerdbaz

Saħiranê sext remilê nerdbaz

Xusrew wat yaran diġ be endîşen

Bizanan<sup>169</sup> taġey ŝûmiş ce çêşen

Fire metersûn ce çînê çareş

Ce sîmay sengîn siya sitareş

Mizanûn be min<sup>170</sup> ye qatîl mebo

Fisqê fesadiş lêş hasil mebo

515 Remaalın ŝendin neqşê nerdê<sup>171</sup> tas

Diyan û nocûm nişaney naxas

Saħiranê sext neŝradanê nerd

Yekayek kêşan henasanê serd

Watin beXusrew çêş waçim be to

Mayey fesaden maceray bêşo

**20a**

Bed nişan među siya sitareş

Ûzezeb miwaru ne çîn û çareş

Me'lûmen sendiġ siya bext mebo

Xeţay xanedan tac û text mebo

---

<sup>169</sup> Bizane: ND

<sup>170</sup> Bom: ND

<sup>171</sup> Reml: ND



520 Er fikriş kerdî wer ce xiyaşan  
Wer ne to mebî we pendê şaşan

Xeşay xanedan monewwer şaşan  
Tac û textê to medu be şaşan<sup>172</sup>

Ye celladê ton xûnrêzê Şîrîn  
To meşu ne bad dewranê dîrîn

*Benakerdenê Xusrew Be Qetlê Şîro We Êltemaskerdenê Şîrîn*

Xusrew şineftiş wateyê remmaş  
Cergiş nîşt ne lerz dîş da be şaşan

Derdem teşeb kerd celladê xûnrêz  
Ferman da be qetlê Şîroy şerşengêz

525 Watiş qeştê qetlê siya çareken  
Dîniş ce dîdem her awareken

Fire metersûn damê dêrînen  
Celladê xûnrêz min û Şîrînen

Celladan awerd ferzendê napak  
‘Eşlê û aşariş nigûn bo ne<sup>173</sup> xak

---

<sup>172</sup> Medî we: ND

<sup>173</sup> Ken be: ND

Şîrîn şineftîş xêziya be daw  
Be ser pay<sup>174</sup> ‘uryan yawa be Xusrew

Watiş be Perwêz ye çî xiyalen  
Mer bêhuşenî ye çî kemalen

530 Be herf û gezaf watey remmalan  
Wêt kerî we pend pey watey sağan

**20b**

Ne ray dişmenî bazî meden pêt  
Medey tîşey têz nepay pûr û wêt

Ta dewamî dewr dinya wiyerden  
Kesê qatîlê ferzendê kerdên

Gerdûn be çend reng ferzendê da pêt  
To be herfê bed misaniş ce wêt

Ferzendê ‘ezîz mîwemî baxten  
Hem şadî û hem çeşm hem çiraşiten

535 Pey çêş dirextit pey mekey ne şax  
Çî nûrê daro<sup>175</sup> yaney bêçirax

---

<sup>174</sup> Serapay: ND

<sup>175</sup> Nûrî nedaron: ND

Her ta zêndenî dinya dadîten

Ce wadê merden ca nişînten

Mîraş û maîit kesê newero

Tacê tûfanit kesê nebero

Bîbexşîş be min be êqbalê wêm

Ba ce bedî ew her çi meyo pê m

Seriş ne xeyey<sup>176</sup> camim meberûn

Be ferzendî wêm qebûlîş kerûn

540 Xusrew şîneftîş serefkende bî

Ce watey herfîş eramende bî

Bena 'elacî beta be xaşer

Nedaştîş cuwab cemaîê dişber

Be çend ê 'tiraş salarê dêrîn

Şîroy şermesar bexşa be Şîrîn

Reza da be merg nigûn bo ne xak

Wiyerd ne kuştên ferzendê napak

---

<sup>176</sup> Yeşey: ND

Hor daştiş Şîrîn be çend ‘ezîznaz

Gêrtiş be axûş dilber be dilwaz

21a

545 Seriş ce yexey camiş ber awerd

Ne cagey ferzend Şîroş qebûl kerd

Pêçaş ne<sup>177</sup> libas walay bo ‘enber

Kerdiş perweriş be şîr û şeker

Naziş da nîzam bêhter ce daye

Siperdiş be dest dayanê daye<sup>178</sup>

Bena kerdiş bezm meclês ce kamiş

Be şadiy şîlan biwanan namiş

Da ne sûz û saz zewqê zidayî

Kêşa Şîrîniş şîlanê şadî

550 ‘Alimanê ‘ilm meļlaw qaziyan

Ne ferqey<sup>179</sup> xelat Şîrîn razîyan

Be şeday şelat meqamê bêşo

Şîrîn niya nam şûmiş be Şîro

---

<sup>177</sup> Bew: ND

<sup>178</sup> Taye: ND

<sup>179</sup> Xirqe: ND

Werçîm<sup>180</sup> ce sa'et Şîroy sitemger

Nuţfeş ber awerd ce betnê mader

Mahê şefer bî cilûsê encom

Çarşenbey şefer surey sêzdehom

Mewlûdê nehşîş çew dem bî beyan

Ce barê hemlîş sema bî 'eyan

555 Cew dem ce taley şûmê bedtafe<sup>181</sup>

Yawa be bilûx çîwarde sale<sup>182</sup>

Şîrîn be edeb xêza bî edeb

Siperdiş be dest leleş be mekteb

Wendiş ders û 'ilm û xundewarî

Pîr amuzîş dan be ser suwarî

Yawa ne meqam meşafê merdî

Kes bawîş nebî ce hem neberdî

**21b**

Şed heşqey zîre be rêzesazî

Mekend ce meydan be nêzebazî

---

<sup>180</sup> Waçim: ND

<sup>181</sup> Şûrşer: ND

<sup>182</sup> Peç: ND

560 Dest û berd goriz herbey şîr û têx  
Çeng mida ne kuh mekendiş ce bêx

Hîç kes cew 'esre nebî be merdiş  
Bo beham qerîn beham neberdiş

Bağê bahû berz sehî siyareng  
Be yağ û kupağ ekwanê Erjeng

Şîfet sipî<sup>183</sup> bûm qehremanê qîn  
Rimûz û Rustem Nerîmanê kîn

Yawa be cayê birût û bedxo  
Ne hengamê weqtê wadey goft û go

565 Ce sehmê Şîro ne Xusrew ne kes  
Şadan bî<sup>184</sup> ce taw bikêşan nefes

Şaman şehriyar serhengê sipaş  
Neyaran ce xewf bewyaran ce laş

Mewyera ce layXusrew çûn qeza  
Ce ters xewfiş cergiş melerza

---

<sup>183</sup> Sefid: ND

<sup>184</sup> Ne tawan: ND

Rûşê mekêlna ce çîn û çareş

Newînu dîdar siya sitareş

Taqî mezana<sup>185</sup> hunî giyaniş bî

Xapûrî xane xanedaniş bî

570 Eşer kerd ne di! Xusrew be taqî

Ce destîş 'omriş nemenden baqî

Be!ê be xatîr Şîrîn nekerd derd

Neberdiş 'elac nuşfey nehîsbed

Ce tîflî zebûn berşî ce destîş

Qewî bî qeşaş qayim qeştîş

**22a**

Her kes be şelay herfê jenan bo

Lazim ce kariş mebo rencero

Er Xusrew be herf Şîrîn nekerd da

Ta ke neşey nûş<sup>186</sup> Şîro newerd da

*Peyda Şodenê Ferhad Be Westan we Peyda Nêmûdenê Şapûr*

575 Destanê Şîro bada bimano

Ta ew ro be rût be dîş bişano

---

<sup>185</sup> Mezanaş: ND

<sup>186</sup> Ne 'şey nûş: ND

Bişno ce Ferhad deyri daxê derd  
Ama ce westan Şapûr peyda kerd

Ferhad Şapûr di kêşa bangê şîn  
Şapûr di Ferhad xeftan da be çîn

Herdû be zarî sûzê xar xem  
Gêrten ne axûş ser û dûş hem

Awerden be yad xerîbê şaran  
Kerden şûr û şîn pey rozigaran

580 Zayif<sup>187</sup> û zamet derwêşê dilrêş  
Bezeyîş mama be ewqatê wêş

Beden bêlibas ce poşakê ser  
Poşanê bejin paş ce mutaber

Dûdê derûniş dil meka û no  
Heway henasen sengê metawno

Reway rehbanî deştey pusitşen  
‘Ebdalan destûr her ya destişen

---

<sup>187</sup> Zerif: ND



Derdîne dilrêş dewranê dêrîn

Ya hû mekêşo ce daxê Şîrîn

585 Ahir<sup>188</sup> ce kûrey cergiş mexêzo  
Qeqnes ce qirçey cergiş megrêzo

22b

Be dil<sup>189</sup> bêqerar şîn û zar şiyen

Coxdan ferarî şew bêdar şiyen

Perwanan perwaz kurey tawşen

Awan awarey şewê bêxawşen

Hudhudê heway şerrê şurşîşen

Bayeqoşê bêzar şew nalîşen

Şapûr dî cestey Farhadê fanî

Be zarî û zelîl newey kiyanî

590 Dûdiş dêwiya ce kapolê ser  
Pare kerd camey bergiş beden der

Be mûr û zarî Ferhad lawinaş

Nalêş sengê sext siya tawinaş

---

<sup>188</sup> Ayir: ND

<sup>189</sup> Bulbul:ND

Watiş min mudam nazdarê xaqan

Şazadey Çînî longê pustpoşan

Be çi hâlenî hâlê zan dîrîn

Ne min bimanûn ne şûnê Şîrîn

To nazdarê nûr fexfûrê Çîn bît

Ber guzîdey muşk Maçîn zemîn bît

595 Min wêm longê pust bejnê bergê to

Şapûr mewtiş bo wer ce mergê to

Ewse dimay to ce daxê bêşot

Çêş biru cuwab baboy rencerot

Fexfûr bizano bey tewern hâlît

Biwîno<sup>190</sup> rehban reşte 'ebdalît

Dayet bingero be hâlê Ferhad

Dûdî daxê toş çûn meşo ce yad

Çend kerdiş zarî fexan û feryad

Çendê lawinaş zelîlî Ferhad

---

<sup>190</sup> Biwînûn: ND

23a

600 Dimay şûr û şîn zigar û zarî  
Şapûr be Ferhad kerdiş diġdarî

Watiş be Ferhad diġmawer we teng  
Gêcê<sup>191</sup> gerdûnen saqî be<sup>192</sup> şed reng

Her posen bazar seraçey sepenc  
Gehî<sup>193</sup> şadiman gehî derd û renc

Pusiş newaxten bazarê bêpo  
Gahî ne şadî gehî derd û renc

Ga ne zîb û zewq ne padişahî  
Ga ne derwêşî kesbê gedayî

605 Fire kes çûn to xem derûn xeylê  
Nedarî xeber Mecnûn û Leylê

Ya Seyfu'l-Milûk Bedî' u'l-Cemaġ<sup>194</sup>  
Ferqey Fereydûn şikufê Şehbaġ

---

<sup>191</sup> Gêjê: ND

<sup>192</sup> Je: ND

<sup>193</sup> Gahî: ND

<sup>194</sup> Şeyf: NB; Milûkê Seyf Bedî' u'l- Cemaġ: ND

Homîlay çilgîs se' dê Homayûn

Ya canî Belqîs karê Ketayûn

Behramê kêşwer Gulendamê Çîn

Menîjey<sup>195</sup> Bîjen camê cehanbîn

To ziyater nît ce yaranê pêş

Dilberî<sup>196</sup> dilber cewr û cefakêş

610 Hem posen sewday 'eşqê dildarî

Fire kes çûn to wasten bêzarî<sup>197</sup>

Her ta nekêşî sezay rozigar

Ce ko miyawî be dînê dildar

Her ta nenûşî neşeyê nûkxar

Çenî şad mebî be weslê dildar

Ber ker ce xatir xiyalanê xam

Ce şewqê Şîrîn miyawî be kam

**23b**

Ew Şîrînê şox to daxit berden

To xatir şad ber min peyda kerden

---

<sup>195</sup> Menîce: ND

<sup>196</sup> Deyrî: ND

<sup>197</sup> Aqîbet be yawen kamê kêşen: ND

615 Hane westan ra çûn şew çiray şew

Be heremseray kiyanê Xusrew

Ce muşkê Ermen awerdim perêş

Şaden ce dîniş xanê xatîrrêş

Bigêre sakin guşe kenarê

Bisazîm ce reng mesazîm karê

Ťaqî bizane awat westenî<sup>198</sup>

Men'it mekeran heqq be destenî<sup>199</sup>

Her çend neçakeş sezawarenî

Bawîşen her çend cefa berdenî

620 Cew sawe dîdar dişberim diyen

Heqa mezanûn heqê to biyen

Şapûr mizdanî dişber be dişad

Ew ro muştelex watiş be Ferhad

Ferhad şineftiş eħwalê Şîrîn

Şad kerd xatîriş ce derdê dîrîn

---

<sup>198</sup> Westen: ND

<sup>199</sup> Desten: ND

Şikufa be şad ce xarê sernêş

Yawa be murad diłaramê wêş

Watiş be Şapûr derdim şafiyen

Namiş şineftim be<sup>200</sup> min kafiyen

625 Peyda kerdim şûn<sup>201</sup> Şîrîn ne ramê

Be taqî zanam ha ne çî cayê

Ne her xakî<sup>202</sup> bo<sup>203</sup> cayê umîden

Xakê ew zeyde qûtê zeynemen

Her zeydî şinoy Şîrîn bo têda

Nesîmê cennet miwaruş pêda

**24a**

Ew zeydê zamin şifay derdimen

Hem diway derman awê serdimend

Elbet her carê mişnewu namiş

Dił sakin mebo ce zûxê zamiş

630 Şapûr ne Ferhad<sup>204</sup> xordê xawiş bî

Be weqtê bêweqt serhesawiş bî<sup>205</sup>

---

<sup>200</sup> We min: ND

<sup>201</sup> Şewq: ND

<sup>202</sup> Cage: ND

<sup>203</sup> Bon: ND

<sup>204</sup> Ferman: ND

Ne fikrê fam bî baweriş be yad  
Carê binmano Şîrîn be Ferhad

Bikerû 'elac diîdarê dêrîn  
Şaelleh ne cay biwîno Şîrîn

Ama be te 'cîl Ferhadê diîteng  
Qulingê sazna şed menî ye seng

Herdû hewa da ustayê sengtiraş  
Awiş be dem pey neqşê neqaş

635 Rûş kerd ne xaran be sengtiraşî<sup>206</sup>  
Xaran metaşa be nexme paşî<sup>207</sup>

Namê neqqaşî Ferhad bî menşûr  
Zahir bî ce lay Şîrîn û Şapûr

Şîrîn hizêş bê be dinyadarî  
Mekerdîş seyran be dewletdarî

Megêla dayim ne dewrê dîrîn  
Zimistan mekan ne Qeşrê Şîrîn

---

<sup>205</sup> Rojan diîdarî şewan hem razîş  
Bêhter je baboş mekêşa naziş: ND

<sup>206</sup> Nexme paşî: ND

<sup>207</sup> Sengtiraşî: ND

Miz û mêş mekerd çira ne sara

Şîrîn meduşa pey meclêsara

640 Ne cagey çiraş sebzî sunbiļ bî

Ce amaw liwan xeylê muşkiļ bî

Zehmet bî amaş<sup>208</sup> perey miz û mêş

Piştaniş ce xar xaran mebî rêş

24b

Şîrîn be Şapûr watiş çûn kerîm

Çarî be çarey ey kare berîm

Er kesê biya karê bikerda

‘Elac be çarey karim bikerda

Mewqûf peyamiş ce rîşê xaran

Ce amaw liwan sare êwaran

645 Sewday şefayî lêş şader biya

Şîriş ce lay min her xaţir biya

Şapûr şeneftiş awerdiş be yad

Sewday serencam sengtaşî Ferhad

---

<sup>208</sup> Aman: ND



Watiş be Şîrîn be êqbalê wêt

Ustadî qabil mawerûn perêt

Ye watiş Şapûr be xatîr goşad

Rewan bî derdem ne şûnê Ferhad

Ferhad peyda kerd çûn Qeysê Mecnûn

Ne herdey bîrî xîwar sernigûn

650 Hêzê paş nebî payîş we pawe

‘Eşa mekêşa laşêş berawe

Şapûr Ferhad dî halatiş bew hal

Siftey zoxaliş her şana şemal

Yawa be Ferhad be şîn û zarî

Kenît daweneş kerdiş diîdarî

Watiş be Ferhad xatîrt meker teng

Sazanim sewday karit be yek deng<sup>209</sup>

Be sengtiraşî er karê kerdî

Fermanê Şîrîn be ca awerdî

---

<sup>209</sup> Rend: ND

655 Nerdê nexşê xaş meyo be falit

Mekerû fereh muşkiş be halit

25a

Henî wesen dûd sezaw derdiser

Şitûr û şîwan zarî derbeder

Xarê xem werden sûdî niyen pêt

Fikrê hal kere be eḫwalê wêt

Ferhad ye şineft şikufa be şad

Xiyaşanê xam derûn da we bad

Watiş be Şapûr minnet meberûn

Fermanê fermat be ca<sup>210</sup> mawerûn

660 Ey kare fetway fethê faşimen

Lazim benay xeyr be êqbalimen

Ne cildî mujdet siftey nar û nûr

Şed newbet gêla ne dewrê Şapûr

Xêza be axêz xarê xaşirteng

Be şadî demax şanaş ew quleng

---

<sup>210</sup> We: ND

Pertafê pada diŕdarê dêrîn

Daxil bî Ferhad ne qeşrê Şîrîn

Kerdiş ce her cext be mewday quleng

Taşa ce taşan sengê rengareng

665 Ce sê fersexî bendiben coş best

Peywest kerdiş seng ustay ziber dest

Nezmiş kerd ce taw ce sufare seng

Ta be pay telar reşhet şox û şeng

Ĥewzê ce ey ser Ĥewzê ce ew ser

Qerar da be seng çûn Ĥewzê kewşer

Bipuşa seriş be sengê mermer

Mama dûr ce Ĥewz be saye perwer

25b

Şîrê sayeseng mama şaxe ker

Mida boy ‘enber çûn şehd û şeker

670 RaĤet bî ce rah biz û mê nekar

Ce amaw liwan îniş nîşê xar<sup>211</sup>

---

<sup>211</sup> Je sar û rêwar: ND

Ne çiray çemend çadî winanan

Sakin bî ce ray sare êwaran

Farhad karê kerd be têşekarî

Bimano ce yam pey yadigarî

Şapûr dîş ama<sup>212</sup> fermanê ferhad

Şadî ker be şewq be xatir goşad

Bosa dest û pay hunermendê Çîn

Xeylê be Ferhad kerdiş aferîn

675 Watiş fidatim serim ne rêten

Dişdari huner her<sup>213</sup> bawê wêten

Emcar mezanûn deyrî kawê ko

Şed kes çûn Şîrîn layiqen be to

Ce kerdey karit hezar aferîn

Min rû sefid bîm ce şewqê Şîrîn

Şapûr ye watiş riwala be şad

Awerd pey Şîrîn eħwaîê Ferhad

---

<sup>212</sup> Ama dî: ND

<sup>213</sup> Pîr: ND

Be şeh d û şeker be lefzê Şîrîn

Watiş be Ferhad hezar aferîn

680 Rûş kerd ne Şapûr Şîrînê Ermen

Rêza ce dihen gewher be xirmen

Watiş be Şapûr biperse çeneş

Çêşiş lazimen bibexşû penes

Ce karê muşkiş ne hesan û şen

Her çi biberu welle ba wêşen

26a

Şapûr keft ne xak kiyanî neşeb

Xêza û sucûd berd midra be edeb

Watiş fidatim şoxê susen xal

Mebo to ce rêş bipersî hewa!<sup>214</sup>

685 Bizanî ce çêş xatireş wêşen

Çêşiş lazimen menzûriş çêşen

Belkem newaço be min haîê wêş

‘Erzê to keru dûdî derdê wêş

---

<sup>214</sup> Hewal:ND

Şîrîn be Şapûr nebî dîlazar

Bena be xatîr cefay rozigar

Berde bê neşaş sezay derdiser

Be herfê Şapûr nemeşî we ber

Qewûl kerd Şîrîn goftariş ne dîl

Şikufa be şad çûn şikufey gul

690 Fewtey zer neqab da ne banê ser

Ferhadiş der lad teşeb kerd xaşer

Neqabiş ne der Şîrîn da hesar

Cemîn kerd xişar ne perdey pêwar

Şapûr be şadî serencamê wêş

Ûwala Ferhad teşeb kerd ne pêş

Watiş be Ferhad kamen karê to

Bo be sayey şewl newnehaîê to

Meker xewf û bîm susen<sup>215</sup> sayeten

Biwaze meşleb her çê wayeten

---

<sup>215</sup> Şewl: ND

695 Şadî ker be şewq dewranê kamten  
Dîn û dilaray cemîn camiten

*Amedenê Ferhad Be Pabûsê Şîrîn we Xeber Porsîdenê Şîrîn*

26b Ferhad şineftiş ce Şapûr eħwal  
Şikufa çûn gul şana peřr û bal

Derûniş dergay şadî kerdewe  
Çûn xunçey gulân tebeq berdewe

Watiş be Şapûr dostê nehanî  
Serim muştelex giyanim mizganî

Ce şadî şikuf dîn û diğ hozûr  
Şed newbet gêla ne dewrê Şapûr eħwal

700 Riwala be ‘ezm Ferhadê dilrêş  
Ne semtê sayey newnehalê wêş

Perwaz da be ‘ezm<sup>216</sup> siftey xarê xem  
Perwanan destûr perî şewqê şem

Yawa be<sup>217</sup> qedem sayey şewlê şaf  
Ne çerendey çetr ahûyê muşknaf

---

<sup>216</sup> Pîr: ND

<sup>217</sup> New: ND

Çûn Ke‘bey Şerîf hacat<sup>218</sup> dînê pak

Sucdey zemîn berd rû maļane xak

Xêza ce zemin ce pabusê paş

Midra be edeb serenrazê saş

705 Medh û şena wat pey dînê diļkêş

Dest ne ban dest midra ne cay wêş

Şîrîn niga kerd be şewqê Ferhad

Sewday Zilêxa awerdiş be yad

Diya bew dîrey cemînê rengiş

Pîkiya be tîr xarê xedengiş

Belê metersa ce xarê exyar

Wer ne ce dîniş diļ kerd giriftar

Ama be goftar diļdarê diļber

Eşl û aşariş çûn şehd û şeker

**27a**

710 Watiş be Ferhad muradit çêşen

Eşl û aşarit neşeb be kêşen

---

<sup>218</sup> Qible: ND



Ce sengteraşî çêşit xiyalen  
Benat bozorgen ya gencê maîen

Her çît xiyalen huzûren wenet  
Çêşit lazimen bibexşûn penet

Ferhad şineftiş ce watey Şîrîn  
Dîdeş dêwiya ce<sup>219</sup> awê esrîn

Seylê awê eşk zûxanê zaman  
Ser kerd ne dîdeş rêza be daman

715 Dêwiya dûdî derûniş ce derd  
Peyapey kêşa henasanê serd

Watiş be Şîrîn ce gişt wiyerdim  
Ser û maî û muîk fiday to kerdim

Gozeştim ce zîb zer û zewqê dil  
Çûn şeyda perî buîbuî wîney gul<sup>220</sup>

Bozorgan ce dîn bê riya mebo  
Şahan nezeriş kîmiya mebo

---

<sup>219</sup> Be: ND

<sup>220</sup> Çûn buîbuî şeydam perî xunçeyê gul: ND

Mebo bizanî menzûrim çêşen

Nebaşî neşeb neşlim be kêşen

720 Ne neşlê nakes ne geday maşim

Dîwaney dêrî perî xiyalim<sup>221</sup>

Eşlim mepirsî neşlim ce xaşen

Danem ce şedef xaşey<sup>222</sup> xewaşen

Beîê ne şerraf ne gewhernasen

Roziğarê roj rextê libasen

Ew şewqê Şîrîn daney şinasen

Heyatim<sup>223</sup> xerîk ne toy peşasen

**27b**

Ne zer û zînet dinya wiyerdim

Teklîfê dîdar dînê to kerdim

725 Poşanim reday reştey rehbanî

Liwam ne cagey Şêxê Şe‘nanî

Er darî nezer new nemamî no

Kêşam riyazet rence ne ray to

---

<sup>221</sup> Xiyalê xalem: ND

<sup>222</sup> Xewaş: ND

<sup>223</sup> Xeyalim: ND

Er rencim berdim<sup>224</sup> nedey be zaye

Biyawnem diłim be kamê waye

Niyen lazimim renc û genc û maļ

Heqqê min êden biwînû<sup>225</sup> cemaļ

Biwînûn dîdar camê cemînit

Diļ sakin kerû ce derdê dînit

730 Eger heq medey heqê min êden

Wer ne ce dinya diļ naumîden

Ce padişahîm berşîm ce qellaş

Yawam be cayê bîmê sengtiraş

Cew bone kerdim ce 'eşqê dînit

Carê biwînûn camê cemînit

Hezar temen maļ zeřr û gencim bo

Geştîm kerd we nezr fiday bejnê to

Ha watim perêt derdê wêm tamam

Êltêcam êden baqî wes- selam

---

<sup>224</sup> Rencê rencim: ND

<sup>225</sup> Biwînûn: ND

735 Şîrîn şineftiş ce Ferhad xeber  
Pêkiya be tîr be mewday xeter

Cerğış da be çil be nîşê xaran  
Ce dîn û dîdeş di kerd qeraran

Ce rîzey raziş cerğış kawiya

Derûniş be suz zarî tawiya

28a

Belê metersa newa xarî bo

Ya neşlê nakes herzekarî bo

Satê ce sewda fikriş berdewe

Qapî xiyala derûn kerdewe

740 Tersa ce exyar newa bizanan  
Bednamiş ne ‘am ‘alem biwanan

Watiş be Şapûr derde darêwen

Me‘lûmen ye şêt herzekarîwen

Bada bimano ce lay to be şad

Enîn ber be haļ be suzê Ferhad

Ta min bizanûn neşlîş ce kamen

Eşlîş çi kesen ce koş meqamen

Te watiş Şîrin be xewf û endêş

Ferhad ast be ca şî be yurtê wêş

745 Ferhad mend be ca çenî derdê wêş

Be suz û zarî êş û nûşê wêş

Dîdarê dîrey newnehaļ no

Çeman xawê bî nawerdiş be ڤo

Bijangê diļber betertter be tîr

Pêkiya be tîr neşeyê kargîr

Çûn Qeysê Mecnûn wêļ bî ne wadî

Be şîn û şîwen zîlmê ziyadî

Rûş kerd ne xaran be sengtiraşî

Be neqşê neqqaş be nexme paşî

750 Şîrîn cew beter be weswasê rew

Sifteyê suznak be ڤoz û be şew

Ferhadê fexfûr gêļa ne bîdî

Be kaw û kawan be naumîdî

28b

Ama ne seraw serçeşmey westan

Benaş kerd be kar seyrê sermestan

Bisazû taqî ce taşê xaran

Yadigarî bo pey rozigarar

Bitaş û şûret neqşê muneqqeş

Şîrîn û Xusrew Rustem çenî Rexş

755 Beg û begleran xanê soltanan

Xelq û xelayiq ta pehlewanan

Tîpê Teţeran polê sermestan

Beyan be seyran pay Taqê Westan

Niga ken be neqş neqqaşê Ferhad

Hem rencê berdeş baweran we bad

Bizanan sewday ‘eşqîş ye kenden

Destîş ha ne xak destkariş menden

Posen sewday bed beter ter têx

Kaw û kiwekeş maweru ce beş

760 Dewranê dinya nedaro wefa  
Sewdaş bê suden bazariş cefa

Herkes be rengê yek bezrê kaştên  
Neçîre bariş be cage haştên

Wiyerden liwan ne roy rozigar  
Diyaren ce dûr çûn zerey zewar

Sewdaş sipurden be dewranê dûn  
Wiyerden ce yam bêşert û bêşûn

Ser berden nesay sanê seray seng  
Konê ce gilluy tarîkneyê teng

765 Sayey seywanîş menden bê esas  
Xerîkê xaken peşrin ce Elmas

**29a**

Ferhad ce westan dest da ne quleng  
Ta û têşey têz ce xaranê seng

Taş û terhê taq telarê eywan  
Ne serçeşmey şaf serawê seywan

Ce yasê yasîn qoley serender

Sazî țelarê çûn qeşrê qeyşer

Şehbalê exî ejdêhaw ejder

Qerar da ne dewr haşiyey kemer

770 Saza ce seywan sûrey neqşê nexş

Teşwîrê Şapûr Rustem çenî Rexş

Şapûr û Şîrîn Ferhad be ewreng

Şiklê şêweşan qerar da ne seng

Ahûyê muşknaf gulwazê gulrem

Nağdar û bağdar fil û fer ne hem

Eywanê seywan sazaş xeş û xal

Mekîna ne paş serçeşmey zuğal

Ferrey fiwaran ce sîney kemer

Mexêza çûn gul çûn awê kewşer

775 Be rûyê yasra neşî be gerdûn

Ce yasê ebleq mebî sernigûn

Meşanaş ne rûy taşê ebleq reng



Ne yasê xaran mebî şed pereng

Medrûşa ce reng daney diyarî

Her rêzey ce terz rêzay mirwarî

Fewcê fiwarey taqê serkeşan

Meşî ne keywan ka û kehkeşan

Mexêza ce durc sanê siyaseng

Menişit ne eywan çerxê mînareng

**29b**

780 Terhê tayar kerd ne xaray kemer

Xaşter ce eywan xaqan û qeyser

Terzê çil sitûn derîçey zemzem

Bêhter ce telaar şahanê bê xem

Temam kerd tayar turrey cedaalkar

Terfîb da be seng be neqşê nigar

Fermanê Ferhad menşûr bî ne 'am

Bî we dasitan watey xaş û 'am

Bî be yadigar dewranê dêrîn

Ta yawa we goş Xusrew û Şîrîn

785 Xêza xeraman Şîrîn û Xusrew  
Be ezmê seyran riwala be dew

Şapûrê şahana polê sermestan  
Aman be seyran sera û westan

Yadan be westan şahana be dişad

Diyan be destkar fermanê Ferhad

Be kar û ferman mekerdî seyran

Şîrîn xeciş mend Xusrew bî heyran

Şapûrê şahana Xusrew û Şîrîn

Kerden be Ferhad hezar aferîn

790 Xusrew wat yaran derûnim maten

Ustadê westan ba û xeşaten

Beratê en'am ce zeşî û zîwer

Bila bidîn pêş tacê tewanger

Zorê hunermend bê hesawîşen

Her çî bidey pêş wella bawîşen

Gencê xezayin xezêney Yemen

Her çê bidey pêş heman her kemen

30a Xusrew ferman da be fermanê wêş

Ferhad seng û taş teleb kerd ew pêş

795 Ferma fermayan salarê serwer

Be te 'cîl Ferhad awerden ne wer

Yawa be qedem neşlê neşeb pak

Şena da be şah sucûd berd ne xak

Xêza ya ce xak erkan be 'eceb

Dest bestey xidmet midra be edeb

Xusrew wat Ferhad çêşt menzûren

Waçe birewn pêt her çêt zerûren

Hukmê hikûmet ya genc û ya maļ

Er kefte karî bawerûn be haļ

800 Her çê lazimen waçe bidewn pêt

Nedarûn derêx be êqbalê wêt

Watiş fidat bam derwêşê dilrêş  
Geda be hikûm hikmet yanî çêş

Sayil çi kariş be genc û maşen  
Er loqime bo be qedr û haşen

Niyen lazimim zerî û genc û maş  
Sewday herfê min perî derd û haş

Maşê min derûn rencim riyazet  
Be min bideran barê siyaset

805 Er we genc û maş dinya herçê bo  
Kerdim be fiday tofeylê Xusro

Êdim lazimen ne pabûsê to  
Loşfê to seywan sayey serim bo

Kesê ne heqim sitemkar nebo  
Ferman berdarim ne fermanê to

**30b**

Her ta zinde bû be pa serbanit  
Kemer bendey bîm be asitanit

Ce sengtiraşî ce kendenê ko  
Bende fermanim ne fermanê to

810 Xusrew ce Ferhad şineftiş soxen  
Diya ne kemaļ goftarê koken

Pesend kerd goftar ‘eql û kemaļiş

Meniş be xaţir hoşnê cemaļiş

Diyaş ne cemîn ce neslê paken

Teļay eħmeren û ne xoş xaken

Şehzadey kiyane eşlê kiyanen

Aşarê eşliş be min ‘eyanen

Ferman be Şapûr şahê haţem xo

Ferhadê koken misparûn be to

815 Ser hesawiş ber ne weqtê bê weqt  
Ce xord û xorak ce poşak û rext

Eger dilrenciş be xaţir yawan

‘Etabiş ce to megêrûn tawan

Ha watim be to ce rozigarî

Nige darîş ker meyo be karî

Xeylê xatiriş ce lam menzûren  
Rojê hen Ferhad be min zêrûren

Şapûr sucde berd ne xakê sara  
Kerdiş temenay te' zîmê dara

820 Watiş fidatim ferman meberûn  
Emr û fermanit be ca hawerûn

Xizmetkariş hem ey ber guzîdem  
Palaş megêrûn we banê dîdem

**31a**

Şert bo be rengê ew bilawinû  
Xatiriş ce xar xem negawinû

Ye watiş liwa kiyanê Perwêz  
Rû niya ne qeşr eywanê camrêz

Waşîl bî ne text bewrê bolendbext  
Tek da be mesned qerar da ne text

825 Bişno ce Şîrîn derdê diî ziyad  
Zedey zam xeter mejanê Ferhad

Dûr ba dûr ce to be mewday xeşer

Pêkiya be tîr Ferhadê dilber

Cergiş da be çîl be roj û be şew

Bê şebr û aram bê xord û bê xew

Be nêşê noxûn barê xem werden

Diya ne zamiş be mewt û merden

Żayif bî ce reng zerdê ze'feran

Xaşte ce Leylê ce Mecnûn mekan

830 Çûn Yûsifê Mêşr Zilêxay Ken'an

Beter ce tersa be rozê Şe'nan

Şêtê şeyda bî ce derdê Ferhad

Ce xiyaîê xoş nebî diłazar

Xawiş ce xem bî xorakiş zarî

Coşê siyaset ce bêqerarî

Nebî mudaraş çenî daxê derd

Dem dem mekêşa henasanê serd

Birya qerariş şebûrîş ce taw

Bî be çûbê xoşk bê xord û bê xaw

835 Røjê be Şapûr watiş be ruxşet

Ferhad baweran perêş be xelwet

**31b**

Biwînûn ce min camê cemaîş

Bipersûn xeber bizanûn haîş

Ṭaqî bizanûn eşliş ce neşeb

Bişna sû erkan ‘eqliş be edeb

Watiş be Şapûr her tonî kesim

Ne roy tenge da be feryad resim

To bît be sebeb kerdey karê min

To min awerdî bî zîd û zamin

840 Xerîb û xemgîn be to menazûn

Min ke xerîbim her to mişnasûn

Her tonî enîs mûnis be karim

Tonî cay umîd xarê xemxarim



Razim ha ne lat mekêşî nazim

Be to mewaçûn raz û niyazim

Çenim berdenit cefay rozigar

Razê min be to nimebo pêwar

Umîdim be to muşkişim keften

Dilim qirçiyay giranê neften

845 Sewday 'eşqê ew keften ne serim

Be pêkyay peykan xarê xeşerim

Karê wê m ce to çêş niyam kerûn

'Eşqê Ferhaden keften ne derûn

Henî ne menden tabê tewanam

Mebo biyawî be dadê hanam

Mebo to Ferhad bawerî perêm

Biwînûn dîdar dişaramê wê m

Biwînûn ce min camê dişberim

Sakin kerûn nêş xarê xeşerim

32a

850 Çeneş bipersûn eḫwaḷê taqî

Bizanûn çeneş neşliş be taqî

Me'lûm kerden lêş ne kam Şîrînen

Eşliş çenî min be ham qerînen

Ce eşlê pakan ya eşlê napak

Nuṭfiş ce xaşen ya xarê xaşak

Newa nanecîb naşinextê bo

Ya eşlê nakes siya bextê bo

Şêtê her cayê herze gêlê bo

Ya geday derwêş wehşî wêlê bo

855 Bê eşlê bê neşeb nadiyarî bo

Bê nam û nişan herze karî bo

Çenêş kerû raz diḷ be aşikar

Wêm kerû we pend watey ʔozigar

Çaw riswayim bimano ce yam

Bim we serzeniş be ser janê jar

Waçan bednamîm her yek be faşê

Banû wêş baxtî be sengtiraşê

Mebo ce ezel fikrê wêt kerdî

Serit be saman dîn û wêt berî

860 Ewel kerdî fikr xamê qedîman

Ta ce axeriş nebî peşîman

Carê bizanû neşeb be kêşen

Ce sengtiraşî menzûriş çêşen

Şapûr şineftiş sucde berd ne xak

Şena da be dîn eşî û neşeb pak

Watiş fidatim kemter kemînim

Ûolamê êxlaş şahê şîrînim

**32b**

Her ta zindetan be asitanit

Ûafilîm niyen ce pasibanit

865 Ewel ce ezel min tom lawnan

Min tom bey mekan menzilêyawnan

Min berdim cefa ne pey karê to

Min bîm be xilel  ozigarê to

Min tom be ferzend w m qeb l kerden

Min bab  tonan ta be  oy merden

 ap r ba beten n r  giram 

Niyen ce lay min nemek  eram 

Ce min xiyalan xatir biker cem

Sirr    raz  to nemeknom nedem

870 Min me rem  raz derd  nehanim

Her  i biwa i bende fermanim

Ne ferman  to minnet meber n

Emr   fermanit be ca mawer n

 ir n girewa be suz   zar 

Wati  bibere  ar   na ar 

Na  ilecenan mu kilim p ten

 eyb  ce min bo hem  eyb  w ten

Mebo her fikr  ker  be  alim

Wer ne şemaļ şend siftey zuxaļim

875 Şapûr şineftiş řiwala be dad  
Be şewqê şadî yawa be Ferhad

Dîş Ferhad keften ne xakê sara  
Zelîlen ce zam sernêşê xara

Rengê zerd zayif ceste haļ peşyo  
Xemîdey xeman wêļ û bar be lêw

33a

Şîn û zarîşen be dadê bêdad  
Be şewqê şadî yawa be Ferhad

Dîş Ferhad keften be xakê sara  
Zelîlen ce zam sernêşê xara

880 Zelîlen zamit xarê xiyalaen  
Çemray delîlen rağey hewaļen

Ya hû megêşo terzê 'ebdaļan  
Her dad dadişen ce zuxê saļan

Yawa be Ferhad Şapûr be zarî  
Yawnaniş be naz kerdiş diļdarî

Watiş şebrit bo ey şahê Ferhad  
Şabir şebriş kerd yawa be murad

Şad kerd xatiriş ce serniyiş çil  
Xarê xiyaşan xalî kerd ce dil

885 Beharet ama wîney buşbuşan

Şikufa şikuf xunçet be guşan

Nerredit şana remlê nexşê nerd

Awerden dimay demaxit ce derd

Firêştey falit bêdar bî ce xaw

Necmê nocûmit ama ne xesaw

Ber ama ce burc mewtit ce memat

Sitarey siyat berşî zulimat

Fariş bî ce şîn zigariş werden

Şîrîn be xelwet toş teheb kerdên

890 Horîze bişîm şemalê hatşen

Kiştît ne girdab rûyê necatşen

Ferhad çûn şineft ce Şapûr xeber

Mojdey mizdanî ce dînê dilber

33b

Ce zewqê şadî xiru şiyawe

Çûn xunçey guşan şikufiyawe

Xêza be şadî xahiş be zêrûr

Şed newbet gêla be dewrê Şapûr

Watiş fidatim dostê nehanî

Giyanim payendaz serim mizganî

895 Her ta zindêtan bendey xaşê tom

Ûolamê xaşey be êxlaşê tom

Er to nebiyay be sebeb halim

Şema! şendebêz gerdê zoxalim

Awerdiş Ferhad Şapûrê dêrîn

Yawa be xelwet pabosê Şîrîn

Edeb be edeb Ferhadê xemnak

Şenay Şîrîn da sucde berd ne xak

Be pabosê pay şoxê dîdemest  
Midra ne cay wêş dest ne banê dest

900 Şîrîn be edeb diya be Ferhad  
Ser ta paş tamam nezer kerd be şad

‘Ey bê ce endam namaş ce bunyad

Şîrîn bî Şapûr Şîrînî Ferhad

Nigaş kerd be cam cemînê zerdiş

Şorahî gerden mînay bê gerdiş

Mujganê mewday xarê xedengiş

Dîdey muşkamîz siyay sêwengiş

Newlebanê le‘l lalay gulnariş

Ne sîmay şedef rêzey mirwariş

905 Be bejn û balay kiyanî kemer  
Çûn sewlê sayey nûçemey ney şeker

**34a**

Be balê bahû ‘eql û kemaşiş

Nazikî beden pençey şimşaliş



Be dîdey xumar dînê dîdariş

Rêzanê rêzey razê goftariş

Diya b'cemîniş zayifê zerden

Derûniş derdîn alûdey derden

Pêkiya be tîr xedengê xariş

Suçiya be haļ zelîlî zariş

910 Şîrîn be taqî 'eyan bî weneş

Zanaş ne cemîn derdê dêwîneş

Be zahir zanaş ye şehriyaren

Şeydayê Şîrîn ye derde daren

Şîrîn be Ferhad ama be goftar

Rêznaşê rêzey şehdê şekerbar

Şehzadey şerîf şehriyarenî

Ya geday wêlgerd herzekarenî

Watiş be Ferhad ce kot meqamen

Eşlît çi neşlen neşeb ce kamen

915 Me'şûqey 'aşiq derdedarenî  
Ya kasib ne şûn kesbê karenî

Dîldarê derdîn xeṭ û xalenî  
Ya muḥtac be zeṭ gencê maḷenî

Dêwaney deyrî dînê yarenî  
Ya derwêşê derd rozigarenî

Ya daxê 'eşqen sengtiraşenî  
Ya fi'ley ferman nanê aşenî

To ne raḡey min cefa berdenit  
Çend fermanê xaş be min kerdenit

**34b**

920 Ferhad çûn şineft ce Şîrîn xeber  
Endûş coşiya eşriş da ne ser

Be zeîş ama be ḡalê wêşda  
Derdiş coş awerd ne cergê rêşda

Ce daxê zaman zû xawê zaman  
Rêzîpa rêzey eşriş be daman

Watiş fidatim Şîrînê Ermen  
Aher day wenem çûn xarê xermen

Her kes êragêl gencê şarêwen  
Ne şehdê wêş da şehriyarêwen

925 Xerîbê xemîn bê nam û bê nişan

Kes ehwâl nepers xatîr perîşan

Kesê çûn zanû şahî ya geda

Çi qorbê daro sengê bêşeda

Xerîbê er şed xar û xesê bo

Qedriş bidare belkê kesê bo

Mekey teklîfim perî genc û maļ

Kerdenim fiday terkê susen xal

Ne zeṛ û ne genc ne geday maļim

Dêwaney deyrî xiyalê xalim

930 Ne muhtacê maļ ne kasibkarim

Ne geday zeṛim ne herzekarim

Ne derwêşê wêl ne sengtiraşim

Ne zerûr be zer ne nanê aşim

Dêwaney deyrî dînê dîdarim

Eşlim mepersî min şehriyarim

Kerdem terkê genc şahî text û tac

Pey dînê dilber megêlûn muhtac

35a

Pey to wastenim bêzar ce şahî

Poşanim long poşt kesbê gedayî

935

Reştey 'ebdañan riway rehbanî

Pey to şîm ne ray Şêxê Şen'anî

Pey to derwêşim geday nanê aş

Ce daxê to bîm min be sengtiraş

Pey to bîdî gêl her tûn be tûnim

Pey to şeyday şêt wîney Mecnûnim

Her dem mepêkî ne cergim per ba!

Meke teklîfim to be genc û ma!

Her min arezûy geday nane nan

Min şetê şeyda susen xalenan

940 Kerdem terkê tac textê şahî wêm

Namanim to maļ dinya bedey pê m

Eşlim mepersî îman û dînim

Ferzendê fexfûr Çîn û Maçînim

Pey to xurbetkêş koncê şaranim

Bêberî bêzar dînê yaranim

Er maçî diron Şapûr şhadet

Eger xelafen Ferhad xecalet

Niyen lazimim zerî û genc û maļ

Menzûrim êden biwînûn cemaļ

945 Ha watim perêt eħwaļan tamam

Êxtiyar be ton baqî weselam

***Nêqab Endextenê Şîrîn Nêmûdenê Roxê Xod be Ferhad***

Şîrîn şineftiş ce Ferhad xeber

Dûdiş dêwiya ce kapolê ser

35b

Be lefzê Şîrîn rûş kerd ne Şapûr  
Persa lêş eħwaļ ferzendê fexfûr

Watiş be Şapûr mepersûn ce to  
Ye Ferhad watiş rasten ya diro

Waçe bizanim agah ce haļî  
Rastiş biwaçe nemek helaļî

950 Şapûr xêziya hem da keft ne xak  
Eşriş eşriş kerd be dîdey nemnak

Watiş fidatim hûrê rizwan î  
Henî çêş kerûn ce to pinhan î

Rast maço Ferhad herfiş yeqînen  
Ferzendê fexfûr xaqanê Çînen

Min wezîrê bab Ferhadê wêlim  
Ne şunê Ferhad min eragêlim

Fexfûr min kî est ew peyda kerûn  
‘Elacê be haļ derdê ew berûn

955 Dinya kerdem t̄ey ne ŧunê ŧeyda  
Aŧarê Ferhad nekerdim peyda

Yawam be westan be cuyarê ew  
Keftim ne t̄elsim gerdabêXusrew

Ew cefa ke min ne ray ew berdim  
Ce mułkê Ermen to peyda kerdim

Çend zux û zuxaw siyaset werdim  
Pey Ferhad nebî peyXusrew kerdim

Gêłan ne wełat be meynet werden  
Aman ce westan toŧ t̄eleb kerden

960 Cuwabiŧ êden ‘erz<sup>226</sup> kerdim be to  
Êxtiyar be ton new nemamê to

**36a**

Hem min hem Ferhad bendê xezaten  
Tabi‘ be toyim her çi rezaten

ŧîrîn ŧineftiŧ ce ŧapûr xeber  
Fuțey neqabiŧ hewa da ne ser

---

<sup>226</sup> Erzim hatiye nivîsîn

Şefafê şuley hûrê perîzad

Nişan da cemîn be dînê Ferhad

Şewqê cemîn da ne perdey pêwar

Çûn şo 'ay şefeq kirya aşîkar

965 Çûn mahê mehtab şuley cehangîr

Poşa ser besat boy 'etr û 'ebîr

Ce şewqê şuley Ferhadê fexfûr

Beyaz nûriş bî we kogay Tûr

Diya tecellay cemînê di xoş

Satê sernigûn ne xakê xamoş

Şîrîn diş Ferhad bêhoş û medhoş

Ûwala seriş niya ne bawoş

Girtiş ne axûş seriş ne rûy xak

Be destê desmaļ cemîniş kerd pak

970 Çend muşkê mêxek darê we ne boş

Be 'etrê 'ebîr awerdiş be hoş



Malaş be destmaļ dîdey nemîniş

Pak kerd xoşxak eşkê esrîniş

Baļê çem hordaşt Ferhadê dêrîn

Rîş seriş niyan we bawiş Şîrîn

Xêza herasan bosa dest û paş

Rox maļa nekerd siyayê xoşraş

Sucdey sucûd berd be şahan neşeb

Dest bestey xidmet midira be edeb

**36b**

975 Şîrîn wat Ferhad fexfûrê xaqan

Megêre ce min teqşîrê tawan

Xaîrê xar meber bînayê `eynim

Nenasanim to lêlaw bo zeynim

Weş amay dîdem dewran kamit bo

Hezar çûn Şîrîn fiday namit bo

Serim be ser kerd rêzey razit bo

Giyanim Şîrîn<sup>227</sup> payendazit bo

---

<sup>227</sup> Şîrînîm hatiye nivîsîn

Giyan û maļ fiday lence larit bo

Şîrîn be fiday zerdî çarit bo

980 Nezananim haļ lêlaw çûn laļan

Bibexşe teqşîr nezan hewaļan

Ferhad wat Şîrîn dewayê derdim

Haļa şefay mewt mergim nemerdim

Min ke dîm serim ne axûşê to

Henî nîm be qeyd her çi mebo bo

Pencey to maļay ne rûy cemînîm

Lawnayê xatîr xarê xemînîm

Yaway be haļat hoş û medhoşim

Rêzey razê to ama ne goşim

985 Henî bimirûn derdim şafiyen

Er zinde manûn be min kafiyen

Beļê xerîban qanûnê ferzen

Ba haļê miskîn mera'at ferzen

Beîê xerîbim min ne şarê to  
Dûr keftay zamin ne diyarê to

Taqî mizanûn newnehalê to  
Axer merdenîm ne pay textê to

37a

Er merdim ne rat menzûr bidarî  
Ne ray şert û şun te'lim siparî

990 Şîrîn çûn şineft germa be zêrûr  
Ne eşkê endûh watiş be Şapûr

Min Ferhadê ferz mesparû be to  
Naziş bikêşe xaster ce babo

Ser hesawiş ber nemano xemnak  
Ce xord û ce xab ce rext û poşak

Her çê zêrûren hazir ker perêş  
Newa xemgîn bo nebo xatîrrêş

Nigehdariş be ce xaş û ce gest  
Ce nîşê xaran nebo dilşikest

995 Røjan be refîq Őew be hamraziŐ  
Her çend naz kerû bikêŐe naziŐ

Ferhad xerîben nûrê bînayîm  
Ta merden niyen çenêŐ ciyayîm

Ta ke bizanîm çenî mebo çûn  
Çereng mesazo gerdanay gerdûn

Çerxê çep gerdiŐ ce gest ce xas  
Neçrad çê nerdî mawerû ne tas

Ye watiŐ Őîrîn tersa ce exyar  
Newa ke raziŐ bibo aŐikar

1000 Xêza xeraman be Őed sûz û zar  
Rû niya ne qeŐr eywanê zeçkar

Daxil bî ne qeŐr teçare camrêz  
Tekda we mesned piŐtî Őufê dêz

Zedey zam xeste be cergê naŐad  
Çenî daxê dûd ne fikrê Ferhad

37b

Ferhad mend be ca di! nex!e dêrîn

Be sûz û zarî ce daxê !îrîn

Ce dînê dîden !em'ê !emefzûn

Çeman xawê bê nawerdi! be rûz

1005 Çûn naze naxûn ciya bîn be hem

Çûn bulbul ce gul perwananê !em

Ferhad rû! niya be berre beydî

Qeysasa Mecnûn be naumîdî

Wê! bî ne kawan çolê herde da

Seng û xak mekerd be kapo! da

Rojan ge!t û gê! çenî we!!iyan

Tezirasa xerîb !ew bê a!iyan

Bada bimano Ferhad û !îrîn

Bo be ser û kar dewranê dêrîn

***Bordenê Qasêdan Xeberê Ferhad Berayê Fexfûr we Ferestadenê Îlçeyan***

1010 Bi!no ce xaqan fexfûrê na!ad

Dinya kerdi! !ey ne !ûnê Ferhad

Axer ‘eyaran Xusrew perestan  
Soraxê Ferhad kerden ce westan

Merden mizdanî yaran be zêrûr  
Waten eḫwaḷat Ferhadê feḫxfûr

Çend îlçî xaqan be sanê leşker  
Çendî serweran salarê leşker

Çenî çend xerwar genc û maḷ be dew  
Kiyanaş we lay Xusrew be edew

1015 Niwîsa namey nizûl be Perwêz  
‘Erzey ‘acezî xeṭatê Perwêz

**38a**

Żelîlim ziwîr xestey xarê xem  
Bêhêzim ce pa nabînam ce çem

Xemîdeyê bar çemîdey çeman  
Çem dan qametim çûn heḷqey keman

Xusrew dexîlim aman şed aman  
Xarê xermanim zelîlê zaman

Nemenden penem tab û tewanam

Biyawî be dad hawar û hanam

1020 Er neyawenî ferzend be ھاڭim

Şemaڭ meşano siftey zuxaڭim

Ha watim perêt ھاڭatim tamam

Êxtiyar be ton baqî we's-selam

Aman îlçiyar be dewanê dew

Yawan be xidmet paytextêXusrew

Gişt sucde berden be 'alî neşeb

Name dan be destXusrew be edeb

Wana namey nezm Fexfûrê serwer

Dûdiş ber liwa ce kapoڭê ser

1025 Żelîlî xaqan ne cergiş kerd kar

Îlçî be mobet da be mêhmandar

Derdem ferman da hucûm berdişan

Ferhad ne bîdî peyda kerdişan

Ferman da Ferhad berden be ھemam

Poşan xeletiş ser ta pa tamam

Be zîb û zînet poşa rextiwer

Tacê kiyanî niyaşan we ser

Awerden merkeb moress' le cam

Mînay zîn û berk mukemmel tamam

**38b**

1030 Berden pey Ferhad be çend 'ezz û naz

Ferman we şahan liwan we pêşwaz

Şatîr ne cilo şahan ne rikab

Awerden Ferhad edew be adab

Şîrîn niga kerd Ferhad ce mencer

Ahirê 'eşqiş xêziya ce ser

Be taqî zanaş neşlê fexfûren

Şayday Şîrînen dîniş zerûren

Dubare Şîrîn dêwiya derdiş

Tewenê tawna henasey serdiş

1035 Awerden Ferhad we meclêsara

Ne qeşrê eywan pay textê dara



Daxil bî ne cem' meclês be le'eb  
Sudey sucûd berd Ferhad be edeb

Xusrew be 'izzet xêziya be pêş  
Be e'zaz û naz niyaş we lay wêş

Kerdiş tewazo' bêhed be Ferhad  
'Ezrê ma nîş wast me'zûren ziyad

Nezanam eħwaļ wiyerdey werîn  
Ce teqşîriman meşo boyerîn

1040 Ferhad da cuwab kiyanî neşeb  
Te'zîmê şah kerd watiş be edeb

Îlçî serdaran bosa dest û paş  
Maļan ne dîde xoş û xakê raş

Midran be xidmet Ferhadê diļber  
Dest ne banê dest midran beraber

Watişan perêş halatê fexfûr  
Koren nabîna'acizen ce nûr

**39a**

Her çend kerdişan Ferhad nebî nerm  
Ne raĝe liwan Şîrîn nebî kerm

1045 Wêş mida be seng ser mida ne xak

Yexey girîban bergiş meker çak

Ga meşî ne keş ga meşî ne kû[h]

Ga şêtê şeyda be zarî û endûh

Nebî ‘elaciş Ferhad nebî ram

Nawerdiş taqet nekerdiş aram

Her çend melawnaş bedter ter mebî

Derdê derûniş zîyater mebî

Kesê nezanaş derdiş ce çêşen

Sebeb ce çêşen xatiriş rêşen

1050 Îlçîyan be sûz zarî ne her ca

Xalî xecalet liwan ew dima

Haletê Ferhad her çi bî meqdûr

Ehwaşîş teman waten be fexfûr

Ce new hem Çînî kiyanaş çeper

Kerden se‘yê sext ce ew car beter

Fayêdeş nekerd be haļê Ferhad

Şîn û şeydayiş beter bî ziyad

Ce na'êlacî dubare ce new

Namey zêlîlî niwîsa beXusrew

1055 Çûnke xo Ferhad ce ew rażiyen

Xahiş ne xidmet diļnewaziyen

Siperdim be to ferzendê nazdar

Perwêzim kerden we cay ê'tibar

Amanit ferzen aman şed aman

'Erbim dexîl û destim we daman

**39b**

Mebo to bowî be diļnewaziş

Ce yagey baboş bikêşen naziş

Be rengî Ferhad bidarî be çem

Zirrey nerexoş xatiriş ce xem

1060 Newa biřenco derûniş ce derd

Camê cemîniş nek bigêr û gerd

Newa ce bedî Ferhadê ferzend  
Dûd bo ce lay to biwîno gezend

Ferhadê ferzend nûrê 'eynimen  
Bînayê çeman zewqê zeynimen

Ha min ferzend dam be to emanet  
Ne ray emanet nebot xiyanet

Amanet be ferz misparan be xak  
Nîgaş medaro ce xakê bêbak

1065 Ha namey nizûl be to kiya nam  
Biyawî be dad êmdadê hanam

Siperdim be to yadigarê wêm  
To kerdim ne cay ê' tibarê wêm

Misparût be dest ferzendê Şapûr  
Nîgaş bidare Ferhadê fexfûr

Emanet Şapûr bima to ce laş  
Ser hesawiş bo ew ne ragey raş

Newa ce xûrbet ferzendê dijbend

Ce rencê rêşî biwîno gezend

1070 Her derdê daro ew ferzendê wêm

Şapûr ehwaliş bawero perêm

Xusrew niğaş kerd be namey fexfûr

Qebûl kerd siperd be Şapûr<sup>228</sup>

40a

Be halê xaqan ciwîşa cergiş

Seylê esrîn hat we banê bergiş<sup>229</sup>

Kerdiş teqala tamam be Şapûr

Bena be xatîr xaqanê fexfûr

Ce giştê xaş gest bipoş serhesab

Ce bergê poşak ce xord û ce xab

1075 Eger dijbenciş be xatîr yawan

Lazim ce Şapûr megîreş tawan

Newa be Ferhad biya wo gezend

Şapûr şahan herdû bo we pend

---

<sup>228</sup> Peyvek kê m e

<sup>229</sup> Berg da hatiye nivîsîn

Nazdarê fexfûr bidarîn we naz

Bigêreş we naz xatir we dilnaz

Şapûr qebûl kerd ferman be dilşad

Bî be xatirxay xemxarî Ferhad

Mekerdîş xidmet xaşê dilwaziş

Her çend naz mekerd mekêşa naziş

***Şohretê 'Aşêq Şodenê Şîrîn Be Ferhad***

1080 Bişno ce dewran çerxê çepî kerd

Zemaney zebûn çi rengê bikerd

Gerdişê gerdan dewranê keç kerd

Nocûmê efsûn remal exter kerd

Dewranê dinyay dînê denî bad

Ce nexşê awerd we bextê Perwêz

Ce gerdiş kêc dewranê keç kerd

Çend weqtê zeman ce mabeyn wiyerd

'Aşiqî Ferhad me 'şûqî Şîrîn

Zohûr bî menşûr ne dewrê dîrîn

40b

1085 Nameş faş kirya guya bî ce yam

Menşûr bî ce layê xaş û ‘am

Be koftey bedan ce watey e‘xyar

Raziş beXusrew kirya aşikar

Xusrew şineftiş siya bî ce derd

Zu xa û zamet ne cergiş ca kerd

Dû dilêş dîdya ce kapolê ser

Coşiya çûn coş kûrey kûzeger

Xiroşya be xeşm cergiş coşiya

Ne bergî xeftan xezeb poşiya

1090 Satê ce sewda fikriş berdewe

Qapî xiyalan derûn kerdewe

Ser berd ne derûn watiş çêş kerûn

‘Elacê deway derdiş çûn berûn

Eger mekşûş serdê sengînen

Ferzendê fexfûr xaqanê Çînen

Xaqan ferzendiş be min siperden

Min be cay umîd ê 'tibar kerden

Ce lay gişt şahan mebû şermesar

Bêbinyad mebûn be ehdê êetibar

1095 Mebû be ser jan serzeniştê 'am

Çaw ruswa bîm memano ce yam

Waçan bed namîm be zîb û be zişt

Xusrew pey jenî Ferhad çîn kişt

Serim herze bo ce herzekaran

Perwêz Ferhad gişt çûn şermesaran

Razê ruswayî min mebo menşûr

Çêş bidewin<sup>230</sup> xaqanê fexfûr

**41a**

Hîç xaşter niyen be emr û karî

Ferman dem weneş karê rişwarî

1100 Belkim ne renge mekerû efsûn

Be békemanê kerûş sernigûn

---

<sup>230</sup> Peyv kême



Ne xemnigûn bo ne herday kawan

Henî kes ce min negêro tawan

Xeylê bey destûr fikr û xiyaļ kerd

‘Elacê ferman mewtê Ferhad kerd

Xêza be xezeb dûdê daxê derd

Ama nîşt ne text Ferhad teşeb kerd

Qerar da ne diļ mekiran ziyad

Bînay bed ne ser be qetļ Ferhad

1105 Ferma çawişan dadî daweran

Ferhadê fexfûr perem baweran

Tarıyan be tar yaranêXusrew

Ferhad awerden be te‘cîlê dew

***Teşeb KerdenêXusrewFerhad ra ve Merc Bestenê ber sere Şîrîn***

Awerden Ferhad be te‘cîlê dew

Be tarê tondî be nezdeXusrew

Ferhad yek fikrî berd ne xiyaļış

Xusrew xewf kerd fikrî be haliş

Diya be rengiř qeṭranî ce derd  
Feṭway qeṭlê wêř ne diġ eřer kerd

1110 Be taqî zanař hûn giyaniřen  
Mexfi xûnê xeřm ne diyaniřen

Yawa be pabos xûnî xeřmê derd  
Ferhad keft ne xak sucdey zemîn berd

41b Watiř řenay weřf kiyanî neřeb  
Xêza ce muġk midra be edeb  
Diya beXusrew çûn mematê merg  
Çûn bîdê awan lerziř niřt ne cerg

Ama ye goftarXusrew xezebnak  
Be tarê tondî ředayê sehmnak

1115 Watiř be Ferhad mizanî çûnen  
Xiyaġim çenî Koy Bîsitûnen

To ustadê eřiġ sengtirařenî  
Hem seng û hem sext hem neqqařenî

Mizanûn Ferhad derdînê dêrîn  
'Ařiqî ce 'iřq ce řewqê řîrîn

Me‘lûmen be min derdedaranî

Ce derde Şîrîn giriftarenî

Mani‘iş niyen fire kes diyen

Sewday diıldarî biyen ta biyen

1120 Her pose biyen bînay  ozigar

Her kes be kesê biyen giriftar

Her ga bey destûr giriftarenî

Ce ‘eşqê Şîrîn bêqerarenî

Mebo benayê be sazûn perêt

Biyawî be kam diłaramê wêt

Monasib niyen to ce xem ziyad

Farhad biweşkûf Şîrînê şad

Bo ta min û to mercê bibestîm

Bê êqrarê nîm her kam şikestîm

1125 Mîn şert ce Şîrîn to ce giyan wêt

Be êqrarê wêt her çi be yo pêt

42a

Er kerdî tamam karê Bîsitûn  
Şîrîn medew pêt be bêçend û çûn

Eger nekerdî karit serencam  
Ferman fermay min nekerdî tamam

Şerî min êden berwen ce Ferhad  
Serit coda kembe tîxê cellad

Belê karê to mebo bey mezmûn  
Ber awirî aw ce Koyê Bîsitûn

1130 Bin coş biwînî cuweş ce westan  
Awiş biyawnî be Taqê Westan

Cew dima be seng qeşrê bisazî  
Ce zîb û zînet pey diñewazî

Bo be tekyegay ne pay Bîsitûn  
Xaşter ce eywan qeşrê çîlsitûn

Sitûniş ce seng seywan kemer bo  
Bêhter ce eywan qeşrê qeyşer bo

Toxraş ce tela terriş ce durr bo  
Cedwel zereşan neqşê mermer bo

1135 Neqşiş çûn neqqaş nuqtay nigîn bo  
Balater ce qeşr xaqanê Çîn bo

Taqiş ce tawîr yasê ebleq bo  
Eywanê keywan ewcê moleş bo

Terhiş telakêş neqşê neqqaş bo  
Pasar payeş tawîr û taş bo

Renpaş zerwerek telay eħmer bo  
Derya ce derûniş hewzê kewser bo

Çertiş çiraxan çûn şewqê şem bo  
Awiş çûn heyat awê zemzem bo

**42b**

1140 Xîmey xiyawan xarê mexar bo  
Be yasê yasan hezar hezar bo

Yadigarî bo pey rozigaran  
Seyrangey sitûn ragey zewaran

Nezergay nîzam ray rehguzaran

Bimano ce yam pey şehriyaran

Pey yadigarî bimano ce yam

Menşûr û me‘rûf zohûr bo ne ‘am

Ṭaqî bizanan yaranê şanî

Biwînan be yad karê kiyanî

1145 Bizanan eḫwaļ derdê diļdarî

‘Eşqê ‘aşiqî ‘işweguzarî

Sewday ‘işq biyen ey kawê kenden

Destiş ha ce xak destkariş menden

Ce dînê dewran ey terḫê karan

Wiyerden ce yam çûn rawiyaran

NeXusrew mebo ne Şapûr be şad

Ne şewqê Şîrîn ne namê Ferhad

Ne şahanê şah ne şehriyaran

Nişanen nişan pey rozigaran

1150 Êden rezay min çêşen rezay to  
Ha bestim girew herçî mebo bo

Ha watim be to ھاڵê wêm tamam  
Şelay to çêşen baqî weselam

Ferhad çûn şineft ce Xusrew eھwał  
Mecazê mergiş awerd we xiyał

Be taqî zanaş xûnî bergişen  
Xusrew be xiyał mewtê mergişen

43a

Dûdê bêkesêş xêziya ce ser  
Derdê xerîbiş coşiya ne wer

1155 Be eşkê endûh be abê esrîn  
Be sûz û şîwen be zar bo girîn

Watiş beXusrew mizanî çêşen  
Sewday to fetway merg min pêşen

Mizanû be ‘eyb to çêşen yaden  
Benay to be qeşd qetlê Ferhaden

Êxtiyar be ton razim be merden

Min serim tufeyl kiyanî kerden

Beleş be qanûn bozirgevarî

Mebo be xerîb ‘izzetbidarî

1160 Min merdê bêkes xestey xarê xem

Cayiziş niyen be bêkes sitem

Min wêlê xerîb ser diayrê tom

Bêneway û bêkes ne mekanê tom

Kerdenim we yad bî dayim û babo

Êlticay êmdad ne cay giştîm bo

Agah ce eḫwaļ nîst û hestîm bî

Xeber darê ḫaļ ne cay kesim bî

Babom toş we cay ê‘tîbar kerden

Min be emanet we to siperden

1165 Sewgend da be to ser ḫesawim bî

Agah ce ewqat mah û saļim bî

Watiş to bibî be diļnewazim



Ne cagey babo bikêşî nazim

43b

Nek to çenî min hoccet karit bo

Efsaney efsun rozigarit bo

Ce watey eçyar bedanê bedkar

Çenî min kerî sewday sitemkar

Bikerî be min behaney bedî

Awarem kerî ne ragey rewî

1170 Bedîm delalet be hîlesazî

Bînayê berbad perem bisazî

Ba nebot ce diî be mekir efsun

Min we bêsebeb kerî sernigûn

Mim xerîbê tom xarê xecalet

Êxtiyar be ton nekey zelalet

Min xerîbê tom xarê zelalet

Êxtiyar be ton nekey xecalet

Er benat be qetî niyen be ceza

Ferman der be gişt pêm meder seza

1175 Biferma be tîx celladê xûnrêz  
Serim ciyak en be emre Perwêz

Kê boş destelât ne roy rozigar  
Ne fermanê to dem pêko ne kar

Wer ne min be wêm cergim berînen

Çi heddîm ne kar sewday Şîrînen

Çenî to bazar sewday ew kerûn

Ce ko layiqen namê ew berûn

Şîrîn banûy baş heremseray to

Kesê ce hedd hen namê ew bero

1180 Belê min rastî sengtiraşanim  
Be neqşê neqqaş baļa başanim

**44a**

Qayilim be neqş be nexmey başî

Hîç bakim niyen ce sentiraşi

Bêperwam ce kar taşayê kawko

Şerêh nîm ce kar ne fermanê to

Herçê ferman bo lazim bibo pêt

Mawerûn be ca be êqbalê wêt

Beleş yeh herfê mewaçûn penet  
Bêca newaçûn goş der we benet

1185 Ye qedîm biyen nek rojê aro  
Sewday bêsewend sûdê nedaro

Er mebot ferman deîalet derî  
Mebo to çenîm sewgend buwerî

Ta min ce xewfit xatir kerûn cem  
Ber kerûn ce diî xiyânê xem

Dimay seng taşî karim bo tamam  
Emr û fermanit be yo be encam

Be herfê bedan exyarê bedgo  
Çenî min benay bedkarit nobo

1190 Fetway qetlê min be naheq derî  
To be bêtawan qeştê min kerî

Ferhad ce xurbet mergiş bo menşûr  
Çêş medey cuwab xaqanê fexfûr

Eger bişnewan namê merdenim

Perî to cefay bî sûdê berdenim

Merdey meynetî bêkes ce yaran

Bêdefn û kefen xerîbê şaran

Henasey serdiş ne cerg mexêzo

Dûdiş ne derûn be genç mexêzo

44b

1195 Ce daxê ferzend merdê xurbetkêş

Bêzaren ce tac textê teşay wêş

Mebo be boryan zoxaw û zamet

Mesûzû ce dax ta roy qiyamet

Bêrayê mebo pey rozigaran

Bêşertî mebo pey şehriyaran

Ha watim be to derde wêm tamam

Êxtiyar be ton baqî weselam

***Sogend Xordenê Xusrew Berayê Ferhad***

Xusrew wat Ferhad be to yanê çêş

Kê bo horgêla ce êqrarê wêş

1200 Şerţen min Ferhad xaţir řad kerûn

Min be rezay to qesem yad kerûn

Ta to ce sewdam xaţir kerî cem

Berkerî ce diġ xiyalanê xem

Hedd û sinûr bo pey rozigarar

Bêşerţî nebo pey řehriyaran

Sogend bew řenem be daru'l-mecûs

Be lat û menat be naz û naqûs

Hezarey zonnar qesem bew necac

Kilîsay gewran narê ahir bac

1205 Be řeqqê me'lûm botxaney fereng

Şadet bew řeyţan mertebey nîreng

Kawê kosalan kelbê keşîřan

Ehlu'l-xennas êblîs endîřan

Ha werdim sewgend be ayînê wêm

Er be nam bed bo bed be yo ne řem

45a

Ce serdî sewdam xaîr biker cem

Xaî ker derûn ce xaranê

Er sewdam nebo çenît be êxlaş

Cergim pare bo be tîx eļmas

1210 Bişo meşixûl ne fermanê wêt

Karîr tamam ker Şîrîn medûn pêr

Ha ce to sewgend yawinam be kam

Reza bîm be şertî baqî weselam

*Reftenê Ferhad pay Bîsotûn we Qêşşê Kerdenê Ê ba Kûh*

Ferhad şineftîş be şadî şîleng

Sucde berd ne şa dest da ne quleng

Şaniş da be dînXusrew hem ce no

Xêza xaîr cem rû niya be ko

Diya ne pay yas herdey Bîsitûn

Nigaş kerd ne kaw xûnî çeşmê xûn

1215 Diya be qulley şafê serender

Ne ewcê ebleq xarê pîr xeter

Be burcê barûy taqê nîm taqîş

Kawê kehkeşan berzê afaqîş

Der dem eşer ker ne cergê Ferhad

Merg û mewtê wêş awerdiş we yad

Zanaş xestegay xakê xoşîşen

Sayeş serencam sernigûnişen

Mayeş meyneten sewdaş bêşûden

Mayeş melamet her daxê dûden

1220 Ferhadê Feşfûr be dîdey piş xûn

Ama be goftar çenî Bîsitûn

**45b**

Watiş kawê kû salarê kowan

Gonay min niyen megêrim tawan

Sewday êşê nîş cergim şikawan

Giyan nexrexrey nîm nefes yawan

Bêwaxî ce taf awan sitanam

Henî nemenden tawê tewanam

Perwanan peṛ dax şûrê şînimen

Bayeqoş ferar şew naînimen

1225 Be karê 'eşqen dûdî derd ne di  
Şeyday şikufim bedter ce buḫbuḫ

Wer ne min ce ko kawê to ce ko

Seday min çêşen çenî kawê to

Er nemo Ferhad şeyday eşed bo

Kawê to ce ko şarê Çîn ce ko

Dayim diḫazar ferzendê rencerō

Babom keft we ko min keftim [we] ko

Wêlê weḫatim zedey zam be so

Pa bestin ne pey newnehaḫê no

1230 Seday Şîrînim awerden be di  
Seday şikufim bedter ce buḫbuḫ

Cew bo ne amam be taşanê seng

To nigûn kerûn be mewday quleng



Bawerûn ce bêx xarê moxaran

Sengit sa kerûn ne ser diyaran

Kawit rêzekem sanit sernigûn

Gerdit binîşo ne gêcê gerdûn

Taşit be toz kem yasit textesaz

Ne cergit bibo texte textewaz

**46a**

1235 Caget bo be behr keştî bo têda

Qazan biwanan xezel ne cêda

Benay min êden kerû Bisitûn

Sanê sergeştî kerû sernigûn

Kawê Bisitûn aman şed aman

Merweten dexîl destim we daman

To biber enîs sare êwarim

‘Elac ker ne kar çarê naçarim

Meylit çenî min bawer we germî

Sextî xaranit bawer we nermî

1240 Er rencê rencber menzûr midarî

Be dadê êmdad çi nîm keryarî

Ta karê keftem be yo be encam

Ce dînê dilber biyawun be kam

Ya ce sayê to karim bizasûn

Ce sengê sewdat binewazûn

Bîsitûn şineft xeber ce Ferhad

Ûewfê temengîz dûdîş da ne bad

Dêwiya ce derd cergiş coşiya

Dinya ce seylat seyliş bo şiya

1245 Xiroşa ce xem sanê serkeşan

Derwêş şî ne çerx kawê kehkeşan

Eşkê esrîniş hat be haşan da

Ûoşê diyaran da be taşan da

Şînê resta xêz feşanê feryad

Taş û nerkinaş ce daxê Ferhad

Ne herdey perdeş ama şedayê

Ne goşê Ferhad ama şedayê

46b

Watiş ey koken dûr ce xaşesnî

Ebley bê kemaļ xiyalê xamenî

1250 Ey şed têşe taş ne kawê konî

Axir aqîbet her rence ronî

Bawerî ce bêx şed çûn Bîsitûn

Serencam ce saş mebî sernigûn

Er bidey we bad dewranê dêrîn

Ce ko miyawî be weşlê Şîrîn

Keftî ne tîlsêm efsûnê Xusrew

Meħalen ber şî ne dolabê ew

Mizanûn ne pam ser medey we bad

Bîsitûn mebo be xûnê Ferhad

1255 Mebo wêt be qetî ey sewda derî

Xusrew qeşşaş bo min bed nam kerî

To bişî be gişt xiyalê xalan

Min nîme kar bim pey watey sağan

Benat be êden min kerî we pend

Bibo bednamîm ta hezar û end

Çaw ʔiswayîm bimano ce yam

Bûn be serzenişt be ser janê ‘am

Waçan bedey min pey ʔozigaran

Şermendey şahan źerbey zewaran

1260 Ferhad ne ferman taşay Bîsitûn

Neyawa be kam kerdiş sernigûn

Enîsê kariş nawerd be meż mûn

Koken xelţan kerd çenî xakê xûn

Ta ew ʔo dewran dinya bo xerab

Ce şermendegî çêş bedem cuwab

47a Wer ne to ce ko ey sewda ce ko

Xusrew û Şîrîn çenî da be to

To daden bazî behaney yarit

Be mekrû efsûn bisazo karit

1265 Beleş to benat êden be yeqîn  
Ce semtê fexfûr yaweranê Çîn

Wêt bidey we goşt ce zeydê zamin  
Razê riswayît bimano pey min

Mizanûn taqî serit nebaren  
Şîn ûm şîwenim perê Ferhaden

Mebo ce daxit ta roy qiyamet  
Şîn û şîwen kem zarî û zelalet

Şallah to namay Ferhad we pay min  
Sanê samanim sa biya ce bin

1270 Çenî biwînûn zedey zamê to  
Xestey xakê xûn xarî we rencero

Çêş bedem cuwab xaqanê fexfûr  
Bisûzûn be nar beter ce Koy Tûr

Bew tewr da cuwab Fehadê dilrêş  
Şineftiş be goş wey eħwalê wêş

Ferhad şineftiş şeday sanê seng

Be sûz û zarî rûş kerd ne quleng

Watiş yarê xar her tonî yarim

Meyo to berî çar û naçarim

1275 Enîsim tonî refiqê razim

Ba pey rozigar karê bisazim

Belê mizanûn be xiyalê wêm

Her tonî xûnî ser û maîlê wêm

**47b**

Tonî celladim ne herdey çolîm

To meşî ne mexz kelley kapolîm

‘Elacê Ferhad cey sûdê sewda

Bedersa we sûk bereşit mewda

Karê ce koy dûst kerîmê diyarî

Bimano ce yam pey rozigarî

1275 Ce yo min barî to be tewanger

Belkê biyawîm be kamê dilber

Bada bitaştim quley kawê ko

Ne ragey Şîrîn her çê mebo bo

Ewse ce dimay mewtê min ce kon

Qeşşim tonî êxtiyar be ton

Quleng çûn şineft ce Ferhad xeber

Gêliya ce reng siya çûn zixer

Ser da be şida be qebzey quleng

Zêrrey zigarîş nîşt ew sanê seng

1280 Watiş be Ferhad bêhoş kem fam

Be weşlê şîwen miyawî be kam

Ber ker ce xatir xiyaşanê xo

Çenî ber meşî ce damê Xusro

Perwêz be efsûn hîle fend û reng

Fermanê fetway fermaniş be seng

Mebos be duşab zemaney zebûn

Be mekr û efsûn kerot sernigûn

New be rû beydî kawê herdey çol

Nîş mewdayê min meşot ne kapol

48a

1285 Be fendê fetway dînê zîb û zişt  
Mebo to be dest min bişî be kuşt

Benat her êden sewday beşalan  
Min kerî we pend ta qerñ û şalan

Riswayî mano perî peşta peşt  
Waçan ce bedî quleng Ferhad kuşt

Şûmî Şîrîn bo Xusrew biðu reng  
Namê bednamîş mano pey quleng

To bişî we kuşt ce daxê xalan  
Min waz keftbibûn pey watey şalan

1290 Belê mizanûn min şikestê tom  
Celladê xûnrêz qezay qeştê tom

Be xûnî Ferhad namim bo meşhûr  
Çêş derûn cuwab Şîrîn û Şapûr

Nimanûn ce yam to manî be şad  
Çû kerû qîmiş be qetlê Ferhad



Ne meẓzê Ferhad mudam boxûnî  
Çêş bîdem cuwab feẓfûrê Çînî

Mizanûn ew roj mawerûn be yad  
Şûrê şînmen ce daxê Ferhad

1295 Ce daxê dûdî Ferhadê serwer

Mebo bisuzûn ta rojê meşser

Ferhad dimay to ew ro ciya bûm

Nemano ce yam sengê siya bûm

Banat be êden wêt fena derî

Min we pend ‘am rozigar kerî

Wer ne to ce ko î sewda ce ko

Çûn Şîrînê şoxXusrew da be to

**48b**

Ṭaqî mizanûn sewdat bê sûden

Mayet melamet peṛ daxê dûden

1300 Ha watim perêt ebley xiyaḷ xam

Ser meden we bad baqî weselam

Ferhad şineftiş eḫwaḫ ce quleng  
Sewda ne cergiş çûn mewday fereng

Şineftiş be goş mewday mewtê wêş  
Dêwiya ne derd pa niya we pêş

Kawiya ce diḫ Ferhadê koken  
Dest da ne dest tîşey yek şed men

Coşa xiroşa şanaş ew quleng  
Riwala be nerm rûş niya be seng

1305 Qar û qîn û kîn datey wey xeber  
Dûstiş xêziya ce kapolê ser

Ce taw û tondî xirreyê xeşmxûn  
Yawa be xaran taşê Bîtisûn

Dûdê derdê diḫ derûniş coşa  
Ce kelley kapol meşziş xiroşa

Dest da ne quleng qebzey girankêş  
Pay çep winara rast awerd ew pêş

Bazû buġend kerd dest berd ne baġa  
Yezdan kerd be yad niriknaw taġa

1310 Yadê ya hû kerd min hû kerd we yad  
Kêşa ne 'retey feġan û feryad

Qulengê Őed men berd we banê ser  
Namê Yezdan berd be namê diġber

Qînê quwwet da bewrê bê endiŐ  
ÇerxiŐ dane dewr rîŐey girankêŐ

49a

TiŐey girankêŐ daŐ we kemer da  
Çûn berîqey berd awerd be ser da

Ce tawê tiŐe tîzê sengtiraŐ  
TaŐê tawîran bî we Őed piraŐ

1315 Berdê neberd zur ba hûy piř huner  
Őida niŐt ne çerx çewaŐey çemer

Őeqeyê Őest dest be qebzey quleng  
Ce tawê tiŐiŐ seng meniŐt we seng

Pirûşey piş şeng şerarey aher  
Şuley şerer da ne bendê bayir

Tozê temengîz ne pay Bîsitûn  
Kerdiş gêciya ne gêcê gerdûn

Ce nirkey Ferhad rîzey sengê sext

Piraşey pişşeng xêziya be cext

1320 Taw da be bazûy zurê be saman

Lexte lextê seng rêza be daman

Let let sanê seng taşayê tîş taş

Rêze rêze rîg rêzta ne paş

Tawiya ce taş tawê tawîran

Lerzan ce heybet berzê bayiran

Şekest be hem da sextî sanê seng

Piraş piraş bî pişeng ta pişeng

Ye lay Bîsitûn xarê mexaran

Samaniş sa kerd çûn saray haran

1325 Ce xûbê bazûy zerbê peş neberd

Taşê Bîsitûn bî be toz û gerd

49b

Huner nimanmaş ostay berzê dest

Taşê kawê ko bendê ben coş best

Sa kerd serender xar û mexar

Saniş rêze kerd xariş tar û mar

Bew zurê bazûy bewrê bêderîx

Berdê Bîsitûn awerdiş ce bêx

Ce tawê tîşey zerbê bêsamam

Kawê kûy ezîm awerd be daman

1330 Bendê benê coş best paş kerd moħkem

Terhê telariş awerd be qeşem

Ferhad meşxul bî be karê dîrîn

Xusrew xîmeş berd we qeşrê Şîrîn

Çenî xêl xaney silsiley sopa

Ce qeşrê Şîrîn çadir kerd we pa

Fetwayê Ferhad da be têşekarî

Kêşa be sara be dewlatdarî

Pey feżay behar laley lalegûn  
Seyir çeman dan şefayê kawgûn

1335 Be zewqê sersewz suney serawan  
Bûrçînê laçîn betê şetewan

Badenûşê bezm neser diyaran

Tevarê terlan ahûy Teşeran

Xusrew bey destûr bey tewr bena kerd

Ta çend moddetî ce mabeyn wiyerd

*Reftenê Xusrew Be Qeşrê Şîrîn Amedenê Şîrîn be Bîsêtûn*

Bişno ce Şîrîn diğdarê dîrîn

Her way Ferhad kerd ne Qeşrê Şîrîn

**50a**

Cefakêşê wêş awerd be yad

Bena kerd beyo biwîno Ferhad

1340 New beş û bîdî biwîno haliş

Ce derdê dewran persûn eħwal

Bizanûn Ferhad fermaniş saxten

Serefrax mebo ya seriş baxten

Miyawo be kam cedîne dişber

Ya ser mebazûn cey sewda zerer

Biwinûn binyad kariş sernigûn

Çêş kerûn çenî kawê Bisitûn

Şad kerû didiş ce dîne dişber

Xalî dişen ce ser nîşê xar

1345 Fariş bo demê ce şîn û zarî

Sakin kerûn diş ce bêqerarî

Şîrîn pey Ferhad birya şebûriş

Zerd û zayif bî ce derdê dûriş

Rojan restaxêz şewan sûzê xem

Wîney perwanan perî şewqê şem

Mekêşa feşan dûdê derdê diş

Çûn dûdê bulbul ce hêcranê gul

Şewî şîwar da tertîbê tarî

Xurşîd şî ne peşt perdey pêwarî

1350 Xêza xorûc kerd sipay siya reng  
Poşa ser besaþ perdey şewe zeng

Dane debdebey dihoîê deycûr  
Xurşîdê Xawer ce new bîm mexrûr

Pêka teblê kewş neqarey neberd  
Şef da sitaran be çerxê çep gerd

50b

Zînet da zîbay kewkeb ce keywan  
Rexşanê exbom eşer ne seywan

Şem'ê şemefrûz da ne êlaxan  
Sema seranser bî we çiraxan

1355 Sipay zeng zûlim bî we cehangîr  
Xurşîd keft ne behr deryay qe' rê qîr

Qerrebê qemer qerar da ne keş  
Kêşa ne gerdab naxuday hebeş

Hordaşt badiban neqabê hûrî



Keştîş keft ne kêc dehrê deycûrî

Şîrînê şeyda fikr û xiyal kerd

Ferhad kerd we yadXusrew betaļ kerd

Ta we taqet berd dangê şî ce şew

Be rêzey razan Xusrew kerd ne xeber

1360 Perwêz şî ne xaw serxoş ne bade

Bêxeber ce kar medhoş fitade

Nubedarê bêdeng kêşikçî xamoş

Serdarê sermest mehteranê medhoş

Kirne keft be gişt gerdişê seywan

Şeday hazır baş bîrya ce eywan

Şîrîn xêziya çûn şehabê şew

Ciya bî ce bejn peştanêXusrew

Berşî ce cagey mahê mehpare

Qirar bîn be hem mahê sitare

1365 Rewan bî rahî diļdarê Perwêz

Rûş kerd ne kemend şew bend Şewdêz

Yawa be yatax di! be derdewe  
Şewdêz ce he!qey kemend kerdewe

51a

Poşa dû dîdey mestê mencoliş  
Refîqê rahan hamrazê çoliş

Watiş dîdew dîn her tonî yarim  
Hem yarê yawer roy rozigarim

Cewr û cefakêş ragey şew û rom  
Mîraşê mader padaştê babom

1370 Xanezadey rend qedîmê sa!an  
Me!rem be Şîrîn agah ce ha!an

Firê berdenit cefay cewriyam  
Her to yawinay diley min be kam

Destim damanit her emcareten  
Arezûy dîden dîdey yarimen

Ce dûrî dîniş tîrê xarimen  
Sizayê sûzsext gazê marimen

Cergim ce dûrîş tîrê karimen

Zamê xeṭernak nîşê jarimen

1375 Şînê restaxêz zarîw zarimen

Zarê dîdey xûn endûh barimen

Ce dûdê dewran nemend tewanam

Mebo biyawî be dadê hanam

Derûnim derdîn pêkanê tîren

Eşlê exlasît emcar we gîren

Be şertê xidmet ragey rozigar

Dewa ber dilim ce derdê azar

Neşl û neşeb pak badê behrîzad

Dînê kokenim awerden be yad

1380 Mebo to emşew çûn nesîmê bad

Biyawnî Şîrîn be şewqê Ferhad

**51b**

Mizanû sedey zarê zelîlen

Dîdiş întizar ragey delîlen

Îse ce dûrîm sûzanê zaren

Refîqê razîş sernişê xaren

Çemeray minen paybest ne pawe

Ta key dilşûziş beyo ce lawe

Bişûn bizanûn hal û ehwaliş

Biyawun be gerd siftey zuxaliş

1385 New berî beydî xarê pir xeter

Çenî bêkariş çêş amaş we ser

Wînû ce ferman çend kariş kerden

Bizanûn halîş menden ya menden

Kem kesê niyen şedrê sengînen

Ferzendê fexfûr xaqanê Çîn

Biyawun be toq henasey serdiş

Dişakin kerûn ce daxê derdiş

Be rêzey razan kerûş delalet

Fariş bo ce şîn zarî zelalet

1390 Şewdêz şineftiş be Şîrîn ce goş

Kêşa şe'ney şîn be ne'rey xuroş

Naław nirginaş zêrinaş be derd

Seylabê eşik ne dîdey ser kerd

Be sûz û zarî pîr minaş pîr taf

Xêziya ce derd dûdiş cew fitaq

Zanûş da ne xak be sucdey edeb

Bosa xakê pay kiyanî neşeb

Rûş mała ne xak pay kefiş Şîrîn

Sawa ser ne saş midra bezmê zîn

## 52a

1395 Şîrîn be Şewdêz wana aferîn

Sazaş mukemiļ be zînê zerîrîn

Ṭelay dane bend mînay sîmê xam

Pêka ne killeş muṛrese' le cam

Rikabê zereḫşan da ne diyarî

Saçaxê zîn poş rîşe mirwarî

Raznaş be refît zîbay rengareng

Kêşa ko telkêş tengê ziber teng

Ba da ne rikab suwar bî be zîn

Yadê yahû kerd pey Ferhadê Çîn

1400 Rikab da be refîş dînê diî xiyal

Mehmêz da merkeb Şewdêz nîşt ne bal

Ceyranê cild xêz ahûy diî neser

Perwaza ce terî yahû kebûter

Perîaf best be dû şermbare Şewdêz

Nîşt we badê bal kumitey gorêz

Hewaş best ne bal dem kerd be 'eîem

Ser kêşa ne ewc goş kerd be qeîem

Be se'ê seng ber zemîn şikawa

Îp teyir be toz gerdiş neyawa

1405 Şikest da be se' ko sernîş xaran

Wiyara ce terî çûn bad û baran

Şilingê şahîn ahû wist we pêz

Melan mend heyran perîafê Şewdêz

Qeṭre da be dest qeṭ' qeḷem koş  
Taw û tekan da berqê şox ne doş

Ṭeyirasay tewar berqê beharan  
Terzê birûske çûn bad û baran

52b

*Rêsîdenê Şîrîn Bê Kûhê Bisêtûn We Şekestenê Payê Şewdêz*

Rewan bî ne rah be yek keṭre kûn  
Yawa be Ferhad ne pay Bîsitûn

1410 Ama be tezdîk Ferhadê diḷdar  
Wêş da ne penammidra ne pêwar

Cilu da ne mişt derdînê diḷber  
Ne piştê Ferhad midra bêxeber

Be karê Ferhad mekerdiş seyran  
Ce zurê Ferhad Şîrîn mend heyran

Diya diş Ferhad cehdê cexitşen  
Sewdayê sengtaş sanê sextişen

Be taşanê taş quleng karişen  
Taw û tedarik bêqerarîşen

1415 Şitûrê şîwen şînê zarîşen  
Rêzwanê rêzey tewen warîşen

Taşanê tawîr kanê kustîşen  
Fexan û feryad her ya dostîşen

Mişano be sext têşeyê zerbzûr  
Her namê Şîrîn mawero be mûr

Kilêmey şadet şub êwarîşen  
Çûn wîrd û ewrad zîkrê zarîşren

Ce taşê tîşey ahir mewaro  
Ce şewqê Şîrîn xeber nedaro

1420 Medo sitîze taşê Bîsitûn  
Pir sengê sextîş meşo we gerdûn

Mawero ce bêx kawê ko kemer  
Ce dînê dişber nedaro xeber

**53a**

Sengê sext ce zerb zuriş merêzo  
Ahir ce taşay tîşey mexêzo



Şîrîn 'eceb mend kariş kerd pesend  
Şeddiq wat be zur bazûy hunermend

Layiqen penes dildarê dîrîn  
Bawîşen hezar bêhter ce Şîrîn

1425 Dişber bey destûr mekerdiş şenaş  
Ser mekerd be nezr fiday xakê paş  
Ferhad cext mekerd ce taşanê seng  
Taw mida be taş be qebzey quleng  
Wêş be wêş mewat her dem be zarî  
Be dadê endûh zar û zigarî

Key bo karê min beyo be encam  
Ce dînê dişber biyawun be kam

Ser nedewn we bad ce sengê kariş  
Carê şad kerûn diş be dîdariş

1430 Ney gift û go bî Ferhadê dûrîn  
Bêxeber ce haş amanê Şîrîn  
Sûzê sextişen sengtaşê saşan

Be şîni şîwen xiyalê xalan

Nagah nesîmê xêza ce şemal

Hordaştiş bûy 'etr heway zulf û xal

Nesîmê nem nem şebxêzê şebgîr

Alûde mişkîn 'enber ce 'enbîr

Xêza ce boy tork nazik 'ozaran

Bêznaşê 'ebîr 'etrê 'etaran

1435 'Ebîr û 'areq boy 'etrê susen

Maļa ne dimax Ferhadê Koken

**53b**

Dane demaxîş 'etrê ebîrîn

Serxoş bî ce hal ce 'etrê Şîrîn

Boy 'etrê 'ebîr dane dimaxîş

Rûşen biyewe çeşmê çiraxîş

Ce nesîmê naz Mesîhay nefes

Demya ce demax murxîş ce qefes

Sermest bî serxoş ce 'etrê dilber

Coşiya killeş ce kapolê ser

1440 Mesîhay Meryem Şîrînê Ermen

Bî be qûtê roḥ Ferhadê koken

Rûşen bî dîdeş Şêxasay Şe‘nan

Çûn badê Yûsif Ye‘qûb ne Ken‘an

Ce şafafê şewq boy ‘etrê ‘enber

Mexziş coşiya ne kapolê ser

Ce semtê Şîrîn şemaḷ da ne bad

Awerd be canim fexfûrê Ferhad

Ama be hem da kemanê koken

Taw da be tîşey qulengê şed men

1445 Coşa coşiya xiroşa ne kar

Zûrê bazûş da ne taşay moxar

Ce zerbê zuriş ahir bî be dû

Xêza ce xaran çûn şehabê şû

Pirşeyê pirşeng tarê nîligûn

Çerxê çeçmaqış yawa be gerdûn

Rêze rêze rîg lextex lextex seng

Lit lit piraş best be qebzey quleng

54a

Bendê Bîsitûn tawîya çûn aw

Lerze nîşt ne bend pa paçey peraw

1450 Taşê tewen rêz taşay tîşey taş

Seng welaw mebî be rêzey piraş

Zerrey ce rêzey pir şengê xaran

Çûn feşlê gul geşt wadey weharan

Rêza rêzey taş xarê xorderêz

Wara ne canib Şîrîn û Şewdêz

Şîrîn ne pêwar kawê kemer da

Xakê sanê seng rêzaş we ser da

Rêzey sanê seng qebzey şest mîn

Tozê temengîz poşa be Şîrîn

1455 Çûn mahê Xurşîd poşa ne pêwar

Penam bî ne toz tîrey ebrê tar

Ce teqdîrê çerx çewaşey çep gerd

Şûmî taley tal nehsê neqşê nerd

Doıabê dewran dînê bada bad

Ferîştey ferîb fermanê Ferhad

Ce ceftî çarey nehsê sernigûn

Be mekr û efsûn zemaney zebûn

Aşûbê exter sitare serkom

Meqamê merrix çuwaşey encom

1460 Daray taw û taş ce taray tewend

Xêziya ce semt sengê taş koken

*Rêsîdenê Şîrîn Be Payê Bîsitûn We Leng Şodenê Şewdêz*

Şaxey sanê sext ce sufarê seng

Piraşey pirşeng ce qebzey quleng

54b

Çûn birûskey berq re' dê weharan

Berêqey berqîş çûn bad û baran

Be taşê tîşey derdînê dilgîr

Taşa ce taşan çûn paçê penîr

Ce zebirdê zur sengtaşê bîçûn  
Tozê sanê seng yawa be gerdûn

1465 Xêza xaşey seng xarê xorderêz  
Ama bêaman pey ranê Şewdêz

Ez leq da zebûn kerdiş sitêze  
Yek ranê Şewdêz kerdiş be rêze

Tebeq best be taw çûn xarê xedeng  
Wiyerd ce ranîş seng minişt we seng

Lewlaqê lûliş qeş bî çûm qeşem  
Pexş û piraş bî mexziş şed qedem

Mohriş bî be toz bedîş bî ciya  
Ranê rikabiş bî be tûtiya

1470 Xirûc kerd xûniş be xaranê xeşer  
Guliş best gulgûn ce kasey kemer

Tekkey gul tebeq tikya ne rûy seng  
Xaran çûn behar kerd be lale reng

Taşê tawîran ce rêzey rewan

Raznaşê ce reng feşlê erxewan

Şewdêzê şeyda midra we pawe

Yek ranê rastiş gêrit be hewawe

Ce şînê Şîrîn şerêxey Şewdêz

Şe'ney şîn be hem bî be restaxêz

1475 Şîrîn pey Şewdêz be dad û feryad

Be zar û endûh çirrêş be Ferhad

55a

Watiş ey Ferhad sengtaşê sermest

Pencet nerêzo ostay zeber dest

Sengtaşê sertêş xarê xaşîrrêş

Deyrî dilazar ye çêşt kerd çêş

Mer herkes çûn to derdedar mebo

Mebo ce kariş xeberdar mebo<sup>231</sup>

Amam biwînûn dîdarê dişber

Dînit bî we derd bed ce bed beter

1480 Watim dîdarit biwînûn we çem

---

<sup>231</sup> Nebo hatiye nivîsîn

Şikufey şadît bî we barê xem

Îse çêş kerûn pey ranê Şewdêz

Çêş bidem cuwab persanê Perwêz

Kê Şîrîn bero bişo be rawe

Henî çûn bedûn ser we dimawe

Ce şermesarî çêş beyom we ser

Çûn bidem cuwab yaranê yawer

Ha bîmê risway dewranê dûnyam

Be watey waz goft pendê xaş û 'am

1485 Henî ce dewran dinyam temamen

Żewqê zindigî be min heramen

Merdenim ferzen nek zindeganî

Newînûn we çem rengê kiyani

'Etabê laļpoş kîney kemer laļ

Cuwabiş çêşen ce persanê haļ

Xusrew ne xawen nûrê kemer laļ

Ce karê Şîrîn nedaro eħwaļ



Ferda xeber bo ce xawê xamoş

Kê deru cuwab 'etabê laşpoş

55b

1490 Her êd xaşteren wêm helak kerûn

Aşarim awîn xoş xak kerûn

Ce derdê dewaran ce daxê Şewdêz

Nimanûn ce yam newînûn Perwêz

Çêş kerûn çenî bextê siya wêm

Bed ce bed beter her meyo nerêm

Firîştey firset ce meylim ciyan

Tasim sernigûn sitarim siyan

Neçradê nabûd neçşim nehaten

Çiraxim naçax rengê zulumaten

1495 Çunkê siya bext zebûnê sitarim

Her şebir bî ceft mebo be karim

Şîrîn bey destûr megrewa be mûr

Şeyda bî c eşîn eşkê eşermûr

Şewdêz pa şekest lengê dilazar


Eşkê endûhrêz mendey rawiyar

Ferhad ne ferman ne cehdê coşîş

Nagah şidayê zirya be goşîş

Dengê dilgiran çenî neşey dûd

Ahengê xoşxan şob ce şeher zûd



1500 Şinuy şoxê şeng mizganî mergiş

Raxib bî nezdîk ne rîşey cergiş

Çûn awê zemzem heyatê kewşer

Xîzrasay qedîm sabîq Sikender

Mewtiş ce meqam merden berdewe

Mamatiş ce merg zênde kerdewe

Çûn Ye'qûb ce boy Yûsif ce memat

Rûşen kerd zemîr 'eyniş ce zulfat

56a

Şikufa be şewq çûn xunçey gulân

Ce nesîmê gul wîney bulbułan

1505 Ce dengê dilber fikriş berdewe

Koken kokenîş betał kerdewe

Qebzey qulengiş qerar da be çeng

Tîşş tiwasa ce taşanê seng

Serasîme bî sengtaşê sałan

Xatîr berd ne fikr xane xiyalañ

Harê herasan diya be lawe

Dîş şî şewlê midran wepawe

Çûn mahê mehtab sitarey şeher

Ber ama ce gul çûn xor ce xawer

1510 Midra çûn sewlan sawey tûlê ter

Serw û sinober şimşad û 'er'er

Diya dîş susen midran be sûran

Çûn nûrê nergis feşlê newbehar

Çûn nergis be terz yas yafte ko

Ber ama çûn şax şa bo ce şaho

Çûn berazay berz pa pençey peraw

Sewlê say Sehend çûn ce gulaw

Sazaş be sîma kerdiş lalegûn

Biyen we beyzay bendê Bîsitûn

1515 Çûn mehtabê mah 'etrê 'enber bo

Şewqîş da ne şax herde kawê ko

Biyen we bazar çaxê çiraxan

Somaş da ne seng taşê êlaxan

Şoleş da ne bend berzê bayiran

Şefafen ce şewq bendê tawîran

**56b**

Taw dan be taşan wîney taşê Tûr

Bîsitûn biyen we beyzay bilûr

Ferhad diya dîş kariş be karî

Şîrînen we şûn Şewdêz be zarî

1520 Zanaş be rêzan rêzey seftê seng

Da raniş kerden Şewdêz biyen leng

Şinasaş Şîrîn sewlê xeraman

Xêzan ce xay wêş be dîdey aman

Xemînê xemnak xarê xatîr rêş

Şîn û zarîşen pey ranê Şewdêz

Dîş Şewdêzê şox midran we pawe

Gêrten ranê rast pa be hewawe

Law besten ce laş xûnê lale bêz

Tik tik metikyo ce ranê Şewdêz

1525 Dûdiş mexêzo ce difnaqê ser

Minalo be zar çûn ka kebûter

Her hane xiroş tîneyê qarqîn

Her dem mekêşo şehney şûrê şîn

Eşriş merêzo çûn baranê taw

Meşo ne dîdeş çûn tafê seylaw

Ferhad dîş hałat yaranê dilber

Dêwiya dûdiş ce kapolê ser

Dûdê esrîniş ce diłdar eşer

Qirçiya be qîn ce qeqnes beter

1530 Wîney perwanan rêza peş û bał

Siftan sûsiş bî be kûhê zoxał

Tawiya ce taw şerarey şerer

Taw gêrt çûn tenûr kûrey kûzeger

57a

Dîdey bî ce dûd dilazarê derd

Peyapey kêşa henasanê serd

Tewasa ce taw hewa da quleng

Şî ce halê hoş bî be sanê seng

Ferhadê fexfûr xêziya ce qîn

Ce daxê Şîrîn kawiya ce kîn

1535 Eşeriş esir kerd ce daxê zaman

Dest berd yeqey wêş dirî tadaman

Be sûz û zarî eseriş eşer da

Zarî bangê berz dest ce hem werda

Koken tawiya penceş da we seng

Xiroş be xeşim ama pey quleng

Çend sengê sengîn da be quleng da

Pençey wêş be seng midaş be ser da

Çend nasezay sext wat be kemer da

Çend xakê xaşak rêza be ser da

1540 Dûdiş dêwiya ne cergê wêş da

Xeylê medî wat be Bîsitûn

Çend wat be neçrad necmê nocûm da

Be taşê taley sitarey şûm da

Çend pêça be derd derûn xeşer da

Çend doinam be çerx çeftê çemer da

Watiş hey bêdad ce destê bextim

Sitarey zebûn bedbextî bextim

Çûnkê zebûn bext siya sitarim

Bed ce bed beter meyo ne karim

1545 Er dostê be diş meyo newendim

Mesûzo be nar nehis nejendim

**57b**

Siftey siyaset ahirîn barim

Cew bone dişsûz nexmen neçarim

Destgîrê meyo bigêru destim

Bikêşo meynet şûmî şikestim

Ye watiş Ferhad xestey xarê xem



Elweday esrîn rûwala be nerm

Kokenê şeyday şêt yawa be dişber

Çûn çeşmey heyat Xizir Iskender

1550 Be sucdey sucûd sengtaşê dirîn

Bosa dest û pay Şewdêz û Şîrîn

Rûş maļa negerd xakê xoşê raş

Be ‘ozar me‘zûr bosa dest û paş

Çûn bulbul be gul tawiyar be hem

Be ‘eyş û ‘işwey perwanan û şem

Ferhad feryad kerd be zarî zerûr

Watiş ce Şîrîn çend ‘uzrê me‘zûr

Watiş fidatim xemxarê Ferhad

Ye dînê dostit awerden be yad

1555 Ferhad be sergerd ber amanit bo

Fiday qedem renc xeramanit bo

Nezanam to bît hey awat westim

Pencem piraş bo birêzu destim

Lêlaw bo dîdem laî bim ce ziwan

Şihet netaşûn sengê serkiwan

Xatirim xar bo medhoş bim ce hoş

Şinuy Şîrînim neşineften be goş

**58a**

Laî bam lêlaw bam nezanam tonî

Çûn mahê xurşîd ne kakê kokenî

1560 Şefay şewqê to pêka ne kawan

Ruşin kerd kawan kawê kosaran

Boy 'etrê 'enber 'eşqit çûn 'ebîr

Da ne demaxim şemaîê şebgîr

Watim ye mangen ne kel ber aman

Ya 'eksê aftar aman we daman

Şewqê şefafîş<sup>232</sup> kerdên çiraşan

Ne kawê koşar bende êlaxan

Boy 'etrê 'eşqit dane demaxim

Rûşen bî zemîr<sup>233</sup> çeşmê çiraşim

---

<sup>232</sup> Şefafîş: ND

<sup>233</sup> Şu'le: ND

1565 Cew bone taşım tariyan be tar  
Tawê tîşe bî xêziya be ce tar

Perranê pir şeng perdeşanê seng  
Rêzanê rêziş Şewdêz kerden leng

Cew bone<sup>234</sup> dîdem xatîr teng biyen  
Pose şînişen Şewdêz leng biyen<sup>235</sup>

Dîdem cey sewda xatîr meker teng  
Menîşe dilgîr yarit biyen leng

Merkebit merden min xo mendenan  
Kemer bestey kar kemer bendenan

1570 Şed sengê Şewdêz kawê ko tamam  
Ce perrey gahê kemteren ce lam

Minnet mekêşûn be dîde û be giyan  
Be Şewdêzewe meşanût be şan

Wer ce nîme şew şewqê şefeq bîn  
To miyawinûn be Qeşrê Şîrîn

---

<sup>234</sup> Jew sebeb: ND

<sup>235</sup> Şîn û zarîten Şebdêz leng biyen: ND

58b

Heman tîrey kar şew karê şew bo  
Gezimçî sakin Xusrew ne xew bo

Bose dem saman çarê naçarit  
Kes agah nebo eşliş ce karit

1575 Mehteranê sermest yaranê Perwêz  
Nezanan ce kar lengî pay Şewdêz

Henî cey sewda xaîr meker teng  
Menîşe dilgîr hergiz we bêreng

Nimazûn şaney bedanê bedkar  
Bişnewî ce yam wat watê exyar

Şîrîn şineftiş ce Ferhad ehwâl  
Xarê xemaniş ber kerd ce xiyâl

Şikufa be şad çûn xunçey guşan  
Ama be razan wîney bulbulan

1580 Şadê şikuf bî ce dînê Ferhad  
XiyâlêXusrew Şewdêz berd we yad

Ferhad be ʔazan ŧehdê ŧekerrêz  
ŧîrîn peya kerd ce gulê ŧewdêz

Gêrtiŧ ne bawiŧ be bosebazî  
Be ‘eyŧ û nûŧan dînê diŧwazî

ŧemamey lîmû guldestey enar  
Bî be ‘eyŧ û nûŧ ŧeftalûy bazar

Dem niya ne dem be ŧadî kerdên  
Be bosebazî barê leb werden

1585 Bo be seyrê sext fitûrê Ferhad

Dewranê dêrîn ber kerdiŧ ce yad

Berd kerd ce xatîr xarê xiyaŧan  
Zuxaw û zamet daxanê saŧan

**59a**

Ga dest ne lîmû ga ne zulf û xaŧ  
Ga dem ne deman sîmay sipî laŧ

Ga penceŧ ne dam destey damidêz  
Ga bosey beyanv sîbê serawêz

Ga nîga ne cam cemaray cemin

Ga ser ne zanû sayê şewlê sîn

1590 Şewdêz ne şewbend kemend astişan

Kerden ‘eyş û nûş her çi wastişan

Ce sewdayê seft bangê bednamî

Nekerden be hem karê heramî

Dimay ‘eyş û nûş xiroşa Ferhad

Hunermendî wêş awerd be yad

Xêza be axêz mestê badenûş

Şîrîn û Şewdêz herdû şend be dûş

Quleng da ne qed rewan bî ne rah

Amaş we nezer dinya wîney kah

*Berdaştenê Ferhad Şîrîn ba Şewdêz be dûş be qeşr*

1595 Şîrîn Şewdêz herdû şend be şan

Goş da be razan rengîn mehbûnan

Şeyday eşed bo ser şêtê dilber

Hayê herasan heway ‘eşq neser

Şîrîn û Şewdêz şîrgiranê seng  
Ce sengê sengin şed menî quleng

Se kuhê kawan yek we banê yek  
Zemîn ce ciruş melerza bêşek

Ne ziberdê zur rehwarê rahî

Lerza serzemîn ta gaw û mahî

**59b**

1600 Be nerkey Ferhad nañanê Şewdêz

Be tawê te'cîl rû kerd ne Perwêz

Ce pertafê pay peyek bêriya

Sengê serzemîn bî we tûtiya

Bende bayiran kawê kuhê ru

Bî be gerdê xak be pûlê nîkuh

Sengê ser besaţ yekser bî be aw

Taşê tawîran tawiya be taw

Berqê birûskey çeqmaqê ahir

Mexêza ce yas minişt ne bahir

1605 Piraşey pirşeng ne perţaf dew  
Mekêşa şerer çûn şehabê şew  
  
Ne perţafê baş peykasay delîl  
Wiyerd ce Kirend yawa be sermîl

Taw da be qetre çûn berqê beraq  
Wiyerd ce sermîl yawa be sertaş

Ferhadê fexfûr bêxeber ce kar  
Ce sewday Gerıra ragîrê radar

Neħis mostehfez ragey şeb û ro  
Gerrray siya reng bacgîrê Xusro

1610 Timez Gerrray şûm bacgîrê bengî  
Radarin çenî çîl kes ce zengî

Rahdarin ce rah her çîl herimend  
Gêrtên ragey rast ce tengê derbend

Herkes bêferman mewîru be rah  
Çeneş mestano çen bacê mitah

Her çîlê sermest xoşê badenûş



Huş biyen ne hoş ne xawê xamûş

60a

Keften new derbend her çîl siya reng

MeXRur û medhuş meste badereng

1615 ‘Asî ‘ebdaġan qewrê qelender

Ĥebeşanê reng mestê bêxeber

New xiroşê xaw niney haj û waj

Keften ne ser bend wîney siya qaj

Gêrten ray rewan źerbey tengê zaġ

Qawê quşanin çûn qajey qelaġ

Dîwanê dawî yek we banê yek

Ekwanê Erjeng sanê Siyamek

Be nirkey naġan wîney neŕŕê dêw

Poşaniş derbend ne xewxay ne‘rêw

1620 Ce sehmê sengin dawiyânê daw

Zaġey zaġedar mekerdin be aw

Ferhadê koken hêcay hunermend

Yawa be yasal ne tengê derbend

Ne peṛtafê pay zeberd zurê çeng  
Ce zerbê zuriş seng meniş we seng

Şeqey şeqşeqey simkuy çerxê çeng  
Ṭeraqey ṭeruq seng we banê seng

Naga ce yaran bacgîrêXusrew  
Yeke zengiyân bêdar bî ce xew

1625 Bêdar bî sermest ce xawê xamoş  
Goş da şiday sext meyuşê ne goş

Dîş dîwê meyo ne ser diyaran  
Wîney re‘dê berq çûn bad û baran

Mexêzu be taw xişmê xiroşîş  
Mahê mehweşî ana ne duşîş

**60b**

Be tawê tondî meyo hunermend  
Şewqîş şefafen ne tengê derbend

Çeman xurşîden ce xawîr xezan  
Ya mahê mehtab sumaş sitêzan

1630 Zuhren hoştirîn ya şu‘ay şefeq  
Taw wan be tekyen taqê new tebeq

Medrewşu meyo şewqê şemefrûz  
Derbendiş kerdên be rozanê rûz

Boy ‘etrê ‘ebîr dînê dilpesend

Pêçan ‘ebîriş ne tengê derbend

Çûn şehabê şew ha ne guzare

Medrewşo ne terh mah û sitare

Meyo ne derbend tîrey tarê teng

Ce tawiş şiday seng miniş we seng

1635 Ce tawê heybet şîr meşo ce kaw  
Şîran ce suziş diî mebî be aw

Ce ne‘rey nirkeş meyo menalo

Xiroşê dengiş serheng memalo

Ce perţafê paş ahir mecoşo

Pirşengiş berzî bahir meboşo

Ce źerbê zuriş keywan mebêza

Ce sehmê samiş sengî gorêza

Xêza we gorêza be xewxay xiroş

Çirîş be Gerray meste badetoş

1640 Watiş ey Gerra bêdar be ce xaw

Çergim bî be aw yanet bo xiraw

Hoşyarê hoşber bizane çêşen

Peleşengî aman birwetî pêşen

**61a**

Yek dêwê meyo xeylê delîren

Nemez ademen ya bewir şîren

Qezay qaharen belay nagehan

Bedteren ce dêw ejdehay deman

Ya xo ye şîren şikarê pêşen

Ya dêw deyren xiyalê pêşen

1645 Meyo ne derbend çûn şîrê cengî

Hîç bakiş niyen ce zurê zengî

Ce zengî û Geṙṙa perwa nedaro  
Xêzeb ne çarey şûmiş mewaro

Ya dêwen be nay şûrê şerdaro  
Ya xo xafilên be şew mewyaro

Nemez her çê hen şîrê cengiyen  
Laqeydê lawaz sipay zengiyen

Samiş sengiyen şedriş sehimnak  
Şîren şikaren bewren we bêbak

1650 Ha ama be dew heway kînişen  
Qezay qeharen qarê qînişen

Geṙṙay bademest bêdar bî ce xaw  
Tawiyân cergim yanet bo xiraw

Geṙṙa mestê mey medhuşê bade  
Keyfî kebaben serxoş fitade

Ce şiday sengîn zengê diławer  
Ce Şîrîn xaw da xêza bêxeber

Harê herasan bêzar bî ce xaw

Hoşyar bî kelleş ce mestî şeraw

1655 Xêza be axêz şedrê sengînsam

Eşlehey esbab poşa be endam

**61b**

Çûn dêwê dawî hey kerd xiroşa

Ce badey şerab kelleş mecoşa

Xiroşa be xeşm watiş ey xerîw

Samê Siyamek wîney neçre dîw

Çûn Rexşê Rustem me‘rekey Fereng

Qînê qehreman ekwanê Erjeng

Hey kerd we yaran zengî Hebeş da

Zîley zeberhat be kawê keş da

1660 Çirîş ne dîwan zerbey siya zeng

Dawa kerd coşa be wîney neheng

Poşa be endam herbeyê karzar

Gêrtenê seray ragey raguzar

Zengî bengiyan her yek ce layê

Naşan ne‘re dan her yhek ne cayê

Nirkey ne‘re dan her çend qelender

Dîwanê dawî qînê xezenfer

Ûewxa xêziya ce ne‘rey xerîw

Siya zengiyan wîney neŕre dîw

1665 Ûerân be hem da bedter ce ekwan

Aman bêaman pey ƣagey rewan

Niyan benay bed bengî bengiyan

Kêşan sawê şeyf zengî zengiyan

Ce ne‘rey neberd coşan ce her ceng

Gêrten ƣay Ferhad ne derbendê teng

Cew dem bo binger be ƣalê Ferhad

Ne dengê dadres ne dad û êmdad

Be tak û tenya ferdê bêyawer

Feryadres nebî be xeyr ce dawer

**62a**

1670 Ferhad dîş fetway fermaş newerda

Ce bêkes wêş endûş eşer da

Endûş coş awerd ne cergê êş da

Girewa be hal xerîbî wêş da

Ce dûdê dewran derdê ciyayîş

Xerîb û bêkes tak û tenyayîş

Ne di! mewatiş sitarem çeften

Ťasê Ťaley şûm ne Ťarî keften

Be her ca meşûn ne bedbextî wêm

Bed ce bed beter her meyo nerêm

1675 Er Şîrîn b'rengîş neyo ne heşab

Ce şermendegî çêş bidem cuwab

'Elacim êden wêm bidem be kuşt

Xaşteren ce tîr Ťaney zîb û zişt

Şîrîn û Şewdêz niya we zemîn

Coşa we xiroşa şî ne kifr û kîn

Coşa ce her ceng be herbey ne berd

Penaş berd be heq yadê Yezdan kerd



Çûn Rexşê Rustem midra ne cay wêş

Gerrâ bezmê ceng pa niya we pêş

1680 Xerrâ be Ferhad Gerray rengê zêşt

Watiş to kêni mewyerî ne deşt

Bey tewr mewyerî ce derbendê teng

Bêperwa ce sehm Gerray siya reng

Xeber nedarî ce zurê zengî

Çiî qelenderan sermestê bengî

Rawiyar ne ray derbendê tengî

Laqeydî ce şerî şerânê cengî

**62b**

Nezanay ce deng ragey rehguzar

Maway mustehfêz bacgîrê radar

1685 Mebut buyerî be şew karê şew

Nedey xercê bac xeracê Xusrew

Haļa waçe rast er rawiyarî

Bacê wêt bider ha restigarî

Wer ne eger dizd konde karenî

Ya dêw û ya cinn perî wariî

Er şîr û er bewr er ejdehanî

Ya ce pehlewana şahê cehani

Maçûn be yaran neberdê zengî

Dîwanê dawxaz şîranê cengî

1690 Be herbey neberd hebeşî siya

Pêset bikeran wîney tûtiya

Be zurê bazû mawerût we pend

Bî watey sahan mekerût we pend

Her ta zêndenî sixanî azad

Rastê rastî bawere we yad

Bey şewanê tar çêşen xiroşit

Ey mahê meş'el çêşen nedoşit

Darayê dest bord ce kamit kerden

Şikaren be şew ce kot awerden

1695 Ferhad şineftîş xiroşa ce qîn

Dêwiya ce derd kawiya ce kîn

Watiş be Gerra çêşit mebo çêm

Rawiyarenan meşû ne ray wêm

Ba cet çêmê min ba cimê kamen

Bacê min berî be to heraman

63a

Deynê radarî meyot nekerden

Ne min xerîk ker ne wêt be merden

Er merdê merdît muhlet bider pê

Bêdeng û dawa ba bişû ne rêm

1700 Rage birer pê rawê yarenan

Karit nebo çêm kefte karenan

Her çend semacet kerdiş to melûl

Gerra ce Ferhad nekerdiş qebûl

Hebeş rû siya zengê qîr mebe

Zengî zelîl koş zebûngîr mebe

Min çendê be to be mêhrebani

Kerdim semacet şîrîn zewanî

1705 To beter meşî be coşanê ceng

Be herze waten ser medey we seng

Ane muhebet îne neqşê tîr  
Her çêt xo mebo mekere teqşîr

Namim mepersî waçûm namê wêm  
Ewsa to be zur bacit bibu çêm

Waçûm namê wêm Ferhadê koken

Refîqê ramen Şîrînê Ermen

Gêrtenim ne doş diğdarê dêrîn

Ta biyawinûş be Qeşrê Şîrîn

1710 Şîrînit şoxen Şewdêziş lengen

Xerîkê xaren xatîriş tengen

Er ra medey pê m bişûn be rawe

Hîç daw û dawam niyen be lawe

Wer ne sewgendim be Yezdanê pak

Qesem be me' bûd ferdê tenya û tak

63b Ne tengî derbend karê bisazûn

Yekê ce zengî be zêde nazûn

Be qînê qatîl be qebzey quleng  
Be zerbey bazû herbeyê zor ceng

1715 Be tîşey sengtaş kûhê gerankeş  
Yekê nimazûn be zengîw herbeş

Ce zerbê zengî be wêt menazî

Çenî kokenî pençe mebazî

Er tamam zengî Hebeş bibo çem

Min bakim niyen ce zaîxê zixem

Er şiday î derbend ber zengê zaîxen

Pose mezanûn qajê qelaîxen

Wicûdiş niyen ce lamê sengtiraş

Yek gorg we şed mêş mekerûn fenaş

1720 Min bacim ce kuy serkeşan senden

Be zorê pençe Bîsitûn kenden

Îse min bey tewr zebûnim be wêm

Çalekew çeçel Hebeş meyo cêm

Er ra midey pê m ha mişûn koken

Wer dawet mebo êxtiyariten

Ha watim perêt eḫwaḫan tamam

Êxtiyar be ton baqî weselam

**64a** Giṛra ŝinasan Ferhadê koken

Ŗineftiŝ eḫwaḫ Ŗîrînê Ermen

1725 Ce qehrê xîret zobdey zaḫê zeng

Dêwiya ce derd gêliya ce reng

Xêza be xorriŝ xiroŝa xerîw

Nirkey ne 're da wîney neṛre dîw

Watiŝ ye tonî Ferhadê koken

Hamṛaz û hamgerd Ŗîrînê Ermen

Yawinay be cay seray bêedew

Kerî qeŝd nenig namûsêXusrew

Ce ra biŝkenî yek ranê Ŗewdêz

Ne botê xem xewf ferda ce Perwêz

1730 Herkes çûn to sengê tiraŝ mebo

Hamṛaz û hambaz banûy ŝa mebo

Ne xanê xanan nimek binoşo

Ce 'eyşê dinya dîdeş bipoşo

Mer mebot kesê bo be giramî

Ce naniş kerî nimek heramî

Şerî bo to çenî Şîrîn û Şewdêz

Berût ne pay text pabusê Perwêz

Biwîno bunyad banûy baş û wêş

Nibaso Ferhad ferman feremay wêş

1735 Xusrew bo Xeber agay karitan

Biwîno çêşen ne bazaritan

Take to çenî Şîrînê bednam

Kerûn be risway çend wateyê 'am

Kerûtan we bend watey kullê 'am

Bistanûn pey wê m beratê encam

64b Be qernê dewran bo be pendê pîr

Nimek heraman bo be nimekgîr

Ye watiş girray bedbextê zengî  
Qaw keft ne qeytûl qeţranê cengî

1740 Watiş be yaran zengî zengiwar  
Heleşe dan ne dewr Ferhadê salar

Bigêrdê be zur bawerdê perêm

Çeneş bistanûn qeşanê wêm

Yaranê zengî şineften be goş

Çûn qeharê qîn awerden xiroş

Kêşan ha û hû be xewxaw xerîw

Dêwiyan çûn dêw mel'ûnanê dîw

Çûn qajê qelaş ce zaxê zixem

Aman be hem da coşiyar be hem

1745 Be herbey meşas ce zengî Hebeş  
Dewr dan ne dewriş wîney dûdê reş

Aman ne dewriş ha û hû bigîr

Çem zerd û rû reş qeţranter ce qîr



Ûerîwê xewxay sextê siyayîm  
Mewcê Ferhad dan çûn Munkir Nekîm

Dewr dan ne Ferhad merdê tenya û tak  
Sipay sitemger sîmayê sehmnak

Koken keft ne behr siyayê zengwar  
Çûn mahê mehbûb tîreyê ebrtar

1750 Çûn mahê xurşîd gîriya be gîr  
Penam bî ne mewc deryay qehrê qîn  
Be tak û tenya bêyar û bêkes  
Nedan ne êmdad ne kes feryadres

65a Beze îş ama be halê wêş da  
Eşriş eşer kerd ne cergê wêş da

Me mûr û zarî eşkê şûr û şîn  
Awerdiş be yad yaweranê Çîn

Watiş dad ce dest xerîbî şaran  
Bangê bê kesîm pey dûrî yaran

1755 Ya heq to kesî we bêkes neker  
Eger toy delîl be nakes menger

Ya reb hîç merdê matê derd nebo

Eger zebûn bo be namerd nebo

Îste çend kes ce yaranê wêm

Be dad û êmdad biyawan perêm

Ye watiş Ferhad be yar û yawer

Penaş berd be zat Qeyûmê Dawer

Xiroşa be xeşm coşa bezmê ceng

Midra nema beyn sipay siya reng

1760 Ziley zelalet qawê qal û qîl

Mekerdîş we pend nirkey dengê fil

Emcar bo be seyr Şîrînê Ermen

Diya be cesyey Ferhadê koken

Be nîşê naxûn xalın ciya kerd

Be şîn û şîwen wêş kejbela kerd

Watiş hey bêdad Ferhad dam be kuşt

Wêm keften ne dam Gerçay siya zîşt

Namûs û nengim derya be tañan  
Bîm be serzinişt pey watey sañan

1765 Riswa bîm ne dûn namim bî bednam  
Watey waz goft ta be qern û yam

65b Be dîl destax pabest û destgîr  
Çenî riswayî Ferhadê diğîr

Bedter ce dewran miçya we koken  
Zelîlê zengî tak tenya weten

Dîwan ne dewriş qeblê gêrdeniş  
Han ne gîridar mewt û merdeniş

Zelîlen ziwîr be tak û tenya  
Dewriş dan hesar ejdêhay siya

1770 Ce bêkesî wêş hane şûnê şîn  
Mijaniş mewcen ne abê esrîn

Şîrîn pey Ferhad şîne şeyda kerd  
Be nîşe naxûn wêş elbeda kerd

Xaĵan ce sîney wêş aware kerd  
Camey bergê bejn yexeş pare kerd

Watiş hey bêdad ce bêdadê zîşt  
Wê m kerd be ser jan Ferhad dam be kuşt

Ferhad dî Şîrîn be şîn û şîwen  
Ce xewfê xayin bariş be lêwen

1775 Dûdê derûniş kûrey ateşî  
Bi lêsey ahir ne cergiş berşî  
Sûzê şîweniş ce kapolê ser  
Xêziya ce kar kûrey kûzeger

Ce daxê Şîrîn fexfûrê Ferhad  
Fetway fewtê wêş awerdiş be yad

Watiş hey bêdad Şîrînê xewfnak  
Metersûn ce ters cergiş bibo çak

Ewsa cew dima bedî pêşemen  
Henî zêdegî perî çêşemen

**66a**

1780 Coşaw coşiya kemanê koken  
Rû niya be semt Şîrînê Ermen

Taw da be tîşey şed menî quleng  
Hey kerd be helqey tarê siya reng

Naław nirkinaş delîrê dawa  
Sanê şefaray Hebeş şikawa

Birbir kerd be hem sanê siya reng  
Kerdiş tar û mar pereng û pereng

Zengî be zengiyar diŕrî be hem da  
Berşî ne perţaf ne coş çemek da

1785 Şikest da şikest Ferhadê qerîn  
Bew dewanê rew yawa be Şîrîn

Dîş Şîrînê sox ne şîn û zarî  
Be şehdê şîrîn kerdiş diŕdarî

Watiş dîdey dîn ce çêş metersîn  
Mer min merdenan şeydanî ce şîn

Menîşe dilgîr şewlê xeraman  
Xewfê xatîrit ber ker ce daman

Gerrâ çî karen çêşen çî pêşen  
Zengî zengiwar waşî ne çêşen

1790 Siya zengiyan Gerray bêendêş  
Medan gezafî berdaşt perî wêş

Herçî Hebeşen bêreng û raşen

Pose mizanûn qaj û qelaxen

Hîç guşim niyen ce gezafişan

Bêperwam zirrey min ce lafişan

Er bazûn be to biyawo gezend

To bibî bednam Ferhad bo we pend

**66b** Bes ce kon heway hunermendî min

Kawê kokenî ahir mendî min

1795 Eger êzint bo to roxset derî

Be cengê zengî morexxeş kerî

Yek dem be yarî Yazdanê dawer

Be êzin êqbal be yarê yawer

Be zerbê bazûy zurê hunermend  
Gerraw zengiyan şaf keru we pend

Karê bisazûn be yek kifre kûn  
Gerra bo Ferhad zengî bo nogûn

Êzhar nebo eşl ce aşarişan  
Hiç kes nezano çûn bî karişan

1800 Kesê nezano zengî çêş biyen  
Gerra çi tor bî Şîrîn kê diyen

Ferhad bey destûr dilberê lawnaş  
Şîrîni xatiriş be xoş yawinaş

Gerra diş ferman Ferhad bey destûr  
Tawiş gêrt ce taw wîney kûrey nûr

Coşaw xiroşa wîney siya reng  
Qetran bî ce qîn gêla be şed reng

Ûerxa wîney re'd berqê beharan  
Be dad û dişnam rûş kerd be yaran

1805 Watiş hey Hebeş sanê siya reng  
Qewmê bêxîret bênamûs û neng

Zengî çîl nefer Ferhad be tenya  
Hem xewfitanen qewmê rû siya

Heqa her çi qewm qeytûlê zengen  
Bêşerm û şîwaļ bênam û nengen

67a Hey kerd be yaran Geray çareşûm  
Watiş be Hebeş bawerdê hucûm

Bêgiran dewriş be herbey bêbak  
Bikûbin Ferhad yekcar bo be xak

1810 Be dîlê destax be xestey zêlîl  
Bekeşan keşan koken wîney dîl

Wat şermendigî Xusrew neyu pê m  
Şîrînê Ferhad bawerdê perêm

Werne sewgendim be daru'l-mecûs  
Be lat û menat be narê naqûs



We caxê xawer kilîsay fireng

Zênde nimazû yekê siya reng

Yaran be kînen xiroşa be pêş

Ce qehrê xîret Gerray bedendêş

1815 Qaw kerden qeytûl siya rengê zîşt

Ne şonê Ferhad awerden yerîşt

Dewriş dan ne dewr Ferhad çûn heşar

Ferhad çûn nigîn qebil dan qerar

Ziwaney zengî yawa be Ferhad

Koken horgêla Yezdan kerd we yad

Şîrîn dîş Ferhad rû niya be ceng

Şîn be cûş û kîn çenî siya reng

Riwala be nerm Şîrînê Ermen

Futeş west ne ray Ferhadê koken

1820 Daman Ferhad pêçna be çeng

Gêrtîş be yek dest serdestey quleng

Watiş ey Ferhad mirweten aman

‘Erebim dexîl destim we daman

67b Bêdeng ber Ferhad ye cay deng niyen  
Beta! kerd bunyad ye ray ceng niyen

Be tenya çenî çil dêwê zengî  
Mebî be şikar şîranê cengî

Ewsa cew dima min çenî kerûn  
Hawar û hanam we lay kê berûn

1825 To bişî be kuşt min megn û nedam  
Namê bednamîm memano ce yam

Bada şebrit bo dexîm Ferhad  
Şabir şebriş kerd yawa be murad

Kar her be nermî mişo be rawe  
Tundî memanî mo‘tel be lawe

Nermî mar ce lan maweru we ber  
Po!a ce tondî maweru zerer

Be tundî karan gişt ba!il mebo  
Mayey fesadiş çêş haşil mebo

1830 Ebrîşim ferman bergê xaşanen  
Beyzay bejin berg midberma sanen

Her çi min maçûn bigîre ne goş  
Pendê watey min meker feramoş

Ba bilawînîm bêdîn û mezheb  
Dest kota kero ce cengê Heleb

Ba bidem rîşxend perêş binwazûn  
Belkê be efsûn kariş bisazûn

Geŕray şûm be xend zeban bo be pîç  
Henî zengiyan ew ba qîş be hîç

1835 Mitawî ewan gişt 'elac kerîn  
Bê Geŕra ewan dewaş meberîn

68a Ferhad şineftîş ce Şîrîn xeber  
Ce herfê watey ew neşî weber

Sakin bî şebûr xamûş û bêdeng  
Benay cehdê coş beçal kerd ce ceng

Ce herfê Şîrîn beçal bî ce ceng  
Be guşey kenar midra we bêdeng

Ferhad ferîb da xamûş bî be coş  
Riwala be nerm mînay mey firos

1840 Wêş west ne mabeyn ce midî cengiyan

Hey kerd ne zerebey zaxê zengiyan

Midra ne mabeyn çûn şefafê şem

Ferhad û zengî neyawan be hem

Hey kerd we zengî be midra newe

Ce şermê Şîrîn horgêla newe

Ûerxa be Hebeş coşiyane be hem

Tariyane be tar riwala be nerm

Ce sehmê Ferhad ce şewqê dilber

Kes qadir nebî pa binyu newe

1845 Şîrîn be rêzan razê şekerrêz

Be razan raz 'etrê 'enberbêz

Çirîş be Gerxa watiş ey Hebeş

Zengî zebûngîr radarê rûreş

Heqa her çi qewm zengî Hebeşen

Ce bêxişletî gişt her rû reşen

Zengî zebûngîr bêheya mebo

Cew bo ne rû reş rû siya mebo

Siya bêşifet qarê qîr mebo

Zar û zelîl goş zebûngîr mebo

**68b**

1850 Xîrey bêxêred fikr û xiyaļ ker

Siyay sengîndîl şer ne derûn ber

Min banûy perdêz şehzadey şîrîn

Îne Ferhaden fexfûrê Maçîn

Axir her çi bo mêhmanê toyîm

Mêhmanê ‘ezîz er gewir kuyîm

Min arezûy ‘eşq dînê to kerdem

Cew bo ne Ferhad bey zeyd awerdem

Ferhadê koken be qebzey quleng

Taqê bisazû ce sufârê seng

1855 Tekye bisazû ney weqtê cêda

Îmew to be şad bişînim têşda

Be badey boxoş kerîm 'eyş û noş

Be suzê sazan saqî bidîm goş

Emşew çenî to binîşîm be kam

Be himmet xahî rewan bîm ne ram

To xo siya diî mestê bengenî

Çenîman ce coş cehdê cengenî

Ha û hey bigîr zaê zengiten

Ne cay ab û nan de'waw cengiten

1860 Biber xecalet xîrey bêxêred

Cengê çêşiten be Ferhadê ferd

Ce ko rewya bo çenî çîl zengî

Çenî yek tenya yek ten be cengî

Min banûy Xusrew ye Ferhadê Çîn

Mebo ce rengîş xecalet mebîn

69a Girdîn şineften ce Şîrîn xeber

'Eşqê diîdarîş ne diî kerd eşer

Şewqê Şîrîniş awerd ne xiyal  
Xamûş bî ne ceng cengiş bî betal

1865 Xerxa be yaran sanê siya reng  
Ne dewrê Ferhad horgêlan ceng

Hewaş keft ne ser dîn û dil zêrûr  
Wastiş ce Şîrîn çend 'ezrê mexrûr

Watiş bînayim hokmê hakimen  
Metersûn daway Zûlmê zalimen

Hûrê rizwanî 'etrê 'enberîn  
Mebo ce teqşîr bendet buyerîn

Ama be sucdey sucûdê edew  
Bosa xakê pay nazdarê Xusrew

1870 Kerdiş tewazo' be zarî zêrûr  
Wastiş ce Şîrîn çend 'ezrê me'zûr

Xasî xecalet awerdiş be yad  
Hem çenî Şîrîn hem ce lay Ferhad

Bexşaşan xetay xetabê bengî  
Razî bîn be raz bedanê zengî

Xamûş ce xak şuley siya reng  
Ferhad farix bî ce me´rekey ceng

Şîrîn be şadî efsûs kerd be yad  
Îşarey be naz kerdiş be Ferhad

1875 Be qebzey quleng taqê bisaze

Yanê be te´cîl merdî binwaze

Ferhad dîş diyan dîdey şox û şeng

Yahûş kerd be yad yanaş ew quleng

69b Taw da be taşan yasê ebleq reng

Yawa be sofar sanê sextê seng

*Teraşîdenê Ferhad Taqê Gera ra*

Tîşeytaşê têz awerd ce serda

Ne tawîrê taş kawê kemer da

Piraşey pişeng ahirê bedreng

Xêza çûn şehab cew sengê quleng

1880 Tazê tawîran yawa be gerdûn

Taşaş çend taşan be yek kefre kûn



Benaş kerd be taw tekyey taqê seng  
Payeş berd we ban sazaş yek dereng

Dewriş be cedwel ce sengîn rengîn  
Sazaş çûn terrey telaranê Çîn

Cay da ce laş Ferhadê fexfûr  
Çûn ayîney medruşa ce dûr

Mehfel da xeta we xişt û xariş  
Hiç şahê nedaşt ce terhê tariş

1885 Nedaşt ce terhiş çûn nosxey nigîn  
Ne Qeyser ne Rûm ne xaqanê Çîn

Taqê dilpesend ce tîşe karî  
Mano ce mekan pey yadigarî

Yadigarî bo pey rozigarî  
Ne ragey rewend zerbey zewaran

Temam kerd teyar be dilnewazî  
Çûn camê Cemşîd şîşey Şîrazî

Terhê turrey taq tekyeş tamam kerd

Ama be Şîrîn sucdey edeb berd

70a

1890 Şîrîn diya dîş destkarê Ferhad

Kerdiş aferîn be xatir goşad

Teklîf kerd be taq Gerray bê endêş

Gerra keft ne pes Şîrîn keft ne pêş

Daxil bîn be taq taşay 'eceb reng

Seyrangey şefay tekyey di! ce seng

Yek yek aferîn kerden be Ferhad

Nîştên be di!xoş be xatir goşad

Ne taqê talar kerden çiraxan

Şule dan ne şewq berze demaxan

1895 Niya be nay bezm badey bokolaw

Mezey şehdê şur şerabê kebaw

Piyaley bilûr şîşey Şîrazî

Şafiyane şaf beyzay beyazî

Sazan daye saz saqiyan ne dûr

Çeng dane caman piyaley bilûr

Şîrîn be serxoş Geṛra be sermest

Ferhad ne xidmet dest we banê dest

Sermest bî serxoş Geṛray bêedew

Laqeyd ce Ferhad xeṭabê Xusrew

1900 Awerd be xatîr xiyalanê xam

Watiş be diḷber piyawun be kam

Emşew be Şîrîn xatîr kerûn şad

Seher ce Xusrew her çi bada bad

Xarê xemanîm ber kerûn ce yad

Şadî be Şîrîn be kûrî Ferhad

***Dast Diraz Kerdenê Geṛra be Şîrîn we Koştenê Ferhad Geṛra ra***

70b Geṛra bêendêş be diḷnewazî

Dest berd pey Şîrîn be dest dirazî

Gêrtîş pençey paş bikêşun ne pêş

Keru kiramet ‘eyş û nûşê wêş

1905 Diļber dîş daw adem ne tengî  
Yawan be yagey bednam û nengî

Şîrîn îşaret kerdiş be Ferhad  
Namerdit keran namûs şî we bad

Gerray bênamûs cehd ce xetişen  
Ferhad fidatim wadey wextişen

Beterse ce nam bed tengê tengî  
Namûsit meder be Hebeş zengî

Zêr naş be raz Şîrînê Ermen  
Feryad be Ferhad fexfûrê koken

1910 Ferhad şineftiş dadê diļberiş  
Derdiş dêwiya ce kelley seriş

Koken kawiya dêwiya ce derd  
Be heybet helmet bazûy gerraş berd

Gêrtiş bahûy bal bengî siya reng  
Be qeşdê qatîl qerar da ne ceng

Kendiş ne rûy ferş berd we banê ser

Gêlaş be dewir çerxiş be çemer

Çerxiş da ne çep daş we seng da

Piraş bî ne taq ebileq reng da

1915 Muleq da ne taş tûşê serender

Xûniş xiroşa ce kapolê ser

Rêze rêze bî ne rûy mesken da

Sanê sengêwen hane new teng da

71a Coşiya be coş çûn şîrê cengî

Rûş niya be bezm çîl zengî bengî

Yaranê Gerıra diyan be Ferhad

Berdê bençîney Gerıra dan we bad

Aman bêaman qînê sextişen

Perî qetlišan cehd ce xetişan

1920 Xêza xiroşan zerbey zaxê zeng

Cehdî ce nigîn coşa bezmê ceng

Kerden perî zerıra efxan û feryad

Helqe dan hucûm ne dewrê Ferhad

Yasa! da ne dewr koken çûn nigîn

Wara pêş da herbey qeşt û qîn

Ferhad fetway fewt xirmaniş be teng

Yezdan kerd we yad dest da ne quleng

Naław nirkinaş berd bêendêş

Çûn şîrê jiyan pa niya û pêş

1925 Coşiya be coş zerbey zengê zişt

Her çîl be qebzey mewday quleng kuşt

Hor kendiş binyad bînayê zengî

Nastiş nişaney eşlen ce bengî

Bose ser gim kerd tar û marişan

Êzharî nemend ce aşarişan

Kesî nezanaş îne kê kerdên

Şîrîn ya Ferhad cey ra wiyerden

Dimay cehdê ceng kemanê koken

Ama pey Şewdêz Şîrînê Ermen

1930 Quleng da ne qed be yadê Yezdan  
Şîrîn ûn Şewdêz herdûk şend we şan

71b Şeleng da be şerq dîrî diyaran  
We yaran wiyerd çûn bad û baran

Perţaf pa da diġdarê dîrîn

Yawa be telar be Qeşrê Şîrîn

Hêman tarê terġ şewgar ne şew bî

Gezmeçî xamûşXusrew ne xew bî

Nubedar ne xew kêşçî xamûş

Serdaran sermest mehteran medhûş

1935 Eşlen ce yaran Şapûr û Perwêz  
Nezanan ce kar Şîrîn û Şewdêz

Kesê ce ferman Şîrînê diġdar

Ce liwaw aman nebî xeberdar

Şîrîn hem ce new wad nîme [ce] şew

Peştan bî ne ca ne be jan Xusrew

Poş niya be boy ‘etrê şewbiwan

Xusrew nezana ama be eywan

Mehteran medhûş koken bêkeman

Şewdêziş kêşa berd we be xêzwan

1940 Bestîş ne axor bendîş kerd ne bend

Niyaş balay ser be heqey kemend

Neba be Şîrîn bî şîr û tane

Kolê kîşawe perî nişane

Waçan mehteran ce persê Perwêz

Î kolê keftin ne ranê Şewdêz

Xusrew xatîriş ce kes nebo teng

Sewday sitûnen Şewdêz kerden leng

Neba ‘eyaran peneş biyawan

Xusrew ce Şîrîn negêro tawan

**72a**

1945 Horgêla Ferhad be te ‘cîlê taw

Bêxiya! ce xord bêxeber ce xaw



Qeṭre da be qeṣt be yek kife kûn

Yawa be yatax ne pay Bîsitûn

Heway bo `ebîr Şîrîn daş ne ser

Taw da ne taşan be taşay kemer

Ce `eşqê yagey yadê dîlberîş

Meẖziş coşiya ce kasey seriş

Ustay zibze dest huner nimanaş

Şed quleng be yad Şîrîniş şanaş

1950 Hêman wadê weqt şewgar ne şew bê

Sitaran ne dewr dewarê dew bê

Şefeq çenî şew ne coşê ceng bê

Xurşîdê xawer zêlîlê zeng bê

Nesîmê nem xêz şemaîlê şebgîr

Ga ga ne demaẖ mida boy `ebîr

Çend neqşê neqşîş be mezmûn yawa

Ewsa şo`ay şewq şefeq şikawa

Sîrrê sewadiş xêza ce ser da

Çi paw dane çerx çetrê çemer da

1955 Sitarey seher zerdîş bî 'eyan

Şikufay şefeç zerdîş bî beyan

Serdarê şub xêz sitariş maļa

Zînayê zer û zîb hordaşt ne kaļa

Sewdayê sewdaş xêza ce xaran

Xîmey zer û zîb dane diyaran

Nesîmê nem nem sumay şubê şefeç

Murxê zerîn baļ tewqiş da tebeç

72b Tolu'ê tel'et taqê gomezgûn

Hor da xiyaban xîmey zerşitûn

1960 Zîbay zerwereç zûlmet bî zebûn

Tewqê teneney tarî bî nigûn

Xurşîdê xawer şanaş baļ û per

Hordaşt badiban xîmey zîb û zer

Ferhad ne ferman coşê cehdê cext

Metaşaş ce naş tawîranê sext

Mekerd cehd û cext be soz û zarî

Serxoş bî ce boy 'etrê dîldarî

Te'cîliş mekerd kariş bo tamam

Ce dînê Şîrîn biyawo be kam

Bend bin coş besit terhiş bî tayar

Zerrey mende bê aw meyo be war

1965 Çaçtê mende bê kariş bo mezmûn

Aw ber awero ce koyê Bîsitûn

Ferhad fermaniş awerd be encam

Çaçtê mende bê kariş bo tamam

Bero ce Xusrew girew ce goftar

Bistano Şîrîn be şert û êqrar

Nagah exyarê ce bedan pêş

Fitney şerengîz bedgoyê bedendêş

Ce semtê Xusrew ama wiyara

Diya be ferman Ferhadê xara

1970 Diya dîş ferman Ferhad temamen  
Şîrîniş berden dinyaş be kamen

Şeytanê şerco riwala be dew  
Yawa be dîwan gezindê Xusrew

73a Sucdey sucûd berd be dad û bêdad

Watiş be Xusrew fermanê Ferhad

‘Erz kerd be Perwêz eħwaļan temam

Fermanê Ferhad yawa be encam

Watiş ey Xusrew ye çêşit kerd çêş

Pêkayê cerg wêt ne nûkê sernêş

1975 Wêt kerd be ser jan gişt şehriyaran

Ha mend rişwayît pey rozigaran

Bednam kerdî nam neşlê kiyanan

Bît be watey wat waz keftê saļan

Kuřê Hurmizit gom bî ce merdan

Nabûd kerdî nezm namê şîrwan

Textê tenteney wêt day be taļan

Ûiswa bêd ce yam pey qerñ û sañan

Wel-ħaşıl Ferhad kariş temamen

Şîrîn mend ce to dinyaş be kamen

1980 To mendî meħrûm deyrî derdedar

Pey tîrê terkiş ta ney rozigar

Ha watim be to eħwañan temam

Êxtiyar be ton baqî weselam

Xusrew şineftiş watey wey xeber

Dûdê esrîniş xêziya ce ser

Gêliya ce reng qetranter ce qîr

Xarê xeşernak pêkiya be tîr

Çîn da ne çariş cemîn tirş û tar

Xeşmê xezebnak wîney jarê mar

1985 Fikrî bî ne fikr ne xaney xiya!

Tariya ne text dîwan kerd beñal

73b Sanê şefaray dewr da bo şikest

Xemîn ne xeñwet derwazey der best

Ne fikrê wêş bê ta çûn kero çûn  
‘Elac û derman Ferhad çûn berûn

*Amedenê Pîrezal be Xidmetê Xusrew we bêna Kerdenê Xusrew be Qetlê  
Ferhad*

Nagah peyda bî yek Pîrezalê  
Siftey siyaset derûnê zoxalê

Ama yek pîrê ce Pîrezalan  
Qarî qerînê qern qeltaxê şalan

1990 Daday dêwê deyr dolabê şalan  
Felek ferîwker ce kohne maşan

Fitney falê fil qernî qel be qel  
Cametey cadû mekr û fêl ne mel

Ferhad ferîwin aşuy şerengîz  
Coşê cengê coş xenîmê xûnrîz

Teşîman şiken dawa be dîwen  
Weşat wêranker bena be şîwen

Mekr û hîleker ‘ilmê ‘emeşzan  
Xapûrî xeter xaney xanedan

1995 Deġalê doġab eşiġ efsûnsaz  
Şeytanê eblis sêhrê cadûbaz

Yexey şeraşûb dadanê weswas  
Zewcey şeytanî dayey elxennas

Milçal piştê kox diwelay dûdkom  
Çiriçê çol çek çûn dewal dom

Kimtarê kem reft çaley çeçel çem  
Muzî meymûn mil kêsey gîwe dem

74a Kasey kêsel pişt ser ne sîne kem  
Reft rûbahê zişt çûn jûjûy pay çem

2000 Çem kasey gilûr taqê xirawan  
Ebru çûn pasar kulbey xirawan

Leb textey dewar siyay şeb deycûr  
Bînî bedsirişt dihen çûn tahûr

Dulay gîwekeş guçan ne ruy zik  
Çikey çem ne ban meşkuley memik

Şeytanê êblîs şeyatîne şer

Dêwê deyrî reng pîregurgê der

'Ecuzey 'enter çeman çûn çeçil

Eşqeme ne aw pîregurger

2005 Suçerey sencer meşkey mingexor

Kîsel û kemtar cumley caniwer

Qapûrey qeltax çarçuyê çift çêl

Bedguy xeybetî fitney fend mo!

Çilêsê çir çul dêwê bêdendan

Acûc û bacûc daday ecandan

Dihenê pust put hemaney bêder

Mangay bêdendan gaw qurbaq xiwer

Wamendey mînkane be hîç neyawa

Rezan siperdey helûrek sawa

2010 Keftey keftedar çûn gamey gilîn

Lebê sîniger çûn kugay sergîn

Ama Pîrezal bêcay bêdedew



Sucdey sucûd berd be xanê Xusrew

Dûla keft dûgom 'esasiş çûngez

Xeřr meyfirûşan sîne ce merez

74b Nefes çûn henas diley tawistan

Mejîna çûn meşk kurey kawistan

Mekêşaş henas ziwaney henas

Lêlaw merêza ne perdey pełas

2015 Midra mendir kerd ce dem gêrt qerar

Ne xanê Xusrew ama be goftar

Watiş fidatim çêşit xiyalen

Dayrey dewran dewrit beçalên

Pey çêş xeternak xatir rîşenî

Waçe fidatim fikrê çêşenî

Waçe perî min derdê halê wêt

Karit bisazûn ser bidem nerêt

Her çend karê sext asanen ce lam

Şeytan wêş mebo we pabosê pam

2020 Elxennas be fend fitney min benden  
Şeytan dersê 'ilm we lay min wenden

Ye çenden wey tewr wiyerde şalim  
Sê şed şalim bo hêman mindalim

Ce tîflê min toxm şeytanîm şenden  
Êlmê 'edawet wey şerîm wenden

Tîflî ta îse min ye karîmen  
Çend fendê fitne gîrdarîmen

Çerxê çep kerdiş keften ne bendim  
Gerdûn gorêzan ce fitney fendim

2025 Elxennas ce taw tariya be tar  
Şeytan ce mekrîm ferar bî ferar

Waçe 'uzrê wêt 'elacit kerûn  
Dewayê derman derdanit berûn

75a Er karit be keç çerxê gerdûnen  
Felek ce fitney fendim zebûnen

Er dewat be cinn dêwê perî bo

Ya t̄elsimê ter̄ cadûgerî bo

Er ne zîrê zemîn er ne sema bo

Ne zîrê xurşîd ne pitê mah bo

2030 Meşeknûş t̄elsim mawerûş we gîr

Be mekr û efsûn be fend û tedbîr

Waçe perê wêm derdê wêt tamam

Çêşen mudey ta baqî weselam

Xusrew şineftîş ce Zâlê zerhan

Şad kerd xatiriş ce zerrey penhan

Watiş çêş waçûn dad û derdê wêm

Qa ‘deyê qirçan qeqnes biyen çem

Sewday siyaset muşkilim karen

Nimeyot be dest çarim naçaren

2035 Her çend meynetim ko besten ce ko

Bada şerhê wêm niwaçûn be to

Belkem ‘eyb niyen ‘elacim kerî

‘Elacê derdan dermanim berî

Min çenî Ferhad êqrarim kerden

Nema beynê merc sewgendim werden

Bestenim keru be sextê sewgend

Be şert û şurût şehadet be çend

Kar wateyê min nebo ne mezmûn

Aw ber awero ce koy Bîsitûn

2040 Îse kerdeniş karê wêm tamam

Karê fermaniş yawan be encam

75b Berden mercê min tamam kerden kar

Şîrîn mebero be şert û êqrar

Er bero Şîrîn dima giyanmen

Yek dem bê Şîrîn çûn jiyanimen

Eger nedun pêş bednamim tamam

Çawê rişwayîm memano ce yam

Waçan bedî min her yek be faşî

Banûy wêş baxten be sengtiraşî

2045 Eger nedun pêş bêşertî mebo

Ne mercê merdan namerdî mebo

Řiswayî mebo pey rozigarane

Bêşerfî mebo ce şehriyarene

Eger mikşûş şedrê sengînen

Ferhadê fexfûr şehzadeyê Çîn

Baboş min we çay ê 'tibar kerden

Emanet ferzend be min siperden

Ne ragey rastî dîn û diyanet

Mebo emanet nebo xiyaret

2050 Bednamî mebo pey min pişt be pişt

Xusrew pey jenê Ferhadê Çîn kuşt

Er satê Şîrîn çenem bo ciya

Derûn ce dûrîş mebo elweda

Bey tewr mendenan sextê sergerdan

Gîrê derdanim ne dehrê derdan

Xusrew wat er çarim kerdî

Er dewa be derd dermanim berdî

2055 Şerç bo sengê wêt gewher bide m pêd

Zer û genc berî be ênsafê wêt

76a Kerût mera 'at herçî beyo rêm  
Kerût we banûy heremseray wêm

Ha watim be to halîm seranser  
Eger mitawî derdim dewa ker

Dad watê Xusrew her êden karit  
Asanen ce lam derdê naçarit

Be fend û ferîb be yek îşare  
Mesazûn karit meberûn çare

2060 Min tîlsimê terî dêwim şikesten  
Zîçim ne xêz baļ serzemîn besten

Qeṭrey mekrê min ne derya keften  
Derya ce dûdîş çûn arê neften

Min be mekr û fend fitne mizanî  
Ferîbê Ferhad be min hemanî

Ye çî emrêwen ye çî karêwen  
Ce lay min liway ce bazarêwen

Beleş be şertê fermanim berî  
Mer çi min waçûn be ca bawerî

2065 Mebut çenî min dewlet bî efsûn  
Teşrif bawerî ne pay Bîsitûn

Sê şiwane roj perî mekr û fend  
Ceya ken be hem sawa û gusfend

Ewse mewînî be yek kefre kûn  
Ferhad be hîle çûn kemser nigûn

Samaniş sa bo binyadiş be bad  
To çenî Şîrîn binîşî be şad

Ew be hesret mend xeletan bo ne xûn  
Xifet xêziş bo çenî Bîsitûn

**76b**

2070 Dûdî daxê derd derûnê şed çak  
Daxanê Şîrîn bisparu be xak

Xusrew şineftiş xêza bêmidar  
Çar da be sopa siwar bo siwar

Xêl xaneş awerd ne pay Bîsitûn  
Hor da xiyaman xeymey zêrsitûn

Quşin qerar da sakin bî sipa  
Çetrê çadîran rengîn bî we pa

Xusrew xiroşa be xatîr goşad  
Benay bed ne ser be qetlê Ferhad

2075 Ferma be êlat hucûm berdişan  
Sawa û gusfend ciya kerdişan  
Çar çîyan çar dan hozan hoz be hoz  
Biyabê sawa sê şebane û roz

Fetûrê Ferhad puse dan qerar  
Rozê çîwarim xurşî ne şîwar

Xurşîdê xawer perwaz bê ce ko  
Şamê şeb be coş rêza rengê bo

Sipay siya reng da ne tîblî kûs  
Zulmat da zuhûr ne zengê naqûs

2080 Sipayê zeng zor wêş da gorîz



Coşê cilûs kerd tarî tem tengîz

Şurişê şewgar tewqê tarê teng

Xiroşaw xêza tazî çûn eneng

Keştî keft ne wer xurşîd nigûn kerd

Şewgar û şo'ay şefeq firû berd

Tufan bî qerîrab xawer ne zûlmat

Qehar ne xûte neheng ne zûlmat

77a Rêja rengê roj ne zûlmatê sext

Şikufê şewgar tayîn bê be text

2085 Şef da sitaran sanê sitaran

Ne semay sîma senceq winaran

Xiroşê xawer riwala be dew

Tarî tîrey tar şahî da be şew

Munşî moqereb teleb kerd be pêş

Benaş kerd binyad ferman fermay wêş

Teleb kerd ne pêş katiban keyil

Hesabdarê sext ceyaran seyil

Aman aşifan hûrî hesabker

Awerden esbab ce ferdê duxter

2090 Çem bîn çemaray fetway ferdê fewt

Mustewfi memat munşiyane mewt

Yek yek mikr û fikr fetwaş kerdewe

Defter xaney ferd lêşan kerdewe

Kerdişan hesaw ce siyet mergzar

Wiyerden ce yam yawan be Ferhad

Diyan dîn ferman Ferhad be taqî

Henî hesawiş nemenden baqî

Henaseş ne 'eqd qeysê duceylen

Şimareş tamam peymanîş keylen

2095 Diyan hesawiş niyen be lawe

Mergiş ne mewten niyen we pawe

Kerdişan hesaw salîş seranser

Fermanê fewtiş derya ne defter

Fewtiş ne defter yek yek kerden sext

Zeriq karxaney rizdêş kerden sext

77b

Namey mergê mewt besten be 'ariz

Siperden be destqibûzê qabiz

Meleku'l-mewt merg qebziş sitana

Qellabey çengiş peneş nemana

2100 Eceļ camê merg peṛ kerd ce bade

Saqî pey seher kerdiş amade

Bidoş ne demax badey bêhoşî

Beruş ne xaney xawê xamoşî

Şeytan şî ne pust perdey Pîrezal

Peṛ kerd ce weswas cergiş ce xiyal

Şewgar bey destûr aşûb û ayîn

Fetway fewtê ferd Ferhad kerd tayîn

Teman bî tertîb tîrey tarê tîr

Nemana nesîm şemalê şebgîr

2105 Seher da ne kûs sewadê serr serr  
Şefeq şikawa ne mewcê merri merri

Xiroşê xurşîd xêza ce xawer  
Sanê siya reng tarî da ne wer

Toû'ê tel'et şubhê se'adet

Ber ama ce burc berzê 'ebaret

Beyza da beyzey beyanê bêgerd  
Kêşa xeyaman xeymey zîbê zerd

Şikawa şikuf şefeq ce xurşîd

Roşê rewşenî ceman aferîd

2110 Hordaşt badeban zîbay zîbê zer  
Şewqê şefafîş poşa behr û ber

Tayîn bî ne text hakiman destûr  
Pey celladê can Ferhadê fexfûr

78a Cehan kerd be ferş ce zîbay zuşal  
Ruşin kerdiş reng ragey pîrezal

Ferhad her ew şew zahêr bî be zeyn  
Merdey mergê wêş awerdiş be ‘eyn

Koken diş ne xaw keştîş şikesten  
Xêrqê nehanen ne gerdab keften

2115 Dîş kelleş ne qeşd qebzey quleng

Laşêş ne qullab nîşê nehengen

Herasan ce xew bêdar bî ce xaw

Melerza ce terz terket tafê aw

Ta şub xiyal kerd wêş be wêşewe

Tekêş da be seng be endêşewe

Seher siyaset xêza ce her la

Xewxay şûrê şer coşa ne bala

Melekê mewt merg be qebzey qullab

Midra muntezêr seydiş çûn ‘uqab

2120 Quleng mêkşaş ziwaney qeza

Ce xûn mexziş nebo şûn xeza

Gişkuy xakê 'erz dehan gêrt ne pêş

Ferhadê fexfûr bikêşun pey wêş

Ye gişt ne qeşdiş qeza kerden yad

Midiran mukemmel pey qetlê Ferhad

Seher pîrezaî bêdar bî ce xaw

Kerdiş tedarik be te'cîl û taw

Fîkr û fend û fêl fitneş berdewe

Kitab kerdey mikriş kerdewe

2125 Herçend fitne bî awerdiş be yad

Pey fendê fetway ferîbê Ferhad

**78b** Watiş be merdum pey ferîb û fend

Daxil ken be hem sawa û gusfend

Merdum bê midra hucûm berdişan

Sawa û gusfend daxil kerdişan

Xêza resta xêz mûr û melamet

Zarî û zawma bî we zelalet

Weled pey walêd walêd pey weled

Bî we zilzeley bêdad û bêhed

2130 Bî we qiyamet nadirey nedîm

Xêza zayiley zelalet 'ezîm<sup>236</sup>

Şida nîşt ne çerx pay gêcê gerdûn

Pîciya ne gaw qulley Bîsitûn

Puse dan saman Ferhadê koken

Bêxeber ce kar Şîrînê Erman

Wêş niya ne gil ce ser ta kemer

Fîrriş da ne ser yexeş pare kerd

Be şîn û şîwen be çuyî çemer

Dane herdey çol beydî gêrt ne wer

2135 Rîwan bî ne ra be zarî û zebûn

Rû kerd ne helet qulley Bîsitûn

Be zarî zigar şeydayê şîn şûr

Her namê Şîrîn mawerdiş be hûr

---

<sup>236</sup> Xêza zelalet zayiley 'ezîm

Be şîn û endûh Şîrînê lawnaş

Fexan sanê seng sext tewen tawnaş

Mekerdîş bêdad fexan û feryad

Dêmê pey Şîrîn demê pey Ferhad





79a Ferhad şinefteş zayleyê zebûn  
Xêza ce qeytûl nîşt ew Bîsitûn

2140 Diya dîş dilway diyaren ce dûr  
Şîrîn be şîwen maweru be mûr

Şîrîn û Ferhad xasê milawno  
Cergê sanê sext sengê metawno

Ferhad ce zarî diş şî ce hoşîş  
Reng dadayê pîr yawa be goşîş

*Rêsîdenê Pîrzaş be Ferhad û Xeber Daden be Wey*

Xarê xeşer bî ce xaneyê xiyaş  
Hewa da quleng kariş kerd beşal

Ce xewf û zarî ce herfendêş  
Her dem mewatiş yaran yanê çêş

2145 Tekyeş da be seng be diş giranî  
Penceş da ne diş deste ziranî

Her dem ahê serd mama lêşewe  
Dem dem mewatiş wêş be wêşewe

Nek gerdûn sitem wenem kerde bo

Dûd bo ce giyaniş Şîrîn merde bo

Wer ne yanê çêş karê kes nedîm

Meyo ce qeytûl zayleyê 'ezîm

Eļbet ya Xusrew ya xo Şîrînen

Bêreng restaxêz dewrê dîrînen

2150 Țaġî mezanûn meynetê bawmen

Herĉî hen cew seng dînê xawimen

Aru min yeqîn nerdî neġamen

Ya min ya Şîrîn bizanûn kamen

**79b** Ferhad ce westan ey wiġînewe

Pejarey zarî suzê sînewe

Megrewo be suz mepîĉîw ce derd

Dem dem mekêşo henasanê serd

Țufê henasan her mido we bad

Her ta pîrezal yawa be Ferhad

2155 Ama pîrezaļ piṛ mekr û efsûn  
Yawa be Ferhad ne pay Bîsitûn

Asaş da ne kef koney kifrê kîn  
Tasê piṛ helwaş niya we zemîn

Cinazeş niya ne pêş Ferhad  
Dûla keft dûkom be fendê feryad

Ferhad wat dada diļ be endêşen  
Penem waçe rast bizanûn çêşen

Destim damanit peykê pîrezaļ  
Ce haļê Şîrîn penem der eḫwaļ

2160 Be çêşen şîwen î zarî kerdên  
Dûr bo Şîrîn herkesê merden

Werne yanê çêş zayleyê zebûn  
Pêçiya ne bend qolley Bîsitûn

Derdê diļberim ne cergê min bo  
Yallah herkes hen her Şîrîn nebo

Dada şineftiş xeber ce Ferhad

Kêşa bangê sext be dadê bêdad

Watiş ey Ferhad xarê xatir rêş

Beleş beley nemez waçûn çêş

2165 To ahir giyan xarê xem xeşer

Xawenî ce min mepersî xeber

80a Er waçû penet diłazar mebo

Eger newaçûn aşîkar mebo

Şellah min aru newatim be to

Çend henî berdit cefay rence ro

To perî Şîrîn sizayê sexten

Taşanê ey taş cehdê cexteten

Er Şîrîn nebo perî çîşiten

Xarê xem taşî îşê nîşiten

2170 Ferhad min bimirûn xeylê cefat berd

Serit selamet Şîrîn we faş kerd

Çend berdî sezay sextê curiyam

Ce şewqê Şîrîn neyaway be kam

Henî cey fişter mekêşe cefa

Sengtaşî perêt nedaru şefa

Sengtaşî taşan henî pey kêtên

Fikrî henî ker her Ferhad şêten

Î şîn û şîwen min perî tomen

Bî sudê sewday to rence rûmen

2175 Rastiş her êden min watim perêt

To zanî çenî derdê halê wêt

Şîrînit aro gişkoy tazeşen

Î tase helway wer ce nazeşen

Îne şerbet bî awerdim pey to

Ce dimay Şîrîn mebî rencero

Ha watim perêt seranser xeber

Er fikir darî ‘ elacê wêt ker

Be watiş dada beden kerdiş çak

Be şîn û zarî wêş niya ne xak

80b

2180 Ferhad çûn şineft ce dada xeber

Dêwiya dûdiş ce kapolê ser

Şî ce haîê hoş gêlîya ce reng

Tewasa ce taw tekiş da be seng

Xêza ce bînîş dûdî daxê derd

Peya pey kêşa henasanê serd

Girewa be soz nirkinaw naîa

Be eşkê endûh rûş klerd we baîa

Watiş ey gerdûn meynet barenî

Zarê zebûngîr diîazarenî

2185 Heqa to terdest nexşê nerdenî

Zalim zebûnker zebûngîrenî

Hey çerxê çep gerd Zâlê zerhanî

Gerdûnê kecbaz fetûrê fanî

Ye çendê wexten ne pay Bîsitûn

Taşan metaşû be nûkê naxûn

Mekêşam cefay dewranê dîrîn

Zerrey xatîrim şad bê be Şîrîn

Ew berdî Ferhad ce mînet haştî

Ewîç ce bextim rewya nedaştî

2190 Min dimay dilber be wê mînazûn

Bigêlûn be şad wê mîzênde nazûn

Xêza xeternak Ferhadê xemgîn

Wêş elbeda kerd ce şîne Şîrîn

Yeçêş pare kerd wêş niya ne xak

Be nîşê naxûn wêş kerd sîne çak

Dest da ne kapo çeng da be ser da

Beden da ne xak ser da be seng da

**81a** Şehîd bî şekest ce şîne şeyda

Bejn û beden çak cemîn elweda

2195 Kohanê kewan ce dedê hanaş

Henî nemend haz hêzê tewanaş

Taşê tawîran sengê şed saleş

Tawîyan ce taw feñan û naleş

Bîsitûn ce suz sîney bî be aw

Lerze nîşt ne bend pa pencey peraw

Minaļa be zar xarê xatîr rêş

Megrewa be zar pey bêkesî wêş

Mekerdiş futûr feñan û feryad

Pey Şîrînim ro pey Şapûrim dad

2200 Bêdadim ce cewr dinyay bêbinyad

Pey Ferhadim ro pey fexfûrim dad

Yaweran Çînî hamseranim ko

Pey dewranim dad pey bêkesîm ro

Watiş pîrezaļ ce heq neberî

Konay min çêşen pêse pêm kerî

Bezeyît nama be eħwaļê min

Çêşit bî çenî wey hewaļê min



To şûmê şeyday sernîşê xaran

Derwêşê dirêş xerîbê şaran

2205 Bênewaw bêkes dûr ce xan û man

Deyrî biyaban beydî wêranan

Bêberg poşak ker eħwaîê nezan

Muhtacê muflês dûr ce ab û nan

Teye nişîn bîm derwêşê dîrîn

Bey haîê şad bîm ce şewqê Şîrîn

81b Erê bê mirwet xenîm xûnrêz

Pîrezalê peyk perduxê Perwêz

Xeţabê Xusrew diîalê dîrîn

Celladê Ferhad şeytanê Şîrîn

2210 Amatî Ferhad fena dey be fend

Bo be şamanit ta hezar û end

Be şadimanî horgêlî be dew

Haîê mizganîm waçî be Xusrew

Te 'rîf derî nezm wêt be nîzamî

Waçî şerhê min be şad û kamî

Fewtê fethê min bo be pîreza!  
Xusrew bidu pêz zerî û genc û mal!

Ferhad wat dada bizane taqî  
'Emrê min û to nemendin baqî

2215 Aro rojêwen çûn rojê meşer  
Şîrîn ne xaken Ferhad ne xeter

To dimay Şîrîn Ferhad bimanî  
Heyfen bimanî be şadimanî

Aro ne say seng pay Bîsitûn ko  
Ne min mamanûn ne aşarê to

Karê pêz kerûn pey rozigarî  
Heret namebopey şehriyarî

Bo be pendê pîr ta be qern û sa!  
Henî kes be kes nedu pey hewa!

2220 Nemanî be şad daday bed dewas  
Gencê Xusrewît mano we mîraş

Min dimay Şîrîn emşew şînimen

Henî zêdegî perî çêşimen

82a Be qebzey quleng ser bidem we bad  
Yek dem dimay ew nenîsim we şad

Ewsa to dimay Şîrîn û Ferhad

Heyfen bimanî ne dewranê dar

Be watiş Ferhad dêwiya ce derd

Be heybet helmet ranê dadaş berd

2225 Çûn bazê û şahîn 'uqabê tîzçeng  
Çeng da ne daday dejalê rêw reng

Kendiş ne zemîn berdiş ne hewa

Dewriş da be dewr ce ser bî sewa

Dewriş da be ser çerxiş bo çemer

Gêlînaş ne zur ne dewranê ser

Bew zebr û zur çengalê şîrçeng

Daş be zemîn da ne rûy sanê seng

Neqşê zemîn best bendiş bî ciya

Rêzey êstxaniş bî be tûtiya

2230 Xûniş ce demax dehaniş dem da  
Guşt û pust û mexz guya be hem da

Çeng da ne lingiş paçiş gêrt be qîn  
Be çengalê çeng qeştê qarê qîn

Ling niya ne ling dadayê bed qiyas  
Hor dirîş be hem ce karê ker bas

Zêrnaşê ziber zarîş nîşt ne ber  
Giyaniş teslîm kerd be şeytan şer

Pareyê pust pîs heleş çiya kerd  
Kerdiş hewaley qoley yasê zerd

2235 Her rêzey guştiş ne xarî darî  
Her pîşiş bend bî ne ser diyarî

**82b** Qetrey ne xûniş ne her ca mekeft  
Mesuznaşê seng wîney qîrê neft

Mekeft ne derya mawerdiş xiroş  
Çûn tiyaney taw me coşa be coş  
Ferhad daday dêw 'edû pare kerd

Dîdariş ce dîn wêş aware kerd

Cew dima Ferhad bewrê çeng ne xûn

Ûş kerd ne rûy taş şafê Bîsitûn

2240 Bezarî zigar endûhê esrîn

Waweyla pey wêş pey mergê Şîrîn

*Hêmet Xahî nêmuđenê Ferhad Ez Bîsitûn*

Watiş Bîsitûn Xuda nigadar

Ya mişun we şun ragey rozigar

Ye çendê wexten wêlim ne pay to

Sewday siyaset ser ha ne say to

Taşanim ce to çend taşê naxar

Çend tom be dilrêş kerdên dilazar

Ha min sengtaşî sewdam bî beçal

Ne ray refîqî bikerem heçal

2245 Ye ragey nehat kes ne dînimen

Ye dîne dîwen axirînimen

Yawam ne memat terkê heyaten

Liwanim agey kes cey nehaten

Amam ne pay to biyawun be kam

Damê rozigar pîçiya ne pam

**83a** Watim to mebît be sayey selam

Habît we mezar maway kelbelam

Boniyam ne boy xakê xarê to

Maway to kerdim we xakê gilko

2250 Pey gişt esretan daxê derdewe

Ser niyam ne san sengê serdewe

Dinyam bî tamam karim nîme kar

Ten dam be qezay qeşdê rozigar

Ye şîn û şîwen axirînimen

Bîzarî dewran pey Şîrînimen

Beleş Bîsitûn niyazim êden

Emanet ferzen be tom umîden

Wesyetim êden mewaçûn be to

Ûagey rundan pay Bîsitûn ko

2255 Amanit herfim bidarî be guş  
Aman şed aman nekey feramuş

Çemit ne ra bo yanê be yeqîn  
Meyan mewyeran zewaranê Çîn

Ûerbey zewaran we bextê wêşan  
Hekayatê min waçe perêşan

Amanet bidan zarî bo zerûr  
Derdê halê min waçan be fexfûr

Waçan be dayem yaweranê Çîn  
Kero şûr û şîn nadirey ne dîn

2260 Waçan be dayem be dadê bêdad  
Hinîç mehalên biwîno Ferhad

Mehalên henî muşkiî dîniman  
Kero şûr û şîn yek ne dîniman

Ye watiş Ferhad zarî xatir teng

Hêmmet xahî kerd ce qebzey quleng

Watiş ey quleng refiqê çolim

Bo bişu ne mexz kelley kapolim

Be to menazam karim rewa key

Be taşanê taş derdim dewa key

2265 Axir be to bî qeşde hewaşim

Hem to bît ecel zerbê zewaşim

Ye watiş Ferhad kêşa ahe serd

Bey qebzey quleng kelleş bibî gerd

Be qînê qatîl şanaş ew quleng

Fişar da destiş be çengalê çeng

Hêmmet xahiş kerd ce dûnê dinya

Nefrîn da be dewr dinyay bêbinya

Destey quleng gêrt hordaşt ne zemîn

Xiroşa be xeşm kîney kifr û kîn

2270 Bazûş bilind kerd şendiş ne hewa



Dewriş da be dewr ce ser bî sewa

Bew zeberdê zur bazûy hunermend

Quwet da be qeşd qebzey piş gezend

Ce nirkey neberd bazûyê kuhken

Taw ra be quleng tîşey yek şed men

Zur û ziber da tîşey bêtebeq

Ser da ne seywan pay çerxê moleş

Qebzey qar û qîn xezayê xeşmxûn

Ser berd ne seywan pay çerxê gerdûn

2275 Horgêla be taw tazeyê tawtêz

Fitûrê Ferhad celladê xûnrêz

83b Çerxiş da çemer tîşeyê taze saw

Ne qeşdê koken tebaq da be taw

Zilqê ziber da ne gîçê keywan

Şidaş ser niya ne seqfê seywan

Sengiş da sitêz çerxiş çemer da

Çûn birêqey berq ama ce ser da

Berqê birûskey xarê xarabîr  
Sengtaşê şed men şedre sînedîr

2280 Çûn qezay qodret awerd ce daman  
Mewday mû şikaw ser kerd ne daman

Xêza zîla zîl ce qajey quleng  
Ce sehmê sengîn seng menşit we seng

Ferhad dîş ama celladê mergîş  
Lerza lerze nîşt ne xanê cergîş

Yezdan kerd we yad be zîkrê 'adet  
Awerd be zeban kelîmey şadet

Çûn qûçê qurban xêza bêderîx  
Giyan da be dawer ser ne ragey tîx

2285 Xêza xiroşa diîdarê dîrîn  
Giyanîş ker fiday şikufê Şîrîn

Dêwiya ce derd derûniş ce derd  
Kêşa ahê serd esriş eşer kerd  
Midra be moħkem keylê kîyanî

Girewa ce daɗ pey newciwanî

Naɓaw nirkinaş be dîdey nimnak

Ŗû kerd ne qibley hacat dînê pak

Pay çep winara rast awerd we pêş

Quleng qaje kerd seriş da nerêş

**84b**

2290 Tîşeyê tazetêz qezay qodretzad

Ŗars ama ne ray kapolê Ferhad

Xêza rêzey raz ce qebzey quleng

Lerza ce heybet kawê kuhê seng

Ťıraqey Ťirûq tîşey yek şed men

Ser da ne kelley kapolê koken

Mewaş şî ne mexz ferqê rence ro

Gim bî ne kelleş tîşeyê tawşo

Ce qajey quleng şilpey mewcê xûn

Lerze nîşt ne kaw qulley Bîsitûn

2295 Şikawa kapol koken ce kîneş

Mewaş ber liwa ce şedrê sîneş

Berqış ber liwa ne berze bayir

Xêza ce dîdeş şerarey ahir

Dêwiya dûdî diş ne cergiş da

Xiroşê xûniş hat û bergiş da

Zêrnaşê zelîl be suz û zarî

Naław nirkinaş ce bêqerarî

Piřtaf bî be pa nigûn bî ce ser

Hewaş best ne taş tûşê serender

2300 Rêze bî rêziş be sanê ko da

Hûniş çûn haław rû kerd ne rû da

Piřtaf bî piřaş ser ne siken da

Piřaş bî ne taş ebleqê reng da

Hewa best ne taş şedrê sehimgîn

Ce zerbê zuriş lerza ser zemîn

Peştan bî ne xak ser ne sanê seng

Xûniş ne xaran bî we lale reng

85a Moxiş pıraş best ne kapolê ser  
Mexziş masiya ne kasey kemer

2305 Bî xurakê xûn zedey zuxê zam  
Hucûm kerden lêş deyrî dêwê dam

Ne pêş haz û hêz ziber destê zûr  
Ser kerd ne laşiş mel û mar û mûr

Qelley kelaw qûr ne çalê nîniş  
Mûran mewyeran ne bendê bîniş

Daļ wazanê daļ ser kerd ne laşeş  
Be çengê naxûn kêşan keşakeş

Ce xiroşê xûn sîneş mewirdin  
Ser ta pay sîneş şed pare kerdin

2310 Nebêş haz û hêz her ta tewanaş  
Feñan û feryad mekerdiş hanaş

Xestey xeşernak be dîdey nemîn  
Mawerdiş be mûr yaweranê Çîn  
Milawina wêş be zarî zerûr

Mewat kon mader we koşî fexfûr

Ce kon hamseran hamser nedînim

Yaran û yawer Çîn û Maçînim

Beyanê bunyan biyawan be dad

Bunyan ce sitey halatê Ferhad

2315 Her çend dadiş kerd ne herdey çol da

Quleng ne kasey kelley kapol da

Ne dad ne êmdad ne kes feryadres

Ne hal zanê hal ne kes feryadres

Kes nebê kero dermaniş ce derd

Birêzuş ne dem qetrey awê serd

**85b**

Be xeyr ce melan mar û mûr û teyr

Beydî meş mekan weşşiyane deyr

Derendey daşan sextî mestanan

Zulmê sitemger ziwane nezanan

*Rêsîdenê Yekî Ez Yaranê Şîrîn we Dîdenê Ferhad weXeber Borden be Şîrîn*

2320 Nebîş destelât xestey zamê xeşer

Menala ce dewr çûn ka kebûter

Nagaw naxeber ce teqdîrê kar

Gerdiş gerdûn we rezay rozigar

Yekî ce yaran Şîrînê dilber

Ama wiyara we ragey guzer

Diya diş Ferhad keften sernigûn

Xeft xêzişen çenî xakê xûn

Bêyar û yawer ew neherdey çol

Xestey xeşernak quleng ne kapol

2325 Bêmal û bêhoş menalo be zar

Dewr dan ne dewriş mel û mûr û mar

*Bezeyiş* ama be halê Ferhad

Kerd be rûş da feşan û feryad

Riwala be ‘ezm be dîdey esrîn

Be dad û bêdad yawa be Şîrîn

Watiş be Şîrîn nenîşî be şad

Xeber nedarî ce halê Ferhad

Halatê Ferhadzedey zamê xeşer

Watiş be Şîrîn tamam seranser

2330 Quleng ne kapoî xûn axêzişen

Çenî xakê xûn xekten xêzişen

86a Serguziştê hal wiyerdey sahan

Yekser wat perêş tamam eħwaşan

Şîrîn şineftiş halatê Ferhad

Dûdî ce kelleş xêza şî we bad

Şî ce halê hoş tiwasa ce tar

Dest werda ce wêş tek da be dîwar

Şeyda bî ce şîn be zarî zerûr

Be taw û te 'cîl teşeb kerd Şapûr

2335 Rîwaşla be nerm Şapûr wîney bad

Şîrîn wat perêş eħwaşê Ferhad

Watiş be Şapûr ey dostê giyanim



To nî agay ھاڭ razê nehanim

Her to nî waqif perdey nehanî

Xaşê gestê min her to mezanî

Bişo bêkeman nezano Perwêz

Behane çeniş bistane Şewdêz

Ta bişîm xerîb şeydaw yad keyim

Şîn û restaxîz fewt Ferhad keyim

2340 We bêkes merden xerîbê şaran

Nazdarê fexfûr dûr kefte yaran

Be sedrê kafûr xesl xusîş deyim

Bisparîm be xak defn kefnîş keyim

Meker mudara şadîm ne baden

Aro restaxîz şînê Ferhaden

Şapûr şineftîş eħwalê Ferhad

Çipey rîşê wêş kendiş ce binyad

Çengiş da ne dil ڤiwala be dew

Be şîn û şîwen yawa be Xusrew

86b

2345 Sucdey sucûd berd ne textê Perwêz

Wastiş pey Şîrîn roxsetê Şewdêz

Watiş be Perwêz dêrim direngen

Şîrîn xemgînen xatiriş tengen

Demax ne dîdey şeydê tîrişen

Ne kolê Şewdêz heway seyrişen

Eger roxset bo zulfan do ne bad

Demê bigêlo be xatir goşad

Şikar kero şad murxê gulawan

Seyrê sersewzan suney serawan

2350 Xusrew şineftiş zanaş çi haşen

Herçê hen ehwâl ce pîrezalen

Me'lûmen kehan koken ne baden

Şîrîn şîweniş perê Ferhaden

Xusrew xiroşa ce fewtê Ferhad

Ce mewtê mergiş xatir kerdiş şad

Ferma şatiran Şewdêz biden pêş

Ta bişo kero dadê dostê wêş

Ciludar Şewdêz mukemmel be zîn

Kêşa be qedem rikabê Şîrîn

2355 Şîrîn çenî çend kenîzanê rend

Muĸkê meĸbûban keĸlaf koy kemend

***Rêsîdenê Şîrîn Ber Ser Ferhad be Pay Bîsitûn Derĸaĸ Nez´***

Ama be te´ cîl xêza bêmidar

Şapûriş hor gêrt Şîrîn bî suwar

Suwar bî şitab ne piştê Şewdêz

Bêperwa ce merg laqeyd ce Perwêz

87a Rikab da be rexş be yek kun fekûn

Yawa be Ferhad ne pay Bîsitûn

Diya dîş Ferhad keften sernigûn

Xeft û xêzişen çenî xak û xûn

2360 Quĸeng ta be su ne kapolê ser

Menaîû be zar çûn ka kebûter

Tejr û mar û mûr deyrî keşakeş

Melan megêlan ne dewrê laşen

Şîrîn dî xestey xarê xeşernak

Xestey zuxê zam bergê beden çak

Nîfrîn da we bext ne textê Perwêz

Wêş sernigûn kerd ne gulê Şewdêz

Rîwala be nerm Şîrînê Ermen

Yawa we balîn Ferhadê koken

2365 Benîş naxûn wêş elbeda kerd

Xalan ne cemîn camîş ciya kerd

Be çengê naxûn yexey wêş dirî

Be eļmasê têz kopê wêş birî

Nîşit ne balîniş şeyday diļ be coş

Ferqê Ferhadîş niya ne axoş

Dem niya ne zux zamê xeşerîş

Horkêşa quleng ce kasey seriş

Teng desmaî şukê şewbîn

Kerdewe ce seqf serkarê serwîn

2370 Çenî nûşdaru Şîrînê Ermen

Best ne cagey zam Ferhadê koken

Dem dem mengera be rengê şewe

Dem binya we zam qulengê şewe

87b Mişya ne rûy zam rence ruşewe

Her dem minya bo we buşewe

Xakê xuşê rûş çenî zamaniş

Mayisa be dem zuxê zamaniş

Rêza rêzey aw eşkê dîdeşûr

Ferhadê fexfûr milawnaş be mûr

2375 Watiş ye tonî Ferhadê miakîn

Nazdarê xaqan fexfûrê Maçîn

Şişdanig şewket şay şehriyaran

Ûerîbê xurbet şehîdê şaran

Bênam û nişan pay Bîsitûnim

We bêkes merdey xelîtanê xûnim

Kê zano eþwaþê kê diþ ne derden

Maçan ne cayê xerîbî merden

Fiday namit bam diþdarê dirîn

Wêt niya ne ray şûm bextê Şîrîn

2380 Şehzadey Çînim bêdadim bêto

Şed giyanê Şîrîn bo be fidat to

Destê Ferhad gêrt maþa nedîdeþ

Dem minya we dem ew ber guzîdeþ

Watiþ ey Ferhad ye çêþit kerd çêþ

Wêt be naþeq kuþt xarê xatîrrêþ

Be herfê efsûn yek pîrezaþê

Serit da we bad yek wey hewaþê

Namirdit keran taqî ker xeber

Ewsa wêt beray be xaray xeter

2385 Mer to nezanay Xusrew be efsûn  
Ha ne qeşdê to kerot sernigûn

88a Ferhad fidatim derdê di lamêz  
Çêşit bî çenî mameley Perwêz

Îse çêş kerûn fikrê to Ferhad  
Ne min ne Xusrew nenîşîm we şad

Taciş nigûn bo bêram Perwêz  
Cergiş pare bo be tîxê xûnrêz

Peyxamiş yekê neyo be duwan  
Nemano ce neşî newey Newşîrwan

2390 Watiş be Ferhad îmanim herden  
Bêdar be ce xaw Şîrîn ne merden

Çem hordar ne xaw biwînûn dîdet  
Rewneq der be reng remeq remîdet

Awerdiş be hoş ce merdey memat

Zênde zêndegî çûn awê heyat

Baîê çem hor daşt dîldarê dîrîn

Dîş seriş niyan we babuş Şîrîn

Diya dîş be çem awat westey wêş

Tekan da ne ca hor rêz û ne pêş

2395 Çend kerd teqala serwe seng sawa

Hêz û quwwet kerd her take tawa

Nebîş haz û hêz xestey xerqê xûn

Naław nirkinaş hem bî xerqê xûn

Girewa be zar zedey xarê zam

Dima giyan wat Şîrîn esselam

88b Watiş ye tonî zêndey serbisaş

Derd bî merigit henî ne heyat

Mîn to dîm be çem zêndey zîbê zîc

Henî mewtê merg merdê min be hîç

2400 Nîm giyan Ferhad Şîrîn fiday lexbet bo



Payendazê pay qedem rencet bo

Şed giyan koken fiday giyanit bo

Ha kerdem fidat eger qebûl bo

Ce giyan Şîrîn hîç ra neberdem

Giyan be fiday giyan Şîrînit kerdem

Ser medam ne xak ne rağey dişber

Min merdenî bîm çi zû çi dêrter

Min ke şineftim namê mergê to

Henî çi lazim rast bo ya diro

2405 Namê mergê to yawa be Ferhad

Labod her êden ser bîdem we bad

Xusrew be efsûn min kerd rencerêş

Ew zano çenî keramatê wêş

Qadir qeşaşan yek yek mistano

Heqê kes we lay kes nime mano

Ha min şîm ce dûn to be selamet

Dînê min û to keft ew qiyamet

Her rojê meşer biyawîm be hem

Dîn dîdeyê yek biwînîm be çem

2410 Belê emanet êdimen we net

Ferzen bo zerûr miwaçûn penet

Ne ragey rencim bidarî we guş

Cefa berdenim ekey feramuş

89a Çend kêşam nerat sewday siyaset

Cewir sezay sext rencê riyazet

Xake sarît bîm ta çendî bisat

Axeriş êd bî ser niyam ne rat

Defnim ker ne xak ne ragey zerûr

Bergê xunînim berd be Şapûr

2415 Cefay cewrê min birare menzûr

Bikya ne halat halîm be fexfûr

Bizano eħwaļ dadeyê diħemîn

Yaran û yawer mam seranê Çîn

Bigrewan zarzar pey newciwanîm

Bî qeṭ'ê mayey rûy zêndeganîm

Her êd wat Ferhad ne axir nefes

Giyaniş pîkya be qirney qefes

Roḥîş ber liwa ce çalê tînîş

Ciwanaw ser kerd ne çalê tînîş

2420 Qabêz be qoḷab nîşîş ne qefes

Keft ne xerxerey nez'ê nîm nefes

Roḥ û rewaniş ber ama ce laş

Bîrya haz û mîz ce dest û ce paş

Baḷê çem hor daşt be dîdey nemîn

Kêşa ahê serd diya be Şîrîn

Çem ra be hem da be dîdey nemnak

Giyaniş teslîm kerd be Yezdanê pak

Leb da be hem da fanî bî Ferhad

Mewatî hergêz ce mader nezad

2425 Şîrîn dest maļa bo cemînê zerd

Dî sextê laliş bî we sengê serd

**89b** Şimşalê baļaş bî be çubê xuşk

Cemînê mahiş ze‘feranî muşk

Zerd û ze‘îf bî gêliya ce reng

Serw û sinober bî be sanê seng

Nehalê baļay şimşal û ‘er‘er

Çûn sewlê saway xesteyê xakber

Şîrîn dîş Ferhad giyaniş teslîm kerd

Be nîşê naxûn wêş elbeda kerd

2430 Fîruzey xalañ xasey dilpesend

Yek yek be mewday nîşê naxûn kend

Hûn gîs birî yeqeş pare kerd

Xalañ we cemîn wêş awere kerd

Şapûr û Şîrîn kenîzan tamam

Dewr dan ne dewran laşey newnemam

Xelţan bîn ce giļ ce pa ta ye ser

Kerden restaxîz be çupî çemer

Şîrîn lawinaş feryad û zarî

Be sûz û endûh zarî û zigarî

2435 Watiş ey Ferhad dinyat xirawen

Serit hur dare çî weqt xawen

Xawêr ne xawî çaxê çînitên

Feşfûr êntizar dîdey dînitên

Bêdar ber bidye we‘dey weharen

Feżay feşil geşt ne murxezaren

Cem biyen yaran yaweranê Çîn

Şatîran perêt merkeb kerden zîn

Ûlaman be tîp midran muntezer

Sipaw serdaran midran beraber

2440 Çewganê çawşan ha be kînewe

Yedek bahiwan ha be zînewe

Nazdaran ce berz baweran be hem

Ûîpê tetêran melûlen ce xem

Şîn û restaxêz xiryo xoşanen

Arizû be dîn dîdey toşanen

Bêdar ber ce xaw fiday xawit bam

Fiday kokenî kuhê kawit bam

Sergerdê saman kes ne dînit bam

Fiday fermayîş şarê Çînit bam

2445 Be nezir çoşay çoşê cengit bam

Fiday qetlê qîn gerray zengit bam

Koken be qurban laşey herdit bam

Fiday bânazî bêkes merdet bam

Nezer nigûnsar xakê xûnit bam

Fiday bêkesî Bîsitûnit bam

Koken noşa bêş badeyê bêhuş

Xamoş bê ne xaw mestê medhuş

Terkê terpoşî tec û textit bam

Fiday 'acizî derdê sextit bam

2450 Fiday xeft û xêz herdey çolît bam

Qulengê qatîl ne kapolît bam

Fikr û fermaniş ne fewtê wêş bê

Fikr û zarîzar zelîlê kêş bê

Fewt û fena bî Ferhadê fexfûr

Bêzar bî ce reng Şîrîn û Şapûr

Dimay şûr û şîn feñan û feryad

Ama ne serkar fermanê Ferhad

90b Mezarê maway xarê xaçîrrêş

Qebriş kend Şapûr be qulengê wêş

2455 Xesiş xuşîş dan be sedrê kafûr

Defn û kefen kerdenFerhadê fexfûr

Xamoş bî ne xaw bêhuş û bêdeng

Peştan bî ne xak ser ne seray seng

Yage lehd gêrit seray qeşrê no

Kêşa be serda lehafê gilko

Ceqey tacê ser ne gilda qerar

Tayîn bî ne text tengê tîretar

Nehan bî ne xem zulumatê bêder

Sakin bî şebûr ta rojê meşser

2460 Bew gişt heşretan dûdê derdewe

Bo niya û boy xakê serdewe

Nexim nehan bî fexfûrê ferhad

Mewatit nebî ce mader nezap

Birutê bahuy bewriş bestewe

Bîsitûn ce zerb qoşemg restewe

Şîrîn bo niya we gilgo şewe

Ser niya we seng şiday no şewe

Hêmmet xahî kerd ce xakê Ferhad

Dûnê henaseş derûn da we bad



2465 Xêza ce gilgoy cefakêşê wêş  
Kerdiş êradey ڤagey qeşrê wêş

*Roxset Dadenê Şîrîn Şapûr we Rahî Şodenê Şapûr be Şarê Çîn*

Bişno ce Şapûr ser ne xoş xak  
Be sûz û endûh bergê sîneçak

91a Pey haîê Ferhad kerdiş hewayŞapûr  
Reżay ruxset wast Şapûr ce Şîrîn

Watiş fidatim ruxestim derîn  
Kerdenim heway purtê şarê Çîn

Er rence Ferhad midarî menzûr  
Ba berûn eħwaî Ferhad be fexûr

2470 Siperden be min bizanû haîş  
Herçê haîş bo berûn eħwaîş

Êlticam êden be seşîê sewa  
Henî newînûn ey zîrê mawa

Mekanî mezar Ferhad bo tê da

Şapûr nemano bikêloş pê da

Henî ey zeyre be min heramen  
Zeynim zulmaten dinyam temamen

Dîniş ne dîdem niyen gewahî  
Reżay ruxşet der ta bibûn rahî

2475 Ba berşûn bilûn be dewan dew  
Henî newînûn dîdarê Xusrew

Çûnke sitem kerd be heqê Ferhad  
Karê kokenîş daxan dawê bad

Eger birupê m daneyê laî dêz  
Şapûr bizaren ce rene Perwêz

Xelţanê xûn bo ce Ferhad betêr  
Pare bo camey cergiş be xencer

Şîrîn şineftîş liwan Şapûr  
Qerca çûn qeqnes bî be kogay Tûr

2480 Wat emcar be sozê zarîm zerûren  
Derde derûnim perê Şapûren

91b Liwan Şapûr beter ce Ferhad  
Karê kokenîş daxan dawê bad

Şîrîn wat Şapûr cagey nazim bît  
Serencamê siq ʔagey razim bît

Ferhad faniyen to meşî we Çîn  
Çûn narê sifte memano Şîrîn

Mendey meynetim emcar çêş kerûn  
Dadê dişey wêm we lay kê berûn

2485 Şîrîn wat Şapûr îne pê meker  
Mazem çenî zam ser mewday xetêr

Memanû zelîl zarî we zelalet  
Kes niyen kero dişim delalet

‘Elacim êden wêm helak kerûn  
Metuqo dişim ne perdey derûn

Şîrîn her çend kerd men‘iş be tûl  
Şapûr ce Şîrîn nekerdiş qebûl  
Watiş fidatim diwaynîmanen

Roze restax ciya bîmanen

2490 Dewran demê bî şî ce kamiman

Felek şiyonaş ser encamiman

Firê ne raget kêşam siyaset

Helel ker nimek ne rayê riyazet

Roxset der penem bişûn bê medar

Henî cey zeyde nedarû qerar

*Reftenê Şapûr be Şarê Çîn ve Xeber Dadenê Ferhad be Fexfûr*

92a Şapûr be şîwen bosa dest û paş

Şîrîn be zarî ruxşet da zicaş

Şapûr be şitab fexan û feryad

Cem kerdiş camey xûnînê Ferhad

2495 Be şîn û şîwen be dad û bêhed

Qolengê qatîl qeşdiş dane qed

Bergê xûnalûy Ferhadê xûnîn

Şapûr şend we şan rû niya we Çîn

Mewat Ferhadim awerd çi nerdiş

Agah bûn ce ھاڭ dewabî derdiş

Negedariş bûn bidarûş menzûr

Ha bergê xûnîn berdim pey fexfûr

Şapûr bey destûr rahî bînerêş

Şîrîn be şîwen şî ne yuz wêş

2500 Ce dûdê Ferhad berşî ce edew

Çend xaş û naxaş watiş beXusrew

Abrûyê xaqan neraştî menzûr

Çêş medey cuwab ferzendê fexfûr

Çend berdiş Şapûr cefay rozigar

Fena day Ferhad Şapûr kerdî tar

Ferhad day we bad Şapûr tûn be tûn

Peymaney dewlet kerdî sernigûn

Ferîrê fermanit nesle fexfûr bê

Dewletit dadey şanê Şapûr bê

2505 Emcar be ھاqî ne dewrê dirîn

Ne wêt memanî ne şûnê Şîrîn

Bê rayî kerdî ne heqê Ferhad

Ne êntiqamiş ser medey web ad

**92b** Şertê Şapûrit da be aw da

Renc û renc berdet da be law da

Farhad şertê şûn wêş awer be ca

Be eqrarê wêş ser giyaniş da

Ha mend bê şertî pey rozigarar

Bednamî to mend pey şehriyaran

2510 Neweyê kiyanan to kerdî we pend

Bî be riswayît ta hezar û end

Napak û namerd herze şîrenî

Her ‘acizê yar zebun gîrenî

Şîrîn çend be şîn bêcay bêedew

Nekerdîş hicab watiş be Xusrew

Xusrew be watiş eramende bî

Zanaş heqişen serefkende bî

2515 Nedaştîş cuwab Şîrîn xereman  
Ce şermendegî serwit we daman

Ce daxê Şapûr cergiş mida çîl  
Şermende Şapûr ce xaqan xecił

Xusrew bey destûr dûdiş şî we bad  
Şîrîn şêt û şîn Şapûr û Ferhad

Şîrîn be şîwenXusrew wist we bêz  
Henî nekerdiş mam demî Perwêz

Xarê xaţir rêş dûdê dił necoş  
Hucrenişîn bî siftey siyapoş

2520 Rêza zarê mûr be diłkiranî  
Penceş dane dił deste ziranî

Herdem henasey dûd miða ne bad  
Demî pey Şapûr demî pey Ferhad

93a *Şîwen Kerdenê Fexfûr Ez Berayê Ferhad*

Bişno ce Şapûr şeyday şûr û şîn  
Yawa bew mekan daxilê bî ne Çîn

Be şîn û şîwen be zarî zerûr  
Sucdey sucûd berd ne textê fexfûr

Bergê xûnalûy Ferhadê xûnîn  
Niyaş ne pay text xaqanê Maçîn

2525 Hewa da quleng be dadê bêdad

Watiş seranser eħwaîê Ferhad

Êqrarê Xusrew sengê taşanseng

Watey Pîrezaî qediş bew quleng

Fexfûr şineftiş eħwaîê Ferhad

Çipey rêşê wêş kendiş ce binyad

Yeşey wêş dirî ser ta we daman

Rîşîş da ne bad ama bêaman

Daş we kapoî da be cengê naxûn

Ce textê zerkar wêş kerd sernigûn

2530 Camey xûnalûy pîçaş ne bawîş



Xûniş melêsa bo mîna we boş

Elweday elwan tel û taciş kend

Wêş wist ne rûy berg xûnînê ferzend

Bişno ce nagah xêza rûy meşer

Ehwaîê Ferhad yawa be mader

Xêza nîşt ne xak xîre sewadî

Zîrey zirîkeş berşî ce wadî

Bejnê bergê wêş hor kend be naxûn

Camê cemin kerd xelîtan çenî xûn

**93b**

2535 Berşî ce herem ser ta pa ‘uryan

Waweylay bêdad be dad û giryan

Rojê restaxîz meşer gêrtiş dem

Xiroş û xewxa xêza ce herem

Banû kenîzan be zarî kerdên

Ber şîn ne pêwar dewar ne gerdên

Zilziley zulmat keft ne şarê Çîn

Xiroşa xiroş zelalet be şîn

Begler baniwan xace xuleman

Meħalê memlûk ser ta we daman

2540 Cembîn cemaray feħan û feryad  
Ne dewranê berg xûnîşê Ferhad

Zayleyê zarî ce êns û perî

Dan ne suz saz çûpey çemerî

Kelaw zerînan taqî tela tewq

Mulê mehbûban cemîn şewqê şewq

Perî peykeran perîzadey Çîn

Qed qed qed kerden zulfanê çîn çîn

Nazdaran be naz zulfan eşed bo

Koko ko kerden keywanê koko

2545 Nezaket nedewr camey herîrpoş

Dewar ne gerden xak û gil ne doş

Serdar ser ne gil sipa ne xiroş

Fexfûr ne feryad daye di! be coş

Zarî zelalet kotel kerden pey

Waweylay ruo key kiyan key

Çend şewane roj xewxay bêxiroş

Ce Çîn ta Maçîn bî we siyapoş

94a Poşan xelayiq êns û perîzad

Sipay sewadpoş ce daxê Ferhad

2550 Xaqanê Ferhad be xewxay xiroş

Bergê xûnalûy Ferhad wist we doş

Ferhadiş be mûr zarî lawina

Bergê serzemîn gerdûn tawina

Mewat ey bêdad ferzendim ce ko

Ferhadê xerîb hunermendim ro

Neqqaşê neqşbend sengê tiraşim ro

Kapo! we quleng şed piraşim ro

Bejnê beden çak nîşê xarim ro

Xerîbê xurbet şar be şarim ro

2555 Bêneway bêkes xerqê xûnim ro

Xestey xakê xûn Bîsitûnim ʀo

Şehbazê şeşdang şûrê şeştîm ʀo

Sahîbê zur ʒat ziberdestîm ʀo

Ferzend be qurban Bîsitûnîb bam

Żelîlê zaman xarê xûnîb bam

Nezdê sengtaşî ne kaw kot bam

Bî sûdî sewday to rencerot bam

Ser kerd saman kes nedînîb bam

Fidayê şînê şewq bê Şîrînîb bam

2560 Fiday namîb bam ferzendê dişber  
Ha dîdarê man keft we ʀûy meşşer

Feşfûr pey Ferhad kerdiş restaxêz

Nefrîn da be tac be textê Perwêz

Beter ce Ferhad nexîm nigûn bo

Peştan bo ne xak xelţanê xûn bo

94b Neqşê neşradîş nigûn bo ne taş  
Cergiş pare bo be tîxê elmas  
Şîrîn bo pare hem be tîşey têz

Kaw Bîsitûn bo be rêze rêz

2565 Hiç kam be şadî nenîşan be şad  
Neyawan be kam ce dimay Ferhad

Nabîna ce çem xarê xemîre  
Çemya çûn çewgan çeftê çemîre

Mend be xatîrxar be diğiranî  
Penceş da ne diğ deste ziranî

Daye diğiran qırça çûn qeqnes  
Keft ne xîrxirey nezxê nîmnefes

Derdem ce hêcran dêqîş kerd ce dad  
Giyanîş teslîm kerd ce daxê Ferhad

2570 Destanê îşan bada bimano  
Gûş der hikayet Şîrîn û Şîro

*‘Aşiq Şodenê Şîro be Şîrîn*

Biwîne dewran çerxê çepî gerd  
Gerdişit gerdan taşê taley nerd

Neçradê nerdbaz nerdiş da sitêz

Yek dûşîş awerd ne bextê Perwê

Xûnê xênîman awerdiş xireş

Coşa xiroşa xûnê Siyaveş

Perî êntiqam qeşaşê Ferhad

Mebo Xusrew yiç ser bido we bad

2575 Qeşaş ce qedîm nekê roj aro

Lazim heq be dest heqdar misparo

95a Şêruy şerengîz bulûxiş nasa

Xeşm û xiroş kerd taliş tewasa

Ziştê zinakar bedîş birûz da

Çiraxê çarey bextiş firûza

Xêzebê xiroş ce çîn çareş

Tayîn bî ne text siya sitareş

Birwet bed reng be dîş birûz kerd

Qeşdê qetlê qîn xişmiş firû berd

2580 Awerdiş be rat remlê remağan

Se'yê ustîrlab nucûmê saġan

Be dîş bî destûr Şêruy zinakar

Megêġa be tond wîneyê jarmar

Ga ne sanê şef ga mebî suwar

Ga ne şûrê şer demê ne şîkar

Royê ce teqdîr çerxê çepî waz

Efsûnê gerdûn mekir hîlesaz

Serkêşa be seyr ne hucrey herem

Şêru ne şefay xizaney direm

2585 Kerdiş temaşay baniwan tamam

Newçe kenîzan baġa new nemam

Ta be dîlberan dîldarê derdîn

Ta yawa Şêru be şewqê Şîrîn

Tîrî ce mojan mojey muşkilmest

Qewsê qezeġdar qajegirt be dest

Xedengê ce kîn kemanê ebru

Pîra ta peş nîşt ne cergê Şêru

Pêkya be tîr peykanê dilber  
Xarê xeternak cew laş kerd gozer

**95b**

2590 Şêru şehîd bî be tîrê karî  
Berşî ce herem ce bêqerarî

Ga seyrê sehra ga meşî we ko  
Ga wêlê weylan rû mekerd ne ko

Ga xamoş ne xak demê ne şîkar  
Be hîç reng nebî dîlîş berqerar

Cemîniş ce dûd derdê dîlgiran  
Ze'îf bî wîney zerdî ze'feran

Bêxurd û bêxab reng ce hêcran zerd  
Mekêşa ne dîl henasanê serd

2595 Merdoman Şêru midîn be matem  
Bî be wat keft wat wat merdom

Miryan be Şêru zayifê zerden  
Deyrî dîlazar derdînê derdan  
Menkeran melûl xatîriş rîşen



Kes nimezanaş derdiş ce çêşen

Şêru şêtê şewq xarê xeşernak

Bêxord û bêxab bêhoş û helak

Xusrew melawna mepersaş xeber

Mewat ce derdim nedaran xeber

2600 Mawerdiş hekîm derdiş berocar

Nebî nişane eşliş ce aşar

Şêruy şûmê şer mergiş ce wêşen

Her wêş mezana derdê wêş çêşen

Axir dûdê diî mecaliş birrî

Zuxaw zamet perdeypoş dirrî

Birriya taqetiş tab û tewana

Cestey cemaîş çi rengê nimana

96a Dirrî derdê diî ce perdeyê derûn

Berşî ne bîrûn ne roy enderûn

2605 Emcar ce nacar zamdarê dirîn

Nebî ‘elaciş ce derdê Şîrîn

Çûn Qeysê Mecnûn be roz û be şew

Wêl bî ne pay qeşr telarê Xusrew

Şewaw be şîwen ya dost mewanaş

Bêxawî ce taf awan sitanaş

Bayeqoş berşî ce şîne zarîş

Bulbul bêzar bî ce bêqerarîş

Perwanan ce boy perdaxîş bêza

Qeqnes ce qerçey sifteş gorêza

2610 Hudhud hewa best ce şew nalîş

Coxdan tewasan şew balînîş

‘Endelîb ce deng dadiş tewasa

Qumrî ce qûqûy nalîş herasa

Îns û cin û dêw mel û mûr û mar

Bêzar bîn ce dûş tariyan be tar

Murxê memaniş ce qerney qefes

Keft ne helaket nerxê nîmnefes

Her çend kerd nebî 'elaciş ce derd

Tewasa ce xewf henasanê serd

2615 Şêruy şermesar şûmê xatir rêş

Sefilmend ce xar sewday bextê wêş

Ama şî we behr xane xiyalan

Çûn kerûn çenî ser feşê sağan

Ser berd ne derûn fikriş berdewe

Qapî xiyalan weswas kerdewe

96b Şeytaniş ne cerg diley pir qelaş

Bî be ham kelam be cagey şelaş

Fehşê meşwerit Şêru dane bed

Şêwna tebdîr ce ra kerdiş red

2620 Terzê xaran berdiş be gerdûn

Ne roy sanê seng kerdiş sernigûn

Her çend kerdiş fikr nebî deway derd

Rengê zerd zayıf zarê zamê zerd

Be hîç reng nebî ragey ruşin roş

Ûeyr ce qeşr qetl qeşasê bawoş

Niyen ‘elaciş şûmê şerengîz

Qeşdiş da qerar ne qetlê Perwêz

***Teleb Kerdenê Şêru Kîşkçıyan***

Şêruy bêedew bena kerd be şew

Saw xencer da pey qetlê Xusrew

2625 Awerd be xatir fenadê baboş

Saw xencer da pey Şîrîn baboş

Hîç xaşter niyen cey kare kerden

Babom xaşteren ya wêm be merden

Xusrew xeştan kem be nîşê xenxer

Biyawun be kam Şîrînê dilber

Heqqeş bipêkûn be textiş tayin

Taciş we ser dem bî xewf û xayin

Şîrînê şahîş herdûk wêm be rûn

Sanê silsiley sipaş wêm be rûn

2630 Hanî çi sebeb xemxorakem bo

Çûn çoıdanê tûn tak û tenyam bo

97a Xêza kemer best be qetlêXusrew  
Kemîn da perêş be roz û be şew

Rojan sanê şef ne dîwaniş bî

Şewan gezmeçî pasewaniş bî

Çend şew kemîn berd ne qeşrê hesar

Kîşkçî peneş mebîn xeberdar

Her çend be parêz meşî be endêş

Nobedar be şew fîrset neda pêş

2635 Çend şew ce şewan parêz meberdiş

Nobeçî dewa neda be derdiş

Meşî ne pêwar ziştê zinakar

Ce şermendiğî megirêza be tar

Ne qeşdê baboş şewan ta şeher

Ne Şîrîn xiyal neXusrew xeber

Nezanan keştî şikesteşanen

Ejdêhaw neheng ne qeşdê şanen

Yek ro fikriş kerd ebley xiyalxam

Gezmey kêşikçi teleb kerd tamam

2640 Aman serhengan nobedarê şew

Gezemew serkêşk nobedarê xew

Ser nesay xeļwet seywan berdişan

Yek yek be Şêru sucde berdişan

Şela dan be dîn Şêruy sitemger

Dest bestey edeb midra beraber

Midran be xidmet xaşey xulaman

Westen be werda seranê merdan

Ce sehmê Şêru melerzan be taw

Terzê terkey tuļ ce taxanê aw

**97b**

2645 Şêru wat yaran mizandê çêşen

Waçûn watê wêm xatirim rêşen

Şerhê haļê wêm mawaçûb peytan

Sewgendim êden we bextê wêtan

Kerîn meşlehet ne karê wêman

Beleş ber neşo ba ne diêman

Herkes gîtarê lêş haşîl mebo

Eşlen ce destim xîlaş nimebo

Êlticam êden rohim şî ce ten

Dexîlim pêtan derdim dewa ken

2650 Biwêrê rengim zahêren lêtan

Na' ilacimen miwaçû pêtan

Wer ne dûdê diê êr karî nebo

Karî bey wîne key carî mebo

Er derdî ce diê nebo kariger

Kê kero qeşid zina be mader

Beleş min zaman cergim medu çîl

Pîkyay peykan şîrînim ne diê

Diê benden ne dam Şîrînê diêber

Zedey êşê nîş be mewday xeter

2655 Xedengê mujgan mestê şewengiş  
Pêkan ne cergim xarê xedengiş

Kemanê ebruş ne dilê karger  
Nîşîş nîş medu çûn nîşî neşter

Her çend ne derûn xiyalim kerden  
Ne darûn 'elac be xeyrê ce merden

Poşî pê m kerden be merden şadim  
Mer merden bero namiş ce yadim

98a Wer ne sezakêş siyaset barim  
Kuterey zoxal abe suy narim

2660 Wer ne be hîç reng nimebom dewa  
'Elacim niyen ce ane sewa

Ar ane nebo derdim niyen çar  
Laboden wizûn heqê wêm berdar

Waçûn rastê wêm şeyday ro ce şew  
Kerdenim bena be qetlêXusrew

Bişûn pare kem cergiş be xencer



Biyawun be kam Şîrînê dişber

Ta îr be şew amanim çend bar

Gezmeçî wenem biyen xeberdar

2665 Nobey nobedar hazir baş şew

Nasten biyawun be halê Xusrew

Biyawun be yuz ya taxê Perwêz

Cerğış hor dirûn be elmasê têz

Taciş nigûn kem textiş beşo bad

Ce şewqê Şîrîn xatir kerûn şad

Xiyalê bey tewr ne diş berdenim

Cew bone yaran teşeb kerdenim

Êlticam êden firşet biden pêş

Biyawun be kam dişaramê wêş

2670 Xusrew be xencer ciger pare kem

Ne textê şahîş baz aware kem

Tac û tûmariş kerûn sernigûn

Xeļtan keru berg ser ta paş be xûn

Ewsa cew dîma sewgend bew senem

Bitxaney Fering bimano we nem

98b Şerţ Şêru bo bêfîkr û xiyal

Nebo lazim zerr û genc û maļ

Ne text û ne genc dînar û direm

Ne daney gewher ne gencê herem

2675 Temamî tamam bide rûn pêtan

Mebxişûn her yek be qedrê wêtan

Kerûtan ne genc şahibê nan û xan

Serdarê sulţan şahibê sipa û san

Xezêney Xusrew lêtan beş kerû

Hemîn diļ ce şewq Şîrîn weş kerû

Dînê diļberim be min kafiye

Zuxa û zaman diļ pey şafiye

Razîm min be kesb geda we derwêşî

Be ŧerę ce ŧîrîn bibum diġxuŧî

2680 Watiŧ be yaran gezmeęî tamam  
Ha watim pêtan baęî wesselam

*Cevab Dadenê Kîŧkçıyan be ŧêru ra*

Yaran ŧineften watey xezebnak

Yeksan be yekbar keften ne ruş xak

Watim fidatim quęê qurbanîm

Ne fermanê to bende fermanîm

Êxtiyar be ton her çê ŧelaten

Ser û maġan nexakê patan

Ferman berdarîm her çê rezaz bo

Kes nişen qadir ne fermanê to

2685 Belî sefilîm ne sewday sitem  
Nimeş çûn kerîm be girdabê xem

99a Xusrew êtibar be ême kerden  
Ser û sîretiş pêman siperden

Daratê dewġet wêŧ be amanet

Çûn mebo kerîm xaşan xiyânet

Nokerîm nê' met naniş menoşîm

Be şefay saşan bergiş mepoşîm

Segî sipleyî be asitanî

Basibanişen rojê be nanî

2690 Ême sipleyîm ce seg kemterîm

Destê heramî be hezim berîm

Çûn be nîm benay karê bednamî

Binuşîm nimek şa be heramî

Naniş binuşîm sifreş pare keym

Nemekdanê xan ew awere keym

Nobeçî waten ême çêş kerîm

Çûn fitwa be qet! Key Xusrew derîm

Waten fidatim fikr û xiya! ker

Buxzê şeytanî ce di! beta! ker

2695 Di! bawer be hoş mer Şêru şêten

Bêgane niyen ye babê wêten

Ferzendê adem key wey cey werter

Qeşr perer kerd zina be mader

Ye xiyal niyen fikrî henî ker

Weswasê şeytan ne diî betaî ker

‘Eqî û qamet bo meker xiyalan

Silsiley babot meder be taîan

Dimay Key Xusrew şay kemerlaîan

Mebî we pendî pey watey saîan

99b

2700 Mebo ême gişt qetîê ‘am kerî

Ewse dest nepey î sewda berî

Ha kerdîm şikat herîxman tamam

Êxtiyar be ton baqî weselam

Cew dima henî şela be kêten

To ferzendê ew ew babê wêten

Şêru şineftîş qetran wîney qîr

Tindya çûntewf zewqê zemherîr

Zehr awerd be niş çûn marê kejdom

Qewsê zimistan be wîney zoqim

2705 Teļx û tond û torş gêliya ce reng  
Nîşîş nîşt ne cerg çûn xaray xedeng

Watiş ey yaran bêray bêmirwet  
Zarê zebûn bî bêcay bêfirset

Sebeb ce êden niyentan tawan  
Neşey nîşê derd pêtan neyawan

Ce qedîm biyen nek roj û aro  
Kes ce derdê kes xeber nedaro

Kê haļ zanê haļ kê fikrê kêşen  
Herkes xeberdar be derdê wêşen

2710 Yaranê bêhuş seng waro lêtan  
Ne min derdê wêm watim perêtan

Minîç mezanûn ye diļ dîşîmen  
Na' elacenan ne ce weşîmen

Derdîm karyen ce perdey derûn

Nûkê sernîşim yawan be derûn

Niyen deway reng ze'îf zerdim

Mer mirûn kerû 'elacê derdim

Min watim belkem derdim dewa ken

Ya çenîm hîley hacet rewa ken

2715 Rastiş her êden miwaçûn pêtan

Rageyê rastî niyam ne rêtan

Ewel be reza miwaçûn pêtan

Dûm medo genc zîb û zeř pêtan

100a Er dan firşetim derdim berûn çar

Her ta zênde bûn ne roy rozigar

Eger nekerîn dewa be derdim

Xusrewê xûnşerq Şîrînê hemdem

Sewgend bew şenem bitxananê pak

Giştîntan be têx mekerûn helak

2720 Ane rastişen watim perêtan

Wêtan bizanin be ھاڵê wêtan

Şerţê Şêru bo karê bisazû

Yekê ce yaran be zênde nazû

Welhasîl watim min êden rezam

Fikrê wêtan ken baqî weselam

Yaran ce şurşit Şêruy naşberz

Çûn bîd awan lerziyan ce lerz

Ce watey Şêru serefkende bîn

Ce sewday gerdûn eramende bîn

2725 Sewday siyaset keft ne dişêtan

Kerden meşweret be rotbey wêşan

Tersan ce Şêru ten be qeza dan

Be qet! Xusrew hoşnê reza dan

Lerzan ce heybet Şêruy şermesar

Nimek dan be aw dîn dan be dînar

100b Waten be Şêru qeşdê qezayîm



Ce fermanê to ême rezayîm

Ême gezmeçî pasebane nîm

Bende pare berg loqme nane nîm

2730 Ême her do‘a be xaşimanen

Çenî daweran her pasebanen

Ême ce karey kemer lajenîm

Herkes xer bo ême palanîm

Her ta Xusrewen be ew newkerîm

Er to bît be şah ême çakirîm

Çi lazim êman siyaset berîn

Be babot kerden her çê wêt kerîn

Her çê bo be wêt kerdenit sitem

Xusrew babuy ton be ême çi xem

2735 Yaran cifey maļ kerdenê xiyal

Reza dan fitway fewtê kemer laļ

Watin be Şêru farix ber ce xem

Bişno ce ême xatir biker cem

Weqtê firisten karit serencam

Biyawî be kam baqî weselam

Belê be şertê be cilûsê coş

Ême ce êqrar nekey feramoş

Şêru ce şadî new ber guzîdeş

Herdu dest niya we banê dîdeş

2740 Keft ne tedarek be ruz û be şew

Ta yawa firset be qetlê Xusrew

Şewê şamê şûm ama be dîdar

Xurşîd şî ne pişt perdaxê pêwar

101a Munewer mufred rêzaş bal û per

Hor pêçaş perdey badê banê zer

Beyîzayê dar sîmaş bî zebûn

Neman bî ne nexm qehrê nîligûn

Tayîn bî ne tar xurşîdê xuşreng

Xêza xiroş kerd sipay siya reng

2745 Sipay sewdayî ser da ne baļa

Rengê rûşenî ruzîş rewala

Qeļa xîş ne rûy kafûrî kaļa

Şefaf mendey nûr Xurşîdiş maļa

Ťîpê Ťenteney tarî bî teyar

Hor da badeban zengî ce dewar

Bosa serbesat perdey rengê reş

Saman da be san sipaş ce hebeş

Daney Ťeblê kewş coşa ce her ceng

Zîbaş firû berd zengî çûn neheng

2750 Da ne debdebey dimulê deycûr

Xiroşa zengî pîrya neqşê nûr

Xêza xiroşa kerd tarî tem engîz

Qendîlê qudret kieya serawîz

Siya sipahiş meqam da be qer

Kerdewe qapî xaney xeyrê şer

Ťeleb kerd xired firiştanê ferş

Ferşê moxîlan qeşay qeşrê 'erş

Cembîn cemaray monşiyânê feşş

Katibanê keyl defter kerden pexş

2755 Tefşîl dan ferman fitway merg û fewt

Sewa kerden sist zanîdeş ce mewt

**101b** Ciya kerd cemi' cayizey memat

Ziyad kerden remz zayendey heyat

Wanan ferdê fewt şima rendey şew

Girdiş serencam yawa be Xusrew

Diyan ne xiroş dîn muşqê menden

Hisawiş ne ferd heyat nemenden

Zadê zêndigîş niyen be lawe

Payedar niyen payîş we pawe

2760 Monşiyânê mewt menden be xiciş

Kêşan pey Perwêz ahê serd ne diş

Dîn ferdê fewtiş ne baren taqî

Keylê hesawiş nemenden baqî

Belgiş ne direct zatifê zerden

Rohiş alûdey adabê derden

Qetrey qetranî abê eceļnoş

Ne rûy belgê diļ Xusrew meda coş

Zanaş ahr emşew xarşê xerîken

Şinaney nizam nez'îş nezdîken

2765 Derdem aşifan mostewfi memat

Munşê fehşê mewt weyşûmey wefat

Firiştanê ferş ce fewtiş faman

Kêşan cayizey namiş ce naman

Niwîsan namey nez'îş be qabêz

Siperden be dest qibûzê qabêz

'Emrê zêndigîş zadiş kerdên kem

Rizqê rezaqîş qet bî ce qeļem

Kota bî ce keyl şimarey nefes

Murxiş melûl bî ce qerney qefes

102a

2770 Qabêz sendiŝ qebz qeṭ'ê hesawiŝ  
Saw da be çengal çengê qulawiŝ

Melekê mewt merg badeŝ girt we çeng  
Saqî dewrê dîn meclês da be reng<sup>237</sup>

Midra ne kemîn camiŝ do ne dem  
Binuŝo mezey neŝey nîŝê xem

Xakê ademxar çûn ejder ne xem  
Xiroŝa Xusrew bikêŝu be dem

Sipay sengê giĭ ne cext zұлmat  
Berdiŝ ne řagey reftê kes nehat

2775 Diŝney taze saw qeŝaŝê Ferhad  
Her dem mekêŝaŝ ziwaney ziyad

Midra muntezêr mewday kînedar  
Xenîmê xûnrêz jar alûdey jar  
Çûn qezay xunîn xenîmiŝ biŝew

---

<sup>237</sup> Derkenar:

Ecel camê merg badeŝ gêrt we çeng  
Saqî dewrê dîn meclês da be reng

Bistano qeşaş Ferhad ce Xusrew

Şeytan şî ne pust Şêruy şermşar

Ce xawê xeflet kerdiş xeberdar

Cehdê celd xêza awerdiş we coş

Pey xûnê Xusrew xeşmiş da xiroş

2780 Meşweretiş kerd ne binyadê bed

Şêruşê şêwna ne ra kerdiş red

Huşiş berd ce ser 'eql û famiş send

Bednam kerdiş nam ta hezar û end

Şeytanê şêwna Şêruy bêedew

Sa kerd silsiley samanê Xusrew

Qabêz ne qefes kemîn da be qest

Ecel da cewlan camê çeyar best

102b Yek şew mukemmel muntezêr be kîn

Ne qeşrê Xusrew midra be kemîn

2785 Şeytan şêwinaş ne xaney xiyal

Binaş kerd ne qeşd qetlê kemer la!

Reza da be wêş raşkiş gêrt ne wer

Bêzar bî ce wêş ce bab û pider

Şêru şêt mebî ce şewqê Şîrîn

Qeşdê Xusrew kerd be eşkê esrîn

Wêş be wêş mewat ey şûmê bedbext

Kerdewey girdab sewdayê sengsext

Henî ce nîştên çêşit xiyalen

Dinyat diłazar şadît beçalên

2790 Horêze ey şûm fikrê karit ker

Diłit dewa ker be mewday xeter

Şêru şêwina samanat ce ser

Bêberît keran ce bab û pider

Mebo bûm we pend watey xaş û ‘am

Razê riswayîm bimana ce yam

Hey dad hey bêdad siyay bextê men

Bergeştey sefil rojê sextê men



Ṭasê ṭaley şûm şermesarê men  
Rûsiyay rengzerd rozigarê men

2795 Derwêşê dilrêş dûdê derdê men  
Naşefay neṛrad neqşê nerdê men

Ha şareyê şûm Şêru kerd we pend  
Riswâ bîm ne yam ta hezar û end  
Şêru bey destûr çend şîn û zarî  
Kerdiş restaxêz ragey dişwarî

103a Pey bext bergeşt siyay rence roş  
Ce rûsiyayî qeşaşê baboş

Dimay şûrê şîn Şêru şêwinaş  
Bey qezayê qedr fendê firîwnaş

2800 Xêza xetakar firuşa be qeşd  
Ne qetlê Xusrew gardê kemerbest

Poşa eslehey esbabê ayîn  
Kerdiş tedarik be taw û tayîn

Be xurd û xeftan cewşen kerd ne wer

Poşa we bala ce paw ta we ser

Qedar da ne qed deşney têxê têz

Sa û mûkeş da ne qetlê Perwêz

Rewan bî rahî coşa bewrê bed

Çar çakê cewşen zerîş da ne qed

2805 Pêka ne kemer damaniş be dew

Ûiwała be nerm pey qetlê Xusrew

Xatir cem ce xewf nobedarê şew

Gezmeçî xamoş kîşikçî ne xew

Şiday hazir ne dîş ce werda

Lehafê xamoş kêşan be serda

Yaran ne qeşdiş sermest û medhoş

Xusrew bêxeber ne xa û xamoş

Fiwareş şiyen ne mewcê gerdûn

Serender nişan biyen sernigûn

2810 Paymaniş keylen hesawiş tamam

Nezî ne fesiş yawan be encam

Xusrew bê xeber ce damê dîrîn

Xeften bêxiya! ne bejnê Şîrîn

**103b** Şî be şîtaban Şêruy şermesar

Yawa ne pay qeşr dîwarê telar

Be taw û te' cîl birwit berdewe

Helqey tenafiş ce qed kerdewe

Şanaş bew şîtab kemendê piş kîn

Çengê qolabiş da ne rûzemîn

2815 Tenafê tawdar bend kerd ne dîwar

Daxîl bî we ser çûn murxê baldar

Çengiş da ne tay tenafê dînber

Çûn murxê têjba! nişt ne rûy kemer

Dest pêça be tay xeyatey xaman

Ce seqfê dîwar ama we daman

Xêza û xiroşa riwala be dew

Pa niya be qeşd telarê Xusrew

Kêşa ne cedwel ayîney bêgerd

Terrey telatar şîşe lacewerd

2820 Ne textê tekyey neqşê muneqqeş

‘Erûsî şûret zerkarê zerkeş

Ser da ne seywan seraperdey şa

Gêla ne yatax yageş ca be ca

Laş nekerdewe be dîma û direm

Xusrew peyda kerd hucrey herem

Diya banuwan her yek be layê

Bêhoşê baden her yek be cayê

Xace serayan ne xaw û xamoş

Banû kenîzan sermestê bêhoş

2825 Ne xaw û xamoş bêxeber ce kar

Ce damê doLAB fitney rozigar

104a Dîş Xusrew çenî Şîrîn be diLwaz

Xeftan ne xeftan peş quy tukê qaz

Peştanen be hem be lence lare

Medruşan ce terz mah û sitare

Ne toy bergê bejn camey ‘enberîn

Bêşek mewatin Zuhrew Muşterîn

Dest ne zîrê ser dem ce naw dem

Şuley şewqîşan çûn şefafê şem

2830 Zulfanê çîn çîn pexş û perêşan

Çûn kogay kelaf da ne dişişan

Alûdey 'areq ce 'eṭr û 'ebîr

Xelṭanê xaran cewala ce ḥerîr

Mutekay mesned mexel karê cam

Leḥafê lêlnerm xeyatanê xam

Dîbayê reng zer gu guşiwaran

Medruşan ce terz somayê sitaran

Zêrîfî zulfan pexşê mawey xal

Fezay firuzeş ce negînê lal

2835 Kemendê Keywan zulfan eşed bo

Çûn kogay Ketûn ko biyen we ko

Lêfê lîmiwan şewqê şemameş

Beyan bo meda ne dewrê cameş

Çûn qubbey qendîl qendê qenatî

Mida neşey neşim nuqrey fetatî

Cemînê cemaray camê Cemawer

Çûn mahê mehtab xurşîdê xawer

Beden çûn bilûr bała nimay cam

Saqê suraîş mînay meymeqam

**104b**

2840 Çend şem'ê fanûs meş'ele be ayîn

Çend suzan be ser çendê ce payîn

Diya dîş Şîrîn hemrazê Xusrew

Bêxiya! û xem xamoşen ne xew

Şêruy şûm diya ne rûy kemerla!

Adab û edeb awerd ne xiya!

Diya be dîdey dînê baboşda

Şerm û hicabiş awerd ne rûşda

Ce şermê baboş beta! bî ce kîn

Abê 'arefiş ser kerd ne cemîn

2845 Satê cew sewda fikr û xiyal kerd

Kîn û kîneş ne diî betaî kerd

Ser berd ne hucrey derûnê 'aqil

Buxzê merdeniş ber liwa ce diî

Dîdeş dêwiya esriş da xiroş

Bezeyîş ama be halê baboş

Watiş ey 'aqil her Şêru şêten

Bêgane niyen ye yab wêten

Birêz û destit herzey bêkemaî

Çenî dest şanûn ne rûy kemerlaî

2850 Babo toş be naz nê' met lawinan

Toş be bolûxet şahî yawinan

Xusrew babeten Şîrîn be mader

Perwerişt kerd be şehdê şeker

Çend sizay sitem çenî to berden

Sa to ne cagey kê kiyan kerdn

Ebley bêxîret di! mawer be coş

Bogzer ce xeça ce xûnê la!poş

**105a** Ber ker ce xaçir xamê xiyalan

Text û bextê wêt meder be ta!an

2855 Dimay Key Xusrew şay kemerla!an

To mebî we pend pey watey sa!an

Îne ra niyen ce ra meber red

Beta! kerd benat ce binyadê bed

Dimay Key Xusrew be heway xiyal

Silsiley şahî to mebo be!al

Er kerî be qeşd qet!ê kemerla!

Bednamîş mebo ta be qer û sa!

Meder be aw da text û bextê wêt

Binyadit beden bed meyo we rêt

2860 Xusrew meker qeşd wêt meker we pend



Ser janen perêt ta hezar û end

Şikatê şeytan terkê xiyal ker

‘Eduy ‘edawet ne di! be!al ker

Şêru be!al bî ce qetlê Xusrew

Diya be Şîrîn şew çiraxê şew

Nigaş kerd ce şewq şexafê Şîrîn

Ew xubî dîn bî hem berşî ce dîn

Şeytan yawinaş wêş be derûniş

Weswas berd ne di! be enderûniş

2865 Per kerd ce cergiş bedter ce sa!an

Ce kînê kînet xarê xiyalaan

Destiş ne gerdab gêçê pejaran

Pêkiya be tîr sernîşê xaran

Dubare be tîr mujganê di!ber

Pêkaniş ne di! kirya karger

105b Xestey xeṭernak ce ewwel beter

Karî bî derdiş ce xaray xeṭer

Dêwiya dûdî derûniş ce derd

Kêşa ne diî da henasanê serd

2870 Betaî kerd benaş ce peşîmanî

Hem şî ne camey namoselmanî

Watiş ey xafîl dadê firşeten

Çi hacet be reng rezay roxeten

Mawer ce xaṭir ce peşîmanî

Mewyeru firşet xeciî memanî

Fikrê derdit ker cergit be tîren

Emcaren emcar firşet begîren

Çend wexten derûn be çîl mesawî

Be çend siyaset be firşet yawî

2875 Ber ker ce xaṭî xiyaḷanê xam

Mekru fermanit bawer be encam

Çi haşl ye wext wadey wiyerden  
Şeher hem Şêru dferdiş ew derden

Meşo mewyeru firset ce destit  
Şîrîn maweru şûmî şikestit

Biyawî be kam ce dînê dilber  
Nimeyut be kar pejarey pider

Bab û berader be karê wêşen  
Kê haļ zanê haļ kê fikrê kêşen

2880 Bey şewqê Şîrîn şûrê şînimen  
Şîrîn ne cagey dinya û dînimen

Henî nîmê be qeyd pejarey pider  
Derûnim xaren ce xaray xeter

106a Fikrê bañlit ber ker ce xiyaļ  
Bisaze be kîn karê kemerlaļ

*Zedenê Şêru we Çend Xencer be Pêderê Xod*

Ye watiş Şêruy bêray bêendîş  
Xiroşa be kîn pa niya we piş

Coşiya be xeşm siya sitare  
Qeşran bî ce qîn çîn da be çare

2885 Gêla ve şed reng tindiya be tar  
Xûnî xezebnak wîney jarê mar

Leb da ne dendan pa niya ne wer  
Dest da dişney têt kêşa ne kemer

Ce qînê qatîl xenîmê xûnrêz  
Ama bêaman pey qeşdê Perwêz

Yawa be Xusrew midra bêendêş  
Pay çep winara rast awerd we pêş

Penceş ca be têt taze sawê têt  
Bazûş buşend kerd ne cergê Perwêz

2890 Mewdayê mûşkaw berqê bêaman  
Qebzey qeza qeşd awerd ne daman

Ce birqey birut berq berd ne dem  
Birûskey beran çûn şefafê şem

Ce sehmê semay sernigûn xûnrêz

Sema lerziya zemîn da sitêz

Quwwet da be qeşd bêray bêedew

Bew zeberdê zer pêka be Xusrew

Pêka ne cergiş ser sawê tazeş

Mêhriş ber liwa ce mêhrê mazeş

2895 Guştiş nîşt ne şûn bendê diî birî

Lehaf şikawa doşek hor dirî

106b Tekan daye taw ce cergiş berşî

Nimanaş birqey berqê ateşî

Sê zerbê karî yek ce yek beter

Yek yek ne cergiş kirya kariger

Žerbe zur žeb ser pa çi xencer

Pêkaş be Xusrew be mewday xeşer

Xusrew ce heybet dişney taze saw

Harê herasan horêza ce xaw

2900 Şêruy şerengîz dîş Xusrew be taw

Zêndey besaten horêza ce xaw

Yek zerb henî bew zeberdê qeşt

Şanaş ne cergiş bere liwaş ce dest

Berşî ce Xusrew beden kerdiş çak

Mewday mûşkaw cew laş nîşt we xak

Xusrew xestey zam zêrnaş be zar

Gorêza gozeşt Şêruy şermesar

Perwêz şew be şad bade werde bê

Bazûş ne balîn Şîrîn kerde bê

2905 Ne lexşa ce caş Xusrew be asan

Nek şîrîn ce xaw biyu herasan

Wêş kêşa ne pêş peşyoya zebûn

Nek bergê Şîrîn bedriyu be xûn

Be bergê nazik be cestey xeter

Menalo be zar çûn ka kebûter

Law dan be yagey cemîn camewe

Sernigûnê xûn dest we zamewe

Zedey zamê xeşer cergê ciger çak

Xestey xeşernak xelşan ne ruy xak

**107a** *Xab Dîdenê Şîrîn Xosrew ra*

2910 Şîrîn dîş ne xaw Xusrew sernigûn

Keştîş bî nigûn ne girdabê xûn

Gîrê gazê şîr çengê pelengen

Giriftarê gîr nîşê nehengen

New hâlatê haş zarê zabûn da

Her gêciş meward ne behrê xûnda

Ce tersê 'ezîm tewasa ce xew

Ce xewfê xayîn horêza be taw

Satê cey sewda ser berd ne hoşîş

Goş da naşey zar meyo ne goşîş

2915 Dîş cageş medo fewc û mewcê xûn

Destey zulfaniş masiyan be xûn

Diya dîş Xusrew dûr keften ce laş  
Napeydan Perwêz nemenden ne caş

Ne xakê xeļtan keften sernigûn  
Menaļo be zar ce dûdê derûn

Dîş fuwarey xûn mewciş ce lawe  
Meşano meyo ce semtê şawe

Coşiya coşxêz mecoşo be coş  
Metkiyu meyo ce lay laļpoş

2920 Çûn tafê daran qeļwezanê dew  
Meşano meyo ce semtê Xusrew

Şîrîn dîş naļan naşîtê laļpoş  
Riwala seriş niya ne axoş

Dîş Xusrew xeften xarê xeţernak  
Xeļtanê xûnen ciger ciger çak

Firuşanê xûn mecoşa be coş  
Ser kerden ce dem Xusrewê laļpoş



107b Çûn gulê gulaw rewaney ce laş  
Meyo miru mewc ne dewranê caş

2925 Rengîn kerdên rextê Xusrew çûn xezan  
Metafu ce terz tafê qelwezan

Firrey fiwarey xûniş ne xiroş  
Coşan be camey cergiş mido coş

Şîrîn wey cestey karê kemerla  
Qirça çûn qeqnes perwaney zuxa

Her çend be lajan lawina şewe  
Ewend be zarî tawina şewe

Dema dem miđya be perwêzewe  
Dem mîna ne zam dişney têzewe

2930 Her dem meyoşaş destê damaniş  
Helêsa be leb zuxê zamaniş

Dem dem meziyaş bo we buşewe  
Miđya we zaman řence řoşewe

Mengira miđya be reneşewe

Guşîş meniya be guşîşewe

Her çend lawinaş be zarî xiroş

Xusrew xeste bî nebîş halê hoş

Her çend be çîrîn ser niyaş be goş

Keften ce watey şîrîn kelaman

2935 Medhoşen ce hoş nedaro ziwan

Ne mergê mewten bêdengê diwan

Ne cagey zaman têgê dişnetêz

Tek tek metikya ne cergê Perwêz

108a Qetre qetre zux zamê xeter xar

Metkiyu ne cay jar alûyê jar

Ga ga ce dûdîş menało ce derd

Ce tafê tafan jarê zux zerd

Ce zerbê zaman jar alûdey jar

Menało me suz be zarî we zigar

2940 New halatê hal dilrêş Şîrîn

Be naşan naz diya be Şîrîn

Yanê mesuzo derûnim be taw  
Dest niya ne diî wastiş camê aw

Şîrîn be şîwen xêziya be taw  
Awerd peyXusrew camî piş ne aw

Tekyeş da ne pişt re'naş kerd ce xem  
Camiş gêrit be des awişt da ne dem

Xusrew xestey xar noşa ne şeyê nuş  
Kari bî ce giyan şî ce halê huş

2945 Şî ne helaket mewtê merdeniş

Name be goftar wesyet kerdeniş

Ciwanaw ser kerd ce nûkê bînîş  
Giyaniş pêkya ne çalê tînîş

Camê cemaray cemînê bêgerd  
Zayif bî ce reng ze'feranê zerd

Qazêb be qullab kawiştê kîneş  
Qerar da ne qeşd ne şedrê sîneş

Perwêz perêşan be dîdey esrîn

Balê cem hordaşt diya be Şîrîn

2950 Moşgan da be hem kêşa awê serd

Eşkê esrîniş ce dîde ser kerd

**108b** Leb da be hem da kêşa awê serd

Giyaniş teslîm kerd zayif bî we zerd

Xusrew fena bî ne mewtê medhoş

Fewtê fariş bî ne xawê xamoş

Şîrîn dîş Xusrew bêdeng diwan

Be naley nalişt nama be ziwan

Her çend şaşa kerd Şîrînê dişdar

Nama we ziwan Xusrewê salar

2955 Dîş Xusrew bêdeng ne xawê xamoş

Ce bêqerarî Şîrîn şî ce hoş

Xêzaw keft ne rûy textê Xusrew da

Elweday esrîn şeyda new şewda

Dest maļa ne bejn xeste xarê dered

Diya diş laşeq bî we sengê serd

Şîrîn be zarî zêrnaş be taw

Banû begleran bêdar bîn ce xaw

Xace serayan xiroşan ce xaw

Coşan kenîzan sîmê zerkilaw

2960 Xace xulaman gardê kemerzer

Banû kenîzan tacê tel ne zer

Be şîn û şîwen şeyda new şewda

Waweyla dararn be rûy Xusrew da

Ser ta ke daman yeqeşan dirîn

Gîsiwan be kard hûnê zulf birîn

Teŕlan teŕaran terkê tohfe pîl

Muşkîn xezalan perî perde keyl

Şahîn şehbazan kelawe kende

Ketûn kelafan pexşê perkende

109a

2965 Xace serayan tacê tel nigûn  
Kemer telaw keyl xerqê xakê xûn

Xara xiyalan walay herîrpoş  
Termey tedarik şewfê semûrpoş

Ser ta pa ne gil esrînê xare  
Şehîdê şîwen yexey şed pare

Taftey telapoş zerîn kelawan  
Sîney sûret çak wêlê weławan

Newber nemaman nazik newnehal  
Çûpî dan ne derd laşey kemerlâl

2970 Zayleyê zarî şeydayê şîn şew  
Bangê waweyla ne dewrê Xusrew

Şîrîn be zarî serwîn kerd nigûn  
Beyan wist we pêz be nîşê naxûn

Zulfan be naxûn tata şendewe  
Xalan be naxûn yek yek kendewe

Gîsu kemendan destey zulfrêz  
Qed qed qed kerdn be elmasê têt

Ser qobeysîneş be şed pare kerd  
Xalan ne cemîn wêş aware kerd

2975 Zeřîn zengulan lerzanê lagîr  
Xeřtan kerd ne xak xiřrey qehrqîr

Zerřtanê zerřbaf taftey țelarêz  
Wařay gulgezîş bî be gilamêz

Destê Xusrew gêrt suzê nalîniş  
Ser gêrt ne axuş nişt ne balîniş

Melawna be suz zarîş be nazan  
Mer Xusrew çeniş beyu be razan

**109b** Xusrew xeřernak ne mewtê medhoş  
Bêdeng diwan ne xawê xamoş

2980 Nebîş hařê hoş diřdarê dîrîn  
Rêzan kerû raz řîrîn be řîrîn

Watiş fidatim kemerê laļ key  
Bewrê şîr û şûr her berzê hey hey

Ye çêşen xiyal xeftê xawiten  
Xawê xakê xûn ce ko bawiten

Ser hordar ce xaw fidayê xawit bam

Neşlê newşîran fiday nawit bam

Ba dergay darit daray kemerlaļ  
Qoflê qeşd nebo ta be qern û saļ

2985 Şeher serdaran sergerdan meker  
Xanan ce xidmet peşîman meker

Carçî çawişan êntîzar meker

Xaşe xelaman tar û mar meker

Dîwanê darat ba nebo bañil

Şefê serdaran mekere xeciļ

Çewgan zerniyan tacê tel ne ser

Teļa telniyan meker der be der



Kilaw zerñiyan perde perwerde

Banû kenîzan medir be werde

- 2990 Xezêney Xusrew silsiley sañan  
Kemend kehlanan meder be tañan

Qeşçî qeşxanan nebo bê şahib

Tazî tewanan nemano xayib

Gilgûn û Şewdêz bala başê bas

Qaţu qeţaran nazî we mîras

- 110a Nekîsaw Barbod şefayê suzsaz

Sade saqîyan nemano bînaz

Meclêsaray Cem bezmê bade mey

Şîwenê şadî key kiyan key

- 2995 Dengê def û çeng xoşxanê aheng  
Meqamê meclês nazi we bêdeng

Meder be xaret şadîm be dişad

Meder be xaret bad awer we bad

Tac û textê wêt meder be tañan

Şîrînit meker we pendê sağan

Ceqey Key Xusrew laľbexşê laľpoş

Bênaz meker bezm banû badenôş

Qeşaşê qetlit biyawin be kam

Şîrîn sa meker seranser encam

3000 Piř zam min fiday durefşanit bam

Lalpoşim fiday laľbexşanit bam

Serdarim sergerd sipaw sanit bam

Salarim seftey rexşê ranit bam

Şahim min şehîd tac û textit bam

Zelîlê zaman zerdey sextit bam

Fiday tîpê tewq lalegûnit bam

Xeľtanê xestey xakê xûnit bam

Dîdem fiday seyr ser diyarit bam

Natewanî nîş naľey jarit bam

3005 Bînayîm be nezr tewqê takit bam

Zigarî zamet zuxê jarit bam

Fiday fethê dîn di lawerit bam  
Ber badî binyad badawerit bam

**110b** Amanen fiday namit bam  
Fiday zametan zuxê zamit bam

Daxê derdê tom key mişo we yad  
Pey Ferhadim ro pey Xusrewim dad

Kiyanê key key Key Xusrewim ko  
Ferhadê di ldar serkeşanim ro

3010 Samanim sa kem bazarim berbad  
Pey Ferhadim ro pey Perwêzim dad

Ûemim be ta lan tacim nigûn bo  
Merdî coşayet hey Ferhadim ro

Şêru Şehîd bo nenîşu be şad  
Sulţanê serhed serweranim dad

Nenîşan be şad polê perîzad  
Pey Şapûr ro pey Ferhadim dad

Nasûr keftey zux zamanim be so

Ûerîbî Ferhad Bîsitûnim  o

3015 Hey hanam ce dest Ş ruy  ezeb xo

Derd n  dilr ş ken zanim  o

Fe anim ce dest sitarey  eftim

 i bext  dařtim  i roj  keftim

Ce  eft   arem ce ř m  bextim

Herdem be kar  meřo ne bextim

Dayim derdedar diř ne coř  men

Her aziyetdar siyapoř  men

ř m  bed exter  are  eft  men

Her ahir n bar nar  neft  men

**111a**

3020  end kerdiř b dar fe an   feryad

Ewel pey Xusrew axer pey Ferhad

B dadim ce dest  erx  d naw d n

Zemaney zeb n b řert   b ř n

Kes ta ser ce say çerxê çepîwaz

Ce damê dewran nebî serferaz

Dînê dûnay dûn mayey meker fend

Çerxit çemer bo ta hezar û end

Xakê ademxar nexmê nehanî

Seray senigûn fend mazî manî

3025 Lehdê lehafit be kê nepoşay

Camê badey merg be kê nepoşay

Ecel ne qapî gêt nekerd kemîn

Gêt be serender nawerd be zemîn

Şîrîn bey destûr Xusrew lawinaş

Be suz û zarî tewen awinaş

Be rêzey esrîn abê eşkê şûr

Te 'rîfê te 'zîm awerdiş be mûr

Dimay şûr û şîn şeyday şûmê şew

Ama ne saman serkarê Xusrew

3030 Xêza xiraman şew şûmê Şîrîn  
Be dûdê enduh be suzê esrîn

Camey bergê bejnxûnînê Xusrew  
Şed parey elmas têxê dişne şew

Xelîtanê xûnîn herîrê walaş  
Kendiş ser ta paş ce bejnê balaş

Be şîn û şîwen daxê derdewe  
Perwînriş ce berg 'uryan kerdewe

111b Be abê 'areq 'etr û 'ebîrat  
Be muşkê mêxek daruy zêrûrat

3035 Pakiş kerd ce xûn be zarî we zêrûr  
Xeslê xuslîş da be sedrê kafûr

Pêçaş ne keften xaşey henrû baf  
Be parçey Hindî terhê şewfê şaf

Be 'etrê 'areq kerdiş muşkamêz  
Pêşa ser û paş be tay zulfedêz

Awerdiş korsî nuqrey sîmê xam

Dane bend ce seng ebyezi ne cam

Laşeyê neqş naz Xusrew bêqerar

Niya ne rûy text korsî zernigar

3040 Kerdiş restaxêz neşlê key keyan

Ta sewadê sobh şerh bî beyan

Çerxê çetirzerd daney diyaran

Şufî şerh xêz xêza ce şaran

Şeweq da tebeq taqê gonbedgûn

Ser da ne seywan zîbay zersitûn

Şana şo 'ayê şem ' şewqê şefeq so

Kewkebey kewkeb kiwan da ne ko

Çetirê çiraxan ne çetirê nîlî

Zulmat zebûn reng terhê be lîlî

3045 Şem 'ê şefeq şo coşiya be cext

Xanê xananiş tariya ce text

Sewdayê sipa zengî da ne wer

Xiroşê xurşîd xêza ce xawer

Ser kêşa ne burc şemaray şerîf

Perwaz dane per ce perdey leîf

112a Talañê tayif rengê wehiş da

Nûriş newaza be kuh keşda

Murxê zerînbal şana bal û per

Hordaşt badiban beyzayê zîbzer

3050 Da ne teblê kewş demdebey demax

Kêşa kirrinay şewqê şem çirax

Ber ama ce burc qezay qehrê qîr

Coşa cilûs kerd bî we cehangîr

*Agah Şodenê Sêpah Ez Mordenê Xosrew Bena Be Şîn Kerden*

Şeher sopay nûr 'elem kerd we pa

Ce halê Xusrew xeber bî sipa

Sanê serdaran aman ce ser da

Waran be laşey neqşê Xusrew da

Gişt dirîn yeqey bergê beden çak

Ser ta pa ne gil nîşt ne qer û xak



3055 Şîrîn kerdiş şîrî rojê restaxêz  
Aman be ser kar adabê Perwêz  
  
Kendenê qebr qeşt xananê xemnak  
Laşey Xusrew şa siperden be xak  
  
Şîrîn kerdiş şîş her ta ke tawa  
Keyliş kerd ce eşk gilkuş we lada  
  
Awerdiş benay ce binyadê bed  
Be geç û acor taqê bena kerd  
  
Xusrew xamoş bê ser ne seray seng  
Xamoş bê ne xaw xaney tarê teng

3060 Mendiş be mîraş daneyê lajdêz  
Xêzan û Şîrîn Şewdêzê camrêz

112b Le 'lê cewahêr nemend perî ew  
Bergî ce kerbas bexşa be Xusrew  
  
Gêrtiş menzilgey mawayê mal no  
Sewdayê sengteng seywanê gilko  
  
Ce zewqe zeynet zîbamend tohî

Bêyarê hemdem razê hemrehî

Bergê 'enkebût kerd be sayeban

Qelax ne qebriş bî we dîdeban

3065 Dergaş bî derbest qapiş mend be çol

Hor pêça seywan şefaray samol

Çawşanê çewgan ne rûy çengewe

Caçîyan ce qeş da be zengewe

Xace serayan gardê kemerzer

Tacê tel ne xak xerreyê şîn şer

Gêç da kenîzan laley lalegûn

Kilawê zerniyan tacê telnigûn

Bidu behriyan kemend perwerde

Yalê dom qelem perçê pey kerde

3065 Sipa sergerdan be zarî kerden

Dûdê di! be coş zigarî kerden

Bergê siyapoş xarê xatîrrêş

Hucrenişîn bî ne yataxê wêş

Bergê azyetî dûdeng kerdewe  
Ser niya ne pişt ne pay perdewe

Bişno ce Şêru şûmê siyabext  
Xêza xiroş kerd tayîn bî be text

*Cilûs Kerdenê Şêru Ez Demay Ferhad*

113a Dimay Key Xusrew Şêru cilûs kerd  
Dane tēblê kewş neqarey neberd

3070 Jendiş gebrekan şadî lox û şer  
Sikeş da nesîm zerbîş da ne zer

Sikkey Xusrewey mewqûf bî ne yam  
Fermanê Şêru rewa bî ce yam

Şêru beçal kerd bazarê baboş  
Tacê tel pêka ce qeş da ne coş

Şêruy şerengîz tendiya ce text  
Teleb kerd sipa serdaran be sext

Bizanûn herkes çêşişen xiya  
Çûnen be xidmet minê kemerla

3075 Herkes narezan be yek îşare  
Mepêkûn seriş be ser qenare

Çawişan be çap hucûm ber dişan  
Sipaw serweran teheb kerdişan

Aman bêaman henî be hewlînak  
Be sucdey sucûd ser berden we xak

Şêru be heybet diya be yaran  
Lerze nîşt ne cerg sipaw serdaran

Ferma be cellad xênîmê xûnrêz  
Kêşan sa û seyf be elmasê têz

3080 Çend ce serdaran kerdiş sernigûn  
Sehengê soltanan xeştan kerd be xûn

Çend xanê xayin serkeşanê şaf  
Nasinaş be tay be heşqey tenaf

Rêru wat yaran çêşen rezanan  
Dayim pey Xusrew rûme! xezanan

113b Ta îse xiroş xanê Xusrew bê  
Sitareş serdar çerxê ne dew bê

Fermaniş be fer felek yariş bê  
Firiştey firşet sebeb kariş bê

3085 Sikkey selţenet namiş rewac bê  
Xerminiş xiroş xercê xerac bê

Îse sitareş zarê zebûnen  
Taleş ne tarîk tasê nigûnen

Hała tîşey min ciger meşkawo  
Mîraşê mendeş be min meyawo

Saman dan şenem serencamê min  
Gêlnaşê gerdûn dewre be kamê min

Sitarem ser berd ne seqfê sajan  
Bûm be canîş şay kemerlajan

3090 Poseş newaxten dewranê fanî  
Ga ser nigûn ga şadimanî

Xusrew min kerdim xeştan çenî xûn

Textiř be tařan tabiř sernigûn

Henî çêřen řın zarî řew û ro

Fexanitanen pey řalê Xusro

Be zeř mekêřûn nazê newkerim

Mer min ce Xusrew çendê kemterim

řerřen binêrûn tacitan be ser

Kerûn mera'et ce ew ziyater

3095 Ce dînê diřber biyawun be kam

Beř kerûn lêtan badawer tamam

Ce řewqê řîrîn diřim řad kerûn

Gencê badawer min we bad derûn

114a Eřrefi be seng zeř dem be lama!

Teřay destefřar kerûn we pama!

Bidu beřriyan řehbazê řahî

Bibexřûn pêtan be xatir xahî

Libasê layiq xelatê ên'am

Ferřê fermayiş ser ta pa tamam

3100 Rengîn kerûn şaf cerengê biro

Nîga bidarûn xastey ce Xusro

Er hen rezatan xiyal ken be xaş

Kemer biwînun kemer be exlaş

Werne cellad têxê bêderêx

Sa kerûn saman tamamî be têx

Penem den cuwab çêşen Şelatan

Ye razê rengîn ye kelbelatan

Serdaran ce şef hocum berdişan

Be sucdey edeb sucûd kerdişan

3105 Watîn fidatîm quçê qurbanîm

Ne fermanê to bende fermanîm

Xidmet karenim kemer bestey kar

Ferman berdarîm firset bo be yar

Şemşîr meşanîm be êqbalê to

Ême çakîrîm Xusrew nebo to

Cimley canfişan rojê mergenîm

‘Elacê newker nane berkenîm

Ême do‘agu be xaşimanen

Çenî to dawa çi basimanen

3110 Serdaranê daw dawî wastişan

Xanan pey xidmet kemer bestişan

114b Şêru şineftiş ce yaran ehwaj

Ce şewq û şadî şana per û bal

Da be sipaw san ên‘amê berat

Xanê sultanan ser ta pa xeLAT

Serdaran kerdiş cewahêr waran

Xacew xulaman be şehriyaran

Bexşa be qûşun zer û zîb zola!

Zer da be esper eşrefi lama!

3115 Zer û zeberced dîbay dilpesend

Behriyan bend kemilan ce kemend



Dane we cewahêr qaţir û qeţar  
Yaqût û zomorud metay geranbar

Dimay bexşayiş şadiş winara  
Bena kerd be bezm we meclêsara

Xanê sołţanan serdaranê pêş  
Niyaş we meclês herkes perî wêş

Tacê ţel ţela keław kemerzer  
Mînay morreşe‘ tacê ţawûsper

3120 Dîbay perweran ţîpê tirmepoş  
Zencîrey zunnar zîbay zer ne doş

Xananê xara bergê ser ayir  
Sołţanê serdaran ciqe cewahêr

Xermanê xaret xemal da we bad  
Xiyał Xusrew ber kerdên ce yad

Xaşe xoşxanan şefay suz saz  
Fewcê kenîzan polê bazî baz

Çenî Çîniyan fencanê fexfûr

Şîşe surahî piyaley bilûr

**115a**

3125 Şem'ê çiraxan biryanê kebab

Besaţê badey ferabey şerab

Dane suz û saz xoşxanê aheng

Muxennî mûkeş naley def û çeng

Çeng da ne çil çeng sazê sitûran

Çar tarê tayin terzê temûran

Qûley qiwaqû xêza ce camrêz

Bêxewf ce Xusrew pirsanê Perwêz

Suzê nexme nay naqûsê çil çeng

Boqê başeban awazê aheng

3130 Sade safiyan camê badew mey

Heya hey ne dem key keyan key

Ce şadî şerab xêza hey xiroş

Serdaran serxoş xoşxanan ce hoş

Noşan peyapey piyaşey şerab

Neşey noşîş berd ce mezey kebab

Xiroşa be xeşm coşiya ce ser

Awerdiş be yad dîdarê dilber

Naław nirkinaş be eşkê esrîn

Noşa we dil bî pey dînê Şîrîn

3135 Çûn narê nextîn derûniş girya

Taw ce tewen send taqetiş birya

Birûz kerd berut be dîş ne xiya!

Sîmaş bî siya bedter ce zuxa!

Pêkiya bedter derûniş be tîr

Qeşran bî siya qeşranter ce qîr

***Reftenê Şêru be Xelwet We Teleb Kerdenê Şîrîn***

115b Şî ne xelwetî qerar gêrt ne text

Xace serayan teleb kerd be cext

Aman xacekan xelwet siparan

Şef şef be sucûd senceq winaran

3140 Be taw tondî watiş be yaran

Şehîdim Şîrîn perêm baweran

Henî nemenden tab û tewanam

Bêxawî ce ʔaf awan sitanam

Eger dem dereng mawerdêş perêm

Wer ne sewgendim be ayînê wêm

Be elmasê têx tîzê beden çak

Pare paretan merêzu ne xak

Yaran şineften ce Şêru xeber

Lerzan ce heybet ce pa ta ser

3145 Çend ce xacekan cuds kerdişan

Ne şonê Şîrîn hucûm berdişan

Riwalan be nerm qeşredan be dew

Zîryan ne herem hecabê Xusrew

Perde perweran beled kerdişan

Şîrîn ce hucre peyda kerdişan

Dîşan nîşte bê ne piştê perde

Siftey siya pust aziyet kerde

Cemînê zux zexm derûnê daxî

Ser ta pa ne berg qîrê qelaxî

3150 Ce gonay xebxeb cemînê caman

Tik tik metîku zuxiş ne daman

Keylê abê eşk dîdeş medu dûr

Farhad û Xusrew maweru be mûr

116a Merêzu dîdeş xûnabê esrîn

Kafir mekerû be halê Şîrîn

Yaran sucde dan be dînê dilrêş

Halatê Şêru watişan perêş

3155 Watin be Şîrîn yaran be zarî

Be şehdê şîrîn zeban dirazî

Er şed derditen derdînê derden

Şêru be te'cîl toş teşeb kerden

Mebo qo berîm ser ha ne qeza

Eger rezanî eger nareza

Emr û fermanit peymanê xelaten

Êden herfîman herçê şelaten

Şîrîn şineftîş ce yaran eḫwa!

Qirça çûn qeqnes rîza per û ba!

3160 Bendî bar be lêw rencê ruz û şew

Dadê derûn kerd hana be Xusrew

Dîsan zuxê zam bestey konew no

Nîşê namûriş hem awerd we so

Xêza xiroşa be nîşê naxûn

Wêş elbeda kerd cemîn coşê xûn

Sewlê esrîniş be fiware kerd

Bergê siwarîş ce ten pare kerd

Be dadê dişuz dîdey eşkamêz

Dad û hanamen ce konî Perwêz

3165 Bişkafê leḫid kefen ne wer da

Ciqqet lerzan ker carî ce ser da

Biwîne 'alem şahê cehangîr

Şêru şîrînit mekêşo esîr

116b Ser hordar ce xak ce kî qînitên

Naşinext ne cat canîşînitên

Merzedey zamet bezmê sextitên

Qesasit tayîn tacê textitên

Çeş mebo carê binmanînewe

Esîrit ce bewr bistanînewe

3170 Xusrew ne xîyal xamoş wêş bê

Xeber ce feryad feñan kêş bê

Rûş kerd be yaran Şîrîn xu be zar

Be eşkê endûh dîdey endûhbar

Watiş bêmirwet min be çi haşim

Siftey siyapust siya zuxaşim

Siya sewadê bergê duşimen

Ce ko suz û saz 'eyş û nuşimen

Be dînê Şêru şed bawer keran

Reza nimebûn meş serim bîran

3175 Yaran çend be soz simacet melûl

Watin be Şêru nekerdiş qebûl

Ce tirsê Şêru tendiyan be taw

Xiroşa be xeşm ce watey xiraw

Yawan be Şîrîn qarqînê qeşt

Gîsuy kemendiş pêçinan we dest

Be tendî tekan be zeberdê çeng

Ne rûy mesneda ferşê lalereng

Taw tekan da xarê xaîrrêş

Kêşaşan be kêş kinya be cay wêş

3180 Nekerden hiçab ce şermê Şîrîn

Bî xewf ce Xusrew kiyane dêrîn

117a Kêşaş be kêşan mîrê xezeb xo

Berdiş banûy baş pey şûmê Şêro

Be tewrê be zor kêşaşan derêx

Çend hûn gîsûş horkinya ce mex



Zayleyê zarî xiroşa ne ca

Xêza ce herem sera perdey şa

Banu kenîzan taqî telazer

Terlan qetaran tohfey tork ter

3185 Feẋan û feryad bêdad û bêhed

Zulfan kerdên pey keywanê qed qed

Ceqey tacê tel hewa dan ne xak

Herîrê wala kerdên be şed çak

Kêşan bangê berz be eşkê xûnrêz

Be dad û feryad çîrrîn we Perwêz

Watin ce konî şahê şîrzerd

Biwîne Şêruy şûmit çêşîş kerd

Kenîzanê zar be şurşîtê şîn

Waweyla wey ro ne dewrê dêrîn

3190 Şîrîn be keşan kenîzan be zar

Ta yawan be text Şêruy zinekar

Yawan we pabos şûmê bêbinyad

Yeksan kenîzan xiroşan be dad

Midra be edeb Şîrîn xeraman

Ce şermê Şêru şed wist we daman

Ser hordaşt ne ca Şêruy siyabext

Teklîf kerd Şîrîn binîşo ne text

Şîrîn da cuwab be zarî melûl

Be ham nişînî nekerdiş qebûl

**117b**

3195 Watiş min sefil siftey siyapoş

Be 'îden ce min şadî 'eyş û noş

Min derdey esîr ser bê serencam

Serdar sernigûn zedey zux û zam

Henî şewq û zewq weşî min kamen

Şadî rozigar be min heramen

Sernîşê xaran êşê dîşiman

Nîştey text û tac perî çêşimen

Xarê xem ne cay xurdê xawimen

Nişat nîşiten ce ko bawimen

3200 Bey tewr da cuwab Şêruy bedkelam  
Dest bestey xidmet midra be meqam

Şêru wat Şîrîn diîdarê diîber  
Mer to ce derdim nedarî xeber

Heqa heqiten tewen lêt waro  
Kes ce derdê kes xeber nedaro

Min 'eşqê Şîrîn karê pê m kerdin  
Herdem miwazûn awat we merden

Kûrey kûzeger coşê tawimen  
Zuxê di ne cay xurdê xawimen

3205 Henasey serdim tewen tawinaş  
Naîştê naîem koan kawinaş

Şew şûmî şimar sitaran zanam  
Bêxawî ce taf awan sitanam

Nocûmê exter eflak şimerdim  
Kewkeb be katib keywan siperdim

Defterxaney ferd şewgarim wana

Ĥesawê encum eflakim zana

118a Ser berdim be sıř gerdiştê gerdûn

Kawan ce kewrim bî be kuhê tûn

3210 Dûdîm demawend poşa wîney Tûr

Ahir dam nebend kaw koyê bilûr

Reday rehbanî zinarrim ne mil

Riştêy rengimen ne çahê Babil

Weşî xezalan ham ziwanimen

Tarê 'enkebût sayewanimen

Qeqnes ce qirçem bî we koy zuxal

Ce dûdî derdim rêzaş peř û bal

Perwanan perdax serbaşış rêza

Be narê neftim suzaw birêza

3215 Bayeqoş bêzar şew nalînimen

Tewlilay teskîn ro nalînimen

Buġbuġ bêqerar ŧew feġanimen

Gorêzanê kar çeng çeqanimen

Coġdan ferarî ah û naġemen

Min ŧûm û ŧîwen ŧasê talemén

Kinase ne çem tûġî ne ŧaran

Buġbuġ ne çemen ko ce kosaran

Qumrî qirçiya berŧî ce banan

Hudhud bêzaren ce ŧew waberan

3220 Yegîŧ tewallan ce ah û naġem

Řazê riswayîm berzen ne ‘alem

Xusrew min kuŧten dinyam bo beġaġ

Ha bîm be xênîm xûnî kemerlaġ

Kê kerdén bey ŧewr ahir biŧolêm

Kerdim qeŧdê qeġl bextê baboy wêm

118b ŧîrîn her çîm kerd perî to kerdén

‘Aŧî ‘eŧqê tom îmanim herden

Henî nemenden taw û tewanam

Mebo biyawî be dad û hanam

3225 Mebo be weşlit biyawun be kam

Meţlebim êden baqî weselam

*Cewab Dadenê Şîrîn Serweran We Mêhlet Xasten*

Şîrîn şineftiş ce Şêru şewab

Be zarî zigar peneş da cuwab

Watiş ey Şêru mer şermit niyen

Zulmê bey destûr hergêz kê diyen

Kemanî ce reng Xusrew merde bo

Min bergê siyam sêweng kerde bo

Ce men zux û zam derûnê daxî

Ser ta pa sewad siya qelaxî

3230 Serdar sernigûn merdemûy melal

Xelţanê xaşak xerrey xak buļ

Min xo siyabext siftey siyapoş

Bergê azyetî dewar her ne doş

Ce ko rew a bo min bey taļewe

Be şîn û şîwen kemer laşewe

Şêru mer to gewr ya ferzengenî

Tersay nesara diş ce sengenî

Er şed car ême esîrê tonîm

Dîlê destbeste destgîrê tonîm

3235 Bênewa û bêkes be to werdenîm

Hercarê xidmet babot kerdênîm

119a Bizane bu heq xidmet guzarî

Mebo zelîlan menzûr bidarî

Neşay xeyrê yam cefay rozigar

To be esîran meberd sitemkar

Îse min kerûn şadî be dîdar

Mebûn ser be jan şaney rozigar

Herfê mewaçûn mekere sitêz

Bena be xatîr mezarê Perwêz

3240 Muhlet der penem ta be çihil şew

Bigîru te'zîm te'ziyey Xusrew

Şewê şam xeyrat ce wer nenazeş

Temam kerûn tewq te' zîmê tazeş

Hêman Xusrew mewt mînge newaren

Te'wqê tabûtiş dimaş diyaren

Fıkr û xiyal ker mer Şêru şêten

Namerdit keran ye babê wêten

Ta be çihil şew muhlet birer pêm

Saman derûnkar serencamê wêm

3245 Ewsa cew dîma her çê rezaten

Şîrîn ne ferman feşlê xezaten

Er neşnewî herf min watim perêt

Peşîman mebî ce êqrarê wêt

Sewgend bew şenem xacê bêderêx

Şikawun perdey cergê wêm be têx

Watiş be Şêru min êden rezam

Êxtiyar be ton baqî weselam



Şêruy ce watey Şîrîn xeraman  
Ce şermendegî ser wist we daman

**119b**

3250 Nedaştiş cuwab seriş wist we pêş  
Şîrîn ruxşet wast şî ne cagey wêş

Şêru şermesar mend be xecalet  
Dermaniş nebî be xeyrê dełalet

Şî ne fikrê xam çi rengî karûn  
Çil roze we' de çenî bo yarûn

Awerd be xatir derdînê dara  
Hiç xaşter niyen ce seyrê sara

Wer ne mehaşen bigîru taqet  
Bêşek metoqo dilim ce hesret

3255 Şêru pey seyran senceq winara  
Da ne suz û saz kêşa we sara

Ûpê xulaman çenî saz û suz  
Xîmew xiyaban tuşey çihil ruz

Ladî cêlurêz ce rîte çewgan  
Neşim bazî bê ne mewcê meydan

Ga seyrê suskan ne ser diyaran

Şikarê şahîn tîpê tetaran

Ga şiday xoşxan nexmey def û çeng

Sazanê dilgîr suzê xoşaheng

3260 Şêru bey destûr ne seyrê sara

Çil ruze we‘dey Şîrîn wiyara

Horgêla be şad Şêru be şitab

Yawa be menzil reha da rikab

Be taw û te‘cîl peya pey ce zîn

Dubare ce new teşeb kerd Şîrîn

Yawa be xidmet Şêruy bedneşeb

Ser berd be sucûd midra be edeb

120a Şêru wat Şîrîn we‘dem temamen

Wadey wextem dinyam be kamen

3265 Henî emrî hen bawerûn we ca

Ce îne fişter çêşenten reca

Şîrîn cey sewda fikriş berdewe

Xaney xiyalan derûn kerdewe

Watiş cew dîn nemano dirêx

Ba dimay Xusrew wêm bedewn we têx

Bada dimay wêm Şêruy bedendêş

Mîraş Xusrew nemano perêş

Be ferîb û fend karê pêş kerûn

Esasey Perwêz ce destîş berûn

3270 Weqtê silsileş berkerdim ce muşt

Ewsa cew dima wêm biru be kuşt

Wer ne çi haşîl wêm bidew we bad

Şêru dimay min binîşu be şad

Şewqê şadiş bo be ruz û be şew

Be maîê mendey mîraşê Xusrew

Bes min ce dîna çêşim meqamen

Îne min kerdim kirdarim kamen

*Bazî dadenê Şîrîn Şêru Ez Maļ û Mîras*

Şîrîn wat Şêru we' det bî tamam

Er mebot ce min biyawî be kam

3275 Herçê min maçû bigîre goş

Pend û goftarim meker feramoş

Min ce to beter meylê to pêmen

Îse 'eybê to hem 'eybê wêmen

120b Ce qetlê Xusrew minîç xuşhalim

Xaş karî kerdî qezat we maļim

Min her ce ezeļ tom ne xiyalen

Şeyday dînê tom ye çendê saļen

Beļê er mebot payet bo new ca

Herçê min maçûn bawere be ca

3280 Bena ker binyad be samanê wêt

Xeļqan dem be tîr tane neden lêt

Megêre be wêt ce merde esas

Nanê namerdî ce maļ û mîras

Perî çêşiten şeday suz û saz  
Çenî ‘aliman meber be ham zar

Mekêşe minnet mîraşê Xusrew  
Mer to ce şahî kemterî ce ew

Badawer bişken Şewdêz biker pey  
Destefşar wize ne behrê bêpey

3285 Çil sitûn sergim Kîsra ker xiraw  
Ne cagey camrêz berawirîn aw

Niksîya be têx ciger pare ker  
Barbodê destbiş ew aware ker

Ba dengê sazan neyo ne goşim  
Ce malê Xusrew dîde bipoşim

Dîniş be dîdem niyen gewahî  
Dîdariş be diş niyen gewahî

Er mebot çenîm bibî be hamser  
Herf û watey min be cage bawer

3290 Weqtê herfê min be ca awerdî  
Herçê min watim to pose kerdî

121a Ewsa cew dima tayîn ker be ڤo  
Teleb ker tamam mulkê qelem ڤo

Mulê û memalik şaran gişt tamam

Meçalê memlûk xe xaş û 'am

Beyan bimidran dû şef şef ara

Yekser binîşan şadî nesara

Ewse min rezay ruxşet midew pê

Bişo ne ser kar suz û sazêwêt

3295 Ha watim be to neşehet tamam  
Er mebot ce min biyawî be kam

Şêru şineftîş ce Şîrîn xeber

Şikufê şadîş ne diê kerd eşer

Watiş binayîm minnet be giyanim

Herçê ferman dey bende fermanim

Xêza firuşa Şêruy bêkema!  
Nezanaş Şîrîn miruş be lama!

Ferman da be cext be te' cîlê taw  
Camrêzu seraş yekser xiraw

3300 Zirîkey Şewdêz zîrey Nekîsa

Bêdadê Barbod dinyaş tewasa

Şewdêz kerdiş pey badawer şikest

Teşay destefşar qehar kerd be qeşt

Nekîsa be têx şikem hor dirî

Barbod ziwan herdû dest birî

Xezîney Xusrew rêza be sara

Dînar û direm nemend ce Dara

Çeper tayîn kerd ne muşkê memlûk

Aman xelayiq ce çîwar bilûk

**121b**

3305 Kêşa mirî xelet tamamî ce ko

Cembînê Cemara ne dewrê Şêro

Midran xelayiq be dew şef be dew

Ce qapî Şêru ta qebrê Xusrew

Qazîş teşeb kerd 'eqdiş ce new best

Niyaş be nay bezm şadiş şî ce dest

Ce şewq û şadî xiroşa ce ser

Nezanaş mebo ce çubî çemer

Mewatiş Şîrîn şefay salîşen

Nezanaş ne qeşt ser û maîşen

3310 Gerdûn ne qeşdiş her hane zeng da

Şîşey şikufiş medu be seng da

Şêru bêxeber ce rimûz û reng

Ne suz û sazan şefay def û çeng

Saz û semtûran çerz û temûran

Çarê taçikir çaxir zerûran

Xiroşa xoşxan çil tar û çil çeng

Tarê temlîbaz sencê xoşaheng



Şefay şurahî sade saqiyan

Xace kenîzan t̄ela taqiyan

3315 Kelaw zerniyan piyaley bilûr

Be camê badey mey keften ne dûr

Demadem dulî ce şîşey şerab

‘Ereqê gulnarî badey bo gulab

Serdaran sermest ce camê bade

Xanan sulţanan medhuş fitade

Bişno ce Şîrîn xarê xatirrêş

Ama ne ser kar qeştê qetlê wêş

122a Şîrîn be Şîwen xêza be xiram

Çenî kenîzan rû kerd we hemam

3320 Bergê sewadî siyaş kend ce ber

Silsiley serwîn hewa daş ce ser

‘Uryan kerdiş ten zexmîn daxî

Bergê azyetî siya qellaxî

Bilûrî beden kafûrî wîne

Ser berd ne hucrey genc û xezîne

Gîsu kemendan zulfanê çîn çîn

Bexş kerd ne ruy aw zulfanê muşkîn

Çûn beş û bûrçîn terlanê awî

Ser suz û şifet suney ser awî

3325 Çûn burcê beyzay bendê êlexan

Hucrey hemamiş kerd be çiraxan

Fîruze xaşan çûn nigînê zer

Dane dest nişan nezmê luluy ter

Kerdiş şost û şoy kemendê kelaf

Be çeng û çil çeng nuqrey sîmê şaf

Awerden ye ca fermanê wêşan

Çend genc û gewher bexşa da pêşan

Be abê 'areq gulabê 'enber

Be muşkê mêxek ce pa ta be ser

3330 'Etrê 'ebîran meşend pêş da  
Be zulf û gîsuy xatîrê rêş da

Xêza xeraman be tuy enderûn  
Ama nîşt ne text ne hucrey derûn

Nîşt be dilazar xarê xatirrêş  
Benaş kerd ba nûr araişê wêş

122b Awerden perêş esasey bergiş  
Terhê tedarik qeşaşê bergiş

3335 Boqçey qumaşan yek yek kerdewe  
Be suz û zarî ahê serdewe

Poşa be endam herîrê waļa  
Qetnî qenawêz qumaşê aļa

Mumetbeq tûrmey tēlabaf  
Xetayê Xuţen şuffî şafê şef

Guļgezî guļbend kesarî ketan  
Kêşê Keşmîrî xaşey serxeţan

Badiley bender dîmay eşedbo

Dîmay zerender zerîtanê zerpo

3340 Qeşbê qeşemkar herîrê zerkeş

Ṭubê ṭeṭabaf neqşê muneqqeş

Poşa be endam reng reng 'ecawî

Dîmay zer û sûr awî ce awî

Mêxekî mişkî ce sebzê nîlî

Dêr ferar çenî feylî mendîlî

Pesteyê cûzî maşî narincî

Kaşî xaş xaşî nurî birincî

Lagîrew lerzan kerdiş serawêz

Pule parçedar dane laîdêz

3345 Ṭewq kerden bend ṭeṭa ce şed qed

Payîş eşrefî zerdê zeberced

Kerdiş serawêz be rûy sîne da

Be xetê xalan hezar wîne da

Dane engoşter be pençey şimşal

Bahu bend û baḷ bazû pîr xirxaḷ

123a Ce dimay saman serwîn kerd tamam

Ama ne ser kar ce lay cemîn cam

Ebrûş be sîweng siyay şendil saw

Kerd be qewsê kêş key kiyanê Dara

3350 Mujgan kerd be tîr xedengê xara

Nîşê nûkê nexş ne kêşê dara

Zencîrey zulfan keylê kiyan da

Kerdiş serawêz we ruy beyan da

Saçaxê serwîn suney diyarî

Best be renga reng kêşê kosarî

Sîbê xebxeban xansarî baxan

Ne taqê ebrûş bî we çiraxan

Dendan kerd ne durc daney diyarî

Milwaney mercan rîşey mirwarî

3355 Leb kerd be lûlî ‘eqîqê ser zer

Zincê zinexdan luluy laleter

Gonaş beţal kerd şem'ê şewçirax

Xaşter ce sîban xansarî ce bax

Şefay serapay qemer da qerar

Şîrînî şîrîn ewsa da diyar

Ûr û melayik amaş be seyran

Firiştanê 'erş menden be heyran

Polê perîzad rizwanê dêrîn

Şelwat dan be dîn dîdarê Şîrîn

3360 Şîrîn be şîwen diya beyaran

Sewlê esrîn da çûn seylê baran

Be dengê dilgîr cergê qêmekêş

Çirîş yaweran yeka yek we pêş

123b Aman ne paboş ber guzîdeşan

Yeka yek bosaş dînê dîdeşan

Yek yek hamseran be zarî tamam

Dem niyan ne dem gunay cemîn cam

Watiş yaweran mizanrê çêşen

Şûr û şînê min şiturî pêşen

3365 Yaranê yawer tacê kapoîim  
Ham raz û refîq hem ragey çoîim

Nazdarê nazkêş cagey nazimen  
Dişuz û diîdar ragey razimen

Dostê diîpezîr yarê xemxarim  
Şebûrî şefay sare êwarim

Teîb derman enîsê derdim  
Ayîney dewran cemînê zerdim

Ser hesabê ser xefet xawanim  
Qedîmî saîan banûy bawanim

3370 Ye sûrê saman şûrê şînimen  
Ye bergê poşak axirînimen

Ye rextê elwan fezay xûnimen  
Ye serwênê saz sernigûnimen

Şerîen min ce dax Şêruy sitemger  
Birem cergê wêm be nîşê neşter

Şadê xatircem nenîşim we şad

Şerî bo dîdarîş birerûn we bad

Watiş baweran xaren xiyalîm

Bikerdî azad biken hejalîm

3375 Xeylî çenî min birditan cefa

Kêşan ne ray min rencê naşefa

124a Henî mehalen binîşîm be hem

Dîdarê Şîrîn biwînen we çem

Ha dîdarêtan gerdûn berd we ser

Mer ruy qiyamet ne deştê meşşer

Daxo dimay min destgîrê kê bin

Werdey waweylay esîrê kê bin

Dîlîrêşê kê bin be zarî zigar

Kê ne derditan biyu dîlazar

3380 Niyen zêndegîm dimay kemer la!

Nemanûn ce yam dinyam bo beta!

Be zîb û zînet xetê xalîmen

‘Ezmê ‘erûsî kemerla!îmen



Žewqê zînetî xuş xiyalimen  
Emşew be mêhman kemerlaşimen

Ba dimay Ferhad nebom payedar  
Bûm be hamnişîn Şêruy zinakar

Bişun ne duşab dinyay bêberîn  
Çenî kes nenîm ser we yek serîn

3385 Ce lefzê Şîrîn şineften yaran  
Tewasan ce taw tîpê teteran

Kenîzan tamam xiroşan ne saş  
Yekcar be yeksan keft ne xak paş

Be şîn û şîwen paşiya newe  
Be şewqê Şîrîn laşiya newe

Watin hey banû dexîlim aman  
Rengê riyazît mawer ne raman

Dewrê dûn meker be zarî ziwîr  
Ême be naheq meder be esîr

**124b**

3390 Silsiley saman Xusrew meşêwin  
Duşminan ce derd dewran medêwin

Terkê tedarik tac û text meder

Ême be esîr naşinext meker

Nemanîm zêlîl ême nakesan

Biwîm be destgîr destê nakesan

Tu ême ce muşk Ermen awerdî

Ce zeydê zamin awere kerdî

Be zarî zigar watin çûn kerîm

Dimay to dexîl be lay kê berîm

3395 Kê bo be êmdad ragey raziman

Kê bo bikêşo çûn to naziman

Be sozê esrîn be dîdey nemnak

Bergê azyetî beden kerû çak

Be abê esrîn eşkê şîn û şor

Awerden be soz zamanê nasor

Her çend laşyan be zarî esrîn

Fayideş nekerd be hâlê Şîrîn

Dest da ne gerden aman be xem da

Kerden zayıley 'ezîm be hem da

3400 Şînê restaxêz kerdişan beşal

Şîrîn be xidmet kerdişan helal

Nedarû medar dêrim direngen

Xusrew pey wînîm xatirîş tengen

Fayideş niyen yar û yaweran

Liwanîm ferzen bidew bawerân

Riwala be nerm yaweran be şîn

Be taw û te'cîl merkeb kirden zîn

125a Be zînê zerîn tekeîltûy teşal

Mînay muşreşe' sazan ce şala

3405 Rikabê zerîşamn daney diyarî

Zînpoşê zerşkêş rîşey mirwarî

Kêşan kenîzan be şîn û esrîn

Awerden we pêş merkebê Şîrîn

Şîrîn be şîwen xêza xeraman

Seylê esrîniş rêza ne daman

Ce new hem bosa dîdew destîşan

Posa dest û pay awat watişan

Şîrîn ne pêwar perdey bergê bejn

Kerdiş tedarik qetlê qeşt ce ten

3410 Dişney têxê tîz nehanî niyan

Hordaşt çenî wêş pey qeştê giyan

Penay kenîzan berdiş bey kema!

Nezanan penes exter encoman

Cellad giyaniş niya ne pêwar

Pa da ne rikab Şîrîn bî siwar

Fuţey hemamiş hewa da ce ser

Hêmmet xamiş ker ce qeşrê menzer

Watiş dewrê dîn Xuda nigedar

To manî çenî rengê rozigar

3415 Sersa! bimanî ne dewrê bêpo

Her mebo noşan neşey nîşê to

Ye watiş Şîrîn ciya bî ne ca

Pa da ne rikab ʔewan bî ne ʔa

Ŧipi kenîzan da ne pişt û ser

Ragey kes nehat mewtiş gêrt newer

**125b** Poîê bazî baz sazanê diîkêş

Çenî def û çeng awerd wist we pêş

Ne pêşê Şîrîn sazê ser serî

Newazan nexmey çaxê çemerî

3420 Şîrîn futey şerm hewa da ce ser

Bêperdey hêcab rageş gêrt newer

Be sozê sazan naîey def û çeng

Kêşa ne mabeyn şefaray xedeng

Ce berqê beyzaş ruşen bêzina

Nûrê peʔ û baî xurşîd rêzana

Ew ʔo qapî qofî gerdûn kirya waz

Pey dîne dîdar dîdey sipî baz

Fewcê melayik amaş be seyran  
Firiştanê 'erş menden be heyran

3425 Herkes dîş dîdar Şîrîn be xalın  
Liwa ne camey Mecnûnê salın

Bî we canîşîn Qeys koyê Duceyl  
Deyrî bî ne deyr ne hêcranê Leyl

Kesê mend we pa kesê sernigûn  
Kesê ne hêcran tûna bî ne tûn

Kesê şî ce hal kesê şî ce moş  
Kesê mend ne ca kesê be medhoş

Merdum ce dîniş ber liwan ce dîn  
Şêt û şeyda bîn ce şewqê Şîrîn

3430 Ce mabeynê şef wiyara be dew  
Yawa be gomez mezarê Xusrew

Merdim mewatin îne beqay jen  
Şed le 'net tamam herçê hen ce jen

126a Biwîne Şîrîn dimay kemerla!  
Şewqê şadışen ha ne xet û xal

Fuṭey hicabiş hewa da ce ser  
Sozê sazişen meşo be şewher

Zanaş Şîrîn xarê derûnrêş  
Sazişê çemrîn ha ne qeşdê wêş

3435 Yawa be qebriş merkeb da qerar  
Peya pey ce zîn Şîrîm bî midar

Esbiş da be dest kenîzanê rend  
Watiş bigêrdî merkebim ne bend

Wêş ba waweyla riwala be dew  
Yawa be gîlkoy mezarê Xusrew

Wêş sernigûn kerd ne xakê gîlkoş  
Peştan be Perwêz bo niya neboş

Yek yek ce xalan mende bê be wêş  
Ne naxûn kendiş ce nu ne cay wêş

3440 Tatayî zulfan mendey têxê têz

Be çengalê çeng horiş kend ce beş

Elwanê alat bergê renga reng

Pare pare kerd be çengalê çeng

Seriş da be seng say gilkoş da

Ten maļa ne xak xaneyê noş da

Xêza be şîwen nîşt we ser nîş

Yawa be gerdûn naļey girîniş

Eşkê esrîniş ne taf dû da

Çirîş be gilkoş xakê Xusrew da

3445 Watiş kemerlaļ fiday nawit bam

Bêdar ber ce xaw fiday xawit bam

126b Ser hordar ce xew diļazarê derd

Biwîne Şêruy şûmit çêşen kerd

Naşinext ne cat bî we cehangîr

Şîrînit be zor mekêşo esîr

Dengê xoşxanan birrî ce eywan

Nekîsa ce dest Barbod ce ziwan



Camrêzê şêwnaş kesra kerd xiraw

Badawerd şikest destefşan ne aw

3450 Şewdêz kerdiş pey Guļgûn da be tîr

Sipa û serdaran awerdiş be gîr

Xace serayan kenîzanê rend

Xaşê xulaman bendî kerd ne bend

Tacit dan ne ser nîştên ne textit

Daş be law da silsiley bextit

Cehdê cextişen Şêru şew û ro

Ha ne qeştê qîn pey manûsê to

Tazî tewaran kehlanî kemend

Bedu beħriyan kemendit nemend

3455 Qeşxanan der best qeşçıyan ferar

Mehteran mouflês qeţar û mehar

Çawişan ne bend caççıyan negîr

Xananê dîldam serdaranê esîr

Sipat sergerdan sultanan xemîn

Şahan ne şîwen şehriyar ne şîn

Korsî nişînan şendelî ce zeṛ

Xalî ce xanan tacê tawûsper

Meclês meqamat mestê camê mey

Tohî ce şadî key kiyan key

**127a**

3460 Saqîyan sergom ce camê bade

Piyaḷan peşêw nigûn fitade

Bazî baz bêdeng sazan sernigûn

Xoşxanan xemûş xeḷtan çenî xûn

Surahî sernîst qerṛa be xefte

Şîşey şeraban şahî şikeste

Sa bî şefaray seywanê eywan

Betaḷen darat dara ce dîwan

Xirawan xapûr derwazey Perwêz

Bangê badeqoş meyo ce camrêz

3465 Neqare xanan timlî tēblê kûs  
Sûrê senc saz neberdê naqûs

Kûsê gebregan şiday sencê saz  
Debdebey diho! tarê timlî baz

Mijniyu meqam xênîmê bedxo  
Hane şadî lex merg û newtê to

Sikkey zerreban zerbê şûr û şer  
Be namê Şêru da ne sîm û zer

Ha be naşinext silsiley saman  
Namê to kirya er gom ce namat

3470 Qapît qufil qeşt qatîl negîren  
Nekes ce Şîrîn emnê esîren

Ser hordar ce xaw çêşit xiyalen  
Bê to şadîw zewq Şîrîn beqlen

Meger çêş mebo carê çûn caran  
Nega key ne dûn biwînî yaran

Lehid bişkawî ce derz î ko

Ciqqet lerzan key ce berzî î ko

127b Xiroşê xeşmit binma nînewe

Ehlit ce esîr bista nînewe

3475 Xusrew fidatim ne gîr kêni

Pabesteyê bend zencîrê kêni

Ye çûn xarêwen to kerden xeşer

Ce dadê Şîrîn nedarî xeber

Ye çûn xawêwen tuş kerden xemuş

Şînê şîrînit nimeyo ne guş

Ye çûn zamîwen to pey xeşerîn

Bêzar ce dîdar dengê dişberîn

Ye çûn zamîwen penes bendenî

Diyanê dîdar Şîrîn kendenî

3480 Ye çûn derêwen ne rût bestenî

Laqeyd ce larey awat westenî

Ye çûn xawêwen to pêş xemuşî

Ce dadê Şîrîn matê medhuşî

Bêdar ber ce xaw Xusrew beharen

Feşlê fezay feyz şewqê şikaren

Xûnawê nem nem ne murxezaren

Biwîne lalay ce lalezaren

Serzemîn siyay qewsê qeharen

Xelas ce xiroş lely û neharen

3485 Kawan gılawan gulê gulzaren

Çemendan ne çax çetrê çinaren

Çemend çemendan mînge niwaren

Şrfay siya maļ dûdê dewaren

Seyranê serçêx telmît siwaren

Temennay tertîb tîpê tetaren

128a Nergisê nûknîş xonçay şikawan

Şeqey şaqayiq herdan ce kawan

Çetrê çinûran laley heļalan

Zîbê kelaļan da ne gulaļan

3490 Susey şef pêkan ce ser kişawan

Şew bo şewqîş ce leb şetawan

Berzay berzan pexşen ne xaran

Nesîmê nesrîn da ce nisaran

Sebzî çemenan lalayê terzter

Tacê tel pêkan ce zengulê zer

Zerêşanê zer dane diyarî

Mewc mido ne rûş rêzey mirwarî

Perrey gul xonçan tacê tel tebeq

Minmano zînet zîbay zerwereq

3495 Benefşe ser weş bendê êlaxan

Gul gulab be fer bulbul ne baxan

Gencê gulalın şaxay şetawan

Kinkirey qelwez tafê serawan

Feşlê şikaren bêdar be ce xaw

Xawê xeftey xak be to niyen baw

Guļwazê gulrem ne yasê xaran

Pêrê parişen ne ser diyaran

Şeqey şaxê şîn pezê puşanen

Şînê restaxêz dînê toşanen

3500 Temennay tewar tîpê tetaran

Ceylê ceyranan pay herdan haran

Şînê restaxêz xidê xoşanen

Texziyê te'zîm tîrê toşanen

128b Ahû xezañan ne herdey helet

Bêznanê gulzar geştê gulgemet

Ĥûrê muşkê nafkawê koşanen

Teqażay tekan nexşê toşanen

Weşî xezañan ne herdey ce bel

Dêwaney deyren coyarê cengel

3505 Be mûr û zarî cestê coşanen

Êntizarê reng ragey qoşanen

Zemzemey suskan ne dewirdaran

Kebkebey kebkan şobê ce nisaran

Ce'ce'ey çeçan şeb û ro şanen

Waweylay ne dîn dînê toşanen

Yahû kebûter huhuyê derddîl

Qûqûy qumriyan ce nûkê serçîl

Fexan û feryad her yahû şanen

Zayleyê zarî şînê toşanen

3510 Buļbuļan ce bağ xerîken xecîl

Bêznan bazar perdey bergê gul

Be zarî gulgeşt xunçey noşanen

Çeçan û fexan ne perto şinasen

Bûrçînê û laçîn zirîn keļawan

Sersezê şenqar suney serawan

Dirracan derdîn zamê soşanen

Çemray çemer çabê toşanen



Buĭbuĭan ce baĭ xeriken xeciĭ  
Bêznan bazar perdey bergê gul

3515 Şeĭengê Őenqar suney Őetawan  
Firreyê balbet ne rûy golawan

129a Megêlan ne burc mîna diĭ be teng

Şefay suneŐan satê ce Őed reng

Mat û melûlen her ru ruŐanen

Muntezêr be dîn didey toŐanen

Şed hordar ce xak derdînê dara

Biwîne Őefay seyranê sara

Qiwaquy quling qetarey qazan

Heway hewapeŕ ne perdazan<sup>238</sup>

3520 Qetreyê qaw qû Őînê toŐanen

Gêcê sergerdan sazê noŐanen

Tazî tewaran Őahînê Őehbaz

Terlanê çerx yuz bazar be bânaz

---

<sup>238</sup> Ev malik hatiye dubarekirin : NB

Qeşçiya fezay rence roşanen

Arezû be seyr şefay toşanen

Bidu beħriyan kiyanê kemend

Neheng merkeban beħrî best ne bend

Hewayê seyr geşt kawê koşanen

Reza be roşet zînê toşanen

3525 Xoşxanan be zar sazan be dilgîr

Kiyanan be şîn yaran be ziwîr

Meclês nişînan giftê goşanen

Çemeṛay dîdar dînê toşanen

Saqiyan sefil be camê bade

Piyaḷey piṛ mey be çeng sitade

Xace kenîzan costê coşanen

Êntizar be dîn raḡey toşanen

129b Ye çêşen Xusrew xerqê awenî

Xerîkê xamoş sextê xawenî

3530 Ye çûn xawêwen bîdarîş niyen

Ye çûn bendêwen ferarîş niyen

Bîdar ber ce xaw seyrê şefat kon

Sedaran sefil ber amanê ton

Sîpa sergerdan serdaran sefil

Xanan xerîken yaweran zelîl

Şef şef ne qapî şef den nesara

Bey şadî şîkar seyranê sara

Ciludar be zewq merkeb kerden zîn

Midran mukemel be zînê zeřrîn

3535 Carçî çawîşan tel be teplewe

Yedek be paçağ zer be zînewe

Çewgan zeřrînan nexmey neynewaz

Be çûbê zeřrîn dan ne teplîwaz

Xanê serdaran ne fewcê meydan

Bidu ne peřtaf çirît çewganan

Boqaşê qirpus terhê telawe

Be zîne zerîne taze ce lawe

Sîne bendê sîm saxtey dilpesend

Mînay moreşşe' duŕrê dane bend

3540 Rikab zerrefşan zîbê zerkarî

Paçaxê zerbaf rîşe mirwarî

Pêkan ne kelleş moreşşe' le cam

Mînay danerêz tela sîmê xam

Saqî surahî ha be çengewe

Be şîşey şerab lale renwege

130a Xoşxanan be suz xoşahengewe

Be nexmey sazan def û çengewe

Qeşçiyane çerx yuzê bazewe

Qiwaquy qişan nexmey nazewe

3545 Pey namanê to giftê goşanen

Çemeray dewran ragey toşanen

Ye çêşen ne xaw xeter nakenî

Xerîkê xamoş qeştê xakenî

Fiday namit bam kê bendit kerden

Şefay seyrê zewq ce yadit berden

Bendî hem pabend kê negîrenî

Bêzarî bêzar nexşê tîrenî

Dimay Key Xusrew serdarê Êran

Dewran bo xiraw yanet bo wêran

3550 Henî ne xêzu rengê gul ce xak

Nûkê nîşê gul xunçeş nebo çak

Nergis nemanî ne pay dermendî

Nepoşan şefay sebzî çemendan

Murxan nemanî ne roy rozigar

Ne qeţar manî ne şîwey şîkar

Mul k  me hb ban newayan we bext

 ahan be  ad  nen şan we text

Xusrew dimay bo dinya bero bad

Ne   eru manî ne   ir n be   ad

3555 Dîdem fiday zam cergê çakit bam

Xaw û xamoşî xaney xakit bam

Fiday serencam seray tengit bam

Mekanê maway tarê tengit bam

**130b** Be neyrê menzil xakê gîlkot bam

Fidayê xuşxak nîzamê nut bam

Fiday tîp û tewq şahê xanit bam

Fiday rengînî sipa û sanit bam

Nezirê tac text kemerlaît bam

Nezir ser tewqan zerrîn baît bam

3560 Fiday tenney fewcê ferîit bam

Fiday bêdaxan zerrîn baît bam

Fiday şoca'î diławerit bam

Fiday laîbexşî badawerit bam

Fiday sanê şef şedhezarit bam

Nezrê telay ter destefşanit bam

Sergerdê Şapûr be Şewdêzit bam

Be nevrê Şîrîn şekerrezit bam

Fiday bezm û rezm suzê sazit bam

Nekîsa Barbod xoşawazit bam

3565 Nevrê kenîzan eramendit bam

Ûpê xulamman perakendet bam

Fiday sextaray şehriyarit bam

Sanê silsiley ûpê tarit bam

Nevrê xelîtanî xakê xûnit bam

Sergerdê sertewq sernigûnit bam

Fiday banuwan esîr kerdet bam

Dîwanê daray betaî kerdet bam

Xusrew xiroşan xeşmê xanit bam

Serdarê serkeş serkeşanit bam

3570 Lalpoşê lalpexş xaş xiyalim ʀo

Kiyanê kawus kemerlaî ʀo

131a Şahê şîrşîkar xaziyanim ʀo

Salarê serheng key kiyanim ʔo

Diłdar û diłber diławerim ʔo

Gencûrê gencîn badawerim ʔo

Şahinşay şahan şehriyarim ʔo

Destbaz û destgîr destefşarim ʔo

Sulţanê salar mîwey berim ʔo

Şedrê serweran kilawê zerim ʔo

3575 Xaşey xulaman durr ne goşim ʔo

Kiyanê meclês badenoşim ʔo

Başê başiqey ‘ezîzanim ʔo

Serdarê şahêb kenîzanim ʔo

Bêdarim keran Key Xusrewim ʔo

Key kiyanim dar sayey serim ʔo

Mer daxanê tom key bişo ce yad

Pey Şapûrim ʔo pey Xusrewim dad

Tacim nigûn bo ntextim bero bad

Pey Şewdêzim ʔo pey Ferhadim dad



3580 Şêru şehîd bo nenîşun be şad  
Pey Şîrînim ro pey Perwêzim dad

Şîrîn bey destûr Xusrew lawina  
Faxan û zarîş tewen tawina

Herçend pey Ferhad şew çiraxê şew

Watiş neşneftiş cuwabê Xusrew

Xusrew xestey xar xerîkê wêş bê

Xeber ce efîxan feryad kêş bê

Pa best bî ne dam dewranê dîrîn

Bêzar bî ce deng diwayê Şîrîn

**131b**

3585 Şîrîn be taqî zanaş çi rengen  
Xusrew ser ne tewq seraçey sengen

Noşaniş badey mewtê medhoşî

Xerîken ne xak xawê xamoşî

Ha ne fikrê wêş xestey xeter xar

Henî pey Şîrîn nemiyo be kar

Xerîken ne xak pa besten en bend

Mestê medhoşen ta hezar û end

***Bena Kerdênê Şîrîn be Qetlê Xod***

Cew dima Şîrîn xêza bêendêş

Kerdiş benay qeşd perî qetlê wêş

3590 Dest da kêşaş têxê dişnetêz

Peştiş mehkem kerd ce xakê Perwêz

Nûkiş kerd neyan nîşîş winara

Ser kerd ne baļay sernîşê xara

Dişney jaralû xênîmen xêza

Kêşaş ser midaş ziwaney qeza

Mewdayê têxtêz nîşê tazesaw

Midra muntezêr mexzê mûşîkaw

Elmasê abdar xarê pişxeter

Xêza ce nûkiş şerarey şerer

3595 Mewdaş mû mekerd ce jarê erqem

Medruşa be suz çûn şerarey şem

Xêlê cor'eten kesê be wêş da  
Biden cergê wêş be nûkê nêş da

Şîrîn bew destûr têxiş winara  
Toxmê tènexiş derûniş kaļa

132a Kerdiş serencam celladê karî  
Keft ne dewrê têx be şîn û zarî

Ce xewfê sernîş canê cuwanî  
Hêmmet xahêş kerd ce dûnê fanî

3600 Watiş dinyay pûç dewê dûna dûn  
Zemaney zebûn bêşert û bêşûn

Çerxê çepîgerd dûnê bada bad  
'Erûsê bêşert her ڤo ne damad

Dewrê bêbinyad be tay ڤencerō  
Mayey bênezac bêtan û bêpo

Kê bo nekêşu êş û rêşê to  
Kê bo nenoşo neşeyê nîşê to

Kê ta ser ne samî çerxit nîşt be şad

Tac ûtext û bext kêt neda we bad

3605 Kêt nekerd xemîn xelîtan çenî hûn

Kêt be ser ender nekerd sernigûn

Dinya noşanoş neşey nîşê to

Kê bo nenoşo neşey nîşê to

Dewranê fanî Xuda nigedar

Ha meşon ce reng ragey rozigar

Ba rojê ruşen kerîm be zolmat

Ser berîm ne say siyahî memat

Ser birîm ne san serdî sengewe

Tek deym ne tekyey tarê tengewe

3610 Bimanîm ne dam bendî bestê bend

Na xakê xûnxar ta hezar û end

Belê dimay min berdit beru bad

Çerxit nigûn bu ne nîşî we şad

132b Dimay Key Xusrew kemer kiyanî

Nemanî be şad dewranê fanî

Ye watiş Şîrîn şeyday bêdirêx  
Ama bêaman perî têxtêz

Perçaf best ba taw xêza ne hewa

Qedrê ce sîney zemîn bêsewa

3615 Bilind bê ne berz xêza be axêz

Ama ser ender perî têxtêz

Sîney cergê wêş ne axêz

Da be nûkê nîş dişney têz da

Kizeş da ne cerg nîşê mûşikaw

Dirîş cergê diî têxê taze saw

Nûkê sermuday sengê saw tazeş

Mewdaş ber liwa ce mohrê mazeş

Sernûkê nîşîş ce piştîş ber şî

Nimanaş birqey berqê ateşî

3620 Gim bî ne cergiş dişne ta beheşt

Kêşa ziwaney ziyadiş ce pişt

Ce qirçey xencer şirbeyê xêxûn  
Şîrîn şî ce ha! kirya sernigûn

Ce tawê dişney jaralûdê jar  
Ce zeberdê zerb nûkê nîşxar

Biruskey ahir şerer keşîdeş  
Berqasa berşî ce dînê dîdeş

Zîrnaş be zar Şîrîn bew zeberd  
Ser kerd ce cergiş qetrey zux û zerd

3625 Quqnaş we hem kîsey waxê derd  
Zuxaw û zamit ne cergiş ser kerd

133a Tek tek zuxê zerd qetranê qîrîn  
Coşa serwaz kerd ne cergê Şîrîn

Zuxaw û Xusrew cefta wîney ceft  
Xiroşa ne di! wîney qîrê neft

Xunaw û Xusrew zuxan û sa!an  
Kîna ne derûn çûn law û ha!an

Xêza xiroşan xûniş bêmidar

Ne zamê dişney jaralûdê jar

3630 Xûniş xiroşa ne cergê pare

Şanaş wîney fewcê fer fiware

Xeştan bî xûn ce ser ta we paş

Çûn gêcê gerdab kolîş best ce laş

Fiwarey xûniş ser kêşa be ewc

Ne dewrê Şîrîn mewciya be mewc

Çûn tafê qelwez haław ne dû da

Ama be gişkoy xakê Xusrew da

Şîrînê Şeyda gina sernigûn

Zencîrey zulfiş masiya be xûn

3635 Gunay gulķemet şu'ay şux û şeng

Ce xûn qirmiz bî we laley fireng

Be yanê sîneş ce xûnê gulnar

Qirmiz bî ce xûn çûn sîbê xanar

Zulfanê zencîr naxûnê serçeng

Řijya rengîn bî ce xûnê sêweng

133b Peştan bî Şîrîn nigûn be nu da  
Na xakê gîlkoy xanê Xusrew da

Zêrnaşê Şîrîn naļa we bêkes  
Keft ne xirxirey nezxê nîmnefes

3640 Murxiş ce qotuy qefes perwaza  
Ce şedrê sîneş nexmez newaza

Bayeqoşasa wend ne wêraneş  
Çûn hudhud berşî ce lêzê laneş

Rohiş řiwala rewaniş be nerm  
Erwaş ser niya ne sewday sitem

Kasey piyaļan dîdeş keylê xûn  
Baļa mijaniş ser kerd sernigûn

Camê cemîniş gêliya ce reng  
Şefafê sîmaş siya be sêweng

3645 Cemîn camiş dîriya be derd  
Že‘îf bî ce reng ze‘feranê zerd



Bêdeng bî ce deng ce alištê naz

Medhoş bî ce hoş ce rêzanê raz

Qabiz ne qeştiş be te'cîlê tar

Ne şedrê sîneş çengiş da qerar

Kêşaş bikêşan cergiş ce ciger

Rîşey rek ce ten ce pa ta be ser

Be qeştê qatîl qebzê rohiş kerd

Şebtê defter bî be katib siperd

3650 Belgiş ce derext rêza ce rezan

Bendiş bî ciya kinya çûn xezan

Fariş bî ce nêş dûdî daxê derd

Laşey qametiş bî ce sengê serd

134a Serkem bî Şîrîn be zux û zaman

Kêşan canîrey namiş ce naman

Ecîl daş ne dem badey bêhoşî

Ser berd ne xaney xawê xamoşî

Menziļ berd ne xak mergiř bo memat

Ne zêrê zulumat ragey kesnehat

3655 Bazarê binyad dinyař bî beřaļ

Poř niya ne boy giļkoy kemerlaļ

Bî be dastan perî pîrê pend

Nezmê nîknamiř ta hezar û end

řerê řîrîn mend ta be qern û yam

řîrîn mend be řer řêru bî bednam

*Xeberdar řodenê Kenîzan Ez Haļê řîrîn We Reftenê ber Seraw*

Biřno ce yaran kenîzanê rend

Menden muntezêr řenî espê bend

Herçend kerden řebr be řîn û řeyda

Dîn řewqê řîrîn hiç niyen peyda

3660 Diřan piřya deng diļgîr û zariř

Namaniř be guř zêrey zigariř

Yaran be yek ca řiwalan be dew

Liwan ne gomez mezarê Xusrew

Dîn Şîrînê şux keften sernigûn

Elweday elwan ser ta pa be xûn

Mişanu meyu xûniş ne dû da

Peştanen ne bejn xakê Xusrew da

Xalaniş be xûn kerden be zoxal

Roşîş siperden mewaçî şed sa!

**134b**

3665 Herçend çirîn lêş kemend dirazan

Nebîş haz û hêz nama be razan

Niyen be goftar be deng û diwan

Roşîş ber liwan nama be ziwan

Dîşan mewcê xûn ne çalê tîniş

Mûran mewyeran ne bendê bîniş

Dişney taze saw xerqen ne cergiş

Xiroşanê xûn meyo ne bergiş

Roşîş perwazan wefatiş kerden

Mewaçî Şîrîn şed sa! len merden

3670 Kenîzan yek bar be dadê bêdad  
Kêşan bangê berz feñan û feryad

Zêrînan be zar be dad û zarî  
Xiroş û xewxay berzê diyarî

Yek car xelayîq riwalan be dew  
Aman û gumez mezarê Xusrew

Aman dîn Şîrîn keften sernigûn  
Ser ta pa elwan xelîtaney be hûn

Kesê ser ne gil kesê xak we ser  
Xêza restaxêz çûn rojê meşer

3675 Yeçey şed pare bergê beden çak  
Rêza be ser da gîlkoyê xuşxak

Xêza zelalet zarî şûr û şîn  
Yawa be Şêru ehwâlê Şîrîn

Riwalan be nerm yaranê dilrêş  
Halatê Şîrîn watişan perêş

Şêru şineftiş ce Şîrîn hewal

Tawiya ce taw bî be koy zuxal

135a Tewasa ce taw satê şî ce hoş  
Xêza xiroşa be xewxay xiroş

3680 Riwala be nerm be eşkê esrîn  
Be şîn û şeyda yawa be Şîrîn

*Amedenê Şêru ber Serê Şîrîn Der Haletê Nezî*

Dîş Şîrîn ne xak Xusrew nigûnen

Ser ta paş ne xak xeletanê xûnen

Be çengê naxûn wêş şed pare kerd

Naîa û nirkinaş kêşa ahê serd

Awerd ne daman yeqeq ta kemer

Wêş niya ne gil ce pa ta be ser

Ce zarî zigar be suz û nalîş

Fexan û feryad amaş we balîn

3685 Be eşkê esrîn dîdey diî ne coş

Hordara sereş niya ne axoş

Dişney têxê têt kêşa ne cergiş

Diya be elwan xûnîn bergiş

Zuľfaniş molimman masiyan be xûn

Kasey çemaniş kerden lalegûn

Mujgan û ebruş wiľawan çîn çîn

Biyen be peykan xedengê xûnîn

Camê cemîniş bayzay cehangîr

Ce xûnê qirmiz qetranen çûn qîr

3690 Lebanê laľiş mewcê serdarî

Biyen be ‘eqîq perrey gulnarî

Saqê surahî sîney sipî laľ

Beyan xerqê xûn çenî zulf û xal

135b Qubbey qendîlan lîmuy şemamiş

Mecoşiyoy xûn ne cergê camiş

Şêru be şîwen her çend lawinaş

Zarîş cergê sext siya tawinaş

Çirriş be dişber be zarî ziwan

Şîrîn be Şêru naman be ziwan

3695 Çend bosaş gonay cemîn camaniş

Dim niya ne cay zux û zamaniş

Bo niya ne buy zamê suşewe

Her dem menyera bu we buşewe

Busaş be zarî destê damaniş

Be leb melêt zuxê zamaniş

Her çend kerd Şîrîn nama be razan

Xeste bî xar sernîşê gazan

Ce mewtê merden nebîş haşê hoş

Mewtê medhoş bî ne xawê xamoş

3700 Zanaş be taqî mewtiş ne mergen

Sernîşê mewdaş ne coşê cergen

Nezmiş nemenden ce dûdê dêrîn

Şêru umîdiş birrya ce Şîrîn

Be aqî zanaş ne roy rozigar

Henî didariş nimeyo be kar

Destê Şîrîn gêrt be mûr û zarî

Be bang û feryad berzê diyarî

Watiş ey Şîrîn şay newnehaan

Kerdîm be xûnî şay kemerlaan

3705 Riswa bîm ce yam perî rozigar

Kerdem xeay xûn bîm be zinakar

136a Textê Xusrewim çûn da be taan

Kerdim be watey wat watê saan

Silsiley saman kerdim sernigûn

Sipaw serdaran kerdim tûn be tûn

Mîraşê Xusrew her çend mend perêm

Dam be law da wêm be destê wêm

Ba boy wêm be têx kerdim sernigûn

Xusrew be xencer xetan çenî xûn



3710 Bîm be wazgoft be serjanê bend  
Ha mend ʔiswayîm ta hezar û end

Hamim menşûr bî ne ʔoy ʔozigar  
Waçan bednamîm Şêruy zinakar

Şîrîn her çîm kerd to penem kerdî  
Gonay ‘eşqît bê ce ʔagem berdî

Herçê bî ce derd ‘eşqê to kerdem  
Bîm be serzenişt serjanê merdom

Herçê to watit mawerdim be ko  
Ane şertê min îne şertê to

3715 Mîraşê babom ce destim berdî  
Axêr ‘aqêbet pêse pêm kerdî

Hem Xusrew be men xeļtanê xûn bî  
Hem Şîrînê şux ce destim ber şî

Hem sipay hemsan hem serw û hem mal  
Hem Banûy Şîrîn hem şay kemerlaļ

Namerdit keran we ser neberdî

Ye pey çêş be wêt pose pê m kerdî

Sewday siyaset be wêm nimanam

Kê meyo be dad hawarê hanam

**136b**

3720 Bed ce bed beter bada beyo pê m

Gonay kes niyen wêm kerdim be wêm

‘Elacim êden wêm bidem be kuşt

Fariş bim ce renc dinyay zîb û zîşt

Wer ne be hiç reng nimebo çarim

Watey wazgoft sernîşê xarim

Wêm sernigûn kem ne rûy yasê xar

Xelas bim ce tîr ta ney rozigar

Hawarê bêhûy ser û maîê men

Xenîmê xûnrêz kemerlaîê men

3725 Rîsway rozigar pendê yemê men

Hem şermendgî şûm hem bednamê men

Xûnî xeşakar xiyalê xamê men

Bî berî ce dîn cemîn camê men

Şûmê şermendey şermisarê men

Cergê cigerrêş nîşê xarê men

Pa bestê bendî bendê damê men

Rencey rozê dîn diłaramê men

Hey dewranê dîn dad ce destê to

Kiyanê kawûs kemerlałim ڤo

3730 Feryadim ce dad dinyay ڤence ڤo

Pey şapûrim dad pey Şewdêzim ڤo

Hey hana kiyay Key Xusrewim ڤo

Perî kesram dad pey camrêzim ڤo

Sa kerdem saman serencamê to

Şehriyarê şahî key kiyanim ڤo

Destim berêz û qetlê kiyani bo

Serdarê serkeş serhedanim ڤo

137a Şêru hey ce zur birêz û destit

Be têxê elmas be keran qeştit

3735 Gerdûnhay çerxit negêlu be şad

Badeban geşt keştît bero bad

Cehan hey cilûs coşt beta! bo

Kawê kiwanit wekuy zuxa! bo

Simahay seqam semat xeraw bo

Sitaret sergem kêşa gerdaw bo

Zemnehay zînet zîbay zebûn bo

Bazarit be tuf tûfannigûn bo

Xurşîdhay xiroş keştît negîr bo

Birûzê beyzat qeharê qîr bo

3740 Neçrad hey nîzam nerdît we gerd bo

Nişanê şestit rêzey ziberd bo

Çarehay êqbal 'eqlit zebûn bo

Tedbîrê ta!ey taştngûn bo

Dîdehay dîdar dînit zulumat bo

Bênayît ne mewt mergê memat bo

Çemenhay ciger sebzit siya bo

Lalay lalezar siftey giya bo

Melanhay meqam nexmet melûl bo

Qotuy qefesgat ne tengê tûl bo

3745 Dimay Key Xusrew dinya bo qehar

Dewran bo be gîc kewlê zirêbar

Ce dimay Şêru Şîrîn diłber

Dinya bo zûlmat zîriş bo ziber

Hem tufê tûfan ce new diyar bo

Zilziley axir çûn ewel car bo

137b Dimay kemerlağ dinya bero bad

Dewran bê Şîrîn nenîşo be şad

Îse çêş kerûn min bey zamewe

Bey zamê bednam řisway yamewe

3750 Herçend kerdiş daw be eşkê esrîn

Dengê delalet neşineft ce Şîrîn

Şîrîn xerqê xûn bédeng û diwan

Be şehdê Şîrîn nama be ziwan

Şêru dîş Şîrîn xariş ne cergen  
Zanaş be taqî ne mewtê mergen

***Dîwane Şodenê Şêru we Reften be Kûh***

Şêt û şeyda bî derdînê dara  
Riwala be nerm rûş kerd nesara

Dengê waweyla be dad ʀo ʀo  
Dêwaney deyrî rû niya be ko

3755 Ne şûnê Şêru xiroşa sipa  
Tawdanê tekawer qetire dan we pa

Kerden cehtê cext her take tawan  
Ha wîn bîn ce dîn penes neyawan

Yawa ne cayê xarê xaîrrêş  
Îse qetilgay Şêru maçan pêş

Rûş niya ne kaw yasê koy kemer  
Riwala be nerm tawiya ce ser

Yawa be ser koy xarê wermoxar  
Ne taşê tawîr qoley şed hezar

3760 Hêmmetxahî dîn dinyay zebûn kerd

Be taşê tûş da wêş sernigûn kerd

**138a** Hewa best ne taş tûşê serender

Muleq da ne mewc şedrê Sikender

Ama sernigûn şedrê Sikender

Ne taşê tawîr şafê serender

Kongrey kilûz xarê muxaran

Ca yasê yasîn hezar hezar

Ey taşê bew taş î sengê bew seng

Piraş bî ne taş tûşê ebleq reng

3765 Ser da be tawîr ten be xalân da

Xûniş çûn qelwez hat be haşan da

Pare pare bî ne rûy tûşê taş

Rêzan rêziş bî be şed piraş

Rêze rêze bî be nîşê xarî

Her peliş bend bî be şed diyarî

Qeļwizey xûniş çûn seylê saļan  
Ama kongireş çûn lawê maļan

Rêza rêzey xûn gulgolî be seng  
Taşê tawîran kerd be lale reng

3770 Hûniş lawiş best be qeļwezan da

Rengîne şîwey xanê xezan da

Her pelê pustiş ne ser diyari

Her zerrey kuştiş be nişê xari

Parey ce rêze rêzaniş be qeşt

Ama keft ne xak neqşê zemîn best

Sipaw serdaran yawan ne kariş

Dîşan nemenden eşlê aşariş

Her pelê pustiş keften ne cayê

Her zerrey guştiş keften ne layê

**138b**

3775 Her yek ne layê hucûm berdişan

Her peliş ne cay peyda kerdişan



Gêlay ne perdey kanê kawê kust  
Rêzey sixaniş hor çiniyen be pust

Niyan ne kîse besten be xarî  
Hordaşten ce xak be şîn û zarî

Be dad û feryad be eşk û esrîn  
Awerden be lay tabûtê Şîrîn

Kerden şûr û şîn her take tawan  
Çemrî ne çerx gerdûn wiyaran

3780 Sipaw sulţanan xanê xulaman  
Şahî şehriyar kîtî kiyanan

Kesê ser ne giş kesê xak ne ser  
Kerden restaxêz be rojê meşser

Zarî şûr û şîn fehanê feryad  
Kesê pey Xusrew kesê pey Ferhad

Kerden şînişan be eşk û esrîn  
Kesê pey Şêru kesê pey Şîrîn

Dimay şûr û şîn be zerbê zerûr

Daşan xesil xusl be şedrê kafûr

3785 Her wek hem dokan ne mekanê new  
Niyane pehluy mezarê Xusrew

Ferzendê babo herem çenî hem  
Tekye dan be teng seray tarê tem

Yaran be zarî be dîdey nimnak  
Serweran be hem siperden be xak

Noşan badey cam mewtê medhoşî  
Serniyan ne xak xawê xamoşî

139a Bendî bî ne bend pabest new kemend  
Menden mehu mat ta hezar û end

3790 Ne tengê tarîk damê bêder da  
Lehafê gilko kêşan be ser da

Tek dan ne tekyey tengê tarewe  
Ne xakê xûnî adem xarewe

Dest ce xaş gest dewran horkîşan  
Keften ne sewday bazarê wêşan

Berden serencam sefaşan we ser  
Yawan bew heşab mîzanê meşşer

Bişno ce sipay xênîmê xûnxar  
Çi rengê kerden dimay şehriyar

3795 Dimay Key Xusrew pirdaxê Perwêz

Xêziya tûfan şînê restaxêz

Cew şah cilûs kerd meşafê merdan  
Şîwiya şurşit bî be şa gerdan

Şûr û şer ba şar şeytan keft ne dewr  
Bî be şerê şûr zurdarê bêzur

Xiroşan be xeşm xananê xayin  
Coşan kerdişan tîpan be tayin

Sulţan serdaran midram miqabil  
Çenî sipaw san kînê qîn ne dil

3800 Kerdişan be hem şolh û selamet

Niyan be nay bed be qetl û xaret

Watin wîn Xusrew çêşiş kerd pêman

Ha dinya biyen be kamê wêman

Nemenden newey neşlê kiyani

Nigûn bî ne xak xemoşê fanî

Meydan xaliyen firseten peyman

Bada bistanîn qeşaşê wêman

139b Henî hewaşan ce kê bipersîm

Xunman ce kê ce kê bitersîm

3805 Ce çîwar canib kerdin cişurêz

Dîşan sipaw san neberde Perwêz

Berdişan hucûm heyahû be dew

Rêzan new herem hicabê Xusrew

Be dîl û destax meberdin be dew

Mekerdin feryad hana be Xusrew

Xîme xiyaban kerdişan tarac

Wîney radaran megêrtişan bac

3809 Hezaran dirûd hezaran selam

Zi ma ber Muḥammed 'eleyusselam

## ENCAM

Di dawiya vê xebata teza xwe de em dixwazin tesbîtên ku me bi dest xistine, nîşan bidin û rêz bikin.

Elmas Xanê Kendûleyî di edebiyata Kurdiya hewramî de yek ji wan şa'iran e ku bi berhemdariya xwe derdikeve pêş. Bi vê hêla xwe ve ji bo dîroka edebiyata kurdî ya sedsala XVIII. xwediyê cihekî girîng e. Kendûleyî bi taybetî bi mesnewiyên xwe yên hemase wekî *Şahnameya kurdî* di nava Kurdên Rojhilatê de hatiye nasîn. Ji Elmas Xanê Kendûleyî gelek berhemên edebî gihiştine serdema me. Ev berhem ji destanên muxtelîf pêk hatine wekî *Rustem û Sohrab*, *Bijen û Menîjê*, *Heftxwanê Rustem*, *Rustem û Esfendiyar*, *Zehhak û Kavê Ahenger*, *Behmen û Feramerz*, *Rustem û Şexad*. Ev yek jî tesîra *Şahnameya Fîrdewsî* nîşan dide li ser Elmas Xanê Kendûleyî.

Me di vê xebata xwe de destnîşan kir ku destxetên berhemên Elmas Xanê Kendûleyî li pirtûxaneyên Îranê, Ewrûpa û li pirtûxaneyên şexsî yên Kurdên Rojhelat û Başûr hatine parastin. Nusxeyên van berheman bi gelemperî li pirtûkxaneya Meclîsa Şûreya Îslamê ya Tehranê û li Pirtûkxaneya Berlînê ya Dewletê cih digirin. Nusxeyên *Nadirname*, *Xusrew û Şêrîn*, *Ferhad û Şêrîn*, *Xawer Zemîn*, *Mûş û Gorbê*, *Xurşîd û Xireman*, *Heft Leşker* û *Siyaveşnameyê* wekî destxetên dijîtal hatine bidestxistin û li gorî van nusxeyan me nasandina berhemên vî helbestvanî kiriye. Heta niha nusxeke *Xawer Zemînê*, nusxeke *Heft Leşkerê*, du nusxeyên *Xusrew û Şêrînê*, sê nusxeyên *Ferhad û Şêrînê*, sê nusxeyên *Mûş û Gorbê*, sê nusxeyên *Siyaveşnameyê*, pênc nusxeyên *Nadirnameyê* û şeş nusxeyên *Xurşîd û Xiremanê* kunyeyên wan hatine dayîn. Ji bo xebatên edîsyon-krîtîkê tesbîtkirina van nusxeyan giring e, ji ber ku ji bo xebatên dahatûyê dibin bingeh.

Elmas Xanê Kendûleyî Xusrew û Şêrina xwe bi pîvana kiteyê nivîsiye. Di vê herhebê de helbestvan li gorî tredîsyona klasîk tevger nekiriye. Beşên weke mihracname, ne'at, sebebê telîfê, methiye ji bo mîr an jî şahê wê serdemê, fexriye nehatine nivîsîn di vê berhemê de. Helbestvan ji bo yeknesakiya mesnewiyê bişikîne di navbera beşan de xesel an jî qesîde nenivîsîne. Ev yek jî nîşandide ku Elmas Xanê

Kendûleyî ji tradîsyona klasîk dût û bi awayeke azad ev berhem kişandiyê nezmê. Helbastvanê vê berhemê di warê serwaya lewaz de tê dîtin ku gelek serkeftî ye, carna bênavber bîst malik bi vê cureya serwayê mesnewiya xwe berdewam kiriye.

Elmas Xan ji hêla naveroka çîroka Xusrew û Şêrîna xwe ji ya Nîzamiyê Gencewî û Xanay Qubadî hin cudatî nivîsiye. Wî cih nedaye lehengên weke Mehîn Banû. Şêrîn bi xwe melîka Ermenê hatiye teswîrkirin. Şapûr wezîrê Fexûrê Çînê hatiye diyarkirin. Di berhema Gencewî û Qubadî de weke nedîmê Xusrewî derbas dibe.

Ziman û uslûba Elmas Xanê Kendûley di navbera gelêrî û kasîk de maye. Helbestvan carna ji hêla vegotinê ve formula destanên gelêrî bi kar anîye. Îfadeyên weke “Bila destana Şîruy li vir bimîne” dibêje derbasê mijareke din dibe. Ev jî yek ji taybetmendiyên destanan e. Elmas Xan weke hevçerxê xwe Xanay Qubadî ji îqtîbasan îstîdafa nekiriye. Têgehên dînî di çarçoveya baweriye de bi kar neanîne. Zimanê wî herekbar e. Ji tewîswîran gelek sûd vegirtiye. Teşbîh, telmîh û alîterasiyon weke hunerên edebî di mesnewiyê de zêde cih digirin.

## ÇAVKANÎ

A.B. Mardoukhi, (1998), *Anthology of Goranî Kurdish Poetry*, (Edited by Anwar Soltani), London.

Aktaş, Hasan, (2005). *Klasik Türk Şiirinde Edebî Sanatlar*, YSY, İstanbul.

Amêdî, Sadiq Bahaeddîn, (2012). *Rêzimana Kurdî: Kurmanciya Jorî û Jêrî ya Hevberkirî*, (wer. M. Xalit Sadîni), Dîwan, Stenbol.

Aslanoğlu, Osman, (2019). *Guherina Dengan Di Kurdî (Kurmancî, Soranî û Zazakî), İngilîzî û Farisî De*, cild 4 jimar 12 sal 6.

Baran, Bahoz, (2012). *Rêzimana Kurmancî*, Belkî, İstanbul.

Bedîrxan, Celadet Elî û Lescot, Roger, (2009). *Kürtçe Gramer: Kurmanci Lehçesi*, Avesta, İstanbul.

Bedlîsî, Şerefxan, (2007). *Şerefname*, (wer. Ziya Avcı), Avesta, İstanbul.

Begzade, Xelîl, (1394). *Siyaveşnameya Elmas Xanê Kendûleyî Kêrmanşahî*, Neşrê Yardaniş, Tehran,

Bin Bel'emî, Ebû Elî Muhammed bin Muhammed, (1353). *Tarîxê Bel'emî, Be Teshîhê Muhammed Teqî Behar ve Be Kûşêşê Muhammed Pervîn Gonabadî*, c. I, Zêvar, Tehran.

Borekeyî, Sedîq Sefizade, (1997) *Mêjûy Wêjey Kurdî*, cild 2, Weşanên Nacî, Banê.

Cebecioğlu, Ethem, (2009). *Tasavvud Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü*, Ağaç kitabevi Yayınları, İstanbul.

Celîl, Celîlê, (2004). *Keşkula Kurmancî*, Coc, Wien.

Çeper, Ramazan, (2020). *Kürt Mitolojisi Sözlüğü*, Aryan, Ankara.

D. Hewremanî, (2007). *Ferhengî Aryanvac: Kurdîy Kon û Kurdîy Niwê (Bergî yekem, duwem û sêyem)*, Çapxaney Wezaretî Roşenbîrî, Hewlêr.

Dilçin, Cem, (2013). *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, TDK Yayınları, Ankara.

Dînawerî, Mîrsadiq, (2012). *Mel Name*, (amd. Sedîq Sefizade Borekeyî), Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr.

‘Ebbas, Xelîliyan, (1380). *Ferhengî Başûr*, Persiman, Tehran.

Ebdulfettah, Deham, (2011). *Kar (Lêker): Di Zimanê Kurdî De (Kurmanciya Jorîn)*, Enstîtuya Kurdî ya Amedê, İstanbul.

Ehmed Bêgê Komasi, (1389). *Dîwana Xaloy Komasi*, (amd. Hekîm Mela Salih), Kurdistan, Senendec.

Ehmedî, Cemal, (1395). *Tarîxê Edebiyatê Kurdî: Ez Aqaz ta Cengê Cehanîyê Evvel*, Êntêşaratê Goher, Seqqiz.

Ela'eddîn, Seccadî, (1389). *Mêjûy Edebî Kurdî: Mêjû, Edeb, Zanyarî*, kurdistan, Senendec.

Emînî, Muhammed Reşîd, (1397). *Keşkulî Şa'iranî Hewreman*, Êntîşaratê Kurdistan, Snendec.

Emînî, Muhammed Reşîd, (2010). *Şahnameya Kurdî Hewramî*, Weşanên Silêmaniyê, Silêmaniyê.

Emînpûr, Salih, (1394). *Ceng û Diplomasî Ber Serê Teqşimê Kordistan: Berrêsiyê Tehlîlî Moqedemat Taqşim Şodenê Kordêstân Der Beynê îran û 'osmanî(1500-1850)*, Têhran, êhsan, 1394.

Enverî, Hesên, (1382). *Ferhengê Bozorgê Soxen* (8 c.), Soxen, Têhran.

Enverî, Hesên, (1382). *Ferhengê Fêşordê Soxen* (2 c.), Soxen, Têhran.

Êsî, M. Huseyn û yên din, (2012). *Wergera Maneya Qur'ana Pîroz Ser Zimanê Kurdî*, Weşanên Nûbiharê, İstanbul.

Etar, Muhammede bîn Îbrahîm, (1388). *Mentiqu't-Teyr*, (amd. Muhammed Riza Şefî'î), Soxen, Têhran.

F. Steingass, (1930). *A Comprehensive Persian- English Dictionary*, Second Edition, London.

Feyzîzade, Taha, (1364). *Nobar: Kelaleyek Bo Qamûsêkî Zarewey*, Êntêşatarê Seda û Sîmayê Comhûrî Êslamî, Têhran.

Fîrdevsî, (2020). *Zaloğlu Rüstem*, (çev. Nimet Yıldırım), Kabalcı Yayınları, İstanbul.

Gencevî, Nêzamî, (1385). *Êqbalnamê*, (amd. Se'îdê Hemîdiyan), Qetrê, Têhran.

Gencevî, Nêzamî, (1387). *Mexzeli'l- Estrar*, (amd. Se'îdê Hemîdiyan), Qetrê, Têhran.



Gencevî, Nêzamî, (1387). *Heft Peyker*, (amd. Se'îdê Hemîdiyan), Qetrê, Têhran.

Gencevî, Nêzamî, (1387). *Leyl û Mecnûn*, (amd. Se'îdê Hemîdiyan), Qetrê, Têhran.

Gencevî, Nêzamî, (1388). *Şerefnamê*, (amd. Se'îdê Hemîdiyan), Qetrê, Têhran.

Gencevî, Nêzamî, (1390). *Xosrev û Şîrîn*, (amd. Se'îdê Hemîdiyan), Qetrê, Têhran.

Gencevî, Nêzamî, (1988). *Hûsrev ve Şîrîn*, (Çev.:Sabri Sevsevil), MEB Yayınları, İstanbul.eyn

Gocerî, Emîn, (1373). *Şîrîn û Ferhadê Elmas Xanê Kendûlyî*, Neşrê Sîna, Qom.

Heme Baqî, Muhemmed, (1395). *Emîrnêşînhayê Erdelan, Baban û Soran: Der Êsnadê Qacarêyyê*, (wer: Mes'ûd Sehîlî), Kanî Kitêb, Senendec.

Hesen Begî Kanîaw, (1395). *Mendey Zemanê: Keşkolî Hesen Begî Kanîaw*, (amd. Necmedîn Cebarî), Danêşgahê Kordistan, Senendec.

Hîsamî, Hacî Şeyx Hamid, (1382). *Yadî Şa'iranî Kurd*, Rostem Xay, Taran.

İpekten, Haluk, (2005). *Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz*, Dergah Yayınları, İstanbul.

Kakayî, Herdewêl û Xeyat Kerwan 'Usman, (2017). *Keşkula Germiyan*, Şiwan, Sine.

Kambîzqasrî, Muhemmed (1390). *Omerayê Erdelan*, Kurdistan, Senendec.

Kendûleyî, Elmas Xan, (1373). *Hikayetê Ferhad û Şêrîn*, (amd. Emînê Gocerî), Weşanên Sîna, Qom.

Kendûleyî, Elmas Xan, (1395). *Berzûnamêyê Kurdî*, (amd.: Celîl Ahengernejad), Kurdistan, Senendec.

Kendûleyî, Elmas Xan, (2010). *Xurşîd û Xireman*, (amd. Ferhad 'Êzetîzadê-Mes'ûd Qenberî), Jiyakurd, Kêrmaşan.

Kendûleyî, Elmas Xan, (2012). *Şanameyê Kurdî: Dastanê Rostem û Zorab*, (amd. Siyaweş Goderzî), Aras, Hewlêr.

Kerîmpûr, Kerîm, (1390). *Destûrê Zebanê Kurdî Kêrmanşahî: Kelhorî*, Neşrê Kerîm Kerîpûr, Kêrmanşah.

Kerîmpûr, Kerîm, (1392). *Destûrê Zebanê Tetbîqî gûyêşhayê Zebanê ba Zebanhayê Îranê Bastan: Badînan, Soran, Goran, Kelhor, Lek û Lor*, Neşrê Kerîm Kerîpûr, Kêrmanşah.

Kulyayî, Mîrza Şefî‘, (1382). *Ferhad û Şêrîn*, (amd. Seyyid Muhemmed Huseynî), Neşrê Tewekkulî, Têhran.

Kurdo, Qanadê, (2013). *Rêzimana Kurdî: Kurmancî-Soranî*, Nûbihar, İstanbul.

Mackenzie, D.N, (1393). *Gûyêşê Hewramî*, (mtc.: Muhemmed Sedîq Zahidî), Neşrê Panîz, Senendec.

Malmîsanij, M., (2013). *Kürtçede Ses Değişimi*, Vate, İstanbul.

Malmîsanij, M., (2015). *Kurmancca ile Karşılaştırmalı Kirmancca (Zazaca) Dil Bilgisi*, Vate, İstanbul.

Mehmûdî, Mohemmed, (1394). *Ferhengê Coxrafyayê Horaman: Vîjêgîhayê Coxrafyayî, Êctêma’î ve Êqtêsadî Bê Hemrahê Şênasnamê Sêkûnetgahayê Horeman, Êntêşaratê Kordestan*, Senendec.

Menberî, Tewfîq, (1390). *Ferhengî Ahûrayî: Hewramî- Soranî*, Têhran, Neşrê Êhsan.

Menûçêhrî, Cemal, (1390). *Şiney Hewreman*, Aras, Sine.

Mewlana Mela, Mustefa, (1395). *Dîwana Bêseranî*, (amd. Ebdullah Hebîbî), Kurdistan, Senendec.

Mîrza Ebdulqadirê Paweyî, (1396). *Dîwan*, (amd. Muhemmed Reşîdî Emînî), Kurdistan, Senendec.

Mîrza Şêfî’ê Paweyî, (1383). *Şêrîn û Ferhad*, (amd. Seyyid Muhemmed Huseynî), Nuqrê Abî, Tehran.

Mo’în, Mohemmed (1389). *Ferhengê Faresî* (6 c.), Neşrê Sêrayêş, Tehran.

Moderrêsî, Fatêmê, (1385). *Ez Vac Ta Comlê: Ferhengê Zebanşenasî-Destûrî*, Çapar, Tehran.

Muhemmedî, Muhemmed, (1396). *Ferhengê Coxrafyayî: Hewreman, Êntêşaratê Kurdistan*, Senendec.

Nawxoş Begir, Selam, (2012), *Ferhengî Herze: Ferhengî Kurdî-Kurdî*, Hacî Haşim, Hewlêr.

- Ocak, Nezîr, (2014). *Waneyên Rêzima Kurmancî*, Sitav, Van.
- Onay, Ahmet Talat (1996). *Eski Türk Edebiyatında Mazmunlar*, MEB Yayınları, Ankara.
- Onay, Ahmet Talat, (2019). *Açıklamalı Divan Şiiri Sözlüğü*. Haz. Cemal Kurnaz, Berikan, İstanbul.
- Ölmez, Cumhûr û Valî, Shehab, (2022). *Mem û Zîna Hewramî*, Nûbihar, İstanbul.
- Özsoy, Bekir Sami, (2011). *Başlangıcından Günümüze Türk Şiir*, Akçağ, Ankara.
- Pala, İskender (2004). *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Kapı, İstanbul.
- Qeredaxî, Mihemmed ‘Elî, (2011). *Keşkülî Kelepûrî Edebî Kurdî*, c. VII, Aras: Hewlêr:
- Rehmî, Fatêh, (1386). *Destûrê Zebanê Kordî: Hewramî*, Kanî, Senendec.
- Rehmî, FfatêSh, (1389). *Beyan Der Şê’rê Horamî*: Kanî, Senendec.
- Rencber Çiqakbûdî, Wehîd, (1388). *Destûrê Zebanê Kêrmanşayî*, (Muhammed Hadî Rencber), Taqê Bostan, Kêrmanşah.
- Rûhanî, Baba Şeyx Merdox, (2011). *Mêjûy Nawdaranî Kurd*: ‘Arif, Zanayan, Wêjewanan, Şa’ran, (wer: Macid Merdox Rûhanî), Ekadîmyay Kurdî, Hewlêr, 2011.
- Saraç, Yekta, (2014). *Klâsik Edebiyat Bilgisi: Biçim- Ölçü- Kafîye*, Gökkuşbu Yayınları, İstanbul.
- Sefa Zebîhullah, (1369). *Tarîxê edebiyatê Îran*, c. V, Fêrdos, Tehran.
- Senendecî, Mehdî, (1394). *Tosîfê Ecmalî: Zebanê Bastanê Horamî Ez Zebanhayê Kordî*, Evîn, Merîvan.
- Serdar, Babed, (2015). *Dîwana Şêx Şemsedîne Exlatî*, Nûbihar, İstanbul.
- Seydî, (1384). *Dîwanî Seydî*, (amd. Muhammed Emînî Kardoxî), Kurdistan, Senendec.
- Siyaypoş, (2011). *Seyfu’l-Milûk û Bedî’u’l-Cemal*, (amd. Bedîrxan Amedî), Nûbihar, İstanbul.

Sultanî, Muhammed ‘Elî, (1364). *Hedîqeya Sultanî*, c. I, Weşanên Kelhor.

Sultanî, Muhammed ‘Elî, (1372). *Coxrafyaê Tarîx û Tarîxê Mufeselê Kirmanşan*, Weşanên Mofîq, Têhran.

Şêkergozar, Yasemîn, (1394). *Behram û gulendam*, Hopa, Tehran.

Şemîsa, Sîrûs, (1383). *Ferhengê Telmîhat*, Çapxanê Mîtra, Têhran.

Şerefkendî, ‘Ebdurrehman, (1379). *Henbane Borîne: Ferhengê Kurdî-Farisî*, Siruş, Tehran.

Tan, Samî, (2011). *Rêzimana Kurmancî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul.

Taş, Çetîn, (2013). *Waneyen Riziman û Rastnivîsa Kurmancî*, Dîwan, İstanbul.

Tebrîzî, ‘Ëssarê Molana Şemseddîn, (1375). *Mêhr û Moşterî*, (amd. R. M. Sebzêvarî), êntêşaratê Danêşgahê ‘Ellame Teba Tebayî, Têhran.

Tewahudî, Kelîmullah, (1384). *Nadir Sahibqiran: Nadirşah Ber Mebnay Êsnadê Xetî*, Jiyar, Hewlêr.

Welî Dîwane, (1392). *Dîwanî Welî Dîwane: Soranî û Hewramî*, (amd. Razî), Kurdistan, Senendec.

Xanay Qubadî, (1985). *Xusrew û Şêrîn* (amd. Muhammedê Mela Kerîm), Urmiye, weşanên Selaheddîn Eyyûbî, Urmiye.

Xanay Qubadî, (2016). *Dîwan*, (amd. Karwan ‘Usman Xeyat), Şiwan, Senendec.

Xanay Qubadî, (2017). *Leyla û Mecnûn* (amd. Karwan ‘Usman Xeyat), Şiwan, Senendec.

Xeznedar, Marif, (2001). *Mêjûy Edebî Kurdî*, c.II, Çapxaney Wezaretî Perwerde, Hewlêr.

Xeznedar, Me’rûf, (1984). *Mêjûy Edebî Kurdî*, Bexda.

Xizrî, Seyyid Şehab, (1393). *Ferhengê Namha û Şexsiyetha: Kordî- Faresî*, Êntêşatarê Kalic, Senendec.

Yaheqî, Mohemmed Cefer, (1386). *Ferhengê Esatîr ve Dastamnvarêha Der Edebiyatê Fasrêsî*, Ferhengê Mo’asêr, Têhran.

Yarshater, Ehsan, (2010). *A History Of Persian Literature: Kurdish, Pashto, Balochi, Osettic, Persian and Tajik*, I.B. TAURIS, New York, 2010.

Yezdanpenah, Mecîd, (1384). *Rustem û Zunûna Elmas Xanê Kendûleyî*, Neşrê Çeşmey Huner û Danêş, Kêrmanşah

Yıldırım, Kadri, (2012). *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dil Bilgisi: Kurmancî Lehçesi*, Mardin Üniversitesi, Mardin.

Yıldırım, Nimet, (2006). *Fars Mitolojisi Sözlüğü*, Kabalcı Yayınları, İstanbul.

Yûsofî, Hadî û Hemdîdî Ferhad, (1393). *Tatbîqê Do Manzûmeyê Qenayî Farêsî û Kordî Mota'alê Morêdî: Xosrô û Şîrînê Nêzamî û Xosro û Şîrînî Xana Qobadî'*, Do Faselnameyê Edebnamê Tatbîqî, salê evvel, şomarê evvel, Payîz û Zemestan.

## FERHENGOK

### A

Acûc û bacûc: yehcûc û mehcûc

Ahir: agir

Ahû: ask, xezal

Ahûyê muşknaf: xezalên navika wan bi misk

Ama: hat

Amam: hatim

Aman: ew hatin

Amaş: ew hat

Ane: ev der

Aro: îro

Aw: av

Awan: (pj.) ew

Awê Kewşer: ava Kewserê

Awerdiş: wî anî

Axêz: rabû piya

Axûş: hemêz

### B

Babo: bav

Bada bimano: pişt re bimîne

Bağ: bask

Bağdar: teyr

Banûy baş herem: şahbanû

Banûy baş: şahbanû

Baş: ser

Bayeqoş: kund, bûm  
Be ca mawerûn: bi cih bînin  
Be: bi  
Bêbinyad: bêasas  
Bed: xirab  
Bêdar: şiyar  
Bedtañe: bêşans, bextireş  
Bena kerd: ava kir  
Bend: ben, kindir  
Beng: esrar  
Ber awerdey: hilgirtin  
Berden: birin  
Berg: cil  
Berq: birûsk  
Berşî: çû  
Berşîm: çûm  
Berûn: min bir  
Berz: bilind  
Betañ bî: poşman bû  
Beter: xirabtir  
Beterter: xirabtir  
Beñn: zik  
Bewyeran: bînin  
Bêxired: bêaqil  
Bey mezmûn: bi awayeke veşartî

Beyza: sipi

Bibexşû: bibexşim

Bideran: didin

Bîdî: çol, sehra,

Bikerû: bikim

Bikêşe: bikşîne

Bikêşûn: bikşînin

Bilêsey ahir: çirîskê agir

Bimano: bimîne

Bimano: bimîne

Bimanûn: bimînim

Bimirûn: bimirin

Binwazûn: bixwazin

Biperse: bipirse

Bipoşa: bipêçe

Biş biş kerd:

Birêzûn: birêjin

Bişşiya: birandin

Bisazû: saz bikim

Bisazûn: saz bikim

Bisparûn: bispêrin

Bişkafûn: vebin, bişkufin

Biwaçan: bibêjin

Biwanan: bixwînin

Biwanan: bxwînin



Biwanoş: ew vexwe

Biwaze: bixwazin

Biwîne: bibîne

Biwîno: bibîne

Bizanû: bizanibim

Bosa: wamn paç kir

Bûrçîn: werdek

## C

Ca awerdey: bicihanîn

Cage: cih

Ce kerdey karit: ji kirina karê te

Ce lay: ji hêla

Ce: ji

Cemîn: enî

Cergiş kawiya: cigera wî heliya

Ceste: beden, laş

Cew bone: ji bo vê yekê

Cext: tûjî

## Ç

Çem: çav

Çenê: çend

Çenî: ligel

Çeper: qasid

Çereng mesazo:

Çerxê çep gerdiş: feleka çep dizivire

Çêş: çî

Çeşm: çav

Çiman: (pj.)çav

Çoqiya: deste

Çûn: dema ku, wexta ku

## **D**

Daş: da wî

Dehanim: devê min

Demax: bivîl, poz

Derdê nehan: derdê vaşartî

Derîçey zemzem: gola zemzemê

Derûniş: nava dilê wî

Deseîlat: çareserî

Deseîlat: hêz, qedret

Dest ne ban dest: dest li ser dest

Destgîr: girtî

Destim berşî: ji destê min çû

Dêwiya: bijorveçûyîn

Dîdarit: rûyê te

Dîde: çav

Dîdem: çavê min

Dîdemest: çavên xumarî

Dihen: dev

Dihol: def

Dîl: esîr, kole

Dîrêş: dilbirîn

Dîn: dîtin, wan dît

Diro: derew

Dirrî: dirandin

Dîş: wî dît

Dîş: wî dît

Dîşan: wan dît

E

Êd: ev

‘Edawet: neyartî

Êden: ev in

Êden: ew

Edew: edeb

Edû: neyar, dijmin, neyar

Elbeda: elweda

Elwan: rengîn

Emcar: îjar, vê carê

Ême: em

‘Endelîb: bilbil

Enderûn: nava hundir

Endûh: xem, keder

Enîs û mûnîs: dost û heval

Êragêl:

Eragêlim: Eware

Eramende:

‘Erûs: bûk

Esrîn: firmêsk

Esrîn: firmêsk

Êwar: êvar

Ewend: her çiqas

Ewhalişan:

Ewîç: ew jî

Exter: sitêrk

Exyar: biyanî

**F**

Ferîwker: hîlekar

Ferzend: zarok

Fire kes: gelek kes

Fire metersûn: pir ditirsim

Fire: pir

**G**

Ga ga: car carna

Gêla: geriya

Gêliya: geriyân

Gêrt: girt

Gêrtên: wan girt

Geşt û gêl: geşt û ger

Gewher: cewher

Gezimçî: xizmetçî

Giļ: herî

Gîliya: guherî

Girdiş: ew girt

Gişt: bi tevahî

Giyan: rih, can

Goftar: gotin

Gurg: gur

## H

Halatişan: halê wan

Ĥalatişan: rewşa wan, halê wan

Haşten: derbas bûn

Henasanê serd: hilm, nefesa sar

Henî bimirûm: eger bimirim

Henî: hêdî, ta

Her çi biwaçî: her çi bibêjî

Herde: çol, sehra

Herzekar: bekar û bereday

Horgêla: zivirîn

Horpêçaş: (yj.) tomar kir

Hûn: xwîn

Hûn: xwîn

Ĥûrê rizwan ^

## Î

Î: ev

Îlçî: qasid

Îse: niha

## **J**

Jen: jin

Jenden: sitran xwendin

Jûjû: jûjî

## **K**

Kapoîê ser: tepalika serî

Kawan: (pj.)çiya

Kawistan: çiyayî

Kebûter: kevok

Keft: ket

Keftey: ketin

Kejdom: dûv xwar

Kelawan: tepalika çiyayan

Kemtar: keftar

Kenaçan: (pj.) keç

Kenîz: cariyê

Kerdem: min kir

Kerdewe: kiirye

Kerdey: kirin

Kerûn: dikim

Kêşan: kişandin

Kêşikçî: dergevan

Kewkeb: sitêrk

Kîsel: kûsî

Kiyanaş: ew şand

Kiyastim: min şand

Koh: çiya

Kotere: kevok

Kûbakûs:

## **L**

Leb: lêv

Lêbas: cil û berg

Leleş: lalayê wî

Let let: perçe perçe

Ûew: lêv

Lêwen: dîn in

Lexte lexta: perçe perçe

Liwa: çû

Liwa: çû

Liwan: çûn

Liwan: çûn

## **M**

Maçan: dibêjin

Maçî: dibêjî

Mah: hîv

Mangay bêdendan: çêleka bêdiran

Mawerûn: ew tînin

Meberûn: ew dibin

Mebo: nebe

Medira: li piya disekine

Megêlam: dizivirim

Megêlam: dizivirîm

Megêlna: ew dizivirin

Megêlûn: digerim

Megêlûn: dizivirim

Megêrûn: digerim

Megrêzo: dirêje

Mêhman: mêvan

Mehpare: perçeya hîvê

Mekend: kûn dikir

Meker feramoş: ji bîr neke

Mekerû: dikim

Mekerûn: dikin

Mekêşo: dikişîne

Mekr û efsûn: hîle û sêhr

Mel: balende, çûk

Melamet: lome

Melan: (pj.) balende

Melawna:

Melerza: dilerizîn

Melûl: xemgîn

Memanû: bimînim

Mend: ma

Menşûr: navdar

Menzûrim: armanca min



Mepêkî: diavêjî  
Mepersî: dipirsî  
Meraļ: xezal  
Merden: mirin  
Merg: mirin  
Mesûza: dişewite  
Mesûzû: dişewitim  
Meşî: diçûm  
Metersûn: ditirsim  
Metikyo: diniqutî  
Mewanan: wan dixwend  
Mewanaş: wî dixwend  
Mewarû: dixwim  
Mewarûş: ew dixwe  
Mewatiş: wî digot  
Mewc: pêl  
Mewcê derya: pêlên behrê  
Mewday xeter.  
Mewyera: tînin  
Mewyero: ew tîne  
Mêxek: qerenfil  
Mexêza: ew radibin piya  
Mexêza: rabûn piya  
Mexêzo: ew radibe piya  
Mexêzo: radibe

Mexfî: veşartî  
Meyawî: dihatî  
Mezana: dizanin  
Mezano: ew dizane  
Mezanûn: dizanin  
Midra we bédend: bédeng sekinî  
Midra: sekinî  
Mijaniş:  
Milçal:  
Mîna: surahiya şerabê  
Mirwarî: sedef, incî  
Mişnewû: dibîhîzim  
Miz û mêş: bizin û mêşin  
Mizanûn: bizanibim  
Mizdanî:mizgînî  
Mizganî: mizgînî  
Mudam: berdewam  
Muneqqeş: neqşkirî  
Mûr: morîstank, kumorî  
Mûr: şîn  
Murx: çûk, balende  
**N**  
Nabîna: kor  
Nałdar: hesp, qatir û çarpê  
Namiş: navê wî

Namiş: navê wî  
Naqûs: zengila kilîsê  
Nawerdiş: wî neanî  
Nawerûn: nehanîn  
Neberd: ew nebir  
Neberdem: min nebir  
Neberdî: te nebir  
Neberdiş: ew nebir  
Nebero: nebe  
Necm: sitêrk  
Nedaro: nîne, tune  
Nekerd: nekir  
Nekerdim: min nekir  
Nekerdîş peyda: ew peyda nekir  
Nemam: şaxa teze  
Nemenden: neman  
Neqab: poşî  
Neşî: neçûm  
Newaço: nebêje  
Newaçûn: nabêjin  
Newero:  
Newey kiyani: neviyên kiyaniyan  
Newînû: nebînî  
Newînûn: nebînim  
Newînûn: nebînin

Newnehaļ: şaxa darê

Newnemam: şaxa teze, xweşik û zerîf

Nezanam: nizanim

Nezer kerd: wî mêze kir

Nifrîn: nifir

Niga kerd: nihêrt, mêze kir

Nigedar: miqate

Ninişt: rûnenişt

Nişt: derzî

Niştên: rûniştin

Niwîsa: nivisî

Nûrê bînayîm: nûra çavên min

## **P**

Pabest:

Pabos: pîmaçkirin

Pêçaş: ew pêça

Pêda: di wî/wê de

Pêkyay peykan:

Pelasan: çirîsk

Pêm: ji min re

Pend: şîret

Penhan: veşartî

Pereng pereng:

Perêt: ji bo te

Perî min: ji mo min

Perî: ji bo

Perwerîş: hatiye perwerdekirin

Pesend kerd: eciband

Pêş: ji wî/wê re

Pêt: ji te re

Pêtan: ji we re

Pêtman: ji me re

Pêtşan: ji wan re

Pêwar: veşartî

Pey çêş: ji bo çî

Pey: ji bo

Pîkiya: avêt, pekiyas

Pîraş pîraş: perçe perçe

Pîraş: perçe

Pîregurg: jina weke dilêgurê pîr

Pîrşeng: çirîsk

Pose: bi vî şeklî, wuha

Pûr: kur

## Q

Qaj û qeļaḫ: qijik û qirang

Qapî: der

Qar û qîn û kîn: xeşm û kîn û nefret

Qar: qehr

Qarê qîr: weke qîrê reş

Qebzey quleng: destiyê kulingî

Qern: sedsal

Qetran: reş, weke qîrê

Qîn: kîn

Qirçiya: dengê şikandina darê

Quleng: kuling

Qûqûy qumriyan: xwendina qumriyan

## **R**

Rast waçe: rast dibêje

Rasten: rast in

Restaxêz: qiyamet

Rêza: wan rijand

Rêze rêze: dinuqute

Rîşê wêş kendiş: riyê xwe kişand

Riwala: diçûn

Rû sefid bîm: rû sipî bim

Rûbah: rûvî

Rûsiya: rûreş

## **S**

Sahû: sahib

Sate: wext, dem

Seng: kevir

Seriş werd: serê wê xwar

Sernigûn: serberjêr

Sersewz: werdekê nêr

Sêweng: reş, kilkirin

Sewgend werdim: min sond xwar

Sewgend: sond

Sewgend: sond

Sewl: serw

Seylê: lehî, laser

Sikenderasa: weke Îskender

Sîm: zîv

Sîpaş: artêşa wî

Siperdiş: ew sipart

Siperdiş: ew sipart

Siperdiş: sipart

Siya sitareş: bextireşiwa wî

Şob: sibe

Soxen: gotin

Sucde berd be xak: secde bir ber erdê

Sûd: fayde

Sûsen: sosin

Ş

Şam: şev

Şar: bajar

Şeb: şev

Şehabê şew:

Şend: avêt

Şeraw: şerab

Şêt: dîn û şeyda

Şêt: dîn, eware

Şew: şev

Şî: çû

Şîkar: nêçîr

Şîkawa: vebû

Şîkawa: vebû, qelişî

Şime: hûn

Şimşal: şimşad

Şîn û şîwen: girîn û fixan

Şîn û şîwen: şîn û girîn

Şîn: ew çûn

Şinaw: avjenî

Şineftim: min bihîst

Şineftiş: ji wî/wê bihîst

Şineftiş: wî bihîst

Şîşdang: bi tevahî, kamil

Şîtab: bi lezgînî

Şîtaw: gola ji ava berfê pêk tê

Şîwe: şilk, terz

Şox û şeng: şad û kêfxweş

Şox: xweşik

Şûm: bêyewm

Şûn: cih

T

Ta îse: heta niha



Tafte: qûmaşê hevrişim

Tak û tenya: bi tenê

Taney roziger: teneya dinyayê ji melametiya felekê

Taq: vekirî

Taş: kevir

Taşê tûr: çiyayê Tûr

Tawinaş: çirisî, heliya

Tawistan: havîn

Tawiya: heliya

Tawiya: heliya

Te'cîl: ecelekirin

Têda: di wî/wê de

Teşay eşmer: zêrê sor

Tewasa: tirsîn, bi tirs

Teşirasa: weke balendeyan

Teşirasa: weke teyr

Tîpê teşeran: leşkerên Tatar

Tîz: tûj

Toz û gerd: xwelî û xubar

Toz: xwelî û ecac

## **W**

Waçan: dibêjin

Wała: bilind

Wano: xwend

Waran: baran

Wasten: xwastin

Wat: got

Watey waz: gotinên zelal

Watim: min got

watin: wan got

Watin: wan got

Watiş: wî got

We: bi, û

We: li ber, li pêşî

Wehar: behar

Weled: zarok

Wêlgerd: serserî, debeder, dîn

Wêman: ez bi xwe

Wêman: em bi xwe

Wenar: anade

Wendiş: wî xwend

Wenet: ji te re

Wer: ber, pêşî

Werdişan: xwarin

Westan: bostan

Westen: girêdan

Westişan: wan xwast

Westişan: xwesteka wan

Weş amay: bi xêr hatî

Wêş be wêş: ew xwe bi xwe

Wêş: Ew bixwe

Weş: xweş

Wêşan: ew bi xwe pirjimar

Wêt: tu bi xwe

Wêtan: hûn bi xwe

Wîne: mîna

Wîr: bîr

Wist: xist

Wiyerd: derbas bû

**X**

Xab: xew

Xasen: baş in

Xaster: baştir

Xaîr : xeyal

Xaw: xew

Xawer: rojhelat

Xecalet: şermî

Xeciî mend: şermî ma

Xedeng: tîr

Xem werden: xem xwarin

Xemnak: xemgîn

Xesaw: derdê dewîneş

Xewf: tirs

Xêza: rabû

Xêza: rabû piya

Xêziya: nişkeva rabû piya

Xizirasa: weke Xizir

Xord û xorak: xwarin û vexwarin

Xord: xwarin

Xurşîd: roj, tav

Xuşk: hişk

## **Y**

Yane: mal, xanî

Yanet bo xiraw: mala te xirab bû

Yataxiş: cihê wî

Yawa: gihişt, hat

Yawa: gihiştin, hatin

Yawan: ew gihiştin, hatin

Yek çend: carek

Yekser: bi tevahî

Yelxar: hêriş

Yeqeş kerd çaq: singa xwe qelaşt

Yolxar: bi ecele, bi lezgînî

Yurtê wêş: warê xwe (wî)

## **Z**

Zam: birîn

Zaman: birîn

Zanaş: ew zane

Zano: dizane

Zîb û zişt: xweşik û elewat

Zinde manûn: zindî bimînîm

Zindetan: jiyana wan

Ziwan: ziman




PÊVEK

PÊVEK: Wenyên Destxetên Berhemên Elmas Xanê Kendûleyî



Pêvek 1: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1825). *Xusrew û Şêrîn: rûpela ewil*, Staatsbibliothek zu Berlin, Patermann II Nachtrag 13.



Pêvek 2: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1825). *Xusrew û Şêrîn: rûpela dawî*, Staatsbibliothek zu Berlin, Patermann II Nachtrag 13.

عادت روزی نکای جاشن کرد و روشن گردون بختمین کرد  
 ساجه صمیم اندام بستان جام و شکر فتنه بگردن شکر آفت و ازیدی  
 در راه و راه چون سنان است بپایان نت تا سینه منی بدست  
 نوشان و شکر شراب گل رنگ زاده جت تقیر صبر خنیل رنگ  
 خاصه ترشی آنا جلاده ۴ سجده زین بر دیند و باده  
 مراد ادب تمامین صفت جام بلورین بیا نزدی کف  
 غلامین جودت استای سنان سنانا جودت جام چهار سن  
 در شکر پیکان تحت شای کادری برد و بان دست و میرزا تمکین  
 بنا جاشن جودت غلام سنانا در دوش و درین جاشن  
 جاشن بودا بود زاج تحت لوان خلوت داران بندگی  
 تاج جودت کاشن سنانا باهو بند لال نکین

Pêvek 3: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (b.t.). *Xurşîd û Xawer: rûpela ewil*, Edmonds's Collection, IX. 2. Kurd.



تا چندی هر وقت که هزاران دنیا به دیاران و عیش و خادی دلخواه  
 هزاران درود هزاران صلوات زما به بر شاه مردان صلوات  
 هزاران درود هزاران صلوات زما به بر روضه مصطفی  
 هزاران درود هزاران سلام زما به بر محمد صلی الله علیه و آله  
 تمت شد کتاب خورشید خاور بعون الملک المنان یکم شهر  
 ربیع الاول در روز سه شنبه لاجل نفس فقید عبد  
 الحامید بیورعی اللهم صل علی محمد و آله  
 کبره الا کرون و کلمات عقل عن ذکره  
 الغافلون اللهم وفقنی  
 علی التعمیل بحرمته  
 سید المرسلین ص  
 آمین  
 ۱۳۳۰

Pêvek 4: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (b.t.). *Xurşîd û Xawer: rûpela dawî*, Edmonds's Collection, IX. 2. Kurd.

بسم الله الرحمن الرحيم

اول و نام خدای پادشاه

پادشاه به عیب کریم کار ساز

این کتب از مال علی اصغر  
تبخاخ

شکر لاله نه جوش بادش

شکوفت شیرین آمانه خدوش

پشتان بین دهم چو لول لاولاد

چون بلبه شخ غنچه کنگاد

شقیقه دماغ خنده کله شکاو

شخروش ویش هراسان رخاوه

ویش شیرین نه شیخ ویش

ویش ویش و خاطر خطر ریش

چکیب و تیر و لبر شودل را

تا جمع سیفند با دروش هلهدا

سحر و ریزه خاطر خطر مان

شیت شیدا اهل قیش کله چاک

ویش ویش و داد و رور

دیوانه ویری روینا نه کوه

چون تیس آهون ویری ده در

بژن بدن چاک سپه کانه در

شقاوه عاران سریش خارا

روالانه کوه روکوه نه سارا

همه مز ویش فرزند بزی زمان


نه کشت زکار ویش دست نمانا

عظمان با نه خاک سفان و زید

چکش با ویش کندش داوید

کنان رمای خرد و براری


سرو پای مرون شپه قاری

  
 Dt. 1990. Hs. or. 9777

Pêvek 5: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1914). *Şêrîn û Ferhad: rûpela ewil*, Staatsbibliothek zu Berlin, Hs. or. 9777.

خیمه طیر مور و مار      نغمه ماش به اشیا چند هزار  
 آدمی تمام انسانان      بنای تخت او بیرون فرمان  
 زور دنیا به و شاد      کانه کول دیو کانه پشت باد  
 به کرت به و دست      نه امر او به اشیا خاصت  
 عیسی مثنیای مریم      موجهش کردی ز لطفه آدم  
 تو به دانای دهنده      چند کن ز نطق او نوی نده  
 ای حکیم کوی طور ما و      کرد منا جات صحیح تا خور آوا  
 تو به امیدت سمانا      موسات و بالای کوه طور کینا  
 است کرد قادر کار ساز      موشا چینی تو آما با و از  
 ستاخ به نه چهار طرف      چس تو موات هزار کجرف  
 پیر نور احمد و مجود      دنیا و دست او کردی موجود  
 و اد و اد سمانا      لولاک لوکشف و روی او و انا  
 خلقشوا فلاك تو و ات      تو کیاستی پریش فرقان و خلا  
 و حرمت کزیده افضل      اسمش محمد مصطفای مرسل  
 بنده روز کارمان      ز کرده خراب نشر مسار نان

Pêvek 6: *Kendûleyî*, Elmas Xan. (1914). *Şêrîn û Ferhad: rûpela dawî*, Staatsbibliothek zu Berlin, Hs. or. 9777.



Pêvek 7: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1915). *Munacat: rûpela ewil*, Staatsbibliothek zu Berlin, Hs. or. 9778.

اول ابتدا و نام داور بے مثل مثال حی تو انکر  
ہم اون خالق دانا کل شی پنہا بند مال لایہوت حی  
یارب و حرمت انبیا تام بہ بخشہ کنار الماس خان تام  
سخن کتوشہ درون کردم جم پے شویش بنشین و ہم  
ایدن امیدم یاران دینی وقتی کہ نشین و شویش  
امر عزیزان ہوش بدین ہوش الماس و اصغر کین فرانش  
ہم ژ فاتحہ با درین و یار نویذہ و کاتب بکین آزاد  
تام شد مناجات کفتہ ملا الماس خان کندولہ و کاتب  
محمد رحیم ولد مرحوم مشہد کریم التماس دعا از برادران دینی  
دارم باقی و السلام

هذا كتاب خاور زمين و به نستعين  
 بسم الله الرحمن الرحيم  
 بنام چون حي ذوالجلال پادشاه قديم بهشت مثال  
 اربد و توفيق يار بوشهر ميو اظھر رکيم تمامر خبر  
 جنگ شاه مردان علي شيراز چنر سلسال شاه پيدنيز کافر  
 بواجم معون ستار عليم فضل بسم الله الرحمن الرحيم  
 روشري نيشته بن احبابان کبير ز مسجد پاک رسول سرور  
 عا شاي مردان حيدر صفد چنر بوالعجز مالک ارژور  
 هم سعد و قاص شير پير هنر عابد انصار عمار ياسر  
 هم زید انصار قبد غلام چنر اصحابان يکايک تام  
 ز کوشه لبان رازان مکدرج هرکي نام و شين خواص مورد  
 عمر عياروات و ياران يار اکرم بنوم کارميو دشوار

Pêvek 9: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1915). *Xawer Zemîn: rûpela ewil*, Staatsbibliothek zu Berlin, Hs. or. 9778.


242  
 شوق مدینه ز خاص و عام نام منم ~~پن~~ کنان و کام  
 هم شکر کون و داده خدا مملو حاصل با سر تا و پا  
 شرع مصطفی هر کس که قبول دستیکش مبعود خدا و رسول  
 چمت بیوشه ز کردار بد پناه بر و ذات سید سرمد  
 ز حرف با جا زبان ادب در تا که خلاص پیت فها ز محشر  
 و داده خدا تو هم قانع بر بچو هر روز ذکر پروردگار کر  
 نو شاد موره و دنیا پر فی فره کس جوین تویش که ز وطن  
 هیچکس تا دی حد پیدا نمندن عاقبت طلسم دنیا ریشخندن  
 هر کن کارم هم شر مسامح بلبی و امید پرور دکارم  
 یارب و حرمت انبیا تمام به بخشی کنای پیشیمان تمام  
 هزاران درود و هزاران سلام ز ما ~~محمد~~ علیه السلام

Pêvek 10: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1915). *Xawer Zemîn: rûpela dawî*, Staatsbibliothek zu Berlin, Hs. or. 9778.



Pêvek 11: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1825). *Xusrew û Şêrîn*: **rûpela 150**, Denmark, cod. Pers. Add.54.





Pêvek 12: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1825). *Xusrew û Şêrîn*: **rûpela 52**, Denmark, cod. Pers. Add.54.


هـ ن ا ل ب ت ا ب س م ا ن ه ا ل ر ح م ا ن ا ل ر ح م ا ن ا ل ر ح م ا ن ا ل ر ح م ا ن ا ل ر ح م ا ن  
 ا و ل م م ب س م ا ل ل ه ا ب ر ر ح م ا ن ر ح م ا ن ر ح م ا ن ر ح م ا ن ر ح م ا ن ر ح م ا ن  
 ل ر م ک ا ر ب ا ز ک ا ر ب د ا س ا ن ش ه ر ا د ه ش ر ف ر ح م ا ن ش ا س ا ن  
 س ر ن ف ت ر ق ا ن ش ع ا ش ف ا ن د ل د ا ر د ب ر س ب ز ر د ل ش د ل ر س ن ج ا  
 ب س و ر س م ن ه س و ر س ع و ع ا د ش ن د ر ش م ر د ش م ر م ن ج و ف ر ن ا د  
 م ل و ک م ف ل ا ب م ع ا ب ج ا ل م و ا ر م ه ل ا ش ک و ف ش ه م a l  
 ب ر و ز ب ه م ا م ک ل ا ن ا م ج م ن ب ر و ا ر پ ر م ن ز ش ک و ف ش م ر م ن ج  
 س ر ا ن ج ا م س د س و د ا ر م ا ل ی و ل ک ر و ا ب ک م ش ا ن ش ک ا ر ک ت ا ب و ن  
 ی ا ح ق ت و ز م ا ر ز و ق ک ش ت ن ه و ا ف ت ر د ا د ه ز م ی ا ز ش ت ن ه  
 ا و ل ت و م د ر س ر ا ن ج ا م ن ا ح ر ت و م ی ه ب ن ا ک ا م ن  
 ا ح ت ا ر و ت و ن ص ا ح ب س ر ط ت ر م ر م ا ن ت و ن س د س ت ل ا ت

Pêvek 13: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1825). *Xusrew û Şêrîn: rûpela ewil*, Denmark, cod. Pers. Add.54.

به اجات فرقا طهره سبطین	کوشواران عرش صن حین
اول اثر تقصیر شیبان بکزر	ویم لر عاصی کینه کمتره
هزاردن دور در هزاران سلام	زما بر محمد علیه سلام
هزاران دور در هزاران تحف	رما بار بر شاه مردان نجف
خدایا بیامرز خواننده	نوبنده و هم شونده
همه اهل مجلس سفار کبار	سپامرز امی قار کبر کار
ز مجلس رحمت یزدان که باد	که کاتب ربه احمد کف پاد
هر که خاند دعا سمع دارم	زانکه من بنده کینه کلام
هر که این خط را سیاه کند	علی حد حکم شرک کباب

تمت الکتاب بعون الملك الوهاب وتمام  
کتاب شریین و خسرین من کلام ملا الماسل خا  
ن بنارنج شهر جماد الثانی عشر ۱۲۳۰

Pêvek 14: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1825). *Xusrew û Şêrîn: rûpela dawî*, Denmark, cod. Pers. Add.54.



Pêvek 15: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (18XX). *Nadirname: rûpela ewil*, Staatsbibliothek zu Berlin, Hs. or. 9775.

آخر کای به هر زهر است  
 بفتح فرصت اهل امامان  
 خیز باد برادش بر نیز شکوی  
 قندی دو غضب ای کرد و شران  
 و تش لیراں احمدی در دانی  
 به هر اور و زن غارتش کردیم  
 کینه مالعی نهی جائے سستیز  
 ما و جش جنگ یار اقبال کن  
 پشت سدا نه پشت طایفه ططر  
 در کنس طپیان یزداں کن دیاد  
 انفعال شفق و زقندی خیر  
 چون باد صرصر طوفانے  
 دست و تیغ تیز آوردن هجوم  
 دشور شمشیر قدر غضب ناکت  
 قاد کردن وقت صلوات هیدان  
 و قتل قرض زایان دال  
 مردان رور مصاف زردی سندن  
 ای طپ دای صفا و صفا ای سان

بقدر کردن قوم کلدش کاک  
 نسیم شمال آما اثر دایمان  
 کیش پیدان پاجنگ رودی  
 کیت داد کیج وادی و لیراں  
 ارد رزم روم ایبو طوران  
 نچاله سیان بردش کردیم  
 جنگ خیرت نهی جای کمریز  
 ما و مردی نان نادر حلال کن  
 باوریش دسر زاد جدر به ططر  
 مردن کیم و زن هر چه بادای  
 کیت دای دهم دست کیت  
 قیقان و قیقان قیقان افق  
 چتر قمر قلمز دای نه قلب روم  
 رومی چون خزان ریزان  
 ططر کاک کندن از سداں  
 طپیان طپیان نه طپ قمران  
 ای طپ دای و طپ او طپ کیت  
 طپیان دای و یک شیمان افق

Pêvek 16: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (18XX). *Nadirname*: **rûpela dawî**, Staatsbibliothek zu Berlin, Hs. or. 9775.

پند چا پرداخ مو احم سنان	پله نامسران و بخت و ستان
مرف کفنارم کمن فراموش	پندم پاسان بکیرنگوش
بویبون منخ بکین و یار	تا ز دما سن کر نم بر و باد
جدا کر جاکش ز دیت بکره	فرزند قره ز رسیور نور
لطفه نا خلف سر مد دیت نیار	ژ لطفه خلف سوینج براد
ژ سرد ژ مال ژ دین در ایمان	نا خلف ژ کشت مو پوچمان
سیاه به شمش نم سون سغید	ژ نفل ناپاکت مهندهن امید
کس ژ چپ را آیدش هرگز نه	ژ مان ژ سپلو چپ آفرین
چینه هرزه کرد مکنج مم رامی	مکن رفیقے چینی هر جائے
البت ژ جائے جامدان و پیش	اگر هر جائے خاس میر ژ دیش
ژ کج کلامان نین عقلمو فی م	چینه هرزه کو بون نام کلام
یکه به بنکر مبر دوش نامش	اگر هرزه کو خاس مپه نامش

Pêvek 17: *Kendûleyî*, Elmas Xan. (1825). *Pendname: rûpela ewel*, Denmark, cod. Pers. Add.54.

به حاجات فرقاطه سبطین	کوشواران عرش حسن حسین
اول اثر تقصیر شیطان بکزر	و بیم لرغاس کمیته کمتره
هزارین دورد هزاران سلام	ز ما بر محمد علیه سلام
هزاران مورد هزاران تحف	ز ما بار بر شاه مردان نجف
خدا یا بیامرز خواننده را	نوبنده و هم شونده را
همه امر مجلس سفار کبار	پیا مرز امی قار کبر کار
ز مجلس رحمت یزدان که باد	که کاتب را به احمد کند یاد
هر که خاند ذنا سمع و آرام	زانکه من بنده کینه کام
مر که اینر خط را سیاه کند	علی حد جگر شرا کباب کند
<p>تمت الکتاب بعون الملك الوهاب و تمام  کتاب شیرین و خوش من کلام ملا الماس خا  ن بنار پنج شهر جماد الثانی عشره</p>	

Pêvek 18: **Kendûleyî**, Elmas Xan. (1825). *Pendname*: **rûpela dawî**, Denmark, cod. Pers. Add.54.